
MAM CELAL

HEVPEYVÎNA TEMEN

JI XORTIYÊ HETA KOŞKA KOMARÊ



Amadekar

Selah Reşîd

Wergêr û Edîtor

Emîr Hesen

Deng

Emîr Hesen

Melek Ehmed

Silêmanî

2026

Cilda 1

Gotara Wergêr

Xwendevanên Hêja:

Berî xwendina vê pirtûkê ku ji hevpeyvîna Selah Reşîd digel xwedê jê razî **“Celal Talebanî”** pêk tê, pêwîst e, ez bala we bikişînim ser çend mijaran, ku dibe ji bo we cihê pirsê bin.

ji ber hebûna hejmareke mezin a navên erebî û ji bo parastina awayê bilêvkirina wan, ez neçar bûm di nivîsîna wan de rêzikên rastnivîsa kurmancî berçav negrim û hinekan li gorî rêzikên gramera îngilîzî binivîsim, çimkî di astsa navdewletî de navên wan kesatiyan bi rênivîsa îngilîzî hatine nivîsandin û bi wî awayî jî tên naskirin.

Di nivîsîna navên erebî de, ji ber nebûna şûngira tîpa erebiya “**eyn =** ع”ê di kurmancî de, min li hinek cihan tîpa kurdî ya “**i**”yê û li hinek cihan jî “**dabir**” (’) bi kar aniye, da ku bi awayekî navînî ew kêmasî were çareserkirin, mînak:

Seidûn(سعدون), Beis (بعث), El-Mezre’e (المزرعه), Es’ed (/ئەسعەد اسعد).

Ji bo ku şaşî di navbera “**heta**” ya kurdî û “**hetta** (حتى)” ya erebî de çênebe, ya erebî wek xwe bi tîpa dubare “tt”yê (he**tt**a) hatiye nivîsandin.

Her wisa ji bilî hejmarek kêm navên biyanî, min ên din li gorî rênivîsa kurmanciya latînî nivîsandine, ne bi rênivîsa tirkî, îngilîzî yan her zimanekî din ê latînî.

Hevalên hêja, bêguman tu berhemek bê kêmasî nabe; lewma ez rica dikim eger her şaşî yan kêmasiyekê bala we

kişand, an her pêşniyarek we hebû, hûn bi rêya **e-maila** jêrîn dikarin ji min re bişînin.

emirmilan2016@gmail.com
Vekolê ziman û rojnamevan
Emîr Hesen (Amir Milan)
Gulana 2026'an

Naverok

Pêşgotin

- Ev hevpeyvîn çawa çêbû.....10

Beşa Yekem:
Qonaxa Zeroktî û Tezelawiyê

- Zaroktî, dibistan û destpêkirina jiyana siyasî.....16

Beşa Duyem:
Destpêka Xebatê

- Destpêka jiyana siyasî.....23
- Destpêkirina karê siyasî.....27
- Komara Mihabadê.....28
- Kovara Gelawêjê.....32
- Bûyerên Iraqê û Serhildana Wesbeyê 33
- Jiyana xwendekariyê 36
- Partiya Komunîst a Iraqê û pirsa Kurd.....41
- Yekem nakokiya di nav PDK'ê de 44
- J.K. û Komara Mihabadê 46
- Cihêbûna yekem a ji PDK'ê 50
- Serhildana Tişrînê (Cotmeh) 53
- Çepgirî û guhertina navê PDK'ê.....54
- PDK û hilbijartina parlamentoya Iraqê.....57

Beşa Sêyem:
Qonaxeka Nû ya Xebata di Nav PDK'ê de

- Avakirina saziyên xwendekaran, ciwanan û jinan.....61
- Mafê çarenivîsê û partiya komunîst.....63
- Têkiliya PDK'ê û Hizba Demokrat (PDK-Iran).....66
- Pîrozkirina helkeftên neteweyî.....67
- Rêxistina karên PDK'ê li Hewlêrê.....69
- Bandora Yekîtiya Sovyetê û Eniya Sosyalîst li ser PDK'ê.....71
- Komara Demokratîk a Neteweyî ya Kurdistanê.....74
- Kurdên Îranê û beşdariya di PDK'ê de.....75

- Têkiliya bi Kurdên parçeyên din ên Kurdistanê.....76
- Yekem çalakiya siyasî li derveyî Kurdistanê.....77
- E vîndarî û girtîgeh.....78
- Rola Îbrahîm Ehmed û Hemze Ebdullah di PDK'ê de.....79
- Sewqa Barzaniyan, jiyan û karê siyasî li Sovyetê.....83
- PDK di serdema paşatiyê de.....89

Beşa Çarem:
Destpêka Qonaxa Çalakiyan li Derveyî Iraqê

- Festîvala Warşovayê û Nazim Hîkmet.....93
- Serdana Çînê.....97
- Festîvala Ciwanan Li Moskowê.....99

Beşa Pêncem:
Yekem Hevdîtina bi Barzanî re

- Mam Celal çawa Barzanî dît? 105
- Avakirina partiyeke Kurd li Sûriyeyê.....111
- Cihêbûna kadroyên Kurd ji partiya komunîst.....113
- Partiya komunîst û çepên Iraqê cihêbûn û yekbûn.....115
- Fehd û pirsa Kurd.....118
- Eniya Yekîtiya Nîştimanî ya Iraqê.....123

Beşa Şeşem:
Geşbûna Xebata Kurdatiyê
Di Qonaxa Ebdul Kerîm Qasim de 1958-1963

- Vegera Barzanî bo Iraqê.....129
- PDK û Şoreşa 14'ê Tîrmehê.....133
- Derkirina Mam Celal ji polîtburoya PDK'ê.....135
- Çapemeniya partiyê û rojnameya Xebatê.....137
- Tevgera Şewafê li Mûsilê.....141
- Destpêka nakokiyên Ebdul Kerîm û PDK'ê.....146
- Nakokiyên Qasim û Barzanî.....149
- Barzanî û Brîtanya.....155
- Barzanî û partîtî.....159
- Yekem plana Qasim li dijî Barzanî.....161

Beşa Heftem:
Destpêkirina Şoreşa Îlonê

- Xebata çekdarî.....166
- Şoreşa Îlona 1961'an.....169
- Peyama Şêx Ehmed bo Ebdul Kerîm Qasim.....171
- Yekem bombebarana Kurdistanê.....171
- Xweamadekirin bo xebata çekdarî.....173
- Vekişîna Barzanî ji şoreşê û çûyîna Tirkiyeyê.....176
- Slogana şoreşê û navê pêşmerge.....178
- Darayiya şoreşê çawa hat peydakirin? 179
- Yekem çalakiya pêşmergeyan li devera Silêmaniyê.....181
- Ji xebata siyasî heta şoreşa çekdarî.....184
- Pirsa Kurd û demokrasî.....186
- Geşbûna şoreşê û meseleya caştiyê.....195
- Barzanî û partîtî.....197
- Xurtbûna pêşmergeyan û vejîna encumenên gundan.....199
- Du xetên siyasî di nav partiyekê de.....201

Beşa Heştem:
Diyalog û Xebata Dîplomatîk

- Têkiliya Beis û PDK'ê.....204
- Yekem wezîrên Kurd.....205
- Destpêka nakokiyên PDK'ê û Barzanî.....206
- Barzanî û nasnavê "Mamoste" 208
- Darbeya Sibata 1963'yan.....211
- Diyaloga PDK'ê û Beisiyan.....215

Beşa Nehem
Ebdul Nasir û Kurd, Xebata Kurdî-Erebî

- Ebdul Nasir û pirsa Kurd.....221
- Serdana Mam Celal a Qahireyê.....223
- Navcîtiya Ebdul Nasir di navbera Kurd û hikûmetê de.....226
- Serdana Mam Celal a Cezayîrê.....229
- Serdana duyem a Bexdayê.....235

- Têkiliya Kurd û Amerîkayê.....242
- Serdaneke din a Qahireyê.....245
- Destpêkirina şer, piştgiriya cîhanê bo Kurd.....252
- Rola Sovyetê, Ewropaya Rojava û Ereban.....254
- Darbeyeke nû û diyalogeke nû.....263
- Lihevkirina Şêx Ehmed û hikûmeta Iraqê.....267
- Pirsa Kurd, nakokiyên Sovyetê û Çînê.....271

Beşa Dehem:
Destpêka nakokiya navbera polîtburo û Barzanî

- Lihevkirina Barzanî û Ebdul Selam Arif.....275
- Kûrbûna nakokiyên Barzanî û polîtburoyê.....280
- Polîtburo û Barzanî.....281
- Çareseriya nakokiyên Barzanî û polîtburoyê.....183
- Barzanî û şoreş.....288
- Biryara karnekirina gel Barzanî.....289
- Pêşniyara Barzanî ya guhertina navê PDK'ê.....291
- Parçebûna PDK'ê.....292
- Destpêka şerê navxweyî yan şerê birakujî.....294

Beşa Yazdehem:
Ji Hemedanê heta Bexdayê

- Çûyîna Îranê 297
- Têkiliya Barzanî û Îranê.....302
- Yekem Diyaloga Barzanî û polîtburoyê.....304
- Rola Îranê di tevgera Kurd de.....308
- Destpêkirina şerê hikûmetê û PDK'ê.....312
- Lihevhatina demkî ya Barzanî û polîtburoyê.....314
- Ragihandina şerê li dijî polîtburoyê.....317
- Diyaloga polîtburoyê û Bexdayê.....322
- Peymana 29'ê Hezîrana 1966'an.....328
- Beşdariya du baskên PDK'ê di hikûmetê de.....332
- Cemaeta Melayî û Celalî yan Cemaeta 66'an.....333
- Kongreya Cezayîrê ya 1967'an û pirsa Kurd.....335

- Avakirina baskê çep di nav PDK'ê de.....344

Beşa Dazdehem:
Hatina Beis û Peymana 11'ê Adara 1970'ê

- Darbeya Beisiyan.....348
- Sedam Hisên û Kurd.....352
- Beşdariya Polîtburoya PDK'ê di hikûmeta Beis de.....358
- Şerê navxweyî yê PDK'ê.....363
- Peymana 11'ê Adara 1970'yan.....365

Beşa Sêzdehem:
Lihevhatin û Yekbûn

- Helwesta Barzanî piştî 11'ê Adarê.....368
- Lihevhatina Barzanî û polîtburoyê.....369
- Hilweşandina PDK'ê (baskê polîtburoyê).....375
- Rêxistina Komeleya Rencderên Kurdistanê.....380
- Şerê navxweyî û hikûmeta Bexdayê.....382
- Barzanî piştî 11'ê Adarê.....385

Beşa Çardehem:
Bandora Kurd û çepên Îranê li ser Kurdistana Iraqê

- Têkiliya Kurdên Iraqê û Îranê gel çepên Îranê.....390
- Têkiliya bi Kurdistana Îranê re.....396

Beşa Pazdehem:
Karkirina di nav Filistîniyan de

- Jiyana di nav filistîniyan de.....404
- Karekî gelek bi xeter.....407

Beşa Şazdehem:
Peymana 1975'an a Cezayîrê

- Peymana 1975'an a Cezayîrê.....421
- Rola Nû ya Sovyetê.....424

Beşa Hevdehem:
Bingeha Xebatek nû

- Komele (Komeleya Rencderên Kurdistanê) 427
- Hizra Maoîzmê di nav tevgera Kurd de.....430

Beşa Hejdehem:
Wêne Mam Celal

- Ji xortiyê heta serokkomariyê.....439

Parvekirina Pirtûkê li Gorî Xelekên Dengî

Xelek	Rûpel	Xelek	Rûpel	Xelek	Rûpel
Pêşgotin	10	Xeleka 16	171	Xeleka 32	332
Xeleka 1	16	Xeleka 17	181	Xeleka 33	344
Xeleka 2	23	Xeleka 18	195	Xeleka 34	358
Xeleka 3	32	Xeleka 19	206	Xeleka 35	368
Xeleka 4	41	Xeleka 20	215	Xeleka 36	380
Xeleka 5	50	Xeleka 21	226	Xeleka 37	390
Xeleka 6	61	Xeleka 22	235	Xeleka 38	404
Xeleka 7	71	Xeleka 23	245	Xeleka 39	421
Xeleka 8	83	Xeleka 24	254	Xeleka 40	430
Xeleka 9	93	Xeleka 25	263		
Xeleka 10	105	Xeleka 26	271		
Xeleka 11	115	Xeleka 27	283		
Xeleka 12	129	Xeleka 28	291		
Xeleka 13	137	Xeleka 29	302		
Xeleka 14	149	Xeleka 30	312		
Xeleka 15	159	Xeleka 31	322		

Pêşgotin
Ev Hevpeyvîn Çawa Çêbû?

Mam Celal Gulana 1990’an ku Remezan jî bû, hat Berlînê û heyamekê em bi hev re di apartmana hevalekî de diman, ku bi xwe li wir nebû. Demek dirêj di ber destê me de hebû. Bi vegotina bîranîn û gotûbêjan me derbas dikir. Ji ber ku Mam Celal rojî digirt, rojane ji bo kirîna pêdiviyan me serdana bazarê dikir.

Tevî wan karan, lê demek me ya baş hebû, lewma ez fikirîm hevpeyvînekê bi Mam Celal re bikim. Her çend destpêkê min pênivîs û kaxiz bikar anîn, lê gelek zû derket ew şêwe bersivdar nîne, lewma min bi riya qeydkera deng, dest bi tomarkirina hevpeyvînê kir, ku amûreka sade bû.

Ya rast ne min pêşwext xwe ji bo hevpeyvîneke wiha dûr û dirêj amade kiribû, ne jî Mam Celal çavkaniyên pêdivî di ber dest de hebûn, ji ber wê yekê pêwîst bû em nav bi nav gotûbêja xwe rawestînin û dubare dest pê bikin.

Vê hevpeyvîna dûr û dirêj li wê apartmanê dest pê kir. Her gavê ez bi her mebestekê derketibama derve, min çend pirs û kasêt li cem Mam Celal datîna, da ku bersiva wan pirsan bide heta ku ez vegerim.

Piştî tijîbûnê, wî bi xwe kasêt diguhert, lê hinek caran bîr ve dikir, tevî ku bersiva hemû pirsan dida lê beşek ji wan nedihat qeydkirin, ji ber wê yekê bi neçarî Mam Celal dubare bersiv wan pirsan dida û digot: “**Bersivdayîna herî nexweş, dubarekirina bersivê ye**.”

Piştî ku me beşek berbiçav ji hevpeyvînê qeyd kir, Mam Celal vegeriya Kurdistanê. Piştre jî guhertinek mezin li Kurdistan û Iraqê çê bû, paş hingê me li Kurdistanê hev du dît.

Ji wê hingê heta vegera min a hertimî ya Kurdistanê di Havîna sala 2000'ê de, min wekî alîkarê Cenabê Mam Celal ji bo karûbarên derve yê YNK'ê kar dikir.

Heta jinavçûna desthilata Beis û avakirina Encumena Hukim li Bexdayê, mecal ji bo hevpeyvînê çê nebû, ji bilî ku min car bi car Mam Celal didît, çend pirsên nû jê dikir.

Ya rast di vê hevpeyvînê de, min nedît ku Cenabê Mam Celal bala xwe bide çavkaniyekê yan jî di bersivdayînê de dudil be, yan pirsekê red bike û hez bike li gorî xwesta wî pirs bê kirin an jî bersivekê biguhere.

Di hevpeyvînê de Mam Celal li gorî têgihîştina xwe behsa bûyeran dike, çawa ku bi xwe bûyer dîtiye wisa jî vedibêje. Bi taybetî ku di piraniya bûyeran de rolek wî ya berbiçav hebûye, ji ber wê yekê, em nikarin bêjin; şêweya wî ya vegotinê pir bê alî ye, tenê wekî vegotina bûyerek dîrokî bala xwe dayê, ku tê de pirs jê hatiye kirin.

Vê hevpeyvînê heyama 15 salan kişandiye. Di wê heyamê de, bûyerên mezin û girîng li cîhanê, deverê, Iraqê, Kurdistanê û di nav Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê de qewimîne.

Dema vegotina bîranînan, Mam Celal bi awayekî ku bûyer qewimîne behsa wan dike, nek mîna ya ku niha heye. Lewma her nirxandin û şirovekirin pêwîst e, di çarçoveya wê rojê de bê kirin a ku tê de bûyer qewmîye.

Dema min dixwest vê hevpeyvînê biweşînim, gelek dost û hevalan digotin hîn zû ye, lê niha di demekê de hevpeyvînê diweşînim, ku mixabin Mam Celal nexweş e û pêştir jî mecala

wî nebûye, da ku naveroka hevpeyvînê bibîne û nêrîna xwe di wê barê de bêje yan ruxseta weşandinê ji cenabê wî wer-bigirim.

Lê ez bi xwe di vê baweriyê de me, pêwîstiya dîroka hemdem a Kurd û nivşa nû bi van şahidî û agahiyên Mam Celal heye lewma min weşandina wê girîng zanî.

Hinek kesan digotin: Rewş hestyar e û dibe ku ziyana weşan-dina hevpeyvînê hebe yan bibe sedema dilgiraniya hinek ali-yên siyasî yan kesatiyan. Lê pirs ev e, kengê dem ji bo weşanê maqûl e?

Dehan sal in tê gotin rewşa Kurdistanê hesas e, ev jî kirine hincetekê ji bo negotin û veşartina gelek bûyerên girîng ên dîrokî.

Ya rast tevî wan hemû nêrînan, min ev erk wekî emaneteka dîrokî û exlaqî, girtiye stûyê xwe. Her wisa ez piştrast bûm, ev hevpeyvîn ronahiyê dixe ser beşek ji xebata gelê Kurdistanê û di dîtina buhuriyê de dibe goşeyek taybet.

Hevdem ji bo dijatî yan berjewendiya aliyekî yan kesatiyekî de nehatiye kirin, belkî tenê behsa buhuriyê dike, bi wî awayî ku Mam Celal dîtiye.

Ez nabêjim; min nêrîna Mam Celal derbarê jiyana siyasî, ci-vakî û kesî ya wî wergirtiye. Ya rast hemûşe karê kesî yê tekane, bê kêmasî nabe. Lewma nayê payîn ji vê baştir be.

Di vê hevpeyvînê de, behsa du pirsên girîng nehatiye kirin, ew jî jenosîdên Enfal û kîmyabarana Helebceyê yan jî kîmyabarana Kurdistanê ye. Lê di hevpeyvînên xwe yên din de, Mam Celal bi hûrî behsa wan her du jenosîdan kiriye ku bêguman dikarin vê valahiyê pir bikin.

Tevî ku hinek dost û hevalan digotin, ne şert e ku tevahiya bersivên Mam Celal tam wekî xwe bêne weşandin, bi taybet jî yên derbarê nakokiyên berê yên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistanê.

Di hember de hinekên din digotin: Di vegotina dîrokê de nabe veşartin hebe, bûyerên dîrokî çawa ku qewimîne divê wisa jî bên vegotin. Tevî sûdwergirtina ji her du nêrînan, lê min nexwest sansorek bi wî awayî bikim.

Ji ber ku dîroka hinek pirs û bersivan vedigerin qonaxekê ku bûyerên wê, bandorek mezin li Mam Celal kiriye, lewma wî bersiva hinek pirsên siyasî û dîplomatîk nedaye. Belkî mîna her kesî çawa ku bûyeran bandor lê kiriye, Mam Celal jî hesta xwe ya wê hingê şirove kiriye. Lewma min tenê navê hinek kesatiyan ji hevpeyvînê derxistine, ku min wisa baş dizanî, lê bersivên wan bûyeran wekî xwe mane.

Eger Xwdê alîkar be, mirov dikare naveroka hevpeyvînê ku wekî xwe tê parastin, di demeke guncawtir de, dubare bide weşandin.

Her çend heta niha di hevpeyvîn û pirtûkên din de, kesatî û aliyên siyasî, li gorî nêrînên xwe behsa bûyerên Kurdistanê, Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê, nakokî û hevrikiyan kirine, lê taybetiya vê hevpyvînê di vir de ye, Mam Celal bi awayekî cuda ji hevpeyvînên din, behsa bûyerên navxwe yên PDK'ê û YNK'ê dike.

Her wisa min gelek hewl daye bersivên pirsan tam wekî xwe binvîsim, pevîn erebî nekiriye kurdî yan dahûnana wan neguhertiye.

Dibe ku hinek nav an dîrokên bûyeran şaş hatibin nivîsandin çimkî amûrê bi awayekî baş deng qeyd nekiribû. Lewma

hinek hevok tam nedihatin femkirin, tevî ku me çendîn caran gûhdariya bersivan dikirin û piştî şopandinê dinvîsîn.

Amadekirina vê berhemê, zêdetirî 25 salan kişandiye. Di guhertina deng bi nivîsînê de, hevjîna min “Dilxoş” gelek alîkar bû. Her wisa hejmarek hevalên YNK’ê di nehîştina şaşiyan de û hinek heval û dostên din jî di peydakirina wêneyên pêdivî de alîkariya min kirin.

Ez vê hevpeyvînê wekî erkek tevalî dibînim. Hevdem wekî danîna kevirekî dibînim li ser xîmê koşka mezin a xebata Mam Celal, ku mixabin heta niha gelek kêm behsa jiyana wî ya siyasî, hizrî û civakî hatiye kirin. Hêvî dikim bi hevkariya tevahiya dilsozan em bikarin beşekê ji wê valahiyê pir bikin.

Selah Reşîd
Bihara 2017’an

Beşa Yekem
1
Qonaxa Zaroktî û Tezelawiyê

- **Zaroktî, dibistan û destpêkirina jiyana siyasî**

Zaroktî
Dibistan û Destpêkirina Jiyana Siyasî

❖ Em bi vê pirsê dest pê bikin navê te çi ye, kengê û li ku derê ji dê bûyî?

Ez Celal im, kurê Şêx Hisamedînê kurê Şêx Nûrî, kurê Şêx Xifûrê Talebanî. Li gundê Kelekan a girêdayî bajarê Koyeyê ji dayik bûme, lê tam nizanim kengê bûye.

Beriya ku dayika min emrê Xwedê bike, min xwest derbarê dîroka jidayikbûna xwe jê bipirsim, lê ji ber ku nexwendewar bû, tenê dizanî demsala Havînê bûye. Digot: Salekê piştî peydabûna “Flusê Sor” ango pereyê mîs yê sor li Iraqê bûye, ku dibe sala 1932’yan.

Ji ber wê yekê, sala jidayikbûna min dikeve navbera salên 1933’yan û 1934’an.

Ez bi xwe di vê baweriyê de me, ku sala 1933’yan ji dê bûme, çimkî diviya salekê zûtir biçûma dibistanê, lê ez salekê paşde ketim, ji ber ku wê demê zarok di temenê heft saliyê de diçûn dibistanê. Lewma di vê baweriyê de me, jidayikbûna min sala 1933’yan e. Tevî ku di belgeyan de sala 1934’an hatiye qeykirin.

❖ Destpêka dibistanê û tazelawiyê te li ku derê derbas kiriye?

Destpêkê em çend salan li gundê Kelekanê bûn. Apê bavê min yê mezin li Koyeyê şêxê Tekiyeya Talebanî bû, beriya ku wexera dawî bike, bavê min li şûna xwe danîbû, lewma paş

mirina wî mala me çû Koyeyê û bavê min li wê derê bû murşidê tekiyeyê. Lê nizanim mala me çi salekê çûye Koyeyê? Bi wê yekê rewşa jiyana me bi temamî hat guhertin.

Hewşek mezin a tekiyeyê bi dar û keskatiyê hebû, tê de zikir û nimêja cemaetê dihat kirin.

Tevahiya wan taybetiyan em xistibûn rewşek tam olî, bi awayekî ku her ji zaroktiyê ve ez di zikir, tehliye û îbadetan de beşdar dibûm.

Beriya dibistanê min li hucreyê dersa Quranê dixwend. Bismamekî me yê mezin bi navê "Kake Sûr" hebû, ku em hînî helbestên Şêx Reza Talebanî dikirin, bi taybet helbestên ku pesnê Talebanî û Şêxê Talebanî didan.

Sala 1941'an em li Koyeyê bûn, wê salê şer di navbera Reşîd Alî Geylanî û Înglîz de derket. Her wisa Almanyayê êrişî ser Sovyetê kir, gelek baş ew du bûyer tên bîra min:

Em yek ji wê hejmara kêm a malan bûn ku radyoya me hebû, wê demê ez zarok bûm ji riya radyoyê me dizanî ku artêşa Iraqê li Hebbaniyê hêzên Înglîz (Brîtanyayê) dorpêç kiriye, lê piştî ku Înglîz hikûmeta Reşîd Alî Geylanî şikand dawî bi dorpêçê hat. Paş hingê leşkerên Înglîz hatine Koyeyê.

Her wisa li sînemaya bajêr dest bi propagandayê ji bo Înglîz hat kirin.

Tê bîra min Almanyayê êrişî ser Sovyetê kir. Wê serdemê Şêx Fazîl Talebanî cîgirê qaymeqamê Koyeyê bû. Ez diçûm civînên meclisa qaymeqamiyê, ji ber ku bavê min tenê kurekî wî

hebû, lewma ew maf dabûne min da ku di civînan de beşdar bibim.

Di civînê de behsa şerê Almanya û Sovyetê dikirin û digotin, Almanyayê bişkê. Şêx Fazîl di vê baweriyê de bû, şikista Almanyayê dest pê bûye, behsa vê yekê jî dikir pêştir Napolyon jî heta nêzîkî Moskowê çûye, lê piştre hêza wî hatiye şikandin.

Wê demê ez hînî sê-çar navan bûm ji wan; Stalîn, Napolyon û Hîtler. Dikarim bêjim wê yekê ji zaroktiyê ve bandor li min kir.

Şerê Stalîn û Hîtler û nakokiyên wê serdemê, bandorek siyasî û hizrî li ser mejiyê min çê kir, bi awayekî ku sala paştir ez çûm dibistanê. Wê serdemê tevahiya mamosteyên me Kurd bûn. Em hînî liberkirina helbestên kurdî, lawije û stiranên kurdî dikirin û hesta me ya kurdatiyê dihejandin.

Ji ber wan sedeman, gelek zû ez ketim nav hizra kurdatiyê. Dema ku sala çarem a dibistana destpêkê bûm, cara yekem Cejna Newrozê li Koyeyê dihat girtin, wekî zarokekî di Newrozê de min helbest xwend.

Ji ber ku xwendekarekî jîr bûm, gelek caran ji min dihat xwestin di rê û risma sibehan de li dibistanê helbestan bixwînim. Piraniya wan helbestan jî ku min dixwendin ên Hacî Qadirê Koyî, Mela Gewre û yên niştimanî bûn. Piraniya wan helbestan di Kovara "**Gelawêjê**"[1] de hatin weşandin.

……

[1] Gelawêj kovareka edebî, rewşenbîrî û zanistî bû ku hejmara wê ya yekem di **Kanûna 1939'an** de li Bexdayê hat weşandin. Xwedanîmtîyazê wê **Îbrahîm Ehmed** û sernivîskarê wê jî **Eladîn Sucadî** bû. Piraniya rewşenbîr, siyasetmedar û helbestvanan tê de babet dinvîsîn.

Ji nav mamosteyan, bandorek mezin a du-sê mamosteyên dibistana destpêkê li ser bîr û nêrîna min a siyasî hebû.

Yek ji wan, mamosteyê me yê dîrokê Mecîd Şêx Nûrî bû, lê bandora Mamoste Mihemed Emîn Meirûf li ser bîr û nêrîna min zêdetir bû. Mamosteyan bi reftar û edeba xwe ya bilind bandorek mezin li me dikirin. Dema ku li sinifa pêncê ya dibistana destpêkê bûm li ser siyasetê diafivîm.

Wê demê behsa avakirina Komara Mihabadê dihat kirin, lê hîn nehatibû ragihandin.

Di rojname û kovarên nîştimanî û beşa kurdî ya Radyoya Tewrêzê de behsa serhildana "Barzan" dihat kirin.

Ev agahî di wê qonaxê de, bûne xîmê nêrîna min a siyasî. Di wê serdemê de Kovara "Nîştiman" ku organa **Komeleya J.K.**[2] bû, ji bo xwendinê dest bi dest dibû û hêvî û xwesta rizgariya Kurdistanê tê de dihat xuyakirin.

Li mala me hemiyan behsa siyasetê dikirin, bi taybet dema ku xelk di meclisa bavê min de li tekiyeyê beşdar dibûn, piraniya wan behsa mijarên siyasî dikirin. Yek ji wan kesan Hacî Baqî bû, zilamekî gelek jîr û rewşenbîr ê wê serdemê bû, ku piştre li Silêmaniyê hat girtin.

❖ Hacî Baqî kengê li Silêmaniyê hat girtin?

……

[2] Rêxistina Komeleya Vejiyana Kurdistan an jî **Komeleyî Jiyaneweyî Kurdistan (J.K)** dema Şerê Cihanê yê Duyem ji aliyê elît, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd ve, di 16'ê Gelawêja 1942'yan de bi awayekî nepenî hat avakirin, ku Serokê wê **Ebdul Rehman Zebîhî** bû.

Hacî Baqî mamosteyê fîzîkê bû. Sala 1963'yan ji aliyê Beisiyan ve hat girtin û piştre hat bidarvekirin. Mala wan cîranê me bû. Havînan dihat Koyeyê û teqrîben hemû rojan li mala me dibû.

Li heywana malê ku hênik bû, rûdinişt û ji me re diaxivî û ders jî dida me. Hemû salan Havînê pêşwext dersa sala bê ya xwendinê dida me.

Ji ber ku di mala me de her tim behsa siyasetê dihat kirin, min bi xwe jî hejî helbestan dikir û li xwendingehê min sirûdên (marşên) neteweyî li ber dikirin, lewma ji wê hingê ve mêla min a siyasî hebû.

Tê bîra min dema ez li sinifa pêncê dibistana destpêkê bûm, li Koyeyê Cejna Newrozê hat girtin, wê sersalê gelek bandor li nêrîna min a siyasî kir. Ji ber wê yekê bû, ku ji min hat xwestin babetekê binvîsim. Min jî gotarek kurt nivîsî û tê de behsa rewşa Kurdan kir û got: "**Kurd paşde mane û zilmeke mezin li wan hatiye kirin**".

Tevahiya cîhanê ber bi rizgariyê diçe û Cihû jî dibin dewlet, tenê Kurd nebûye tiştekê. Piştî ku min gotara xwe xwend, mamosteyekî me gazî min kir û got:

"Gotara te baş bû, lê cihû jî wekî me mirov in, çima te wisa got?"

Ya rast, ez li dijî wê yekê nebûm ku Cihû dewletê ava bikin, çimkî li Koyeyê têkiliya min û Cihûyan gelek baş bû. Di sinifa me de kurekî Cihû hebû, tenê min hevaltiya wê dikir, bandora wî jî li ser min hebû.

Bûyerek bû sedem da ku ez bibime hevalê herî baş yê wî kurê cihû. Ew jî êrişa komeka ciwanên serkêş bû li ser taxa Cihûyan li Koyeyê. Xwendingeha me li wê taxê bû û navê “Xwendingeha Cihûyan” lê hatibû kirin.

Li wê derê min bi çavên xwe dît ku çawa wan ciwanan bi keviran li Cihûyan didan. Di wê êrişê de kevirek li serê wî hevalê min yê cihû ket û serî wî şikiya.

Bi nêrîna min a wê hingê, ew êriş dîmenek gelek kirêt bû. Ez gelekî pê êşiyam û şermezar bûm.

Ez çûm da ku navcîtiyê bikim, berî min kesên din jî hatibûn û hewla ji hev cudakirinê didan, ew bûyer bû sedema mukumbûna dostaniya navbera me her duyan.

Beşa Duyem
2
Destpêka Xebatê

- Destpêka jiyana siyasî
- Destpêkirina karê siyasî
- Komara Mihabadê
- Kovara Gelawêjê
- Bûyerên Iraqê û Serhildana Wesbeyê
- Jiyana xwendekariyê
- Partiya Komunîst a Iraqê û pirsa Kurd
- Yekem nakokiya di nav PDK'ê de
- J.K. û Komara Mihabadê
- Cihêbûna yekem a ji PDK'ê
- Serhildana Tişrînê (Cotmeh)
- Çepgirî û guhertina navê PDK'ê
- PDK û hilbijartina parlamentoya Iraqê

Destpêka Jiyana Siyasî

❖ Çi tiştekî din bandor li bîr û hizra te ya zaroktiyê kir da ku nêzîkî siyasetê bibî?

Li Koyeyê hejmarek zilamên rûspî yên Cihû hebûn ku dihatin tekiyeyê û bavê min didîtin, piştre jî karê siyasî dikirin. Di sala 1945'an de li Koyeyê hevalek ji me re peyda bû ku ji derve hatibû, gelekî ji me mezintir bû, me wisa dizanî ku mamoste ye, lê piştre derket ew jî xwendekar e. Navê wî Hîsamedîn Teyîb bû ku paşê bi navê "Şeib" hat naskirin.

Wî dest bi siyasetê kir, ji me re behsa nîştimanperweriyê û kurdatiyê dikir, her tim tekez li xwe rêxisrinê dikir û digot: **"Divê rêxistina me hebe û em alaya Kurdistanê bilind bikin."**

Cara yekem ji bo ku em nîşan bidin, dikarin bê tirs erkên xwe bi cih bînin, pêwîst bû bi şevê me serdana goristanekê li derveyî bajarê Koyeyê bikira û alaya Kurdistanê li wê dayna.

Min ew erka xwe bi cih anî û ala bir li goristanê çikiland. Ji ber ku destpêkê ez li gund mezin bibûm û zarokên gundan jî zêde natirsin, min karê xwe encam da. Di nav sê-çar xortan de ez serketim û min karî alaya xwe biçikilînim. Hîsamedîn Teyîb çû lê nihêrî û dît ku min ala çikilandiye, lewma êdî ez wekî murîdekî xwe pejirandim.

Havîna 1945'an-1946'an guhertinek mezin di jiyana min de çêbû, xwendekarên zanîngehê hatibûn Koyeyê û bîr û bawera kurdatî û nîştimanperweriyê belav dikirin.

PDK hêdî hêdî dihat avakirin. Wê hingê Kekê Omer Debabe xortekî bi bejn û bal û navdarê Koyeyê bû. Rojekê em li çayxaneya Heme Req rastî hev hatin. Wî dizanî ez xwendekar im û li xwendingehê sirûdên nişţimanî dixwînim.

Dema li çayxaneyê **Omer Debabe**[3] ez dîtim, gazî min kir û ez çûme ba wî, hinek nivîs û wêne dane min. Wêne yên Mela Mistefa û Qazî Mihemed bûn, nivîs jî daxuyaniya avakirina PDK'ê bû, ku li Mihabadê hatibû çapkirin û ser navê Mela Mistefa hatibû weşandin, lê Hemze Ebdullah bi erebî nivîsî bû.

❖ Di wê serdemê de tu navendeke rewşenbîrî û siyasî li Koyeyê hebû?

Wê serdemê li Koyeyê du pirtûkxane hebûn. Pirtûkxaneya Hacî Qadirê Koyî ku girêdayî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bû û ya din jî ya Partiya Komunîst a Iraqê bû. Em wek xwendekar di bin bandora wan her du hizran de bûn. Navbera min û Fatîh Resûl, Celal Bêtûşî û Ezîzê birayî wî gelek xweş bû. Ez û Ezîz hevsinif bûn.

Fatîh Resûl û Celal Bêtûşî dixebitîn me bikin Komunîst, ji ber wê yekê wan ez kiribûm abûneya pirtûkxaneya Koyeyê.

……

[3] Omer Debabe yan **Omer Mistefa**, jidayikbûyê sala 1923'yan li **Koyeyê** bû. Sala 1951'an xwendina xwe li **Koleja Yasayê** ya Bexdayê temam kiribû. Heman salê di kongreya Duyem a Partiya Demokrat a Kurdistanê de ji bo endamtiya komîteya navendî hatibû hilbijartin.
Dema nakokiyên nav PDK'ê, Omer Debabe aliyê baskê polîtburoyê bû. Sala 1975'an digel Salih Yûsifî **Tevgera Sosyalîstiya Kurdistanê** damezirand. Heta Çileya **1992'yan** endamê Serokatiya Yekîtiya Nişţimanî ya Kurdistanê bû, ku di nav salona Kongreya Yekem a YNK'ê de li Silêmaniyê dilê wî ji kar ket û wexera dawiyê kir.

Min mehê 100 fils didan. Her bi wî awayî ez di pirtûkxaneya Hacî Qadirê Koyî de jî abûne bûm.

❖ Çi rolek rêbaza Komunîzmê û Yekîtiya Sovyetê di geşbûna jiyana siyasiya we de hebû?

Min biryar li ser alîgiriya tu aliyekê nedabû, lê di bin bandora Sovyetê, serketinên wî welatî û alîkariya wan ji bo Komara Mihabadê de bûm. Wê demê helbestên Hejar û Hêmin belav bibûn. Me yek ji helbestên wê demê li ber kiribû.

Bijî Stalîn xoş bê çekoş û das
Le jêr îstîbdad Kurdî kird xelas

Her wisa helbestek din hebû ku di pesindayîna Sovyetê de hatibû gotin, me ew jî li ber kiribû.

Ezanî malman çilon bû bira
Çi xedrê, çi zilmê le Kurdan kira
Ke alayî sûrman le nêw helkira
Be carê temî hewrî xeman rewî
Bijî dostî Kurd dewletî Şûrewî

Wê demê Kurd wisa difikirîn, ku Sovyetê Kurd rizgar kiriye, bi alîkariya Sovyetê dewleta Kurdistanê tê damezrandin. Komara Mihabadê jî bandorek mezin li dil û hundirê xelkê kiribû.

Ez bi xwe di bin bandora komunîstan de bûm, heta wê demê ku li ser vê yekê gelo Kurd netewe ye yan na? Di nav wan de pirsgirêk çêbûn. Wê pirsê mejiyê min bi xwe ve mijûl kir, li ser wê ketim nîqaşan, gelo Kurd netewe ye yan na? Wê Havînê ji sinifa pêncê dibistana destpêkê diçûm sinifa şeşê.

Kekê Omer Debabe car bi car belavok didane min. Ez çûm ba wî û min jê pirsî: “Gelo Kurd netewe ye yan na?” Wî jî wateya neteweyê ji min re şirove kir û got: **“Belê Kurd netewe ye.”** Wî behsa nêrîna Stalîn derbarê netewebûnê kir.

Wê demê min gelek dixwest ku ji netewebûna Kurd piştrast bibim. Ji dil û hundir ve min kurdatî dikir, ji ber wê yekê ketim nav nîqaşê bi komunîstan re, bi wê sedemê ez ji şaneya hişyarkirinê ya komunîstan derketim.

Fatîh Resûl heftane em kom dikirin, ez di nîqaşan de rijd bûm li ser viya ku Kurd netewe ye û mafê Kurd yê diyarkirina çare-nivîsê heye. Wan digot: Pêwîst e karker, cotkar û rêncber pêşeng bin. Min jî digot: Lê bi şertekî ku ji bo pêşketina xelkê Kurdistanê be.

Karker, cotkar û rêncberên Kurdistanê bên rizgarkirin û we-latê Kurdistanê jî bê rizgarkirin. Ji ber van nakokiyan ez li şaneya hişyariya wan derketim û ber bi PDK’ê ve çûm.

Paş hingê Omer Debabe çendîn caran ji me re civîn li dar xist, sala xwendinê dest pê kir, piraniya mamosteyên me PDK’yî bûn, rola wan jî di geşbûna bîr û nêrîna me de hebû.

Wê salê mamosteyekî me yê nû bi navê Kemal Ebdul Qadir Neşet hebû ku bi esil Koyî bû, mamosteyê werzişê bû û gelek girîngî dida dersa xwe.

Di nav lîstikên werzişê de min tenê pîng pong baş dizanî. Lewma wî jî ez kiribûm berpirsyarê pîng ponga xwendingehê. Min alîkariya wan xwendekaran dikir ku pîng pong dilîstin û di wê çarçoveyê de min ji wan re gotinên siyasî dikirin.

Destpêkirina Karê Siyasî

❖ Te çawa dest bi jiyana siyasî kir?

Hevalekî min bi navê Wirya Mela Elî Kanîmaranî hebû. Ew hinekê mezintir bû lê ji gund hatibû, em dibirin mala xwe û dixwest em bi awayê rêxistinî kar bikin, di encamê de wê salê me xwe ji bo girevgirtinekê li xwendingehê amade kir.

Ez sinifa şeşê bûm, me li dijî du mamosteyan girev girt. Reftara yek ji wan li hember xwendekaran xirab bû lewma me nerazîbûn nîşan da û me girev girt. Di girevê de ez li pêşiyê bûm û min berdevkiya girevgirtiyan dikir.

Em çûn ser rêveberê xwendingehê û me gotareka nerazîbûnê dayê. Rêveber jî ji me re axivî û got:

“Hûn xwendekar in ji bo ku karê we serî bigre divê rêxistinek we hebe.”

Rêveberê xwendingehê di avakirina rêxistineka xwendekaran de alîkariya me kir û me navê komeleya xwe kir “**Komeleya Pêşketina Xwendewariyê**”(**KPX**) ku piştre ket bin bandora PDK’ê. Ez endamê herî çeleng an jî serperstê wê rêxistinê bûm.

Di Zivistana 1947’an de mamosteyekî me yê din bi navê Tayer Seîd hebû. Zilamekî gelek jîr û şiyar bû, di bîrkarî ango matêmatîk û dersa zimanê înglîzî de gelek baş bû. Rojekê ez û Wirya vexwendin mala xwe û piştî heyamekê ser daxwaza wî me form tijî kir û di Çileya 1947’an de em bûn endamê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), navê min yê rêxistinê “Agir” û yê Wirya jî “Pişko” bû.

Wê demê ez sinifa şeşê dibistanê bûm. Wirya ji min mezintir bû, dema ku ji ber beşdariya civînên pariyê yên şevê em di derengiyê de diman, berpirsê civînê ji Wirya dixwest destpêkê min bigihîne malê, piştre biçe mala xwe.

Ya rast min gelekî karê rêxistin û siyasî hez dikir. Her demê ku daxuyanî û belavokên partiyê digihîştin destê min, yekser diçûm odeyekê û bi aramî dest bi xwendina wan dikir. Gelek caran jî ku dema nanxwarinê dihat, heta xwendina belavokan temam neba, min nan nedixwar.

Hinek hevalên min ên din ên xwendekar jî hebûn, ku me di nav partiyê de jî bi hev re xebat dikir wekî: Cemal Hacî Tayerî Koyî, Mihemed Mela Sadiq, Kerîm Şêxanî, Xalîd Seîd, Wahîd Seîd, Mecîd Asinger û çend hevalên din.

Komara Mihabadê

❖ Çi bandorek herifîna Komara Kurdistanê[4] li Mihabadê li ser we hebû?

Wê bûyerê bandorek mezin li min kir, ji ber ku têkiliyek taybet a bajarên Koye û Mihabadê hebû.

Çend kes ji xelkê Koyeyê di Komarê de beşdar bûn ji wan; Bekir Ebdul Kerîm Hewêzî û Mistefa Xoşnaw li Koyeyê perwerde bibûn, ên din mirovên wan li Koyeyê hebûn.

.....

[4] Qazî Mihemed û hevalên wî di **31'ê Adara 1947'an** de li bajarê **Mihabadê** ji aliyê **rejîma sahê Îranê** ve hatin bidarvekirin, bi wê filaketê jî dawî bi **Komara Kurdistanê** hat.

Yek ji wan di artêşê de efser bû, ku dema vegera ji Mihabadê di nav berfê de qerisî û canê xwe ji dest da.

Yekî din Mihemed Tofîq Werdî bû. Mamosteyê min jî bû lê sala çarê dibistana destpêkê, revî û çû Mihabadê. Her wisa Dilşad Resûlî ku mamoste û nivîskar bû û di kovara "Gelawêjê" de babet dinvîsîn, ew jî li Mihabadê bû.

Piştî ku Werdî û Resûlî vegeriyan hatin girtin û piştî heyamekê hatin berdan. Paş vegerê Werdî nêzîkî Partiya Komunîst a Iraqê û Resûlî nêzîkî siyaseta PDK'ê bû. Wan behsa rewşa Mihabadê ya piştî êrişa Îranê dikirin û digotin: **"Li wê derê çi qewimiye û çi bi serê gelê Kurd hatiye,"** lewma Îran û rejîma Şah berçavê me ketin û bi taybet piştî bidarvekirina Qazî Mihemed.

Roja bidarvekirina Qazî Mihemed baş tê bira min. Wê rojê me şîn girt, me cilên reş li ber kirin û gelek bi xembarî derdiketin û ji nîşaneyên şahiyan dûr ketin û em li xwendingehê deqeyekê bêdeng rawestiyan. Herifa Komara Kurdistanê li Mihabadê karesatek mezin bû ku dilê hemiyan tijî kul û keder kir û wekî ziyanek mezin a neteweyî dihat zanîn. Wê demê hinek ji Barzaniyan vegeriyan Kurdistanê û hejmarek din ber bi Sovyetê çûn, beşek ji yên vegeriya bûn Kurdistanê, hatine Koyeyê.

Wê hingê min "Mela Mistefa Barzanî" gelek pîroz didît, çawa ku misilmanek bi rêz bala xwe dide Mekke û Medîneyê. Ya rast min Barzanî wekî Qibleyê didît. Me Barzanî Wekî qehremanekî mezin ê neteweyî didît ku di nav dil û hinavê me de cih girtibû.

Tê bîra min jineka eşîra Barzanî li Koyeyê pars dikir, ku hinek pirç pê re bû, digot: **“Pirça serê Mela Mistefa ye,”** min gotê: ez dikirim. Wê demê dînarekî min hebû, min ew dînar dayê û tiştek ji min re nema, dînarek wê serdemê gelek bû, lê ya girîng ew bû ku min bi dînarekî çend têlên porê Mela Mistefa Kirî da ku her tim bi min re be. Du-sê malên Barzanî hatin bajarê Koyeyê, me di yek ji wan gundan de bi cih kirin, ku girêdayî binemaleya Talebanî ne.

❖ Em kîjan salê dikarin wekî destpêka karê te yê siyasî deynin?

Ez ji sala 1947’an ve ketim nav siyasetê, siyaseteka rêxistinkirî, pêştir jî ez endamê “**Komeleya Pêşketina Xwendekariyê**” (**KPX**) bûm. Her wisa di sala 1947’an de wek endamê çeleng ê partiyê min dest bi xebatê kir ku wê demê jê re “Partiya Demokrat a Kurd- Iraq” dihat gotin,

Wê serdemê di navbera PDK’ê û Partiya Komunîst a Iraqê de bêtifaqî û nakokî hebûn, lê dema ku di 19’ê Hezîrana 1947’an de çar efser bi navên: Mistefa Xoşnaw, Îzet Ezîz, Xeyrulla Ebdul Kerîm û Mihemed Qudsî hatin bidarvekirin, Elî Ebdula şaneya sereke ya xwendekaran kom kir û xwest em xwe ji bo xwendina sirûdekî amade bikin.

Her wisa ji her kesî hat xwestin ku tê de beşdar bibe, bi taybet ku Mistefa Xoşnaw koyî dikat hesabê. Lê cenazeyê wî neanîn Koyeyê, birin Silêmaniyê û li Girê Seywanê sipartin axê. Xelkê Silêmaniyê bi xwenîşandanek mezin, bidarvekirina wî protesto kirin. Çendîn helbestvanên mezin ên wekî Bêkes, Pîremêrd û Kameran helbest û gotar pêşkêş kirin.

Piştî derçûna ji sinifa pêncê, Havîna 1947'an min dest bi xwendina dersên sinifa şeşê kir. Wê Havînê min çend pirtûkên erebî peyda kirin. Wê serdemê pirtûkên erebî gelek kêm dest diketin. Her wisa ji sala 1947'an ve bûm abûneya rojnameya "Ehalî", ku rojane dihat weşandin.

❖ Rojnameya Ehalî kê diweşand û li ser çi rêbazekê bû?

Mistefa Kamîl Çadirçî[5] xwedanê Rojnameya "Ehalî" bû, ku organa navendiya Partiya Nîştimanî ya Demokratîk a Iraqê dihat zanîn.

Lê rojnameyeke navdar bû, ez ji wê rojnameyê baş hînî zimanê erebî bûm. Her gavê ku di femkirina peyv an hevokan de pirsgirêk heba, min ji rêveberê xwendingehê yan ji mamosteyan dipirsî.

Wê salê yekem car min karî pirtûkek înglîzî peyda bikim ku ya Hacî Ebdul Baqî bû. Wî li Koleja Melîk Feysel dixwend û înglîzî dizanî. Wî pirtûkek bi navê "Stalîn Li Ser Lenîn Dinvîse" anî bû ku wêneyên Lenîn û Stalîn li ser bûn.

Di nav pirtûkê de belgeyên Lenîn hebûn. Min hevokên wê li ber kiribûn, tevî ku tevahiya wateyên wan nedizanî. **1947, sala xîmê jiyana min a siyasî bû. Wê salê him ez bûm endamê PDK'ê,** him jî mijûlî xwedinê bûm.

……

[5] Mistefa Kamîl Çadirçî li sala **1897'an** li Bexdayê ji dê bûye, **serokê rêxistina yekem a rojnamegeriya Iraqê bû**. Rojnameya **Ehalî ji sal 1942'yan - 1962'yan** ji aliyê wî ve dihat weşandin, ku wekî organa partiya wî ya bi navê "**Partiya Nîştimanî ya Demokratîk a Iraqê**" dihat hesabê.

Kovara Gelawêjê

❖ Wê demê çi bandorek Kovara Gelawêjê û kovar û rojnameyên din li ser te hebû?

Gelawêj kovareka navdar bû, xwedan û sernivîskarê wê Mamoste Îbrahîm Ehmed û rêveberê nivîsînê jî mamoste Eladîn Scûdî bû. Wê demê li Bexdayê dihat weşandim. Ji sala 1939'an -1949'an weşana wê dewam kir. Ya rast rolek mezin a Kovara Gelawêjê di belavkirina bîr û bawera kurdatiyê de di nav xelkê pêşketî, demokrat û sosyalîst ên dijî faşîzmê de hebû.

Her wisa roleke Gelawêjê ya girîng di vejandina edeba kurdî û hînkirina kurdî ya nû û hûnandina peyv û hevokên nû yên kurdî de hebû. Min tevahiya kovarê dixwend û beşek mezin jî li ber dikir.

Di hînbûna zimanê kurdî de kovarek gelek bi mifa bû. Wê serdemê rojname di pirtûkxaneya Hacî Qadirê Koyî de dihat danîn û yên bixwestan dikarîn bixwînin. Ev rojname wê serdemê dihatin weşandin; Ehalî û Şeib yên Yehya Qasim bûn. rojnameya Weten ji aliyê Partiya Gel ve dihat weşandin, xwedanê wê jî **Ezîz Şerîf**[6] bû. Rojnameya Îtîhada Wetenî jî, ji aliyê Ebdul Fetah Îbrahîm ve dihat serokatîkirin.

……

[6] Ezîz Şerîf sala **1904'an** li bajarokê **Ane** jê bûye û sala 1932'yan beşa yasayê li Bexdayê xwendiye. Sala **1946'an Partiya Komunîst** a Iraqê ava kir, ku partiyek çep a pêşverû bû. Di nav hikûmetê de çendîn erkên wî hebûn. Wekî **wezîrê kar** di sala **1969'an** de rolek wî ya baş di **amadekirina Peymana 1970'yan** hebû.
Di dawiya salên 1970'yan de, çû Moskowê û di sala **1990'an** li wê derê wexera dawiyê kir. Ezîz Şerîf pirtûkek giranbiha bi navê **"Pirsa Kurd li Iraqê"** nivîsiye.

Eger kesek abûneya wan rojnameyan neba, dikarî li pirtûkxaneyan bixwenda.

Ez yek ji wan kesan bûm ku tevahiya wan rojnameyan dixwand, her çend min nedikarî tevahiya babetan fem bikim, ji ber ku erebiya min gelek baş nebû, lê ez ji wan hînî gelek peyvan bûm.

Bûyerên Iraqê û Serhildana Wesbeyê

❖ Çi bandora bûyerên Iraqê li ser we hebû û we jî çi rolek di wan de didît?

Sala xwendina 1947'an-1948'an ez çûm xwendingeha navendî ya Koyeyê. Çileya wê salê serhildana navdar a "**Wesbe ya Bexdayê**" qewimî. Wê serhildanê li Koyeyê jî deng veda û bû sedema vejîna xelkê, çimkî nûçeyek belav bibû û behsa vê yekê dikir, Omer Debabe ku di xwenîşandana Wesbeyê de rolek wî ya çeleng hebû, şehîd bûye tevî ku paşê eşkere bû tenê birîndar bibû.

Sedemek din a vejîna xelkê ew bû, ku Mihemed Ziyad Axayê Xefûrî nûnerê Koyeyê li Parlamentoya Iraqê û çend endamên din di daxuyaniyekê de dest ji kar kişandina xwe ragihandin, ji ber kuştina xelkê di wê xwenîşandanê de (ji aliyê hêzên hikûmetê ve).

Yekem xwenîşandan li Koyeyê, bi alîkariya PDK'ê û Partiya Komunîst a Iraqê hat lidarxistin. Di xwenîşandanê de daxuyaniya Mihemed Ziyad Axa hat xwendin ku tê de Kekê Ziyad gotibû: **Wî dest ji endamtiya parlamentoyê kişandiye, ji ber ku hikûmet xelkê serkut dike û dikuje.**

Daxuyaniya partiyê ji aliyê Elî Ebdullah ve hat xwendin û ragihand: "**Bijî ruhê Qazî Mihemed, hevalên wî û çar efseran."** Piştre hevalekî me bi navê Hisamedîn Ferîd qîriya û got: **"Bijî Qazî Mihemed."** Heyameke kêm bû ku Qazî Mihemed hatibû bi-darvekirin.

Her di sala 1947'an de me têkilî bi xwendekarên Hewlêr û Silêmaniyê re danîn ku dostê PDK'ê bûn. Helbet ji riya Ebdul Xaliq Fetah Axayê Hewêzî, ku li Silmaniyê dixwend û ji riya wî ve me Hîlmî Elî Şerîf, Mihemed Ehmed Teha, Cemal Hacî Şefîq û Kameranê helbestvan nas kirin.

❖ Di Sala 1948'an de ji bilî serhildanê çi bûyerek din a girîng qewimî?

Hilbijartin Ji yekîtiya xwendekaran re hat kirin, da ku her xwendingehek nûnerê xwe hebe. Ez wekî Endamê Komîteya Rêveber a Yekîtiya Xwendekaran li Koyeyê hatim hilbijartin û bûm nûnerê navendên Koyeyê.

Di Yekemîn Kongreya Giştî ya Xwendikarên Iraqê de (naskirî bi Kongreya Sîbai), ku 14.04.1948'an li Bexdayê hat lidarxistin, tê de tevahiya demokrat, çepgir û komunîstan ji bilî neteweçi-yan beşdar bûn.

❖ Ev yekemîn serdana te ji bo derveyî Koyeyê bû?

Belê, ew yekemîn serdana min ji bo karekî siyasî li Bexdayê bû. Di Meydana Sîbai de helbestvanê mezin ê Iraqê Mihemed Mehdî Cewahîrî beşdar bû. Yekemîn car bû ji dûr ve min didît, ku li wir helbesta xwe ya navdar dixwend:

يومَ الشهيد :تحيةُ و سلاُم
بك والضحايا الغُرُ يزهو شامخاً
بك والذي ضَمَّ الثرى من طيبهم
بك أُبعث" الجيلُ "المحتمُ بثعُه
وبك العُتاة سيُحشرون، وجوهُهُم
سَفاً إلى سَف طغاماً لم تذُق
ويحاسرون فلا" وراءُ "يحتوي
وسيسألون مَن الذين تسخّرُوا

بك والنضالِ تؤرخُ الأعوام
علمُ الحسابِ، وتفخرُ الأرقام
تتعطرُ الارضون و الأيام
وبك" القيامةُ "للطغاة تُقام
سودٌ، وحَشوُ أنوفهم إرغام
ما يجرَعون من الهَوان طَغام
ذَنباً ولا شُرطَاً يُحوز" امام"
هذي الجموعَ كأنها أنعا

Wê demê min cara yekem Cewahîrî didît ku helbest dixwend. Ya rast helbestên wî gelek bandor li min kirin. Dema ku ew helbest bi dengê xwe yê bibandor dixwend, demek nîzîk bû ku birayekî wî bi navê Ceifer hatbû şehîdkirin. Ji ber wê bandorê ez heta roja îro jî, wekî derwêş û şûnketiyê Cewahîrî mame.

❖ Kongreya Sîbai tenê taybetî xwendekarên girêdayî Kartiya Komunîst bû?

Nexêr, tevahiya aliyan tê de beşdar bûn. Bi giştî çar partî ji wan; Partiya Niştimanî ya Demokratîk, Partiya Gel, Partiya Demokrat a Kurdistanê û Partiya Komunîst a Iraqê. Nûnerên hemû aliyan beşdar bûn, tevî ku partiya komunîst tê de serdest bû. Di pêkanîna serokatiya wê de nûnerê hemû komeleyan beşdaer bûn. Nûnerê PDK'ê xortekî Hewlêrî bi navê Heyder Heme Emîn bû ku bû endamê komîteya serokatiyê. Çawa ku min got, ji Hewlêrê Heyder Heme Emîn, ji Xaneqînê Fayiq Sebrî Ebdul Qadir û ji Koyeyê ez û ji Silêmaniyê jî lîsteya Komunîstan hatibû pejirandin.

Rola me di hilbijartinê de hebû, ez bi xwe jî wekî Cîgirê Komîteya Cîbicîkar a Yekîtiya Xwendekaran a Iraqê hatim hilbijartin.

❖ Ew yekem serdana te ji bo Bexdayê bû?

Belê, yekem serdana min a siyasî ji bo Bexdayê bû. Tevî ku pêştir ji bo çareseriya tendirustiyê min serdna Bexdayê kiribû.

Li wê derê Omer Debabe serperetiya karê me dikir. Me serdana baregeha Partiya Gel kir û Ezîz Şerîf dît. Her wisa me serî li baregeha Partiya Nîştimanî ya Demokratîk da û Mistefa Kamîl Çadirçî jî dît.Li wê, min çendîn zilamên navdar ên Iraqê û hejmarek hevalên naskirî yên PDK'ê dîtin, wek Reşîd Ebdul Qadir ku rolek wî ya diyar di xwenîşandanên sala 1948'an de hebû. Her wisa me Dr. Ceifer Mihemed Kerîm dît ku kesatiyekî navdar ê PDK'ê bû. Wî du-sê gotar li ser Kurd û Barzaniyan di rojnameya Ehalî de nivîsî bûn.

Dr. Ceifer kesatiyekî iraqî yê rêzdar bû. Me li Klînîkê serdana wî kir, gelek bi kêfxweşî pêşwaziya me kir û bi me re axivî.

Jiyana Xwendekariyê

❖ Kengê jiyana te ya xwendekariya zanîngehê dest pê kir?

Sala xwendinê ya 1950'yan-1951'an, ez li Hewlêrê xwendekarê sinifa çarê lîseyê bûm. Berî cerbandinên dawiya salê min xwendina xwe temam kir, çimkî asta nimreyên min bilind bû. Wê demê eger tevahiya nimreyên her xwendekarekî ji

sedî 85’an zêdetir ba, bê ceribandinên dawiya salê, ew derçûyê wê sinifê dihat hesab.

Vegeriyam Koyeyê lê hatim girtin. Girtina Havîna 1951’an yekem girtina min bû, ku piştî darizandinê sewqî Mûsilê hatim kirin. Her wisa cara yekem bû ku min jiyana sewqiyê didît.

Her yek ji Hamid Yûsif, Elî Ebdullah, Omer Herbî, Omer Debabe, Reuf Serbestî û Hemîd Batasî bi min re hatibûn sewqkirin. Wê Havînê em li Mûsilê man, lê piştî ku îtiraza me hat pejirandin, em hatin azadkirin.

Bi biryara PDK’ê ez çûm Kerkûkê û min malek li hember mala Elî Hemdî kirê kir. Piştî ku ez li wê malê bich bûm, gotin me tu ji bo alîkarîkirina Rojnameya “**Rizgarî**” aniye vir, ku xwedanê wê Mamoste Îbrahîm Ehmed bû, Xwedê jê

razî Mîrza Efendî Ebdul Kerîm jî babetên rojnameyê tayip dikirin.

Piştî ku rojname amade dibû bi riya min dihat belavkirin, wate mala min bibû navenda belavkirina Rojnameya “Rizgarî”.

Ez bi xwe jî wê demê li qonaxa lîseyê bûm، hevdem endamê komîteya navçeyê ya PDK’ê jî bûm.

Wê salê, hatim girtin lê bi awayekî ecêb rizgar bûm. Tevahiya rojname û belavokan ji riya mala me ve dihat belavkirin.

Min carekê rojnameyên para Raniyeyê da kesekî, lê ew di rê de hat girtin û îtiraf kiribû ku rojname ji min wergirtiye.

Dozgerê lêkolînê yê Kerkûkê Kemal Omer bû, kesekî baş û mirovekî pêşketiyê demokrat bû, dostê partiya pomunîst jî bû.

Rojekê gazê Îhsan Talebanî dike ku xizmekî me bû û dibêjê, daxwaz hatiye kirin kurek bi navê Celal Talebanî li Kerkûkê bê girtin, wisa bizanim xizmê te ye. Ew jî dibêje; belê xizmê mine. Dozger dibêjê:

“Biçe bêjê eger tiştên qedexe li mala wî hene bila li malê nehêle, çimkî li Raniyeyê hinek rojname hatiye girtin û polîsê mala wî sehbike.”

Min bi lez tevahiya tiştên ku qedexe bûn li malê derxistin. Piştre dozger û polîs hatin ku muxtar jî bi wan re bû. Tiştek li malê peyda nekirin, lê ez hatim binçavkirin. Ji ber ku xwendekarê qonaxa lîseyê bûm, wê demê jî girîngiyek lîseyê ya taybet hebû, lewma wan ez nebirim girtîgehê, li cihekî taybet danîm. Çend rojan ez li wê derê binçavkirî bûm. Piştre li dadgehê ew kesê rojname bi wî re hatibû girtin, anîn hemberî min lê min got: Ez wî nas naikm, ew rast nabêje. Ew jî poşman bibû û got: **“Li min dane lewma min wisa gotiye.”**

Girtina min berî ceribandina dawiya salê ya bekaloryosê bû. Binçavkirinê du hefteyan kişand ku ziyanek mezin li min da, tevî ku xwe amadekirin ji bo ceribandinan ji dest min çû, lê nimreyên min baş bûn. Wê salê ji 87 xwendekaran tenê heft kes ji ceribandinê derçûn, ku yek ji wan ez bûm.

Her çend nimreyên min bi giştî baş bûn û 85, 90 û 95 bi dest anî bûn, lê ji ber ku di du dersan de nimreyên min 50 û 52

bûn, ew yek bû sedem ku asta nimreyên min bi giştî dakevin ser 70’ê.

Wê Havînê min li Hewlêrê kar kir, piştre li Payîza 1952’yan ji bo xwendina kursa yasayê li kolejê çûme Bexdayê.

❖ Çawa tu çûyî koleja yasayê?

Destpêkê min hez dikir biçim koleja tibê, çimkî min bingeha zanistî xwendibû. Nimreyên min jî baş bûn û bihayê wê yekê hebûn ku bikarim li koleja tibê bixwînim. Li parêzgeha Kerkûkê mafê min hebû û min ji bo xwendinê dikarî daxwaz pêşkêşî koleja tibê bikira.

Ji bo wê yekê diviya tevahiya wan belgeyan ên ku pêwîst bûn, min pêşkêş kiriba lê pirsgirêka min a nasnameyê û belgeya min a bêtawaniya darazê hebû. Ez du caran hatibûm girtin û hatibûm tawanbarkirin, lewma aliyê têkilîdar razî nedibû ku ez li koleja tibê bixwînim. Mecal jî nema bû û wergirtina xwendekaran li koleja yasay dihat rawestandin.

Lewma min belgeyên xwe ji koleja tibê wergirt û bir koleja yasayê, wan jî bi şertekî ji min wer gitin ku piştre ez mameleyên xwe yên mayî temam bikim. Du belgeyên min nuxsan bû, nasnameya Iraqê û belgeya bêtawaniyê.

Rojekê li kolejê navê komek xwendekaran li cihê agahdarkirinan dabûn, ku belgeyên wan nuxsan bûn û navê min jî di nav wan de hebû. Ez çûm beşa têkilîdar, lê berpirsê wê kesekî gelek xirab bû û tu alîkariyek nekir.

Piştre ez çû min belgeya nasnameya xwe ya iraqî anî, belgeya min a bêtawaniyê nebû. Lê çûm beşa têkilîdar a kolejê û min got berpirsê wê: Ev belgeyên min e, wî jî bê ku lê binhêre got: Dayne û biçe, du mamostejî lê bûn.

Paş heyamekê careke din ji min hat xwestin ku belgeyên xwe temam bikim, ez çûme ser û min gotê:“Ev çi ye? Min wê demê hemû tişt anîbû.” Min got: “Ew her du mamoste jî lê bûn.” Got: “Rast e, lê ez nikarim peyda bikim.” Min jî dubare kir û got: “Min digel belgeya nasnameyî anî bû,” wî jî got: “Baş e, bavo tişt nabe.”

Bi wî awayî çûm koleja yasayê. Munîr Qazî Serokê Koleja Yasayê bû, kesekî gelek baş û dostê Talebaniyan bû. Munîr Qazî bi wî awayî qebûl kir ku ez li koleja yasayê bixwînim, berovajî wê salê ez nedihatim qebûlkirin ne li koleja yasayê û ne jî li tibê.

Li Bexdayê jî mijûlî karê siyasî bûm û me karî li wê derê jî komîteya navçeyê ya PDK’ê ava bikin.

❖ Di wê heyamê ku li Bexdayê bûyî çi bûyerek girîng li jiyana xwendekariya te da qewimî?

Wê salê gelek bûyerên mezin qewimîn. PDK di aliyê rêxistinê de pêş ket. Sala 1953’yan li piraniya cihan komîteyên navçeyên PDK’ê hatin avakirin. Rêxistinkirinê li Behdînan dest pê kir, li navçeyên din pişgiriya ji xebata cotkaran bû sedema berfirehbûna xebata wan. Wê yekê bandor li yekîtiya nav xwe ya PDK’ê kir û ber bi partiyeka çepgir a şoreşger bir.

Di wê salê de “**Melîk Feyselê Duyem**” taca paşatiyê da serê xwe û bi fermî bû paşayê Iraqê.

Li ser wê yekê, gotarek gelek girîng a Mamoste Îbrahîm Ehmed di rojnameya “Rizgarî” de hat weşandin. Di wê gotarê de mamoste bi peyv û hevokên hejî dijatiya tac bisedanîna melîk dike û dibêje, Kurd îtirafê bi paşatiya wî nakin, çimkî berevajî vîna gel, ew kirine paşayê Iraqê.

Her wisa wê salê Festîvala Ciwan û Xwendekarên Cîhanê li Warşovayê hat lidarxistin. Ji bo cara yekem me jî tê de beşdarî kir. Bi komkirina pere ji nav PDK’ê û dostê PDK’ê, me karî Hejar Mukriyanî bişînin festîvalê, her wisa Ebdul Rehman Zebîhî û Sînem Bedir-Xan pêr çûn. Dema ku Hejar ji Warşovayê vegeriya, ji Patiya Komunîst a Iraqê gelek aciz bû, ku li wê derê partiya komunîst nehîştibû behsa Kurd bike û planên şandeya Kurd têk dabû û nehîştibû Hejar serdana Moskowê bike.

Partiya Komunîst a Iraqê û Pirsa Kurd

❖ Çiqasî tu agahdarî nakokiyên PDK’ê û Partiya Komunîst li ser netewebûna Kurd bûyî?

Wê salê nîqaşek berfireh li ser netewebûna Kurd navbera PDK’ê û Partiya Komunîst a Iraqê de hebû. Komunîstan digotin Kurd netenê “**milet**” nîne, “**netewe**” jî nîne, ger netewe nebe, mafê diyarkirina çarenivîsê jî nîne. Komunîstan digotin: **Madam Kurd netewe nîne, wê demê nabe partiya Kurd a serbixwe yan rêxistina Kurd a taybet hebe, nabe mafê Kurd ê**

çarenivîsî hebe û digotin, Kurd beşek ji Iraqê ye. Di encamê de nîqaşên navbera Kurd û Komonîstan gelek tundûtîj bibûn.

❖ Helwesta komunîstan li hember pirsa Kurd ne erênî bû?

Belê, Komunîstan hetta peyva **Kurd** bikar nedianîn. Di silavkirinê de mirov fem dikir, ku kî komunîst e û kî jî PDK'yî ye. Endam û alîgirên PDK'ê hevoka "**roja we baş**" Bi kar dianîn, di kember de Komunîstan "**selam eleykom**" bi kar dianîn. Yanî her kesê ku peyvên kurdî bi kar anîba û kurdatî kiriba, girêdayî PDK'ê bû û yê ku bigota Kurd netewe nîne û peyvên erebî bi kar anîba, ew komunîst dihat hesabê. Di navbera PDK'ê û Partiya Komunîst a Iraqê de li ser gelek mijaran nakokî hebûn.

Wekî mînak li ser helwesta li hember partiyên din wek; Partiya Gel û Partiya Nişţimanî ya Demokratîk a Iraqê.

Partiya komunîst dijatiya wan dikir, lê PDK'ê dixwest eniyek berfireh ji partiyan bê avakirin, Komnîstan jî dixwestin bi xwe serokatiya wê eniyê bikin. Wê demê hesta PDK'ê ya neteweyî xurt bû, komunîst jî zêdetir rijd bûn li ser hesta çînatiyê.

❖ Wê demê plana we ya avakirina rêxistinên girseyî hebû?

Di sala 1948'an de, em ketin plana avakirina Komeleya Cotkarên Kurdistanê kir, da ku rêxistina wan a taybet hebe. Ez yek ji wan kesan bûm ku di wî warî de gelek çeleng bûm.

Destpêkê min di nav cotkaran de dest bi rêxistinê kir, di encamê de wan karîn bingeha komeleya xwe deynin.

Di Havîna 1948’an de, min dest bi rixistina grupên pîşeyî yên nav bajaran û wan grupan kir ku di rewşa xêzaniyê debûn wekî yên karê pembo û helaciyê dikirin. Di wê çarçoveyê de min serî li wan kesan dan yên kurtan didûriyan, asinkarî dikirin û yên ku di wan cure pîşeyan de kar dikirin.

Di encamê de me karî di nav wan de grupka paş çê bikin. Paş hingê di nav cotkaran de jî, me karî xebatek bi mifa bikin. Wê demê têkiliyeka min a baş bi şêniyên gundan re hebû. Xelkekî zaf serdana tekiyeya me dikirin.

Min jî bi şevê serdana wan dikir û li ser zilm û zordariya dijmin diaxivîm û ji wan dixwest ji bo berevanîkirina ji mafên xwe, yekgirtî bin û xwe bi rêxistin bikin.

Di wê serdemê ango sala 1948’an de, bîr û bawera min a çepgiriyê hebû. Ez ji wê grupê bûm ku di nav PDK’ê de me pirtûnkên marksîstî dixwendin. Wê demê du-sê pirtûkên marksîstî hebûn, ku Elî Ebdullah ji me re şirove dikirin

Her wisa me pirtûkên Matryalîzma Diyalêktîkî û Matryalîzma Dîrokî yên Stalîn dixwendin ku Xalid Begdaş wergerandibû ser zimanê erebî. Her wisa pirtûkeka din a Stalîn a bi navê “Pirsa Neteweyî” jî me dixwend.

Yekem Nakokiya di Nav PDK'ê de

❖ Wê demê piraniya endamên PDK'ê li ser bîr û bawera çepgiriyê bûn?

Piştî ku Şêx Letîf Hefîf û Heme Ziyad Axa wekî cîgirên serok hatin destnîşankirin, nakokiyan di nav PDK'ê dest pê kirin.

Heme Ziyad Axa zilamekî nîştimanperwer û kurdperwer bû, di asta nîştimanperweriyê de diket pêş Şêx Letîf Hefîf, lê Şêx Letîf kurê Şêx Mehmûd bû, ew jî navdar bû û tecrubeyeka wî ya Komara Mihabadê jî hebû.

Wê demê, em wek xortên nav PDK'ê di bin bandora bîr û bawera çep de bûn. Mamostayekî me bi navê **Mihemed Emîn Meirûf** hebû. Wî rehendên pirsa neteweyî ji me re şirove dikir.

Berî avabûna PDK'ê rojnameyên "**Şoreş**" û "**Rizgarî**" hebûn. Rojnameya Şoreşê organa Partiya Komunîst a Kurdistana Iraqê bû. Wê partiyê, partiyek din a nîştimanperwer bi navê "Partiya Rizgarî" ava kiribû, rojnameya Rizgarî jî organa wê bû.

❖ Çi roleke partiyên çep ên Iraqê di wê qonaxê de hebû, çepên PDK'ê çi digotin?

Pêş wê qonaxê, serokatiya tevgera Kurd di dest şêx, mele, axa û began de bû, lê cara yekem bû ku serokatiyên wan her du partiyan (Partiya Komunîst a Kurdistana Iraqê û Partiya Rizgarî) ketibûn dest kesatiyên rewşenbîr, lê piştî avabûna Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) dubare serokatiya tevgera Kurd ket dest eşrtiyê. PDK bi serokatiya Mela Mistefa

hat avakirin, ku bi xwe him mele, him jî serokeşîr bû. Her du cîgirên wî Şêx Letîf û Heme Ziyad Axa bûn.

Ew pêkhatiya serokatiya PDK'ê bû sedem, hejmarek ji xortan ji nav partiyê derkevin. Piştî ku sala 1948'an di navbera Şêx Letîf û **Hemze Ebdullah**[7] de nakokî derketin, pirsgirêka navbera me û baskê çep ê PDK'ê bi temamî teqiya.

Baskê çep serokatiya began qebûl nedikir û digotin: **Nabe axa û beg di serokatiya partiya me de hebin, tevî ku dikarin dost û alîgir bin.**

Em li Koyeyê di bin bandora nêrîna çep de bûn. Piraniya me li komîteya Koyeyê di bin bandora nêrînên Mamoste Mihemed Emîn Meirûf da bûn. Em ji wê xetê bûn ku dixwest nakokiyên PDK'ê di kongreya yekem de bên çareserkirin, bi taybet ku Mela Mistefa li derveyî welêt bû.

Ez di vê baweriyê de me, Hemze Ebdullah şaşiyek mezin di dîroka Kurd de kir, ku eşîr anî nav tevgera kurdatiyê û nav rêxistinê.

……

[7] Hemze kurê **Ebdullah** kurê Omer kurê Kurdo ye. Sala 1915'an li gundê Rajanê girêdayî navçeya Mergewer a Rojhilatê Kurdistanê jê dê bûye. Sala 1934'an li Koleja Yasayê ya Bexdayê xwendina xwe temam kiriye. Sala 1943'yan bi alîkariya komunîstên Koyeyê çûye Mihabadê û li wê derê hejmarek ji serkirdeyên Hizba Demokrat a Kurdistanê nas kiriye.
Hemze Ebdullah 12'ê Tebaxa 1946'an digel Îbrahîm Ehmed û Teha Mihêdîn Meirûf çûye Bexdayê. **Di Kongreya Yekem a Damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê de wek Sekreterê Giştî yê PDK'ê hatiye destnîşankirin**, ku bi hevkariya kadroyên Partiyên Şoreş, Rizgarî û Hîwayê hatibû lidarxistin.

Piştî Şoreşa 14'ê Tîrmeha 1958'an di **Kongreya çarem a PDK'ê** de jê hatiye xwestin dev ji sekreteriya partiyê berde. Hemze Ebdullah di temenê 83 saliyê de, 13'ê Mijdara 1998'an wexera dawiyê kiriye .

Dibû ku PDK'ê mînanî Partiya Rizgarî kar bikira. Di dema Partiya Rizgarî de, baskê partiyê yê eşîrtiyê hebû. Hejmarek zilamên eşîr ên mezin kiribûn endamên partiyê; wekî Ziyad Axayê Koye, Îzedîn Mela Efendî yê Hewlêrê, Salih Begê Mîran Begê Şeqlaweyê.

Hejmarek kesatiyên navdar di şaxeyekê de kom kiribûn û jê re digotin: Şaxeya Eşîrtiyê ya Partiya Rizgarî. Baştir bû ji vê yekê ku wekî bask di nav partiyê kar bikin.

Hemze Ebdullah **ew rêxistin tevlîhev kir û anî nav serokatiyê**. Ev jî **paşdeçûna herî mezin a siyasî, îdeolojî û çînatiyê** di dîroka Tevgera Rizgariya Kurdistanê de tê hesabê.

Ew paşdeçûn di Mihabadê de jî qewimî yanî li wê derê jî, her bi vî awayî eşrtî bû sedema şikistê.

J.K. û Komara Mihabadê

❖ Çi bandorek J.K û Komara Mihabadê li ser hesta neteweyî ya Kurdistana Iraqê hebû?

Komeleya J.K. partiyek biçûk a hişê gelemperî bû, ku ji xwendekar, mele, feqî, kasib û esnafan pêk hatibû. Ji bo cara yekem li Kurdistana Îranê, tevgerek girseyî derketibû holê ku ji aliyê girseyê ve dihat birêvebirin.

Qazî Mihemed ji aliyê Sovyetê ve bû serok, ku mîna serok eşîrekî tevdigeriya. Wî serokatiyên girseyî yên wekî Ebdul Rehman Zebîhî, Dilşad Resûlî, Nanewazade û Sidîq Heyderî ji holê rakir û hejmarek dewlemend, beg û bazirganên Kurd ji bo

serokatiya partiya nû destnîşan kir û navê wê danî "Hizba Demokrat a Kurdistanê".

Bi nêrîna min, rêvebirina partiyê ji aliyê hejmarek bazirganan ve sedemeya sereke ya herifîn û şikista Komara Mihabadê û Qazî Mihemed bû.

Di bingehê de, ew bazirgan zilamên qezencxwaz bûn û taqeta wan a şoreş û xebatek demdirêj nebû, wisa difikirîn ku hikûmetek ji wan re tê avakirin, ew ê jî berhemên wê bixwin, lê piştî ku Sovyet vekişiya, hikûmeta wan herifî û teslîmî Şahê Îranê bûn. Şaşiya Sovyetê di vir de dest pê dike. Li şûna ku Sovyetê Qazî Mihemed bikira serok û wî jî derdora xwe tijî zilamên eşîr û beg bikra, dikarî J.K wek xwe bihîşta û xortên nav wê grup grup bibira Sovyetê yek-du salan li wê derê bihatan perwerdekirin, bi wê yekê dikarî ji bo Kurd bi sedan kadro amade bikira.

❖ Gelo PDK'ê jî li Kurdistana Iraqê karê Hizba Demokrat kopî kir?

Hemze Ebdullah heman kar kir. Ew jî di bin bandora tecrubeya Mihabadê û bandora Sovyetiyan de bû.

Ez dixwazim balê bikişînim ser du tiştan, ku bi wê yekê em dikarin dersek mezin ji Komara Mihabadê werbigirin:

Yekem: Netenê evîna Kurd ji bo Yekîtiya Sovyetê û destwerdana wî welatî li karûbarên kurd, di berjewendiyan kurd de nebû, belkî bi ziyana Kurd jî bû. **Eger Sovyetê Qazî Mihemed negihandiba Serokatiya Komara Mihabadê û J.K'ê hikûmet kiriba, rewş bi wî awayî nedihat guhertin ku me dît.**

Duyem: Tevgera Kurd li Kurdistana Iraqê jî baş pêş ketibû, lê anîna baskê eşîrtiyê, li hember wê pêşketinê astengî çê kir, **sedem jî dikeve stûtiyê destwerdana Sovyetê**. Lewma em dikarin bêjin, destwerdana Sovyetê di karûbarên Kurdan de, him ji bo Kurdan û him jî ji bo Sovyetê xirab bû.

❖ Çi roleke Partiya Şoreşê di avakirina PDK'ê de hebû?

Destpêkê kadroyên Partiya Şoreşê qebûl kirin Partiya Demokrat a Şoreşger a Gireseyî bê damezrandin, bi şertekî ku serokatî û çarçoveya wê ya sereke di dest kesên marksîst lenînîst de bin.

Lê Hemze Ebdullah nêrîna wan red kir û teoriyek rastgir pêşkêş kir, qaşo **civaka Kurd civakeka eşîrtiyê ye û eşîr tê de hêza sereke tê hesabê** û digot:

Ji ber wê yekê, **divê em eşîran werbigirin û bi riya eşîran ji bo rizgariya gelê Kurd şoreşê bikin**.

Ew nêrîna Hemze Ebdullah bû sedem da ku cemaeta baskekî kadroyên Partiya Şoreşê ya berê ji PDK'ê cihê bibin. Tevî ku Salih Heyderî bi awayekî nerast behsa wê serdemê dike, lê ya rast ev e, ku min di pirtûka xwe de ji zarê wî behsa wê hingê kiriye.

Salih Heyderî dibêje; xwedêgiravî wî pişta cuda bûna komunîstan negirtiye. Wê serdemê hemiyan qebûl kirin di nav partiyeka demokratîk a şoreşger de kom bibin. Bingeha wê nêrînê jî teoriya Stalîn bû.

Stalîn di axaftinek xwe de dibêje: Marksîst û lenînîst di welatên paşdemayî de bi sê awayî xebtê dikin:

Yekem: Di wan welatan de ku proletarya tê dexurt û geş bûye û xelk di çarçoveya çînekê de tev digerin, divê di wan welatan de partiya komunîst hebe, wekî mînak jî balê dikşîne ser Hindistanê.

Duyem: Di wan welatan de ku proletarya tê de heye, lê hîn nebûye çîneka bitev û bi awayê siyasî û sendîkayî xwe necerbandiye, dikarin wekî du baskan di nav partiyekê de xebatê bikin. Wekî mînak jî balê dikşîne ser welatê Çînê di wê serdemê de.

Sêyem: Di wan welatan de ku çîna karkeran pêş neketiye û nebûye çînek rêk û pêk ku rûveta wê ya taybet hebe, baştir e kesên marksîst lenînîst rêxistinek demokratîk a şoreşger ava bikin.

Li gorî gotina Stalîn, sê cure partî dikarin pêşverû bin: Ya yekê, partiya komunîst li welatên kapîtalîst, ya duyê partiya komunîst a karkeran li welatên Dinya Sêyem û ya sêyê, partiya demokratîk a şoreşger li welatên paşdemayî.

Ev teoriya partiya demokratîk a şoreşger a Stalîn bingeha hizrî û îdeolojiya avakirina PDK'ê bû.

Her çend tevahiya cemaeta şoroşê qebûl kirin partiyek bi vî awayî damezrînin, lê dema danîna serokatiyê, cemaeta şoroşê cihê bûn û gotin: Em vê yekê qebûl nakin, hetta razî nebûn ku Mela Mistefa jî wekî serokê PDK'ê bê danîn.

Û digotin: **Mela Mistefa kesekî eşîr e û tecrubeyên wî yên rêve-birina partiyek siyasî nîne**.

Bila em wekî kesatiyekî niştimanperwer wî berçav bigirin, nek bikin serokê partiyê. Cemaeta şoroşê li dijî têkiliyên Mela Mistefa û hinek efserên Brîtanyayê hebû. Tevî ku hajî wan bel-geyan nebûn ku paşê derbarê wan têkiliyan hatin belavkirin.

Bêguman eger rastiya têkiliyan eşkere ba, ew ê Mela Mistefa kafir û xiyanetkar bihesibandan.

Cihêbûna Yekem a ji PDK'ê

❖ Sedema cihêbûna çepên nav PDK'ê çi bû?

Mixabin baskê çep li şûna vê yekê ku di nav PDK'ê de bimînin û ji bo guhertina partiyê bixebitin û bi danîna lîsteyekê, nehêlin lîsteya din serbikeve, çawa ku me paşê ew kar kir, lê cihê bûn û çûn nav partiya omunîst.

Sedema wê bêtifaqî û cihêbûnê Hemze Ebdullah bû. Ya rast wî bîr û bawera rastgiriyê xuliqand û eşîrtî anî nav tevgera Kurd. Bi nêrîna min cemaeta şoreşê şaş bûn, madam bawera wan bi partiyê hebû, pêwîst bû bimînin û dikarîn bi riya hil-bijartinê ya ku dixwestin bi dest bînin. Sala 1949'an hejmarek pirs hatin pêş, wekî em çi li partiya xwe bikin?

Bi taybet piştî ku li destpêka 1949'an tirs û xofê, girtin û kuştin û bidarvekirinan li Iraqê dest pê kirin. Di encama serhildana Çileya 1948'an ango Serhildana Wesbeyê de, hejmarek kes hatin girtin û hejmarek ji serkirdeyan jî dev ji PDK'ê berdan.

Dr. Ceifer sewqî Îranê hat kirin, sê sal cezayê girtinê ji Reşîd Ebdul Qadir re hat birîn, Omer Debabe jî hat girtin.

Her wisa Mamoste Îbrahîm Ehmed ku berpirsê Şaxeya Silêmaniyê ya PDK'ê bû, hejmarek hevalên din yên çalak wekî Ehmed Teha, Salih Dîlan, Hîlmî Elî Şerîf, Xefûr Reşîd Daraxa hatin darizandin û girtin.

Hejmarek ji hevalan jî dev ji PDK'ê berdan wekî; Parêzer Reşîd Bacelanî Xaneqînî, Salih Yûsifî û Teha Mihêdîn Meirûf, ku di serdema Beisiyan de bi nav wek cîgirê serokkomarê Iraqê hatibû danîn. Yên di serokatiya PDK'ê de man û nehatin girtin, ev bûn: Ziyad Axa, berpirsê karûbarên rêxistinê bû. Elî Ebdullah û Kerîm Tofîq.

Kerîm Tofîq ciwanekî Koyî yê jîr bû, ku li Koleja Melîk Feysel yasa dixwend, yek ji damezrênerên PDK'ê û endamê Polîtburoyên Partiya Şoreşê û PDK'ê bû.

Lê piştî ku xwendina xwe ya koleja yasayê temam kir, ji berpirsyariyê vekişiya. Sala 1949'an, sala teqîna nakokiyên nav PDK'ê bû, gelek ji serkirdeyan dev jê berdan û hejmarek jî hatin girtin.

Wê salê ji bo çareserkirina rewşa navxwe, PDK'ê konferansek li Bexdayê li dar xistin. Nûnertiyên Bexda, Silêmanî, Koye, Mûsil, her wisa serkirdeyên mayî wekî Ewnî Yûsif û Elî Ebdullah tê de beşdar bûn. Di wê konferansê de komîteyek hat hilbijartin da ku serpestiya PDK'ê bike, her wisa amadekariyan ji bo lidarxistina konferansa giştî bike. Di konferansê de, Ewnî Yûsif, Elî Ebdullah, Salih Ruşdî, Elî Hemdî, Mistefa Kerîm, Nûrî

Mihemed Emîn, Mihemed Mûsa Sadiq û ez wekî endamên serokatiya PDK'ê hatin hilbijartin.

Tevî wan hewlan nakokiyên nav PDK'ê teqiyan, him li ser çawaniya partiyê û him jî li ser reftara Hemze Ebdullah, ku li Silêmaniyê hatibû girtin.

❖ Çi rolek Hemze Ebdullah di nav PDK'ê de hebû?

Sala 1938'an nasnameya Iraqê ji Hemze Ebdullah hatbû standin, 11 salan girtî bû, di wan salan de wekî zilamekî têkoşer nav derxistibû, lê berdana wî bû cihê ecêbmayîna çepên nav partiyê. Bi taybet Salih Ruşdî û Mistefa Kerîm digotin: "Bêguman teslîm bûye, lewma hatiye berdan."

Wê yekê bêtifaqiyek din di nav partiyê de çê kir. Piraniya endam û kadroyên partiyê bawer nedikirin, ku Hemze Ebdullahn teslîm bûbe yan xiyanet kiribe, lê di vê baweriyê de jî nebûn ku her tişt rast be. Wê demê ez li Koyeyê li sinifa sêyê navendî bûm, her wisa endamê Komîteya navçeyê ya partiyê û berpirsê xwendekaran û cotkaran bûm. Me li Koyeyê ew gotinên serokatiya partiyê bi taybet yên Salih Ruşdî derbarê Hemze Ebdullah red dikir.

Me dixwest partî siyaseta çepgiriyê bigre ber û navê xwe ji "**Partiya Demokrat a Kurd**" biguhere û bike "**Partiya Demokrat a Kurdistanê,**" çimkî em di vê baweriyê de bûn, tenê Kurd di Kurdistanê de najîn û divê navê partiyê wek navê welat be nek navê gelê wê, da ku gelên din ên wekî Tirkmen û Asûrî bikarin di nav partiyê de beşdar bin.

❖ Mebesta te ji peyva "me" kî ne?

Mebesta min endamên komîteya navçeya partiyê ya Koyeyê ne. Wê demê “Mihemed Emîn Meirûf” rêbertiya me dikir, ku mamosteyekî jîr yê wê serdemê bû. Endamên komîteya Silêmaniyê jî di heman nêrînê de bûn û wan jî dixwest PDK navê xwe biguhere.

Serhildana Tişrînê (Cotmeh)

❖ Çi roleke PDK’ê û partiya komunîst di serhildana Tişrînê de hebû?

Sala 1952’yan ez li sala yekem a Koleja yasayê bûm. Wê salê xwendekaran û xelkê Bexdayê dijî desthilatê serî hildan ku di dîroka Iraqê de bi navî “**Serhildana Tişrînê**”(Cotmehê) tê nas kirin.

Xwenîşandanan li zanîngehan dest pê kirjn û piştre berfireh bûn û tevahiya bajêr danber xwe. Neraziyan daxwaza azadî, demokrasî û avakirina hikûmetek nîştimanî bi serokatiya Kamîl Çadirçî dikirin. Her wisa daxwaza azadkirina girtiyên siyasî û Barzaniyan û vegeriyana wan ji bo navçeya xwe dikirin.

Xwenşandêran dixwestin xebata partiyên siyasî û weşandina rojnameyan azad bibin û hilbijartin bi awayekî rasterast bê lidaxistin, çimkî wê serdemê hilbijartin li Iraqê nerasterast û bi du qonaxan dihat pêkanîn.

Me jî slogan xistibû nav xwenîşandanan, me daxwaza be-talkirina peymana Iraqê û Brîtanyayê dikir û me dixwest wê

bikin slogana xelkê. Tevî ku piraniya partiyan di xwenîşandanan de beşdar bûn, lê rolek mezin a Partiya Komunîst a Iraqê di berfirehbûna serhildanê de him li Kolejan û him jî li qadan hebû. Wekî PDK jî rolek me ya çeleng di Kolejan de hebû.

Hikûmetê nekarî serhildanê kontrol bike, lewma ji Fermandarê Giştî yê wê demê yê Artêşê Nûredîn Mehmûd ku Kurd bû xwest hikûmetekê dayne û rewşê kontrol bike. Di encamê de hêzên artêşê daketin qad û kolanên Bexdayê û karîn rewşê bixin bin kontrolê. Piştre biryara girêdana xwendingeh û Kolejan hat dayîn. Em jî vegeriyan Koyeyê.

Çepgirî û Guhertina Navê PDK'ê

❖ Çi bûyerên girîng ên wê salê hebûn, PDK'ê çi kir?

Bûyereka girîng a wê salê **neteweyîkirina petrola Îranê** bû ji aliyê Serokwezîrê wê demê Dr. Mihemed Mosedêq, ku di encamê de xelkê Îranê dijî Kompaniya Petrolê ya Brîtanyayê serî hildan. Wê serhildanê Kurdistana Îranê jî girt.

Wê demê Hizba Demokrat a Kurdstanê dest bi çalakiyan kiribû û nûnerê xwe şandibû Kurdistana Iraqê cem PDK'ê. Yek ji bûyerên girîng ên wê salê lidaristina kongreya sêyem di 26'ê Çileya 1953'yan ji aliyê PDK'ê ve bû, ku bi nepenî li malekê li Kerkûkê hat lidarxistin û tevahya nûnerên partiyê û rêxistinan tê de beşdar bûn. Hinek hevalên girtî yên ku nû hatibûn azadkirin wekî Reşîd Ebdul Qadir jî beşdar bûn. Wê demê

Reşîd Ebdul Qadir endamê polîtburoyê bû û du-sê sal bûn hatibû girtin, wekî endamê serokatiyê dihat hesibandin.

Di wê kongreyê de biryar hat dayîn ku PDK siyasetek çep a pêşketî bimeşîne û navê partiyê jî hat guhertin û bû **“Partiya Demokrat a Kurdistan-Iraq.”** Her wisa Komîteya Navendî hat erkdarkirin da ku di çarçoveya biryarên kongereyê de programekê amade bike û belav bike û tê de tekez li ser destnîşankirina mafê çarenivîsê yê gelê Kurd bê kirin.

Hevdem daxwaza herifandina rejîma paşatî û avakirina komarek demokratîk a niştimanî li Iraqê û Komarek federaliya çep li Kurdistanê bê kirin. Her wisa daxwaza reforma erdîn çandiniyê û ji holê rakirina xan û axayan bê kirin.

Xurtkirina siyaseta rêxistina kar û çalakiyên karkeran, cotkar û rêncberan xalek din a wê programê bû.

Kongreyê destxweşî li Mamoste **Ezîz Şerîf** [8] kir, ji ber nivîsîna pirtûka bi navê “**Pirsa Kurd li Iraqê** (العراق فى الكردية المسالة),” ku wê demê helahelayek mezin çê kiribû.
Berî ku ew pirtûk bê weşandin nakokiyek mezin di navbera PDK’ê û Partiya Komunîst a Iraqê û hinek grupên çep ên wekî “Wehde El-nêzad” de, hebû ku ji aliyê Mamoste Ezîz Şerîf ve dihat birêvebirin.
Derbarê mafê diyarkirina çarenivîsê jî, gelo Kurd netewe ye yan na? Di encamê de bêbingehiya wê bawera şovênîst eşkere bû.

……

[8] Li dîpnota hejmara **[6]** binêre. →

Hetta partiya pomunîst bi xwe di wê barê de belavokek bi navê “**Mîsaqa Basim**” weşand. Mebest ji Basim heman **Behadîn Nûrî**[9] bû.

……

[9] Behadîn Nûrî sala 1927’an li navçeya Qeredaxa Silêmaniyê ji dê bûye. Sala 1946’an çûye nav Partiya Komunîst a Iraqê û **di 22 saliyê de bûye sekreterê giştî yê wê partiyê**.

Sala 1953’yan cezayê bidarvekirinê lê hatiye birîn, lê piştre hatiye guhertin û bûye cezayê girtina hetahetayî. Piştî Şoreşa Tîrmeha 1958’an hatiye azadkirin.

Behadîn Nûrî **nêzîkî 40 salan di serokatiya Partiya Komunîst a Iraqê de bûye**, ji wê heyamê çar salan sekreterî giştî bûye.

Sala 1994’an Partiya Tevgera Demokrasiyê damezrand û sala 2018’yan jî pirtûkek derbarê pirsa Kurd û tecrûbeya Kurdistana Iraqê nivîsiye ku tê de **bal kişandiye ser şeş şaşiyên dîrokî yên serkirdeyên Kurd di xebata çekdarî de**.

PDK û Hilbijartina Parlamentoya Iraqê

❖ Çi roleke Kurd di hilbijartina Parlamentoya Iraqê hebû?

Hilbijartina parlamentoyê bi awayekî rasterast hat lidarxistin. PDK'ê dikarî di gelek cihan de nûneran hilbijê re lê ji ber gîrobûnê ket rewşek şepirze.

❖ Encamên hilbijartinê çawa bû?

Derbarê pişikdariya di hilbijartinê de, du nêrîn di nav PDK'ê de hebûn.
Yekem: Em beşdar bin da ku bizanin çi dikarin bikin?
Duyem: Yan jî dijatiya wan bikin.

Mamoste Îbrahîm Ehmed ku wê demê sekreterê PDK'ê bû, li ser bingeha pirtûka Lenîn (Çepgirî di nav tevgera komunîstiyê de sergêjiyek zarokane ye), bal kişand ser vê yekê ku hilbijartin, hevrikî ye lê dijberî şaş e. Wî bal kişand ser nêrîna Lenîn a derbarê hilbijartinê û got:

"Divê em hilbijartinê bikin hevrikî, hetta di parlamentoya herî kevneperest de beşdar bibin û hevrikiyê bikin, eger di hilbijartinê de nûnerê PDK'ê derket, ew dê biçe parlamentoyê û bîr û bawera me bigihîne, lê eger derneket, wê demê me hevrikiya xwe kiriye û me kariy hikûmetê rezîl bikin."

Mamoste Îbrahîm Ehmed got: Ji ber ku em dikarin li Koyeyê nûnerekî derbixin bila Mesûd Mihemed beşdariyê bike û **"Bila nûnerê me be û em wî hilbijêrin."**

Tevî ku nêrînên cuda li ser **Mesûd Mihemed**[10] hebûn.
Her wisa ew bi xwe jî di hinek pirsan de gelek hişk û di hinekên din de gelek nerm bû, lê me destnîşan kir û bernameya hilbijartinê jî ji wî re nivîsî û 100 dînar jî wekî pereyê beşdariyê partiyê dayê.

Di nav bazarê de min propagandayeke mezin ji Mesûd Mihemed re kir. Yekem car min dest bi axaftinê ser girîngiya hilbijartinê, çawaniya birêveçûn û mifayên wê pêvajoyê kir. Her wisa min serî li hejmarek gundan da ku şêniyên wan ez nas dikirim û têkiliyên me hebûn. Ji wê derê min cotkar birin Teq Teqê da ku beşdariyê di pêvajoya hilbijartinê de bikin.

Di rê de pêlava min diriya lê bi pêxasî û di bin baranê de, ez pêşiya wan ketim û min gihanidin cihê dengdanê. Ew dilsoziya min wekî xwendekarekî Koleja yasayê ya bi pêxasî bû handanek mezin da ku di pêvajpyê de beşdar bibin. Me hemiyan deng da Mesûd Mihemed, di encamê de ew wekî nûner hat hilbijartin, hevrikê wî dengekî wisa ne anî ku Mela Hewêz Axayê Koyeyê bû û axayekî kevneperest dihat hesabê. Mesûd Mihemed yekem zilamê olî bû ku PDK'ê wekî nûner şand parlamentoya Iraqê. Ziyad Axa jî piştevaniya me kir û bi kêfxweşî got: **"Bila vê carê Kekê Mesûd biçe parlamentoyê."**

❖ Çima nûnerên PDK'ê li navçeyên din ên Kurdistanê nehatin hilbijartin?

……

[10] Mesûd Mihemed sala 1919'an di malbatek olî de li bajarê Koyeyê ji dê bûye. Xwendina xwe li Koyeyê û Hewlêrê temam kiriye û di sala 1940'an de li Koleja Yasayê ya Bexdayê hatiye wergirtin. **Çend geran endamê Parlamentoya Iraqê bûye**, salên 1953'yan-1954'an nûnerê navçeya Koyeyê li parlamentoyê bûye.

Dewam dike →

Wek PDK me li cihên din xwe amade nekirbû, berevajî nûnerên me dikarîn li Silêmanî û Hewlêrê jî derketiban. Dema ku kolêj vebû ez û Mesûd Mihemed bi hev re çûne Bexdayê.

.....

Dewama [10] → Çendîn erkên wî yên cur bi cur di nav hikûmetên Iraqê de hebûne ji wan di kabîneya Tahîr Yehya de sala 1964'an wezîr bûye. Her wisa **yek ji rexnegirên pispor ê pergala Komunîsmê** bûye. Di yekê Nîsana 2002'yan de Mesûd Mihemed li bajarê Hewlêrê wexera dawiyê kir.

Beşa Sêyem
3
Qonaxeke Nû ya
Xebata di Nav PDK’ê de

- Avakirina saziyên xwendekaran, ciwanan û jinan
- Mafê çarenivîsê û partiya komunîst
- Têkiliya PDK’ê û Hizba Demokrat (PDK-Iran)
- Pîrozkirina helkeftên neteweyî
- Rêxistina karên PDK’ê li Hewlêrê
- Bandora Yekîtiya Sovyetê û Eniya Sosyalîst li ser PDK’ê
- Komara Demokratîk a Neteweyî ya Kurdistanê
- Kurdên Îranê û beşdariya di PDK’ê de
- Têkiliya bi Kurdên parçeyên din ên Kurdistanê
- Yekem çalakiya siyasî li derveyî Kurdistanê
- Evîndarî û girtîgeh
- Rola Îbrahîm Ehmed û Hemze Ebdullah di PDK’ê de
- Sewqa Barzaniyan, jiyan û karê siyasî li Sovyetê
- PDK di serdema paşatiyê de

Avakirina Saziyên
Xwendekaran, Ciwanan û Jinan

❖ Çawa û kengê we plana avakirina saziyên pîşeyî kir?

Sala nû karê me yê yekem avakirina Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê bû. Ehmed Ebdullah û ez wek serok û sekreterê yekîtiyê hatin hilbijartin.

Ehmed Ebdullah xelkê Amêdiyê û xwendekarê Dar ol-Muelîmmîn ango Koleja Mamosteyan bû. Kesekî xwedan şiyan, jîr û aqil bû. Zimanê erebî baş dizanî û nivîskarekî baş jî bûhelbet ji siyasetê jî dûr nebû.

Civîna avakirina Yekîtiya Xwendekaran li mala Ebdul Qadir Ziyad Axayê Koye, li Taxa Ezîmiye ya Bexdayê hat kirin, ez û ew di qonaxa lîse û kolejê bi hev re bûn.

Di civînê de her yek ji; Ehmed Ebdullah û Heyder Heme Emîn ji Hewlêrê, Hîlmî Elî Şerîf, Xefûr Reşîd Daraxa û Celal Ezîz ji Silêmaniyê û Fayiq Ebdul Qadir ji Bexdayê û Ez ji Koyeyê û çend hevalên din beşdar bûn ku ser hev hejmara me digihîşt 10-12 kesan.

❖ Ew civîn kongreya Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê bû?

Belê, di wê civînê de yekîtiya xwendekaran programa xwe danî. Piştre daxuyaniyek hat belavkirin bi navê çima yekîtiya xwendekaran pêwîst e? Ku ji aliyê min ve hat nivîsandin.

Ew daxuyanî yekem şirove bû ji destpêka jiyana xwe ya siyasî min nivîsîbû ku bi wî awayî hat belavkirin. Paşê em bûn bingeha avakirinê ji bo Yekîtiya Lawên Demokrat a Kurdistanê.

Endamên Komîteya Damezrêner a Yekîtiya Lawên Kurdistanê ev bûn: Parêzer Bekir Îsmaîl, Hejar Mukriyanî û ez.
Paş hingê Heyder Mihemed Emîn û Mihemed Mûsa Sadiq xwendekarê kolejê yê Feylî li komîteyê hatin zêdekirin.
Bi vî awayî me her du yekîtiyên xwendekaran û lawan avakirin. tevî ku yekîtiya Lawan nekarî bibe rêxsitinek mezin, lê yekîtiya xwendekaran karî cihê xwe bigre û di praktîkê de bibe rêxistinek çeleng û ektîv.
Her ji destpêkê ve Komunîstan astengî ji me re çê kirin, bi vê hincetê ku pêngavek ji bo cudabûnê ye. Wê salê nakokî ket navbera me û xwendekarên Komunîst li ser vê yekê, gelo yekîtiya xwendekaran pêwîst e yan na?
Wê serdemê Îzedîn Mela Mistefa, Fazîl Ferec û Cemal Nebez xwendekarên herî çalak ên Komunîst bûn ku li ser yekîtiya xwendekaran bime re diketin nav nîqaşan.
Hinek ji wan destê rastê yê Komunîstan bûn. Di şerê li dijî Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê de ew fikir ji holê rabû, lê yekîtiya xwendekaran cihê xwê girt.

❖ Yekîtiya Afretên Kurdistanê çawa û kengê hat avakirin?

Tevî ku pêştir behsa avakirina Yekîtiya Afretên Kurdistanê hatibû kirin, lê paşê li Silêmaniyê komeleyek ji wan re hat pêkanîn.
Endamên damezrêner ên Yekîtiya Afretên Kurdistanê ev bûn: Encûm Ebdullah Zuhdî, Behiye Meirûf, Nahîde Şêx Selam, Direxşan Şêx Celal Hefîf, li Bexdayê Ronak Ebdullah Zuhdî, li Koyeyê Sureya xwişka Mesûd Mihemed û hejmarek jinên din li Bexdayê.

❖ Çima yekîtiyên cotkaran û karkeran nekarîn wek pêwîst li Kurdistanê rola xwe bibînin?

Me hewl ji bo pêşxistina yekîtiya cotkaran da, hetta ji bo cara yekem me bi nepenî kovarek bi navê "**Nirkey Cûtyar**" weşand, ku behsa girîngiya pirsa reforma çandiniyê dikir.

Di wê çarçoveyê de Polîtburoya PDK'ê biryar da parêzerên partiyê pişta cotkaran bigirin.

Mamoste Îbrahîm Ehmed bi xwe, ji bo bicihanîna wê biryarê dixebitî, bi taybet di tevgera cotkarên deşta Dizeyê, navçeya Şarbajêr û Şarezûr, partiyê gelek baş pişta cotkaran girt.

Tevgera karkeran jî li Kurdistanê nekarî xurt bibe, ji ber ku tenê hejmara karkerên pîşeya petrolê zêde bû, lê piraniya wan Kurd nebûn.

Her çend me hewl da, ku li her bajarekî sendîka ji bo karkerên înşaet, kargehên kerpîçan û şaredariyê ava bikin, lê nekarîn bibine sendîkayek zindî.

Mafê Çarenivîsê û Partiya Komunîst

❖Çi salekê Mîsaqa Basim hat ragihandin, giringiya wê çi bû?

Di sala 1953'yan de "Mîsaqa Basim" hat derxistin û bi navê "Behadîn Nûrî" hat naskirin, ku dihat wateya pêkhatina guhertinê di programa Partiya Komunîst a Iraqê de. Ji ber ku partiya komunîst sala 1944'an Mîsaqa Niştimanî ya xwe derx-istibû. Heta wê demê tu guhertinek tê de nehatibû kirin û **Kurd wek kêmaniyek etnîkî** hatibû zanîn. Lê di Mîsaqa Basim de, behisa vê yekê hatibû kirin, **Kurd netewe ye û mafê**

diyarkirina çarenivîsê, cudabûn û avakirina dewleta serbixwe heye.

Di encama derketina wê mîsaqê û hinek pirsgirêkên din de, nakokiyên nav partiya komunîst bi temamî teqiyan û "Komeleya Raye el-Şexîle" veqetiya ku ji aliyê van kesan ve dihat serokatî kirin: Ezîz Mihemed, Cemal Heyderî, Salih Heyderî, Ebdul Rezaq Safî, Hemze Selman û Mihemed Hisên ku kadroyên kevin ên Partiya Komunîst a Iraqê bûn.

Piştî wê parçebûnê partiya komunîst da xuyakirin, ku ji vir şûn de partiya wan siyasetek çepgir dimeşînine.

Ya rast siyasetek şoreşgerî bû, ku **herifîna rejîma paşatî, demokrasiya neteweyî û mafê çarenivîsê ji bo gelê Kurd dixwest,** her wisa girîngî jî dida karker û cotkaran.

❖ Ferqa Mîsaqa Fehd û Mîsaqa Basim çi bû?

"Komeleya Raye el-Şexîle" ya cudabûyî, her di bin bandora nêrînên kevin ên Fehd de bû, tevî ku di rastiyê de Mîsaqa Fehd zêdetir programek hilbijartinê bû heta Mîsaqa partiyek siyasî. Mîsaqa Fehd ji ber ku ji xwestekên biçûk ên reformê pêk dihat lewma zêdetir ji bo programa hilbijartinê û çûna nav palamentoyê baş bû.

Lê **Mîsaqa Basim ku ya Behadîn Nûrî[11] bû, ji bo çareserkirina bingehîn a piraniya pirsgirêkan gelek baş bû**.

❖ Sala 1953'yan çi guhertin di nav PDK'ê de hat kirin?

Di konferansek du rojî de li 26'ê Çileya 1953'yan hinek guhertin di nav programa Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) de

.....

[11] Li dîpnota hejmara **[9]** binêre →

hat kirin û biryar hat dayîn, **saziyên demokratîk bên avakirin**, wek **Yekîtiya Xwendekarên Kurdistan, Yekîtiya Lawên Demokrat a Kurdistanê**, her wisa bi girîngî li ser avakirina Komeleya Cotkaran û Yekîtiya Afretan partî bixebite.

Her wisa biryar hat dayîn PDK bi çelengî di tevgera aştiyê de li Iraqê, cîhanê û wan festîval û civînan de beşdariyê bike, ku li derveyî welêt tên lidarxistin.

Di konferansê de biryar hat dayîn PDK dev ji siyaseta hemberderketinê berde û nêrîna xwe derbarê pêvajoya hilbijartinê û pirsên din bi awayeyî zelal diyar bike.Bi wan hewlan hikûmeta kolonyalîst li Iraqê rezîl bike.

Têkiliyên
PDK’ê û Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê

❖ Kengê têkiliyên PDK’ê û Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê çêbû?

Sala 1953’yan têkilî navbera her du partiyan de çêbû. Cara yekem hejmarek ji hevalên Hizba Demokrat a Kurdistanê serdana me kirin, yek ji wan **Xenî Bilûriyan**[12]bû. Payîza 1953’yan Xenî Bilûryan ji aliyê Partiya Tûde ya Îranê ve hat Bexdayê da ku rewşa tevgera me bizane.

Ez bi xwe ji bo karê wergêranê bi wî re çûm serdana Ezîz Şerîf û Selîm Çelebî ku berpirsên wê demê yên Partiya Komunîst a Iraqê bûn. Her wisa serdana Cemal Heyderî ji "Komeleya Raye el-Şexîle" ya cudabûyî ji partiya komunîst kir da ku Partiya Tûde ji rewşa wan li Iraqê agahdar bike. Ji bilî komunîstan Bilûriyan têkilî bi me re jî wek PDK danî.

❖ Bandora bûyerên welatan bi taybet ên sosyalîst li ser we hebû?

Bêguman, wek mînak ez dikarim balê bikişînim ser dema mirina Stalîn. Em di wê rê û rismê de beşdar bûn.

……

[12] Xenî Bilûryan yek ji damezrênerên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê û serkirdeyekî Partiya Tûde ya Îranê bû. Her wisa kesatiyekî herî bi bandor di nav Kurdên Îranê de bû, ku di nav Kurdên Iraqê de jî dihat naskirin.

Xenî Bilûryan 25 salan di girtîgeha rejîma Şahê Îranê bû. Piştî şoreşa sala 1979’an hat azadkirin, lê sala 1983’yan **Komara Îslamiya Îranê hewl da wî bigire, ji ber wê yekê Bilûryan ji Îranê derket.**

Xenî Bilûryan roja Çarşemê, 8’ê Adara 2010’an di 86 saliyê de li bajarê Koln ê Almanyayê **di encama krîza mejî de** wexera dawiyê kir.

Cenazeyê wî bi balafirê hat veguhestin bo Herêma Kurdistanê û di rê û rismek hêja de li goristaneka Hewlêrê bi axê hat spartin.

Min nameyeka sersaxiyê ser navê polîtburoya PDK'ê nivîsî û da balyozxaneya Sovyetê li Bexdayê, tevî ku ez ditirsiyam bêm girtin, lê min name da balyozxaneyê û navî xwe jî di pirtûka pêvajoyan de nivîsî, lê derbarê erka xwe ya di partiyê de, min tiştek nenivîsî.

Pîrozkirina Helkeftên Neteweyî

❖ We çawa helkefta Newrozê pîroz kir?

Sala 1953'yan me agirê Newrozê vêxist. Bi navê pişik-darîkirinê komunîstan xwestin têk bidin. Şandeyek wan pêkhatî ji Îzedîn Mela Mistefa û Fazîl Ferec hatin ba me û gotin: Pêwîst e partiya komunîst di rê û rismê de beşdar be û gotara wê bê pêşkêş kirin.

Me jî got: Ji ber ku me bi xwe îzna rê û rismê wergirtiye û li hember her tiştî berpirsyar in, lewma em bi xwe dê agirê Newrozê vêxin, alîkarî jî me ji Kurdan û kesatiyên Kurd wer-girtiye.

❖ Kê îzin da hûn helkefta Newrozê pîroz bikin?

Wê demê Dr. Fazil Cemalî serokwezîrê Iraqê bû. Me daxwaza xwe pêşkêşî wî kir, piştre wî jî da Seîd Qezaz ku nû bibû wezîrê navxwe.

Tevî ku me îzin ji walîtiyê wergirtibû, wezîrê navxwe betal kir. Me jî ji bo îtirazkirinê şandeyek ji xwendekaran pêk anî û çûn ba serokwezîr. Wî pêşwazî li me kir û em li ofîsa xwe dan rûniştandin, wisa xuyabû li benda Seîd Qezaz e.

Piştî ku Seîd Qezaz hat bala xwe da min û got: Hûn li vir çi dikin? Min jî got: Îtiraza me li ser biryara te heye! wî jî pirsî: "Ji ber çi?" Min got:

“Te îzina pîrozkirina Newrozê betal kiriye,” got: “Wisa nîne û sedem tiştekî dine,” lê me gotina wî qebûl nekir.

Seîd Qezaz derbasî odeya Serokwezîr Dr. Fazil Cemalî bû. Piştre em jî çûn hundir. Me behsa pirsgirêkê ji serokwezîr re kir û me got:

“Ew biryareke şaş e û Newroz helkeftek me ya neteweyî ye, çima hûn rê nadin?”

Serokwezîr got: **“Ez şîe me û tu pirsgirêkek min bi Newrozê re nîne, ew wezîrê we ye û li hev bikin.”**

Seîd Qezaz berê xwe da serokwezîr û bi dest îşaretî min kir û got:

“Ez vî baş nas dikim, dixwaze helkefta Newrozê li dar bixe û dijî Peymana Tirkî- Pakistanî biaxive.” Û got: Ji ber wê peymanê ez qebûl nakim.

Tevî wê yekê Seîd Qezaz bi me re hat derve û bi rûyekî xweş got: Min rê neda ku hûn Newrozê pîroz bikin, lê şûna wê ez ê ji we re karekî din bikim. Ez dixwzim hûn kovarekê derbixin lê bala xwe da min û got:

“**Lê tu hemiyan neke siyaset, dijatiya kolonyalîstê û Peymana Tirkî- Pakistanî, zêdetir li ser mijarên rewşenbîriyê binivîsin**” û got: Ser navê kesekî din daxwazekê bikin.

Me jî ser navê Cemal Şalî daxwza weşandina kovara “**Tirîfe**” kir. Piştre me Parêzer Fayeq Eqrawî wek rêveberê kovarê destnîşan kir û me daxwza xwe pêşkêş kir, lê Seîd Qezaz berevajî soza xwe îzin neda, bi wê yekê kovara “Tirîfeyê” nehat weşandin.

Rêxistina Karên PDK’ê li Hewlêrê

❖ Çima tu ji Koyeyê çûyî Hewlêrê?

Havîna 1949’an piştî ku Hemze Ebdullah hat berdan û vegeriya nav PDK’ê nakokiyên nav partiyê gelek tund bibûn. Hemiyan dixwestin PDK kongreyekê li dar bixe.

Ez Havîna 1950’yan sinifa sêyem a dibistana navîn bûm, ji bo xwendinê çûm Hewlêrê. Ya rast çûna min a Hewlêrê ji bo karê siyasî bû. Ji ber ku şaxeya PDK’ê ya Koyeyê girêdayî ya Hewlêrê bû, lê şaxeya Hewlêrê bi xwe jî hilweşya bû û tiştek jê nemabû. Lewma ez çûm hevkariya hevalên wir bikim, da ku carek din em komîteya navçeya Hewlêrê ya PDK’ê vejînin. Li Hewlêrê ji bilî komîteyên navçeyên Koye û Balekayetiyê, tu rêxsitinek nema bû.

Li Hewlêrê zilamekî Kurdperwer bi navê Mîrza Efendî Ebdul Kerîm hebû, li dadgehê başkatîb bû. Çend endamên partiyê ba wî mabûn. Her wisa Nûrî Şaweys li wê derê bû. Me her sêkan li hev girt û dest bi rêxistinê kir û me komîteya navçeyê Hewlêrê ava kir.

Her yek ji me di asta xwe de dest bi karkerin û peydakirina endaman kir. Mîrza Efendî hejmarek ji endamên kevin peyda kir û min jî hejmarek xwendekar kirin endam.

Her wisa min di nav karker û cotkaran de jî dest bi çalakiyê kir. Digel hevalên nav rêxistina cotkaran ên wekî Hesen Mistefa, Salih Şêre û Mela Ebdullah me dest bi çalakiyan kir.

Piştre ji bo vejandina karê komîteyê ez çûm navçeya Balekayetiyê. Piştî azadbûnê Ewnî Yûsif çar-pênc kes ji axayên nîştimanperwer bi navên Ehmed Heme Emîn Dizeyî, Îbrahîm

Dizeyî, Sabîr Axa û Muşîr Dizeyî kom kiribûn ku hemû zilamên baş bûn.

Me bi hev re dest bi çalakiyan kir, di encamê de dubare şaxeya Hewlêrê ya PDK'ê vejiya. Her wisa me ji Hewlêrê ve şaxeya Behdînan vejand. Destpêkê li Behdîna tevî ku me gelek hewl da, lê me tenê karî li Akrê şeneyekê pêk bînin. Piştre hêdî hêdî li Duhokê, Amêdî û Akrê me dest bi rêxistinê kir û em gihîştin asta çalakiyan.

❖ Kengê kongreya duyem a PDK'ê hat lidarxistin?

Kongreya duyem a PDK'ê sala 1951'an li mala Elî Hemdî li Bexdayê hat lidarxistin. Di wê kongreyê de Salih Ruşdî û Mistefa Kerîm dixwsetin Hemze Ebdullah Ji partiyê bê derxistin, lê kongreyê xwesta wan qebûl nekir, ew jî bi hejmarek hevalan re ji kongreyê vekşiyan. Piştre rojnameya "Rizgariya Nû" weşandin.

Tevî ku me çareseriyek ji bo wê pirsgirêkê peyda kir, ew jî hilbijartina komîteyek nû bû, ku nedibû tu hevalekî kevin tê de endam be, da ku program û destûra partiyê amade bike û siyasetek nû ji partiyê re dayne û navê partiyê jî biguhere û bike partiyek girseyî ya şoreşger a pêşverû da ku mifayê ji marksîst lenînîstê werbigre.

Ew nêrîn di nav kongeryê de hat plankirin û ev pênc kes; Mamoste Îbrahîm Ehmed, Celîl Hoşyar (ku nû ji girtîgehê hatibû berdan), Mihemed Emîrn Meirûf, Nûrî Şaweys û Bekir Îsmaîl wek endamên Komîteya Demkî ya Rêveber a PDK'ê hatin hilbijartin.

❖ Tevî ku xort bûyî, çima kongreyê tu ji bo serokatiyê hilbijartî?

Rast e, ez ji bo serokatiya partiyê hatim hilbijartin, lê ji ber ku biçûk bûm, min ji Celîl Hoşyar xwest ew bikeve şûna min.

Bi hilbijartina wê komîteya rêveber programek nû, serokatiyek nû û qonaxek nû di jiyana PDK'ê de dest pê kir.

Danerê wê nûxwaziyê jî Mamoste Îbrahîm Ehmed bû. Di kongreyê de endamên serokatiyê yên kevin, wek Hemze Ebdullah, Elî Ebdullah, Kerîm Tofîq nehatin hilbjartin. Hilnebijartina wan ji bo vê yekê bû, da ku PDK di hemû waran de bibe partiyek nû.

Bandora Sovyetê û Eniya Sosyalîst li Ser PDK'ê

❖ Çi bandorek Yekîtiya Sovyetê û Eniya Sosyalîst li ser PDK'ê hebû?

Mixabin ji destpêkê ve kesên ku ji aliyê Sovyetê wekî berpirs ji bo dosyeya Kurd hatibûn destnîşankirin azerbaycanî bûn û bi nêrînek şovênîst bala xwe didan pirsa neteweyî ya Kurd û bandora wan li ser mejiyê Hemze Ebdullah hebû. Yek ji wan profîsorekî Rûsî bi navê Fêlçêveskî bû, ku Rûsya wek pisporê pirsa Kurd diyar kiribû, prtûkek wî li ser pirsa Kurd hebû, lê nêrîna wî gelek şaş bû.

Degot: **"Civaka kurdî, civakek eşîrtiyê ye ji ber ku hêza wê ya sereke eşîr in, divê hewl bê dayîn beg û axayan bikşînin nav şoreşê, bi eşîran di civaka kurdî de guhertinê bikin."**

Tirkên Azerbaycanê jî bi awayekî şovênîstî tevdigeriyan, yek ji wan Serokkomarê wê demê yê Azerbacana Sovyetê Mîr

Cefer Bagirov bû. Wî gelek hewl da Komeleya J.K'ê bide hilweşandin.

Bi nêrîna min, şaşiya yekem a Sovyetê ji wir ve dest pê dike, ku "J.K" hilweşand û Hizba Demokrat a Kurdistanê ava kir. Helbet avakirina Hizba Demokrat a Kurdistanê gelek baş bû, diviya J.K bikira Hizba Demokrat, wê xwe û navê xwe biguherta û programek ji xwe re dayna û serokatiya xwe hilbijarta. Lê Sovyetê Qazî Mihemed erkdar kir û jê xewst Hizba Demokrat a Kurdistanê ava bike û bernameyê jê re dayne.

Qazî Mihemed her bi nav digel J.K'ê bû. Piştî damezrandina Hizba Demokrat, ji cemaeta J.K'ê bi taybet endamên serokatiya wê yên şoreşger kes neçû nav wê partiyê. Qazî Mihemed bi alîkariya Sovyetê, baskê eşîrtiyê vegerand nav tevgera Kurd li Îranê, ku dema desthilata J.K'ê baskekî lawaz bû.

Li Kurdistana Iraqê jî, Hemze Ebdullah ku ji rûyê hizrî komunîst bû, gelekî di bin bandora Sovyetê de bû û wisa hizir dikir; ya ku Sovyet dibêje pîroz e, bi awayekî hetta dixwest programa ku me ji PDK'ê re danîbû sovyetî bibînin. Bi wê meremê bername da Mistefa Xoşnaw û Mîr Hac da ku bibin Tewrêzê û nîşanî Sovyetiyan bidin. Wan jî di çarçoveya berjewendiya xwe de guhertibûn.

Me dizanî programa partiyê nuxsan e, wekî mînak reformên çandiniyê tê de nebûn û me digot: Ne şert e ku Sovyet baştir ji me hajî rewşa Kurdistanê be û her gavê me daxwaza guhertina programê bikira, Hemze Ebdullah hêris dibû û digot: "Nabe."

Hemze Ebdullah piraniya caran wekî bavê Kurdan navê Sovyetê dianî û digot: **“Bavê Kurdan gotiye, bavê Kurdan razî nebûye, divê bavê Kurdan razî be.”**

Me ew zêhniyet şikand û me got: Tevî ku em Yekîtiya Sovyetê hez dikin, lê ne şert e ya ku li wê derê baş û rast û maqûl be, her bi wî awayî ji bo welatê me jî baş be.

Em di vê baweriyê de bûn, Hemze kesekî rastgir e, dibe ku ji zarê Sovyetê ve wan gotinan bike. Tevî ku piştre di serdana Moskowê de rastiya gotinên wî ji min re eşkere bû û derket ku yê Hemze Ebdullah nîne, lê me digot: Ew gotinên rastgirane yê Hemze ye û dixwaze bi ser me de ferz bike.

Xirabiyek me ya din serhişkiya me ji bo Sovyetê bû. Me wisa hizir dikir, ya ku ji Sovyetê were mînanî Quranê pîroz e lê paşê derket, em bi xwe bûn ku wisa difikirîn. Wê demê Hîlmî Elî Şerîf, Mamoste Mihemed Emîn Meirûf û Mamoste Îbrahîm Ehmed û ez ji baskê çepgir ê PDK’ê bûn, ku di nav xelkê de kesên herî baş û jîr dihatin hesab.

Mamoste Îbrahîm Ehmed rêberiya wê hizra çep a di nav PDK’ê de dikir. Wî dixwest PDK Marksîzm û Lenînîzmê qebûl bike û demokrasiya gelêrî wekî sloganekê bipejirîne. Her wisa dixwest pirsgirêka çandiniyê bê çareserkirin û dostaniya bi Sovyetê re jî bê mikumtirkirin.

Em li hember bê alîtiyê sekinîn, çimkî wê demê hikûmeta Iraqê bê alitî dixwset. Lê Mamoste Îbrahîm Ehmed digot:

“Em bêalî nînin, di cîhanê de du enî hene, Eniya Sosyalîzmê bi serokatiya Sovyetê û Eniya Împeryalîzmê bi serokatiya Amerîkayê. Em jî li dijî wê eniyê ne lewma nikarin bêalî bin.”

Rêbaza çepgiriyê di nav PDK'ê de xurt bû û desthilat bi dest anî. Kesî nedikarî di nav partiyê de li hember wê rêbazê bisekine yan dijatiya wê bike.

Wê demê endamên PDK'ê tenê çend sed kes bûn, piraniya wan xwedanê bîr û bawera çep bûn, ku piştre di nav tevahiya partiyê de bû tiştekî mutleq û urfekê û berfireh bû.

Çend pirtûk derbarê demokrasiya neteweyî hatbûn weşandin, lê ji ber ku me zimanên biyanî nedizanî Mamoste Îbrahîm Ehmed ji me re werdigerand ser zimanê Kurdî.

Her wisa wî çend pirtûk derbarê demokrasiya neteweyî û bîr û nêrîna Mao Zedong xwendibû, lewma pirsa Demokrasiya Gelêrî di nav mede belav bû.

Komara Demokratîk a Neteweyî ya Kurdistanê

❖ We çawa pirsa Kurd û Iraqê bi hev re girê dida?

Cara yekem li Iraqê slogana herifandina rejîma paşatiyê di nav me hat dayîn. Me digot:

Divê rejîma şûngira paşatiyê, rejîma demokratîk a neteweyî ya bi serokatiya nivşa karkeran be.

Slogana mafê çarenivîsê hat guhertin, armanca me ev bû, ku Iraq ji du komaran pêk bê; **Komara Demokratîk a Neteweyî ya Kurdistan** û **Komara Demokratîk a Neteweyî ya Erebî** ku her du Komara demokratîk a Neteweyî ya Iraqê pêk tînin.

Di wê çarçeveyê de mafê Komara Demokratîk a Neteweyî ya Kurdistanê heye, **têkiliyên wê yên dîplomatîk hebin û bibe endamê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî.**

Wan nêrînan di nav programa sala 1953'yan a PDK'ê de cih girtin, ku ji sala 1951'an ve dest pê kiribû.

Kurdên Îranê û
Beşdariya di PDK'ê de

❖ Hejar wekî Kurdekî Iranê çawa karî li derve nûnertiya xwendekar û lawên Kurdên Iraqê bike?

Di wê serdemê de gelê Kurdistanê ferq û cudahî nedixist navbera Kurdan. Ji berê ve Kurdên Îranê dema neçar dibûn dihat ba PDK'ê, wek mînak dikarim balê bikşînin ser; Ebdul Rehman Zebîhî, Hejar Mukriyanî, Hesen Qizilcî û Dilşad Resûlî ku endamên partiyê bûn û erk bi wan hatibû sipartin.

Mamoste Îbrahîm Ehmed di vê bawriyê de bû; **di her welatekî de (welatên Kurdistan bi ser wan de hatiye parvekirin), partiya Kurdistan daş(-) wî welatî hebe, ku ji aliyê serokatiyek hevpar a neteweyî ve bên rêvebirin**. Wekî mînak; Partiya Demokrat a Kurdistanê - Iraq.

Em heman salê li gorî şiyana xwe li ser Turkiyê (Bakurê Kurdistanê) xebitîn. Hejmarek xwendekar ku qonaxa lîseyê temam kiribûn û dixwestin biçin Tirkiyeyê û li wê derê bixwînin, me ji wan xwest li wir têkiliyê bi Kurdên Tirkiyeyê (Bakûrê Kurdistanê) re dayînin.

Yek ji wan xwendekaran xortekî Kerkûkî bi navê Nejad bû, di qonaxa lîseyê bi hev re bûn. Yekî din Enwer Dizeyî bû. Ew xwendekar li Tirkiyeyê li ser hişyarkirina Kurdan dixebitîn.

Têkiliya bi Kurdên
Parçeyên Din ên Kurdistanê

❖ Armanca şandina ciwanan çi bû xwendin an avakirina partiyekê li wê derê mîna Kurdistana Iraqê?

Ji bo her du armancan bû. Şandina hevalan ji bo wê yekê bû da ku di paşerojê de li wê derê partiyekê ava bikin û kurdatiyê vejînin. Çûyîna Mamoste Hejar Mukriyanî ji bo Sûriyeyê jî tevî ku di bingehê de ji bo pirsgirêka wî ya tendirustiyê bû, lê me wisa pêwîst zanî ji mecalê mifayê werbigre û têkliyê bi Kurdên Sûriyeyê re dayîne. Wê demê Kurdên Sûriyeyê bê partiya siyasî bûn.

Her wê salê (1953'yan) Mesûd Mihemed nûnerê PDK'ê, cara yekem li parlamantoya Iraqê behsa pirsa Kurd û welatê Kurdan û bêpariya navçeyên kurdî ji xizmetan kir.

Wê salê têkiliyên PDK'ê û partiyên Iraqê hatin xurtkirin. Him digel partiya komunîst û him jî bi Partiya Nîştimanî ya Demokratîk a Iraqê re. Hevdem me hewl da, têkiliyên xwe bi wê grupa komunîstan re jî baş bikin ku bi navî "Cemaet El-Qaide " dihat naskirin.

Sala 1953'yan ji bo cara yekem têkiliya me bi neteweçiyan re jî dest pê bû. Heta wê hingê tenê têkiliya me bi komunîstan re hebû. Destpêka sala xwendina 1953'yan, li Koleja yasayê min xwendekarek bi navê Zekî nas kir. Cara yekem min navê Partiya Beis(Partiya Baas) ji wî bihîst û bi riya wî min zanî ku partiyek wisa li Iraqê heye.

Di heman salê de Behadîn Nûrî hat girtin, lê wî gelek bi netirsî di darazê de berevanî kir, bi taybet helwêsta wî ya derbarê mafê çarenivîsê yê gelê Kurd, ku bû sedem daraz biryara bidarvekirina wî bide, ku piştre bû cezayê girtina hetahetayî.

Yekem Çalakiya Siyasî li Derveyî Kurdistanê

❖ Yekem çalakiya te li derveyî Kurdistanê çi bû?

Cara yekem wek Kurdekî di civîna neteweçiyên Ereb de min axaftinek kir û tê de min behsa biratiya Kurd û Ereb, yekîtiya têkoşînê û pêdiviya hevxebatiya her du gelan kir.

Ew axaftina min rastî rexneyek tund a komunîstan hat, wan êrişek mezin kirin ser me û digotin: Hûn rastgir û kevenperest in, çimkî hevkariya neteweçiyên Ereb dikin.

❖ Gelo ziyana têkiliya we û neteweçî yên Ereb ji bo Komunîstan hebû?

Komunîstan dixwestin têkiliya tevgera Kurd tenê bi wan re hebe û tu têkiliyek PDK'ê bi partiyên din ên Ereban re nebe.

Hejar Mukriyanî piştî vegeriyana ji Festîvala Lawan û Xwendekaran a Cîhanê, dest bi nivîsandina çend helbestan kir. Rêxistina Lawan a Demokrat a Kurdistanê jî hat avakirin. Em li ser nivîsandin û wergerandina pirtûkên derbarê aşitî û Tevgera Aşitiyê li cîhanê dixebitîn.

Heme Ehmed Teha (Kameranê helbestvan) sala 1954'an çend helbest nivîsîn, min jî pêşgotin jê re nivîsî û weşand. Wê pêşgotinê pirsgirêkek mezin çê kir, ji ber ku min bi zimanê

çepgiriya wê serdemê nivîsî bû û wekî zilamxwir behsa împeryalîzmê kiribû.

Li ser wê helbest û pêşgotinê em hatin darizandin. Heme Ehmed Teha salekê hat sewqkirin, ez jî hatim berdan, ji ber ku ez tenê weşanker bûm, nek nivîskarê pirtûkê.

Evîndarî û Girtîgeh

❖ Tê gotin wê serdemê ji bilî siyasetê te evîndarî jî kiriye, di wê barê de çi dibêjî?

Pirsa te bîranînek nexweş tîne bîra min. Wê demê ez xort bûm, min û Keçekê li kolêjê hev du hez dikir. Me qirar danîbû li cihekê hev du bibînin. Wan rojan min destek cil kirî bû, min kiras û pêlavek jî kirî û xwe xemilan da ku biçim ser qirarê.

Demjimêr 11.40 xulek ji kolêjê derketim, da ku biçim hezkiriya xwe bibînim, lê du efserên lêkolînên sûçan pêsîra min girtin. Wan ez siwarî teksiyê kirim û birim Navenda Lêkolînan a Sûçan. Derbarê wê pirtûkê ya ku pêştir min behsa wê kir, dest bi lêkolînan kirin û ez heft rojan hatim girtin, di wan çend rojan de ew cilên min jî têk çûn.

Wê demê îstasyona trênê ya Hewlêrê li derveyî bajêr bû. Du polîsan ji îstasyonê peya û kelebçekirî, ez birim girtîgeha Serayê di nav bajêr de. Di rê de wan zincîrek bi destê min ve kiribûn û bi dû xwe ve dikişandin.

Li wir jî ez dubare hatim darizandin. Di yasayê de xalek heye dibêje “nabe mirov li ser sûçekê du caran bê darizandin”. Min behsa wê xalê ji dozger re kir û min got: Li ser vê pirsê li

Bexdayê, ez hatime darizandin û nabe niha jî dubare bêm darizandin, lê tevî wê yekê heft rojan ez hatim girtin.

Hezar rehmet li Qasim Mela Efendî be, wî hewlek ji bo min da û ez ji girtîgeha asayî hatim veguhestin ji bo nexweşxaneya girtîgehê. Li wê derê ez di odeyekê de dimam.

Wê demê girtin şerefek mezin bû, mîna vê yekê bû mirov serdana Mekkeyê kiribe, rojane ji her aliyekê ve xwarinên cur bi cur ji wan kesan re dihat ku hatibûn girtin.

Bi wî awayî sala xwendina 1953'yan-1954'an, ez 110 rojan neçûm kolêjê, tevî wê yekê di ceribandinan de nimreyên min baş bûn.

Rola
Îbrahîm Ehmed û Hemze Ebdullah
di PDK'ê de

❖ Di salên navbera 1953'yan-1958'an de çi roleke Barzanî di bûyerên siyasî yên Kurdistanê de hebû?

Piştî ku Mamoste Îbrahîm Ehmed bû sekreterê PDK'ê du bûyer di nav partiyê de qewmîn.

Yekem: Koma Salih Ruşdî cuda bû.

Duyem: Piştî wê komê, Hemze Ebdullah sala 1954'an ji partiyê cuda bû.

Di wan salan de Mela Mistefa Barzanî li Sovyetê bû û **hajî tu tiştekê di nav partiyê de nebû, her wisa di nav tevgera Kurd de jî çi rolek wî nebû**. Nêrînek di nav partiyê de belav bibû û dihat gotin: **Ji ber ku li welêt nîne, pêwîst e ji serokatiya partiyê bê derxistin.**

Mamoste Îbrahîm Ehmed digot:

“Barzanî li welêt nîne, em hajî wî nînin û nizanin ku ew hez dike serokê partiyê be yan na? lewma em wekî serok wî qebûl nakin.”

Hemze Ebdullah tu yasayek qebûl nedikir. Ya rast nêrînên wî li gorî nêrîna me ya wê serdemê, rast û rewa nebû. Wek mînak; ew dijî wê **rêbaza çepgiriyê** ya di nav partiyê de bû. **Têkiliya navbera me û Eniya Sosyalîzmê şaş dihesiband** û digot:

“Civaka kurdî civakek eşîrtiyê ye, nabe em dijî beg, şêx û axayan bin, belkî divê em hewl bidin wan ber bi xwe bikşînin.”

Hemze Ebdullahn digot:

“Pêwîst nake em li ser karker û cotkaran bixebitin, divê em giringiyê bidin beg û axayan, eger em bikarin baweriya wan qezenc bikin, wê demê em ê bikarin civakê jî qezenc bikin.”

Em dikarin nêrînên Hemze Ebdullah wek rêbaza neteweyî ya rastgir bi nav bikin. Tevî ku reh û rêşeya wê nû bû, lê gelekî paşde vegeriya bû. Her wisa komek mirov bi navê baskê pêşverû yê Partiya Demokrat a Kurd a Iraqê, berafî der dora wî bibûn û her rijd bûn li ser Kurd û amade nebûn îtirafê li kurdistanîbûnê û guhertina programa partiyê bikin. Yên ku bi Hemze Ebdullah re bûn, hejmarek ji Silêmaniyê û çend kes jî ji Behdînan bûn.

Yên Ji Silêmaniyê ev bûn: Miherem Mihemed Emîn, Mihemed Kerîm Fethulla, Şehab Şêx Nûrî, Ebdul Soran, Babe Tayerê Şêx Celal, Omer Kerîm Ezîz û Reuf Meirûf.

Baskê Emze Ebdullah rêbaza çepgiriya nav partiyê baş nedidîtin. Hemze Ebdullah Mela Mistefa her bi serokê xwe û gelê Kurd dizanî û hevokek bi erebî afirandibû ku bi kurdî bi vê wateyê ye:

Biçe pêş bi rêberiya qehremanê rizgariya Kurdistanê, General Mistefa Barzanî (الى الامام بقيادة بطل التحرير كردستان، جنرال مصطفى البارزانى). Hemze Ebdullah digot: **“Ez wekî Mela Mistefa me,”** bi kurtî xwe li şûna Mela Mistefa danîbû.

Piraniya rewşenbîrên nav partiyê di vê baweriyê de bûn, PDK partiyek pêşverû ye, mifayê ji Marksîzm-Lenînîzmê werdigire û Mela Mistefa jî azad e, ku tê de dimîne yan na, lê divê em ji wî bi xwe bipirsin.

Hêdî hêdî di nav tevgera Kurd de nîqaş li ser wê nêrînê hat kirin, gelo Mela Mistefa dê her mîna berî serok be yan na?

❖ Nêrîna te bi xwe li hember Barzanî û pirsa serokatiya wî çawa bû?

Ez bi xwe di vê baweriyê de bûm, pêwîst e Barzanî serok be, çimkî min ji rûyê destûra navxwe ya partiyê lê dinhêrî.

Xaleka destûrê bi vî awayî bû; **Eger her yek ji serkirdeyan ji ber çalakiya siyasiya xebatê ji şûna xwe dûr ketibe, ji erka xwe nayê dûrxistin û li cihê xwe de dimîne.**

Çendîn mînak hebûn: Dr. Ceifer dûrketibû, lê her wek endamê serokatiyê mabû, Mîr Hac jî dûrketibû, her wek endamê Komîteya navendî mabû. Lewma ez di vê baweriyê de bûm, pêwîst e bi Barzanî re jî wisa serederî bê kirin.

Em dijî wê yekê nebûn ku Barzanî serokê me ye, lê di praktîkê de rola wî nebû û pişkdarî di tu kar û biryarên me de nedikir, em hajî hev du nebûn. Me nedizanî li ku derê dijî, wî jî tu hewlek nedabû ku têkiliyê bi me re dayne.

Ji dawiya sala 1949’an ve, navbera Mela Mistefa û Sekreterê Partiya Komunîst a Azerbaycanê Mîr Cefer Bagirov têk çû.

Tenê Seyîd Ezîz û Dr. Rehîm Qazî û hevalên din ên li wê derê bûn, hajî wê nakokiyê hebûn. Wan digotin:

“Dema ku sala 1950’yan şerê Koreyê dest pê kir, Sovyetiyan dixwestin ji bo Kurdan tiştekê bikin û li ser xurtkirna tevgera Kurd dixebitîn, dixwestin Kurdan çekdar bikin û bişînin Kurdistana Iraqê, li wir dest bi şoreşê bikin, hetta li sewqê hikûmetek Kurdî ava bikin.”

Barzanî ew yek qebûl nekir, ku divê çi rolek Rehîm Qazî hebe, Barzanî gelekî dijî Rehîm Qazî bû û digot: Sîxurê Mîr Cefer Bagirov e, di hember de Rehîm Qazî jî pişta Bagirov digirt.

Piştî têkçûna têkiliyên bi Barzanî re, bi fermana Bagirov li Azerbaycanê Barzanî hatin girtin û piştre hatin veguhestin ji bo navçeyên dûr li rojhilatê Azerbaycanê, Tacîkistan û Uzbekistanê.

Belavkirina Kurdan li nav kûrayiya axa Yekîtiya Sovyetê û dûrxistina wan ji sînorê Îranê, bû sedema têkçûna wê projeyê ya ku biryar bû, Partiyek Kurd bê avakirin û Mela Mistefa serokê wê be, cemaeta Barzaniyan di warê leşkeerî de bên perwerdekirin û bên şandin ji bo Iraqê, da ku li wir dest bi şoreşê bikin.

Ew proje di encama nakokiyên navbera Mela Mistefa û Bagirov de têk çû.

Sewqa Barzaniyan
Jiyan û Karê Siyasî li Sovyetê

❖ Çend salan cemaeta Barzaniyan li Sovyetê bûn têkiliya we hebû?

Ji sala 1950'yan heta 1953'yan cemaeta Barzaniyan li Sovyetê bûn, lê tu têkiliyek di navbra me de nebû.

Tê gotin Mela Mistefa bi riya hevjîna xwe ya Rûsî nameyekê ji Stalîn re dişêne. Piştî ku nameya wî digihîje Stalîn hinekê rewşa Barzaniyan tê guhertin û baştir dibe, berpirsên hikûmetê hinekê hêsankariyan ji wan re dikin û rê didin biçin xwendingehê, her wisa rê didin da ku vegerin Moskowê.

Piştî mirina Stalîn di sala 1953'yan de, Mela Mistefa û Seyîd Ezîz Şemzînî û hejmarek kesên din ji bo Moskowê tên veguhestin. Hin ek li wê derê diçn xwendingeha hizbî û hinek jî diçin xwendingeha çandiniyê. Bi wî awayî mijûlî hînbûn û perwerdeyê dibin û bi giştî rewşa jiyana wan ber bi başbûnê ve diçe.

Bi nêrîna min, destê şovênîstên azerbaycanî di wê rewşê de hebûye ya ku bi serê Barzaniyan hat. Dibû ku Mela Mistefa bi zimanekî nerm û jîrî, ew pirs çareser bikira. Bi gotina Mîr Hac Akreyî û Seyîd Ezîz Şemzînî serederiyên Mela Mistefa bûye sedem, Mîr Cefer Bagirov zêdetir dijatiya Barzaniyan bike, çimkî Barzanî dixwest hemû tişt di dest wî bi xwe de bin.

Ji gotinên wan her du hevalan, min sedema pirsgirêka navbera Barzanî û Bagirov fem kir. Ez di vê baweriyê de me, eger Barzanî qebûl kiriba Rehîm Qazî biba endamê

encumenê, baştir dibû hetta eger ew sîxur jî ba, li şûna wê yekê ku projeyek mezin a bi vî awayî têk bida[13].

Nedibû serhildana şoreşê li Kurdistanê û damezrandina hikûmeta kurdî li sewqê û piştevaniya Sovyetê ji wê xebata çekdarî, biba qurbanê xirabiya du-sê kesan, çimkî pirsgirêk wisa mezin nebû ku nehatiba çareserkirin.

……

[13] Zirar Silêman Beg yek ji hevalên Barzanî li Komara Azerbaycanê di bîranînên xwe de bi vî awayî behsa wê pirsê dike.

Silêman Beg dibêje: Nişkeve biryarek gelek girîng a Serokatiya Yekîtiya Sovyetê Hat ragihandin. Bi razîbûna Meclisa Bilind a Sovyetê, Partiya Komunîst û Encumena Wezîran a Sovyetê, biryara avakirina encumenekê mîna hikûmeteka demkî li derveyî Kurdistanê ji bo Kurdên penaber hat dayîn.

Zira Silêman Beg dibêje: Serokkomarê wê demê yê Azerbaycanê Mîr Cefer Bagirov bi merema ragihandina wê biryara Serokatiya Sovyetê gazî Mela Mistefa û Şêx Silêmanê birayê wî dike.

Zirar Silêman Beg ji zarê Şêx Silêman vedibêje:

"**Bagirov gelek bi germî pêşwaziya wan kir**" û Got:

"**Mizginiyeka min a gelek mezin ji gelê Kurd re heye, ji riya we ez pîrozbahiya Serokatiya Sovyetê ji gelê Kurd re dişînim, li ser navê xwe û gelê Azerbaycanê pîrozbahiya herî gerim li we dikim û prozbahiyê li gelê Kurd ê bira dikim**."

Silêman Beg balê dikşîne ser vê yekê ku Bagirov got: "**Cenabê Mela Mistefa min Serokwezîr Hesenov raspartiye da ku tevahiya pêdiviyan ji we re amade bike**."

Silêman Beg dibêje: Piştî dawîbûna civînê Serokwezîrê Azerbaycanê Hesenov bi me re derket derve û ji Mela Mistefa xwest lîsteya navên wan kesan ji bo roja yekem a civîna ragihandina Encûmena Penaberên Kurd li Sovyetê amdade bike.

Bi gotina Silêman Beg, piştî vegeriyanê Mela Mistefa û Mîr Hac Akreyî mijûlî amadekirina lîsteyê dibin. Û dibêje: **Em tenê hajî navê wan kesan bûn ku biryar bû di encumenê de beşdar bibin.** Mîr Hac Akreyî li gorî rênîşanên Mela Mistefa lîsteyê amade dike û tê de çihê her yek ji endaman destnîşan dike, wate çawa ku Mela Mistefa danîbû ew jî wisa rê dixe.

Dewam dike →

Têkçûna projeya şoreşa Kurdistanê û avakirina hikûmeta kurdî li sewqî, derbeyek mezin li xelkê Kurdistanê xist, eger wê rojê şoreşa Kurdistanê serî hilda û hikûmetek li sewqê bi-hata avakirin, aliyê kêm di cîhanê de bi başî deng vedida û dibû sedem pirsa Kurd pêş biketa.

❖ Çima kêm behsa wê hikûmeta li sewqê hatiye kirin?

Bi nêrîna min heta niha bi hûrî behsa wê hikûmetî nehatiye kirin. Sedema çima Rehîm Qazî nexwstiye besa wê bike، hel-westa wî ya

……

→ Dewama [13]

Silêman Beg dibêje: Çawa ku paşê eşkere bû, **Mela Mistefa pêşniyar û şîretên Serokkomar Bagirov ên derbarê çawaniya rêxistina lîsteyê nedabûn Mîr Hac Akreyî**. Her di wê çarçoveyê de, Mîr Hac Akreyî raportek siyasî jî ji bo roja civîna ragihandina Encumena Penaberên Kurd ên Derveyî Kurdistanê amade kiribû ku roja **19.01.1948**'an bû.

Silêman Beg di berdewamiya bîranîna xwe de dibêje: Roja destnîşankirî civîna ragihandina encumenê li bajarê Baku paytexta Azerbaycanê hat lidarxistin.

Yên ji bo endamtiya Encumenê hatibûn diyarkirin, ev bûn:

Mela Mistefa Serokê Encumenê, Şêx Silêman Barzanî, Mîr Hac Akreyî, Elî Mi-hemed Sidîq Barzanî, Silêman Beg Dergeleyî, Mihemed Necîb Berwarî, Ebdul Rehman Miftî Amêdî, Seyîd Ezîz Şemzînî, Rehîm Qazî Sabilaxî, Elî Gelawêj Sabil-axî û hwd .

Piştî xwendina lîsteyê, gotara Hikûmeta Azeerbaycana Sovyetê, Serokatiya Pena-berên Azerbaycana Îranê û peyama pîrozbahiya Fermandariya Artêşa Qefqasiya ya Sovyetê hatin xwendin.

Silêman Beg dibêje: Di dawiyê de Serokweîzrê Azerbaycanê Hesenov gote Bar-zanî: "**Cenab, tevî ku em dest li karûbarên we wernadin, lê pêşniyar û rênîşanên Serokkomar Bagirov di lîste ya ku hat xwendin de, reng venedaye**".

Dema ku Mîr Hac Akreyî wê gotinê dibhîze ku pêşniyar û rênîşan hebûne, lê Barzanî tiştek di wê barê de negotiye wî, tore dibe û yekser nameya dest ji karkişandina xwe dinvîse û civînê bi cih dihêle û vediger wê leşkergehê ya li ber avê bû. Piştî çend roja Mihemed Necîb Berwarî, Ebdul Rehman Miftî Amêdî, Re-hîm Qazî Sabilaxî û Elî Gelawêj Sabilaxî, Barzanî bicih dihêlin û vedigerin cem Mîr hac Akreyî.

nebaş hebûye, her wisa berpirsyariya wî hebûye, lewma nakariye behsa rastiyan bike.

Seyîd Ezîz Şemzînî jî, behsa tiştekî di wê barê de nekiriye, wisa derdikeve, ew dijî Rehîm Qazî û Qazî Mihemed bûye. Wisa diyar e, Mesûd Barzanî di pirtûka xwe de behsa têkçûna têkiliyên navbera Mela Mistefa (Bavê xwe) û Mîr Cefer Bagirov kiriye, lê bi kurtî.

❖ Çima te di pirtûka xwe de behsa wê pirsê nekiriye ya ku 1969'an hatiye weşandin?

Di wê pirtûkê de min behsa bûyeran hata sala 1961'an kiriye, tevî ku sala 1969'an pirtûk hatiye çapkirin û weşandin. Sedemek ku çima min behsa wê bûyerê nekiriye, ev bû diviya em rexneyê ji Sovyetê bigirin û bêjin: **Sovyet bûye sedema wê tawanê**.

Sedemek din jî ev bû, me wekî nihêniyek ji nihêniyên tevgera Kurd bala xwe didayê, dibû ku dema weşandinê ziyana wê hebûba.

Wê demê baş nebû, em bêjin Sovyetê dixwest şoreşa Kurdî bide destpêkirin û dewletekê ji bo Kurdan ava bike, ew jî hevdemî tevgera Kureyê, ku di nav welatên rojava de gelek bi neyênî dihat şirovekirin.

❖ Paş wan bûyeran têkilî di navbera Barzanî û PDK'ê de dest pê bû?

Mela Mistefa bi xwe pêwendî nedikir, lê her tim PDK'ê hewl dida têkiliyê pê re dayne.

Sala 1955'an ez çûm festîvala Ciwanan û Xwendekaran a Cîhanê li Warşovayê, li wê derê ji bo Çînê hatim vexwendin û

ji riya Sovyetê ve çûm Çînê. Min hewl da li Sovyetê Mela Mistefa bibînim û wî haydarî rewşa PDK'ê bikim.

Dema ji riya Sovyetê ve çûm Çînê, min tu kesek nedît, lê dema vegerê min şansî Iraqiyek dît ku navê wî "Mihemed Elî Haşim Necefî" bû. Zilamekî navdarê Tevgera Şoreşgeriya Iraqê bû ku ji sala 1934'an ve di nav Partiya Komunîst a Iraqê de dixebitî, lê piştre nasnameya Iraqê jê hat standin û ji Iraqê hat derkirin. Piştî ku heyamekê di nav tevgera çep a Iranê kar kir, Haşim Necefî çû Sovyetê û li wê derê, dest bi karkirinê di Radyoya Moskowê ya Erebî de kir.

Piştî vegeriyana ji Çînê, li cadeyek Moskowê digeriyam. Rastî du kesan hatim ku bi erebî diaxivîn, dengê yek ji wan mîna dengê pêşkêşkarê Radyoya Erebî ya Moskowê bû. Min silav li wan kir û got: Ez Celal Talebanî me û ji Kurdistanê hatime, wî jî bi kêfxweşê pêşwaziya min kir. Me hev du nas kir, min navê hotêla cihê mayînê û hejmara odeya xwe dayê.

Ez zêdetirî du hefteyan li Moskowê mam. Di wê heyamê de Haşim Necefî du-sê caran serdana min kir. Wî got:

"Eger peyamek te ji bo Barzanî hebe, ez dikarim bigihînimê."

Rojekê ji odeya min ve bi telefonê digel Mela Mistefa Barzanî axivî, lê aliyê din razî nebû, ez bi Barzanî re biaxivim.

Min ew rapor ji Mela Mistefa re şand, ya ku Mesûd Barzanî di pirtûka xwe de weşandiye. Naveroka raporê derbarê rewşa PDK'ê bû. Piştre Haşim Necefî hat û got: Rewşa Mela Mistefa û cemaeta pê re bi taybet di warê tendirustiyê de gelek baş e, lê got: Vê carê tu nikarî wan bibînî.

❖ Negot çima tu nikarî Barzanî bibînî?

Wî (Haşim Necefî) Got: **“Niha Sovyet rê nade hûn hev du bibînin.”** Lê ji bilî ku du caran ba min bi Barzanî re axivî, peyam û rênîşanên Barzanî ji min re anîn. Adrêsek li Berlîna Rojavayê da min û got: Ji riya vê adrêsê hûn dikarin Mela Mistefa ji rewşa PDK’ê agahdar bikin.

Mela Mistefa gotibû:

Eger hûn dikarin Hemze Ebdullah bişînin ba min. Her wisa gotibû: Hewl bidin bi Hemze Ebdullah re li hev werin û wî vegerînin nav partiyê, çimkî berdewamiya wê nakokiyê ziyanbar e. Ez dikarim bêjim:

“Ji wir ve yekem pêwendî di navbera me û Mela Mistefa de çêbû ku dibe 14 yan 15’ê Cotmeha 1955’an. Ew jî li Moskowê û bi riya Mihemed Haşim Necefî pêk hat.”

❖ Wê demê Mela Mistefa li ku derê bû?

Li Moskowê bû, lê aliyê Rûsî cara yekem rê neda wî bibînim. **Cara duyem, sala 1957’an ku çûm Moskowê min Mela Mistefa dît.** Di wê sernanê de cara yekem ez beşdarî programek Radyoya Moskowê bûm, yanî yekem car bû ku Kurdekî Iraqê di Radyoya Erebî ya Moskowê de diaxivî.

Ez bi navê Heme Emîn û bi zimanê erebî axivîm û min behsa Kurdistanê, gelê Kurd û projeya Bendava Dûkanê kir. Hevdem min daxwaza biratî û dostaniya Kurdan û Sovyetê kir û min got: “**Mafê gelê Kurd e, da ku bigihîje aştiyê.”**

❖ Têkiliya we 1955’an dest pê kir, çima piştî du salan we hev dît?

Rast e di sala 1955’an de têkiliyê dest pê kir, lê tenê wan adrêsek li Berlîna Rojavayê dabûne me û ji Barzanî re me

rojname, belavok û daxuyaniyên PDK'ê dişandin. Xirabiya wê têkiliyê di vir de bû, ku tenê me ji wan re tişt dişand û wan ti bersiv nedidan. Ji ber ku Mela Mistefa, Mîr Hac Akreyî û Seyîd Ezîz Şemzînî, endamên serokatiya partiyê bûn, me ji wan re rapor dişand.

PDK di Serdema Paşatiyê de

❖ Çima berî şoreşa 1958'an PDK'ê nedixwest fermî xebatê bike?

Çimkî wê demê li gorî yasaya Iraqê, xebata siyasî li ser bingeha neteweyî qedexe bû, lewma PDK'ê jî qet ji bo wergirtina îzna yasayiya xebatê hewl nedida.

Her wisa di programa partiyê de, eşkere behsa herifandina rejîma paşatiyê dihat kirin, ji ber ku wê demê li Iraqê rejîmek dîktator a kevneperest hebû, ku rê nedida tu azadiyekê. Hetta desthilatê rê nedida partiyên siyasî yên erebî jî xebatê bikin.

Piştî vegera Nûrî Seîd, xebata tevahiya partiyên erebî wekî Partiya Serxwebûnê (حزب الاستقلال), Partiya Demokratîk a Neteweyî (الحزب الوطني الديمقراطي) û Eniya Gel (الجبهة الشعبية) û yên din hatin qedexekirin. Bi wê yekê qet rê nedihat dayîn, ku partiyek Kurd û bi programek Marksîstî bi awayê yasayî çalakiyan bike.

Li gorî nêrîna wê demê ya hikûmeta Iraqê, PDK du caran dibû kafir:

Yekem**: PDK'ê kurdatî dikir û ji bo bi destanîna mafê diyarkirina çarenivîsê dixebitî.**

Duyem**: PDK wek partiyek Marksîst-Lenînîst dihat hesabê. ji ber ku em him Kurd û him jî komunîst bûn, li darazê ji me re him cudaxwaz û him jî Komunîst dihat gotin.**

❖ Hikûmetê dizanî PDK heye, eger bixwesta dikarê endamên serokatiya wê bigre?

Ya rast hikûmetê hemû tiştek derbarê me nedizanî. Tevî ku hinek caran em dihatin girtin lê wan nedizanîn em kî ne û çi berpirsyariyek me heye. Wê demê yên dihatin girtin diviya tawanbariya wan bi yasa û belgeyan bihata îsbatkirin da ku bihatan cezakirin.

Gelek caran hevalên me bi vê gumanê ku endamên PDK'ê ne dihatin girtin, lê hevalan tometên wan qebûl nedikirin û digotin: Em ne PDK'yî ne, belgeyên wan jî nebûn, lewma PDK'yî bûna me nedihat îsbat kirin.

Hejmarek hevalên PDK'ê wekî; Reşîd Ebdul Qadir sê mehan, Mamoste Îbrahîm Ehmed du salan, Ewnî Yûsif salekê, Omer Debabe sal û nîvekê, Salih Dîlan salekê, Nûrî Ehmed Teha û Hîlmî Elî Şerîf her yek salekê hatin girtin.

Bi dehan kadro û endamên partiyê jî, bi heman awayî hatin darizandin. Ez jî di wan sê- çar salan de, ku xwendekarê Koleja yasayê bûm, çendîn caran hatim girtin. Ser hev zêdetirî salekî girtîbûm. Piştî ku sala 1956'an ji Koleja yasayê hatim derkirin, êdî ez bi awayekî veşartî djiyam.

Eger li darazê gumanek nehatiba îsbatkirin, gumanbar nedihat cezakirin. Wek mînak, ez hatim darizandin bi gumana serdana Moskowê, wan qeyda axaftina min a Radyoya Moskowê nîşan dan, lê min red kir û got: Ew deng yê min nîne.

Bi riya xizmên xwe yên Talebanî li Kerkûkê, min nameyek anî ku nîşan dida, wê demê ez ji ber nexweşiyê li Kerkûkê bûme û li wê derê hatime dermankirin.

Komîteya bijîşkiyê jî rewşa min piştrast kir, bi awayekî ku li darazê îzina min hat qebûlkirin û wiha diyar bû, wê demê ez neçûme Moskowê, belkî li Kerkûkê bûme.

Ya rast wê demê li Iraqê curek serbestiya darazê, bere-vanîkirinî û rûmeta darazê hebû, lewma tenê guman bes nebû, da ku mirov bê cezakirin, belkî pêwîst bû belge hebin.

Wek mînak; Mesûd Mihemed endamê parlamentoya Iraqê bû, guman lê hatibû kirin ku endamê PDK'ê be, lê nekarîn rastiya wê gumanê îsbat bikin، çimkî jê pirsî bûn, wî jî gotibû tiştekê wisa nîne û ew ne endamê PDK'ê ye.

Beşa Çarem
4
Destpêka Qonaxa Çalakiyan li Derveyî Iraqê

- Festîvala Warşovayê û Nazim Hîkmet
- Serdana Çînê
- Festîvala Ciwanan Li Moskowê

Festîvala
Warşovayê û Nazim Hîkmet

❖ We çawa di Festîvala Ciwanan a Warşovayî de beşdarî kir?

Piştî belavbûna nûçeya lidarketina Festîvala Pêncemîn a Ciwanan a Cîhanê. Me bi nepenî komîteyek ji bo beşdariya wê Festîvalê ava kir. Em digel Partiya Komunîst a Iraqê beşdar bûn. Em wekî Yekîtiya Ciwanan a Demokrat a Kurdistanê û ew jî wekî Ciwanên Demokrat a Iraqê berşdarî festîvalê bûn.

Ji bo beşdariyê pewîstiya me bi hinek tiştan wek pasport, xercê çûyînê, belavok û diyariyan hebû.

Me tevahiya pêdiviyan peydakirin û hinek alîkarî jî me ji xelkê wergirtin. Ez û Mela Şakir Mistefa û Necîb Xefaf me nûnertiya PDK'ê dikir. Lê pirsgirêkek me hebû, tevî ku her du hevalên din pasportên wan hebûn, lê ya min nebû.

Hevalekî me bi navê Mihemed Mûsa Sabîr hebû, me pasporta wî destkarî kir û wêneya min danî şûna wîneya wî û bi wê pasportê, bi trênê û ji riya Mûslê ve em çûn Helebê.

Ji wê derê ve jî, em çûn Şamê û li wir me dest bi têkiliyê bi hevalal re kir, di encamê de hejmara me gihîşt heft kesan. Piştre me navê xwe qeyd kir û em ber bi Warşovayê rêketin.

Me dixwest ser navê şandeya Kurdî beşdariyê bikin, lê Partiya Komunîst a Iraqê razî nebû. Tevî ku me serdana yekîtiya Ciwanan a Cîhanê kir, lê wan jî got: **"Nabe hûn ser navê şandeya Kurdî beşdar bin."**

Me li ber avahiya Yekîtiya Ciwanan a Cîhanê geriv girt û di dawiyê de em gihîştin encamek navîn, da ku wek grupekê di nav şandeya Iraqê de beşdar bin û mafê me yê hinek

çalakiyan jî hebe, diyariyan ser navê xwe parva bikin, ser navê xwe xelkê vexwînin û hevpeyvîn û civînan li dar bixin.

❖ Çi rolek we di festîvalê de hebû?

Li Warşovayê du bûyer qewimîn. Ya yakem serederiyên keçeka Ereb û ya duyem jî reftarên kurekî Kurd bû.

Navê keça Ereb "Bûşra Celîl Birto" bû. Yek ji serkirdeyên Partiya Komunîst a Iraqê û endama tevgera jinan a wê partiyê bû. Keçeka çeleng û navdar bû, kincên kurdî li ber dikir û di govend û şahiyên me de beşdar dibû.

Ya din serderiyên wî ciwanekî Kurd yê bi navê Mihemed Mehmûd Ebdul Rehman bû. Wî Eqal ango serbenda Erebî dida serê xwe û digot: Ez navdarekî Ereb im. Kincên kurdî jî li ber nedikir. Kurekî din jî bi navê Newzad Nûrî Ebe naskirî bi "Ebe Qelew" hatibû, wî jî Eqal dida serê xwe.

❖ Ew du xortrên Kurd bi kîjan şandeyê re hatibûn festîvalê?

Ew bi partiya Komunîst re hatibûn. Partiya Komunîst a Iraqê dixwest wisa nîşan bide, ku şandeya ciwanan tenê ji ciwanên Komunîst pêk nayê, belkî ciwanên partî û rêxistinên din jî di nav wan de beşdar in, lê di rastiyê de wisa nebû. Şande tenê ji grupa me, partiya komunîst û Komeleya Raye el-Şexîle pêk dihat.

Ez ji aliyê şandeyê ve bibûm cîgirê serokê şandeya Iraqê. Dr. Selah Hafiz jî bi me re bû, mamosteyê Koleja yasayê bû, gelek alîkariya me dikir. Yek ji wan kesan bû, ku di nav partiya komunîst de mejiyê wan derbarê pirsa Kurd û xebata gelê Kurd gelek vekiribû. Ya rast wî gelek alîkriya min jî kir û got:

“Biçe bêje wan, ev festîvala ciwanan e, ne kongreya partiyên komunîst.”

Kerîm Mrwe ku pêştir sekreterê giştî yê Partiya Komunîst a Lubnanê bû, gelek astengî ji me re çê kir, ku wê demê ber-pirsê devera Rojhilata Navên a Yekîtiya Ciwanan a Cîhanê bû. Di wê festîvalê de Sovyetiyan jî gelek alîkariya me kirin. Zilamekî sovyetî bi navê Romanowskî, berevanî ji vê yekê dikir ku Kurd neteweyeke û taybetiyên xwe hene. Her wisa helwesta ciwanekî Komunîst yê Hindistanî jî derbarê Kurdan baş bû.

Du pirs di xwenasandina me de li festîvalê gelek alîkar bûn.

Ya yekem: Me civînek li darxist û nûnerûn welatên mezin vexwendin ji wan; Sovyet, Amerîka, Brîtanya, Fransa, Hin-distan, Brezîlya, Misir, Japon û Endonêzya.

Di wê civînê de Yasir Erefat jî beşdar bû, ku wê demê li Qa-hireyê xwendekar bû û ser navê şandeya Filistînê di festîvalê de beşdarî kiribû.

Ya duyem: Beşdariya helbestvanê navdar yê Tirk Nazim Hîk-met di civîna me de bû.

❖ We kîjan kesayetiyê navdar di festîvalê de nas kir?

Giringiyek din a wê civîna me, beşdariya Nazim Hîkmet[14] helbestvanê navdar yê Tirk bû. Dema ku beriya civînê, me serdana wî kir, gelek bi germî pêşwaziya me kir û got:

……

[14] Nazim Hîkmet di 15’ê Çileya 1901’an de li **bajarê Salonîkê yê Yunanistanê** ji dê bûye. Bavê wî karmendê Wezareta Derve ya Osmanî bûye. Di sala 1921’an de çûye Sovyetê û xizaniya wê serdemê ya wî welatî dîtiye. Her ji destpêka xortiyê ve alîgirê bir û bawera çep û hizra sosyalîstî bûye. Nazim Hîkmet li Sovyetê dest bi xwendina xwe ya zanîngehê kiriye û **sala 1924’an bûye endamê Partiya Komunîst a Tirkiyeyê**, ku wê demê qedexe bûye. **Dewam dike →**

“Ez Kurdan hez dikim û Ez ê di civîna we de beşdar bibim.” Lidarxistina civênê û beşdariya Nazim Hîkmet wekî du faktoran bûn sedema dengvedana beşdariya me ya di festîvalê de.
Nazim Hîkmet beşdariya civînê kir û min jî ser navê Yekîtiya Ciwanan û Xwendikaran a Demokrat a Kurdistanê gotarek pêşkêşkir.

Paş hingê Nazim Hîkmet gotarek pêşkê kir û bal kişand ser vê yekê, ku zilim li gelê Kurd tê kirin û got:

“Gelek asayî ye ku mafê gelê Kurd yê diyarkirina çarenivîsê hebe, ew jî wek mirovên vê serdemê ne.”

Nazim Hîkmet bi vê gotinê, dawî bi axaftina xwe anî û got: **“Spasiya ciwanên Kurd dikim ku ez vexwendim û ricayek min ji wan heye, ku roja bilindkirina alaya Kurdistanê Azad jî, min vexwînin da ku di wê cejnê de beşdar bim.”**

Gotinên wî atmesfêra festîvalê di berjewendiya me guhert. Girîngiyek taybet a gotara Nazim Hîkmet hebû, çimkî kesatiyekî navdar bû, lewma ji ber gotinên wî, civîna me deng veda û Çînî û Sovyetiyan jî, derbarê xebata gelê Kurd gotar pêşkêş kirin.

Serokê şandeya Çînê got: **“Em ser navê 120 milyon ciwanên Çînê di pêvajoya rizgarî, serxwebûn û bi destanîna mafê çarenivsê de, pişta xebata gelê Kurd digrin.”**

……

→ Dewama [14]

Ji ber wê yekê sala 1935’an du salan hatiye girtin. **Di girtîgehê de helbestên xwe yên xweşik nivîsîne**. Heman salê **daraza leşkerî ya Tirkiyeyê 28 sal cezayê girtinê lê biriye**. Piştî sazbûna kempêneka cîhanî ji bo rizgariya wî, desthilatdarên wê demê yên Tirkiyeyê neçar dibin azad bikin. Di 3’yê Hezîrana **1963’yan de li Moskowê wexera dawiyê kiriye**. Tevî ku wê demê nasnameya tirkî jê hatibû standin, lê 1’ê Hezîranan 2009’an nasnameya wî ya tirkî hat vegerandin.

Me diyarî pêşkêşî nûnerê hinek şandeyan ji wan şandeya Ciwanên Demokrat a Almanyayê û ciwanên Çînê kir.

Di festîvalê de me di tevahiya çalakiyan de beşdarî kirin, hetta yên ku bi navê şandeya Iraqê, dihatin lidarxistin. Car bi car min bal dikişand ser pirsa Kurd. Ya rast, ew çalakî bûn sedem da ku ez bêm naskirin û ji bo Çînê bêm vexwendin.

Serdana Çînê

❖ Vexwendina te ya Çînê encama beşdariya festîvala Warşovayê bû?

Belê, ji Iraqê du kes ji bo Çînê hatin vexwendin. Yek ji Yekîtiya Ciwanan a Iraqê û yê din jî ji Yekîtiya Ciwanan a Dmokrat a Kurdistanê bû, ew jî ez bûm. Ew vexwendin ji bo ciwanên Iraqê bi gelemperî û ciwanên Kurd bi taybetî, serketinek mezin bû.

Em bi trênê ji Warşovayê ber bi Çînê rêketin. Çûyîna me çend şev û rojan kişand, şevekê li Moskowê peya bûn, li bajarên din jî em peya bûn, dikarim bêjim: Me bi trênê Yekîtiya Sovyetê pêva heta gihîştin Çînê.

❖ We li Çînê çi çalakiyek siyasî kir, we kî dît?

Li Çînê jî, bi heman awayî min di tevahiya çalakiyan de beşdarî kir. Diçûm yekîtiya nivîskaran min digot:

Ez edîb û helbestvan im. Li yekîtiya ciwanan jî min xwe wekî xwendekar da naskirin. Her wisa ser navê jinên Kurdistanê jî ez axivîm.

Min destek kincên kurdî yê jinan û alayek Kurdistanê jî ji bo "**Soong Ching -ling**" [15] hevjîna Sun Yat-senbir, ku wê demê Cîgira Serokê Komara Çînê bû û di civînek mezin de beşdar bû, li wê derê min ew kincê

kurdî û alaya Kurdistanê pêşkêşî wê kir, ku wê beşdariyê jî deng veda.

Ez di piraniya civînên siyasî, edebî û semînarên cur bi cur de beşdar bûm. Kincê kurdî jî min li ber xwe kiribû ku li ser qeta stûyê wê Kurdistan hatibû nivîsandin û ala Kurdistanê jî pêve bû.

❖ Hûn çend rojan li Çînê man, piştre hûn çûn ku derê?

Serdana me ya Çînê zêdetirî mehekê kişand, piştre em ji riya Sûriyeyê ve vegeriyan. Her wisa carek din sala 1957'an me di festîvala ciwanan de beşdarî kir.

……

[15] Xatûn Soong Ching -ling ji sala 1976'an-1978'an Seroka Hikûmeta Komara Gel a Çînê bû. Ew hevjîna Sun Yat-sen yek ji rêberên navdar ê şoreşa 1911'an a Çînê û damezrênerê Komara Çînê bû. Ji ber rola girîng a di bûyerên welêt de, **nasnava "Madam Sun Yat-sen" wergirtibû**.
Piştî ragihandina Komara Gel a Çînê (PRC) di sala 1949'an de, çendîn erkên mezin ên Xatûn Soong Ching -ling di nav hikûmeta komunîstiya wî welatî de hebûne. Ji salên 1949an-1954'an û 1959'an-1975'an Cîgira Serokê Komara Gel a Çînê bûye. Ji salên 1954'an-1959'an û 1975'an-1981'an jî Cîgira Serokê Komîteya Hertimî ya Kongreya Neteweyî ya Gel bûye. Her wisa **nûnera Çînê di hejmarek bûyerên navdewletî de bûye**. Sala 1981'an dema ku di qonaxa dawî ya temenê xwe de bûye, Nasnava Rûmetê ya Seroka Komara Gel a Çînê wergirtiye.

Festîvala
Ciwanan li Moskowê

❖ Bêyî ku werin vexwendin çawa hûn di festîvala Moskowê de beşdar bûn?

Nexêr wisa nebû. Li Iraqê komîteya amadekar hebû, em digel komîteya amadekar a li Şamê civiyan. Li wê derê bi wê komîteyê re hevahengî hat kirin, ku xelk dişand festîvalê. Em jî him li komîteya amadekar bûn û him jî çûn Şamê.

❖ Şandeya taybet a hikûmeta Iraqê ji bo wan çalakiyan hebû?

Nexêr. Berevajî hikûmeta Iraqê gelekî dijî wan çalakiyan bû. Çalakiyên bi wî cureyî wekî komunîstî û kafirtî dihatin hesibandin. Yê ku di festîvalan de beşdar dibûn, nepenî diçûn û wêne yên beşdariyê nedihatin belavkirin. Eger hikûmetê bizanîba kesek çûye û bihata îsbatkirin, dihat cezakirin. Ez yek ji wan kesan bûm, hatim girtin û tevî çend ciwanên komunîst ên Iraqê em hatin darizandin, lê me înkar kir û me got: Tiştekî wiha nîne û ne rast e.

Beşdarî di festîvala duyem de hinekê dijwartir bû, çimkî pasporta ku cara pêşiyê pê çûbûm, çend caran wêneya wê hatibû guhertin. Diyar jî bû hatiye bikaranîn. Lewma min biryar da ji riya Şingalê ve biçim. Xortekî Êzidî hatibû Iraqê û bibû endamê PDK'ê, lê ya rast sîxurê hikûmeta Sûriyeyê bû. Ez bi wî re derbasî Sûriyeyê bûm, wî dixwest min teslîmî hikûmetê bike, lê di rê de min fêl kir û jê rizgar bûm.

Ez çûm cihekî din min xwe teslîmî polîsê Sûriyeyê kir. Du çente diyarî bi min re bûn. Min gote wan dixwazim biçim festîvala ciwanan li Moskowê. Şevekê li Qamişloyê mam, lê roja baştir ji bo Hesekê hatim veguhestin. Wê demê min efserekî Kurd bi navê Eqîd Mihemed li Şamê nas dikir. Min telefonî wî kir û rewşa xwe jê re got. Wî bi riya peyamekê ji polîs xwest, min berdin da ku biçme Şamê. Wê êvarê ez hatim berdan.

Lê wê demê ne trên hebûn û ne jî otomobîl, gotin: Tu tenê dikarî bi barhilgiran biçî. Ez yek- du demjimêran li ser rê sekinîm heta ku kamyonek hat, di pêşiya wê de cih nebû, lewma ez li ser barê kamyonê rûniştim. Heta sibehê em di rê de bûn û nîvro em gihîştin Helebê. Li Helebê, li tenişta termînalê kebabxaneyek hebû, min li wê derê kebab xwar û piştre bi otomobîlekê çûm Şamê.

❖ Li Şamê te çawa xwe gihand endamên din ên şandeya Iraqê?

Ez gihîştim Şamê lê ne pasport û ne jî lîzêpaseya min hebû. Ez çûm cem Iraqiyên li wê derê û min xwest alîkariyê bikin lê gotin: Tiştek ji dest wan nayê. Ya rast nedixwestin ez bi wan re biçim. Iraqiyên wê derê ev bûn: Ebdul Qadir Îsmaîl Bistanî, Ebdul Cebar Wehbî û George Tallow.

Bi neçarî êvarê min telefonî Eqîd Mihemed kir, tevî ku min spasiya hevkariya wî kir, lê min got: Pirsgirêkek min heye, wî jî got: Xema te nebe, em dikarin sibe hev du bibînin û me cihek ji bo hevdîtinê destnîşan kir. Roja paştir bi otomobîlekê hat, ku ala li ser bû. Ez gel xwe birim daîreya pasportê cem berpirsê dayîna lîzêpaseyê. Efserek li wê bû, Eqîd Mihemed jê

xwest da ku lîzêpaseyekê bide min. Û got: Ez ê daxwaza wî ya di vî barî de bibim serokatiya Komarê û jê re penaberiya siyasî bistînim.

❖ Yanî gelekî zû tu bûyî xwedanê pasportê?

Belê, wî efserî karê dayîna lîzêpaseya sûrî ji bo min temam kir û min lîzêpaseya xwe wergirt. Lê min ji cemaeta komunîstên Iraqê re negot. Ya rast min guman dikir neku astengiyê çê bikin? Tevî ku min dizanî hez nakin bi wan re biçim Sovyetê, lê gotin: Eger tu pasport an lîzêpaseyê ji xwe re peyda bikî, wê demê dikarî bi me re werî Moskowê.

Wê hingê li Şamê min hinek hevalên din wek Hemîd Derwêş, Hejar Mukriyanî û Ebdul Rehman Zebîhî li mala Sînem xanimê, keça Celadet Bedir-Xan dît. Me li hev kir, di festîvala Moskowê de beşdar bin. Wan gelek hewl dan, lê ne şandeya Iraqê û ne jî şandeya Sûriyeyê qebûl nekirin ku bi wan re biçin festîvalê.

Wan hevalan jî biryar dan digel Sînem xanimê bi riyeke din beşdarî festîvalê bibin. Çûn Almanyayê da ku ji wê dervê ve bên Moskowê, lê rê nehat dayîn, neçar bûn vegerin Sûriyeyê.

Wek şandeya Iraqê em çûn bendera lazîqiyeyê, roja paştir bi keştiyê ji riya deryaya Spî, deryaya Mermereyê û deryaya Reş me xwe gihand bendera Odessayê.

Li wê derê tevahiya wan kesan ên ku ji welatên erebî hatibûn, em bi hev re çûn Moskowê.

Em ji Odessayê bi trênê çûn Moskowê. Hejmarek ji Kurdên Sovyetê ji bo pêşwaziya me hatibûn îstasyona trênê ku Qenatê Kurdo di nav wan de bû. Dema ku wan em bi cilên

kurdî ve dîtin gelek kêfxweş bûn, bi taybet Qenatê Kurdo dest bi strangotinê kir.

Li Moskowê jî dubare em rijd bûn li ser vê yekê ku divê em li ser navê Yekîtiya Ciwanan a Demokrat a Kurdistanê çalakiyan bikin, lê wek grupekê di nav şandeya Iraqê de ku mafê me yê civînan, vexwendin û têkiliyan bi grupên biyanî re hebe, wan jî daxwazên me qebûl kirin.

❖ Wê demê Yekîtiya Ciwanan a Cîhanê hûn wekî endam qebûl kirin?

Em wek Yekîtiya Ciwanan a Demokrat a Kurdistanê, wek çavdêr li Yekîtiya Ciwanan û Xwendekaran a Cîhanê nehatin qebûlkirin, belkî wek şandeyeke vexwendî hatin qebûlkirin.

Ji roja yekem ve, me dest bi çalakiyê kir, ez li Kurdekî digeriyam, da ku me bigihîne Mela Mistefa û hevalên din. Dubare min Mihemed Elî Haşim Necefî dît û wî soz da, ku Mela Mistefa ji hatina me agahdar bike.

❖ Çima we nexwest rasterast bi riya Rûsan Mela Mistefa bibînin?

Ez çûm cem şandeya Rûsî û min xwe da nasîn, ku endamê Polîtburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) me. Min got wan serokê me li vir e, em dixwazin wî bibînin.

Peyva nihênî jî navbera min û Mela Mistefa de hebû, ku di serdana sala 1955'an de, me danîbû da ku bi wê peyvê pêwendiyê bi hev re bikin.

Şandeya me ji van kesan pêk dihat: Cabbar Pîrozxan, parêzerekî Kerkûkî bû ku ji aliyê Beisiyan ve hat şehîdkirin, Homer Dizeyî, Necîb Xefaf, Şêx Elî Bamernî û çend kurdên komunîst wek Dr. Ehmed Osman, Heme Hisên Mela Dizeyî û

Nesrîn Xanim, hevjîna Dr. Ebdul Rehman Qasimlû, ku bi şandeya Îranê re hatibû.

Roja berî destpêbûna festîvalê du Kurd hatin ba me û gotin: **“Hûn Kurdên Iraqê ne,”** me jî got: Belê, me xwe da naskirin û me ji wan pirsî: “Hûn kî ne?” Gotin: **“Em Kurdên Sovyetê ne.”**

Di wê navberê de, Şêx Elî Bamernî ez kişandim aliyekî û got: **“Mam Celal, ew kes Seyîd Ezîz Şemzînî ye, wî nas dikim pêştir di artêşa Iraqê de efser bû û li Partiya Hîwayê jî, me bi hev re kar dikir.” Tekez jî kir û got: “Ez piştrast im ew bi xwe ye.”**

Ez vegeriyam û min ji yek ji wan pirsî: “Tu xelkê ku derê yî?” Wî got: **“Ez Kurdê sovyetê me.”**

Min ji Seyîd Ezîz pirsî: “Tu xelkê ku derê yî?” Wî jî got: **“Ez Kurdê Sovyetê me.”**

Ji devoka wî diyar bû ku Kurdê Îranê ye, lewma min gotê keko tu ne Kurdê Sovyetê yî. Min cuda kir û gotê: “Kekê Seyîd Ezîz çima tu xwe ji me vedişêrî.”

Şêx Elî jî hat ba me û got: “Kekê Seyîd, ez filan kes im û em hev du nas dikin.”

Bi wan gotinan, da stûyê xwe ku Seyîd Ezîz e û got: **“Deng nekin!”** Me jî got: Baş e. Min got: Mela Mistefa agahdar bike ku ez li vir im û dixwazim wî bibînim. Seyîd Ezîz got: Mela Mistefa li vir e, lê dîtina wî bi razîbûna Rûsan ve girêdayî ye. Eger ew razî nebin, wê demê ez ê hewleke din bidim.

Beşa Pêncem
5
Yekem Hevdîtina bi Barzanî re

- Mam Celal çawa Barzanî dît?
- Avakirina partiyeke Kurd li Sûriyeyê
- Cihêbûna kadroyên Kurd ji Partiya Komunîst
- Partiya komunîst û çepên Iraqê cihêbûn û yekbûn
- Fehd û pirsa Kurd
- Eniya Yekîtiya Nişтimanî ya Iraqê

Mam Celal
Çawa Barzanî Dît?

❖ Cara dawiyê we çawa Barzanî dît?

Dîtina Mela Mistefa bûyerek girîng bû. Gelek rojan ji bo karê taybet li cihê festîvalê dernediketim, bi vê hêviyê ku agahiyek ji Barzanî bigihîje.

Rojekê bi cilên kurdî di nav baxçeyê avahiyê de rûniştibûm, du kes hatin ba min bi kurmancî silav kirin. Ji min pirsîn: "Tu ji şandeya kîjan welatî yî?" Min got: "Ez Kurdê Iraqê me." Gotin: "Em naskiriyekî xwe digerin, ku di nav şandeya Iraqê de ye." Bi wê gotinê, min guman kir û pirsî: "Yê ku hûn dixwazin bibînin navê wî çi ye?" Gotin: "Navê wî Celal e." Min got: "Keko ez bi xwe me," lê min pirsî: "Hûn Barzanî ne?" Gotin: "Na, em Kurdê Sovyetê ne." Min dubare kir: "Keko ez Celal im û li benda we me." Gotin: "Baş e, peyva nihênî bêje." Min peyv got û wan jî gotin: "Rast e."

❖ Peyva nihênî ya navbera te û Mela Mistefa çi bû?

Peyva "Suske" bû.

❖ Yên hatibûn pey te, kî bûn?

Yekî ji wan got: Ez Es'ed Xoşewî [16] me û got: Hatime te bibim cem Mela Mistefa, ew li benda me ye.

……

[16] Es'ed Xoşewî, hevalê xebatê yê Mela Mistefa Barzanî bûye. Di sala 1918'an de li navçeya Barzanê ji dayik bûye, bi Barzanî re çûye **Mihabadê**. Piştre bi hevalên xwe ve çûne **Yekîtiya Sovyetê**. Tevî Barzanî vegeriyaye Iraqê. Di 31'ê Gulana 1978'an de li Tehranê wexera dawiyê kiriye.

Em yekser bi teksiyekê çûn û gihîştin ber avahiyekê, me li zengila derî da, Mela Mistefa bi xwe derî vekir, simêlê xwe kur kiribû.

Wêneyeke wî ya simêlkurkirî heye, ya wê demê ye. Halê min wekî vê yekê bû, ku derwêşek şêxê xwe bibîne, min ew himêz kir, ya rast dema min Mela Mistefa dît, ez gelekî kêfxweş bûm.

❖ Gelo Barzanî wekî wê xeyalê bû, te di mejiyê xwe de çêkiribû?

Ya ku di xeyala xwe de min Barzanî wek kesatiyekî tam xwende, rewşenbîr û pisporê Marksîzmê, Diyaletîk û aboriyê didît, lê ne wisa bû. Hetta berevajî wan pirsan jî diaxivî.

Lê ez wisa difikirîm, ku bi wan axaftinan min diceribîne. Ba me dijî Sovyetê axivî û got: **“Em mijûl bûn bi riya Babe Elî têkiliyê bi Amerîkayê re deynin, çimkî çi mifayeke dostaniya bi Sovyetê re nîne.”**

Min hizir dikir, ew her min diceribîne, lewma min jî berevajî bersiv dida.

Di wê serdanê de, min fem kir ku Mela Mistefa ew kesatiyê rewşenbîr nîne ku ez li bendê bûm! Lê wek serkirdeyekî Kurd dihat ber çavê min, ku ji bo bidestanîna mafê Kurd û gelê Kurd xebatê dikir.

Mela Mistefa behsa hejmarek pirsan ji min re kirin, ji ber ku min tevahiya wan gotinan rast dizanî, lewma ez gelek ketim bin bandora wî. Wek mînak got: **“Yekîtiya Sovyetê di hemû manorên leşkerî de wek pisporekî bangî wî dike û digel**

marşalên mezin dicive. Carna jî hevrikî kiriye û hêzek birêve biriye û li hember marşalên din ên Rûsî serketî bûye[17].”

Bal kişand ser vê yekê, çawa wî akademiya Leşkerî ya Sovyetê temam kiriye û pileya marşal wergirtiye. Her wisa li xwendingeha partiya komunîst xwendiye û bi pileya îmtiyaz temam kiriye.

❖ Çima Barzanî bi wî awayî behsa wan pirsan ji te re dikir?

Piraniya wan gotina wisa nebûn, ku wî behs dikir, lê wê demê min ew yek nedizanî. Eger em bixwazin behsa kesatiya Mela Mistefa bikin, pêwîstî bi demeka dirêj heye.

Wek mînak rojekê got: **“Ew û Stalîn bi hev re rûniştine, têkilî di navbera wî û Nîkîta Krûşçev de hebûye.”** Di odeyekê de ku hêj wêneyên Stalîn, Marx û Engels dalqandî bûn, got**: “Heta bi xwe wan wêneyan ranekin, ez ranakim[18] .”**

……

[17] Derbarê vê pirsê ku hinekan ji **Zirar Silêman Beg Dergeleyî** kiribûn, gelo rast e we di Şerê Koreyê de beşdarî kiriye û Mela Mistefa di wî şerî de fermandarekî pilebilind ê Sovyetê bûye? Silêman Beg Dergeleyî dibêje: Dema şerê Koreyê em li Sovyetê di sewqê de bûn û bi ser hejmarek gundên Uzbekistanê de hatibûn belavkirin. **Mela Mistefa jî wek me hemiyan sewqî gundekî hatibû kirin**.

[18] Di pirtûka xwe ya bi navê “**Siyaseta Yekîtiya Sovyetê li hember Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurd 1945’an-1968’an**”
سياسة الاتحاد السوفيتي تجاه الحركة القومية الكوردية التحررية 1948-1968-مهڤان محمد حسين (رشيد البامرني)
de **Mêvan Mihemed Hisên Reşîd Bamernî** dibêje:
Cemaeta Barzaniyan li Sovyetê netenê her tim bi hev re nebûn, belkî di navçeyekê de jî nehatibûn bicihkirin.
Dewam dike →

Her wisa behsa vê yekê dikir, ji nêzîk ve têkiliya wî bi polîtburoya Partiya Komunîst a Sovyetê re heye, **derbarê karûbarên Rojhilata Navîn bi wî re dişêwirin**.

Dema ku Brîtanya, Fransa û Îsraîlê gef li Misirê kirin, ku dê sê alî êrişî wî welatî bikin, **Sovyetiyan ji wî (Mela Mistefa) re gotine: Dixwazin ew fermandariya hêzekê bike.**

Wî nameya ku ji Şêx Ehmed re nivîsîbû da min, ku bandorek xirab li me hemiyan kir.

Wî ser daxwaza min çend name ji Îbrahîm Ehmed, Şêx Sadiq, Hemze Ebdullah û kesatiyên din ên Kurd re nivîsandin. Dema ku vegeriyam Kurdistanê, min behsa Mela Mistefa kir û got:

“Mela Mistefa Marşal e û akademiya leşkeriya Sovyetê temam kiriye û li xwendingeha kadroyên partiya komunîst xwendiye û bi pileya îmtiyaz ew jî temam kiriye.”

Ew hevalên me ji wan nameyan gelek aciz bûn, bi taybet nameya ku Mela Mistefa Ji Şêx Ehmed re nivîsandibû, çimkî nameya wî wekî ya murîdekî bû ku ji şêxê xwe re nivîsandibe. **Mela Mistefa nivîsî bû, ew sofiyek e wekî seyê ber nala wan û amade ye bibe pêlava piyê wî.**

.....

→ Dewama [18]

Heta dawiya sala 1948’an di navçeyên cuda cuda yên Komara Azerbaycana Sovyetê de hatibûn bicihkirin. Piştre ji bo Komara Uzbekistana Sovyetê hatin veguhestin û li nêzîkî bajarê Taşkendê hatin bicihkirin.

Piştî salekê dubare bi ser çend cihan de hatin belavkirin, bi awayekî ku tu têkiliya wan bi hev re nebû. Her wisa dibêje: Di serdema Stalîn de carek din cemaeta Barzaniyan komî cihekî hatbûn kirin.

Xwe wiha biçûk nîşan dabû, bi awayekî Şêx Sadiq û Şêx Ubeyd amade nebûn nameyê ji Şêx Ehmd re bişînin. Ez, Mamoste Îbrahîm Ehmed, Şêx Sadiq û Hemze Ebdullah, ji wan kesan bûn ku me naveroka wê nameya Mela Mistefa dît.

❖ We çawa naveroka wê nameyê dît?

Piştî vegerê nameya ku Mela Mistefa ji Şêx Ehmed re nivîsî bû, min da Şêx Sadiq kurê Şêx Ubeyd biraziyê Mela Mistefa, çimkî wê demê Şêx Ehmd hatibû girtin û me ji wî xwest ku nameyê bigihîne Şêx Ehmed, lê wan name vekirin û xwendin û piştre neşandin, wan name vekirin û ne min.

Wê demê em gelek rijd bûn li ser rêbaza çepgiriyê, ez her di wê baweriyê de bûm, ku Barzanî xwestiye min biceribîne, lewma tu guhertinek di nêrîna min de derbarê Barzanî çênebû û min wek serkirdeyekî neteweyî yê mezin didît û gelek jî di bin bandora wî de bûm.

❖ Piştî dîtina naveroka nameyê tu her li ser wê nêrîna xwe mayî?

Belê, piştî dîtina naveroka nameyê jî tu guhertinek di hizra min de derbarê Mela Mistefa çênebû û min ew wek serkirdeyekî neteweyî didît, lê nêrîna Mamoste Îbrahîm Ehmd, Hemze Ebdullah û çend kesatiyên din derbarê Barzanî hat guhertin û digotin nabe zilam gotinên wiha bike û xwe ewqas biçûk bibîne.

❖ Berî we tu partiyeke iraqî bi Mela Mistefa re hevdîtin kiribû?

Partiya Komunîst a Iraqê sala 1956'an ji bo Kongreya Bîstem a Partiya Komunîst a Sovyetê hatibû vexwendin. Wê demê wan nûnerekî xwe şandibûn cem Mela Mistefa, pê re hevdîtin kiribû û bi hev re wêne jî girtibûn.

Wê demê hevrikî di navbera PDK'ê û Partiya Komunîst a Iraqê de li ser Mela Mistefa hebû, her yekî ji wan dixwest, wî ber bi partiya xwe ve bikişîne.

❖ Em vegerin ser festîvalê, beşdariya we bi çi awayî bû?

Tebaxa 1957'an festîval hat lidarxistin, tevahiya şandeya me bi kincên kurdî beşdar bûn. Di nav şandeya Iraqê de me çendîn çalakî kirin û yek-du şahî hatin girtin. Her wisa me destek kincên kurdê ji Dayika Zoya re bir, ku di şerê Cîhanê yê Duyem de keça wê "Zoya Ana Kosmodemyanskaya" ji aliyê Naziyên Almanyayê ve hatibû bidarvekirin. Dayika wê digel çend jinên din ên Rûsî di ahenga me de beşdar bû. Di ahengê de min gotarek pêşkêş kir, xwedê jê razî Dara Tofîq gotara min wergerand ser zimanê înglîzî.

Di çalakiyên festîvalê de me çend civîn li dar xistin. Di hevdîtinên digel şandeyên biyanî de, me bal dikişand ser pirsa Kurd. Her wisa me serdana sekreteriya Yekîtiya Ciwanan û Xwendekaran a Cîhanê kir, vê carê helwesta wan li hember me gelek baş bû.

❖ Helwesta komunîstên Iraqê û Ereb li hember çalakiyên we çawa bû?

Komunîstên Iraqê û Erbên Sûriyeyê û Lubnanê li hember çalakiyên me, astengî çê dikirin û nedihîştin em bibin endamê Yekîtiya Ciwanan û Xwendekarên Demokrat a Cîhanê.

Di festîvalê de Kurdên Sovyetê jî serdana me kirin, ji wan Qenatê Kurdo û Varîzova. Bi rastî hesta neteweyî ya Kurdên Sovyetê di astek bilind de bû. Kolonelekî Kurd ji Îrkutskê bi balafirê hatibû da ku di festîvalê de Kurdan bibîne û du tûrik xwarek û çend bûtlên şerabê ji me re anî bû.

Bi nêrîna min Festîvala Moskowê ji bo Kurd serketinek mezin bû, bi taybet ku me Mela Mistefa jî dît. Pêş dîtina Mela Mistefa, hemû rojan Seyîd Ezîz Şemzînî ba me bû. Me Dr. Murad jî nas kir û min nameyek bi riya wî ji Mîr Hac Akreyî re şand. Her wisa cara yekem me û Sovyetiyan hevdîtin kir.

Di dawiyê de, em vegeriyan Sûriyeyê, lê bi balafirê ji Pekînê bo Moskowê, ji Moskowê bo Viyenayê û ji Viyenayê bo Şamê.

Avakirina
Partiyeke Kurd li Sûriyeyê

❖ Paş vegera ji festîvalê çi çalakiyeke we li Sûriyeyê hebû?

Sala pêştir ango 1955'an ku ji Sûriyeyê ve em çûn derve, me plan kiribû, li wê derê partiyek wek PDK'ê ava bikin. Piştî min, Ebdul Rehman Zebîhî û Hejar Mukriyanî, ji Iraqê revî bûn û çûbûn Sûriyeyê. Zebîhî lI Tirbespiyê ba Hesen Axayê Haco dima.

Wê demê bîr û bawera kosmopolîtiyê belav bibû. Zebîhî li ser navê Mihemed Ehmed Şinoyî, pirtûkek li dijî kosmopolîtiyê nivîsîbû. Bi kurtî tê de behsa vê yekê dikir; em hemû mirov in,

lê mafê her gelekî yê xebata serxwebûnê ji bo rizgarbûna neteweya xwe heye, gelê Kurd jî yek ji wan gelan e.

Di nav Kurdên Sûriyeyê de tevger nebû. Piraniya Kurdan li wî welatî alîgirên partiya komunîst bûn. Wê partiyê jî rê nedida ku tu partiyek kurdî bê avakirin.

Ji riya Apo Osman Sebirî, me bandor li hinek xortan kiribû, ji wan Hemîd Derwêş, Nûredîn Zaza û çend Kurdên din. Sala 1957'an dema çûm Şamê, min rewş ji bo avakirina partiyek kurdî guncaw dît, lê ez bendê mam da ku ji Iraqê ve li ser avakirina partiyek bi wî awayî biryar bê dayîn.

Piştre li Sûriyeyê hevalan bi alîkariya me **Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê** ava kirin. Dr. Nûredîn Zaza bû sekreterê partiyê, Apo Osman Sebrî, Hemîd Derwêş, Reşîd Hemo, Beşîr Sebrî û Xelîl Mihemed endamên polîtburoya partiyê bûn. Bi vê yekê dikarim bêjim: Sala 1957'an sala avakirina partiya kurdî li Sûriyeyê bû, lê rastî dijatiya komunîstan hat.

Helbestvan Cegerxwîn yek ji wan kesan bû ku di bin bandora komunîstan de dijatiya kurdatiyê dikir. Cegerxwîn sala 1955'an ku endamê Tevgera Ensar el-Selam bû, di hevpeyvînekê de digel rojnameyekê li Helebê di bersiva vê pirsê de, gelo rast e tu di nav tevgera Kurd de kar dikî? Dibêje:

"Nexîr, kurdatî xirab e, ew berhema peymanda SENTO'yê ye, kolonyalîzm e û dixwaze nakokiyan biafirîne, em hemû sûrî ne û bira ne".

Lê di sala 1957'an de Cegerxwîn hat nav tevgera kurdî. Her wisa hejmarek Kurdên navdar li Sûriyeyê hebûn;

wek Memdûh Selîm, kesekî kurdperwer bû û pişta PDK'ê digirt, lê nebû endamê partiyê.

Qedrî Can jî Kurdekî din bû, alîgirê Partiya Komunîst a Sûriyeyê bû û pişta PDK'ê nedigirt, lê hatibû festîvala Moskowê. Wekî edîb û helbestvan dihat naskirin û helbestek di pesindayîna Barzanî de, ji Mela Mistefa re şandibû.

❖ Tu çiqasî li Sûriyeyê mayî û te li wir çi dikir?

Ez li Sûriyeyê penaberê siyasî bûm.

Heta ku ez ji festîvala Moskowê vegeriyam Eqîd Mihemed ku min pêştir behsa wî kir, gelek zû karûbarên penaberiya min temam kiribû, bi wê yekê li Sûriyeyê ez bûm penaberê siyasî û mehê min 300 lîre werdigirt ku wê serdemê pereyekî zaf bû.

Sala 1957'an min serdana Şamê kir, cara yekê li wir min Kemal Fuad dît. Wê demê Kemal Fuad nû bibû endamê PDK'ê û hatibû derve da biçe ji bo xwendinê.

Cihêbûna Kadroyên Kurd ji Partiya Komunîst

❖ Kîjan kadroyên Kurd ji Partiya Komunîst a Iraqê cuda bûn?

Kemal Fuad, Hemîd Osman û Salih Heyderî ji partiya komunîst cuda bûn, ku her sê endamên şaxeya Kurdistanê ya wê partiyê bûn. Di sala 1957'an de gihiştibûn vê encamê ku pêwîst e li Kurdistanê partiyek şoreşger a pêşverû bê avakirin û Kurdên komunîst biçin nav wê partiyê.

Her wisa ew partî bi awayekî hevpar û hevaheng digel Partiya Komunîst a Iraqê xebatê bike. Di vê baweriyê de jî bûn, eger ew yek serî negre, eniyek bê avakirin û komîteyek hevpar serokatiya her du aliyan bike, lê partiya komunîst bi tundî derket li hember wê nêrînê. Li Şamê ez, Kemal Fuad, Zebîhî û Hejar, em hemû PDK'yî bûn. Îzedîn Mistefa Resûl ku ketibû bin bandora Kemal Fuad û pişta PDK'ê digirt, ji wê xetê dihat hesabê.

Ya rast dema ku li wê derê min Kemal Fuad nas kir, gelekî kêfa min jê re het, zilamekî aram, serxwe û aqil bû. Me her duyan digel Zebîhî dest bi çalakiyan kir.

Rojekê li Şamê em rastî Fayiq Samerayî û Sidîq Şensel hatin. Ji ber ku parêzer bûn ji bo civîna parêzerên Ereb hatibûn vexwendin.

Her du endamên serokatiya Partiya Serxwebûnê ya Iraqê bûn. Tevî ku wê demê xebata partiya wan hatibû qedexekirin, lê dostaniya wan bi Cemal Ebdul Nasir re berdewam bû. Wê rojê wan em vexwendin nanxwerinê û me bi hev re kebab xwar.

Wê serdemê têkiliyên navbera partiyên Iraqê baş bû, tevî ku negihîştibû asta eniyekê, lê di praktîkê de cureyek hevkarî di navbera wan de hebû.

Wê hevkariyê di hilbijartina 1954'an de reng veda û bû sedem da ku di seranserî Iraqê de hemû partî bi lîsteyekê di hilbijatinê de beşdar bin, ku piştre ew yek di hejmarek çalakiyên siyasî yên navbera partiyan de derket holê.

Partiya Komunîst
Çepên Iraqê Cihêbûn û Yekbûn

❖ Helwesta Nûrî Seîd li hember hevkariya partiyan çawa bû?

Nûrî Seîd[19] tevahiya partiyan da girêdanê û hemû riyên destûrî û yasayî lê qedexe kirin. Her wisa rojnameyên Partiya Niştimanî ya Demokratîk, Partiya Serxwebûnê û Eniya Gel da girêdanê.

Bi wê yekê jî wan partiyan dest bi xebata xwe ya nepenî kirin. Têkiliya me û partiyên erebî bi gelemperî baş bû, digel partiya komunîst û grupên çep ber bi başiyê diçû. Wê demê ango sala 1955'an, sê rêxistinên komunîst li Iraqê hebûn:
Yekem: Partiya Komunîst a Iraqê (مجلة القاعدة) ku ya sereke bû.
Duyem: Yekîtiya Komunîstên Iraqê (وحدة الشيوعيين العراقيين) ku ji aliyê Ezîz Şerîf ve dihat rêvebirin.

Yekîtiya Komunîstên Iraqê ji hemiyan zêdetir nêzîkî me bû, çimkî ji berê ve têkiliya PDK'ê û partiya komunîst baş bû. Paşê helwesta Ezîz Şerîf derbarê pirsa Kurd ku di daxuyaniyekê de

……

[19] Nûrî Seîd sala 1888'an li Bexdayê ji dayik bûye. Sala 1906'an xwendina xwe li **xwendingeha leşkerî ya Stenbolê temam kiriye** û piştre pênc salan jî li **Koleja Cengê** ders xwendiye.
Tekane iraqiye ku ji sala 1930'yan -1958'an **14 caran serokwezîr bûye**.
Di wê heyamê de du caran ji ber darbeyê ji Iraqê revyaye û piştre vegeriyaye.
Siyaseta erebkirinê ji dema wî ve li Kerkûkê dest pê kiriye, bi fermana wî Kurd ji Kerkûkê hatine veguhestin ji bo navîn û başûrê Iraqê û li şûna wan Ereb hatine bi cih kirin.
Derbarê çawaniya mirina Nûrî Seîd nêrînên cuda hene. Hinek dibêjin: **Wî xwe kuştiye**, lê hinek din jî dibêjin: **Hatiye kuştin**.

bi navê **“Pirsa Kurd li Iraqê”** hat weşandin, zêdetir em li hev nêzîk kirin.

Sêyem: “Ala Karkeran” (راية الشغيلة) ku ji aliyê Ezîz Mihemed û Cemal Heyderî ve dihat rêvebirin. Baskê rastgir ê Partiya Komunîst a Iraqê dihat hesabê û li dijî sloganên çep û şoreşgerî yên serokatiya partiya komunîst disekinî û piştre jê cihê bû.

Di mijara îdeolojiyê de jî, cudahî navbera PDK’ê û Ala Karkeran de hebû. Ew grup li dijî sloganên herifandina rejîma paşatiyê, avakirina Komara Demokratîk a Gel û mafê çare-nivîsê bû, ku demek bû PDK’ê ji bo wan sloganan xebat dikir.

❖ Eger navbera we û hemû aliyan baş bû, çima hûn li hev nêzîk nebûn?

Navbera me û wan her sê grupên komunîst baş bû. Sala 1955’an me ji bo lihevnêzîkkirina wan her sê grupên komunîst hewl da û di wê çarçoveyê de bi pêşniyara me civînek navbera wan de hat lidarketin.

Di civînê de pêşniyara yekbûna her sê grupan ji aliyê me ve hat kirin. Selam Adil ji Partiya Komunîst a Iraqê (مجلة القاعدة) pêşniyar kir:

“Ji ber ku PDK’ê Marksîzm-Lenînîzm kiriye programa xwe, bila di avakirina wê partiya nû de beşdariyê bike, bi vî şertî ku Kurdên komunîst ên tevahiya partiyan biçin nav PDK’ê. PDK wek partiyek niştimanî ya demokrat a şoreşger bimîne û Erebên komunîst jî di nav partiya komunîst da bimînin.”

Di hember de me wekî PDK got: Bila tevahiya Kurdên Komunîst di nav PDK’ê de kom bibin, lê serokatiyek hevpar

navbera PDK’ê û wê partiya komunîst de bê pêkanîn, ku ji wan her sê grupan tê avakirin.

Bi navcîtiya me grupa Yekîtiya Komunîstên Iraqê û Partiya Komunîst a Iraqê li hev kirin û piştî weşandina daxuyaniyek hevpar, cemaeta Yekîtiya Komunîstên Iraqê tevlî partiya komunîst bûn.

Li gorî lihevkirinê him Mamoste Ezîz Şerîf û him jî Ebdul Rehîn Şerîf di serokatiya partiya komunîst de man.

Tundûtîjiya berpirsên berê yên Partiya Komunîst a Iraqê (مجلة القاعدة) bi taybet Basim û Hemîd Osman, sedema sereke ya cihêbûna wê cemaetê bû. Lê piştî ku Hemîd Osman nema û serokatiya partiya komunîst ket dest Selam Adil, **ferq û cudahiyên nav wê partiyê kêm bûn.**

Selam Adil zilamekî nerm û jîrê çeleng bû, ji bo yekbûna tevahiya baskên tevgera komunîst li Iraqê hewl dida, tevî ku kesekî zêde xwende nebû, lê bi rastî kesekî têkoşer û fikirvekirî bû û bi çelengî û jîrî, xwe pêş xist. Di dawiyê de bi alîkariya Xald Begdaş karî cemaeta Ala Karkeran (راية الشغيلة) jî vegerîne nav partiya komunîst.

Selam Adil gihîşt yek ji xwaziyên xwe, ew jî komkirina tevahiya komunîstên Iraqê di nav partiyekê de bû. Her wisa têkiliya wî bi me re wekî PDK jî gelek baş bû.

Piştî êrişa sê aliya Brîtanya, Fransa û Îsraîlê li ser Misirê û rawestiyana Cemal Ebdul Nasir li hember wan sê dewletan, sala 1956’an xebata neteweyî ya Ereb berfirehtir bû. Bi ragihandina siyaseta xwe ya lihemberderketina împeryalîzmê

û peymanên leşkeriyên wê, Misir bû dijminê împeryalîzmê û peymana Bexda û kevneperestên Ereb.

Piştî wê yekê Tevgera Neteweyî ya Ereb berfirehtir bû û dengê pêla hizra neteweyî ji hemû welatên erebî dihat bihîstin.

Partiya komunîst di siyaseta xwe de, slogana xebata rizgariya gelê Ereb dida û pişta xebata gelên Ereb digirt û dixwest li ser bingeha demokrasiyê, tevahiya gelên Ereb bibine yek. Tevî wê yekê siyasetek wê partiyê li hember pirsa Kurd hebû, bingeha wê siyasetê jî "**Mîsaqa Basim**" bû. Li gorî wê mîsaqê mafê gelê Kurd ê diyarkirina çarenivîsê heta cihêbûnê û avakirina dewletek serbixwe hebû. Di hember de hesta neteweyî li Kurdistanê jî geş bibû û roj bi roj berfirehtir dibû.

Fehd û Pirsa Kurd

❖ Helwesta Fehd derbarê pirsa Kurd li Iraqê çawa bû?

Siyaseta Yûsif Selman Yûsif ku bi "**Fehd**" dihat naskirin, bi awayekeî din bû. Wî gelê Kurd wekî Êzidî, Asûrî û Ermeniyan kêmaniya neteweyî dizanî, lewma layîqî mafê diyarkirina çarenivîsê nedidît.

Lê paşê nêrîna wî li hember gelê Kurd hat guhertin û di gotarekê de ku li rojnameya El-Qaide hat weşandin, bal kişandibû ser vê yekê, mafê gelê Kurd yê diyarkirina çarenivîsê û cihêbûnê heye, lê di dema rizgarbûna Iraqê ji împeryalîzmê yan jî di qonaxekê de ku di berjeweniya gelê Kurd be.

Di gotara xwe ya duyem de, Fehd xwestibû li Kurdistanê partiyek pêşverû bê avakirin, her wisa rexne ji Partiya Hîwayê girtibû û wekî kevneperest dabû zanîn û gotibû:

“Ji hemû Kurdên pêşverû û dilsoz dixwaze partiyekê ji bo xwe rêxistinê, lihevkirin, hişyarkirin û rêberîkirina gelê xwe û tevgera neteweyî ya xwe, ava bikin.”

Nêrînên wê demê yên Fehd, dikarî biba destketiyek baş ji hevkariya navbera PDK’ê û Partiya Komunîst a Iraqê, çimkî wê hingê Komara Mihabadê û Komara Azerbaycanê hebû û Yekîtiya Sovyetê jî hez dikir Kurd û Tirkên Azerî bibin xwdanê partiya xwe ya serbixwe.

Wê hingê, ew siyaseta Sovyetê li Îranê dihat bicihanîn, ev jî şikandina wê teoriyê bû, ya ku digot:

Divê di nav dewletekê de tenê partiyek hebe û tevahiya neteweyên welêtî di nav xwe de kom bike.

Ez di vê baweriyê de me, Fehd dema ji rêya Îranê ve çûbû serdana Yekîtiya Sovyetê, ew rastî bi çavên xwe dîtibû. Her wisa ne dûr e, ku Sovyetiyan di wê barê de şîret li wî kiribin. Bi taybet ku di gotara xwe ya duyem de, daxwaza avakirina partiyek kurdî ya pêşverû ya şoreşger ji bo bidestanîna armancên gelê Kurd dikir.

Lê di sala 1956’an de ev pirs derket holê, gelo divê Kurdên komunîst di nav Partiya Komunîst a Iraqê de bimînin an jî biçin nav partiyek kurdî?

Hinek Kurd ku berê komunîst bûn wek Xesrew Tofîq, Nejad Ehmed Ezîz Axa, Kekê Felah û Letîf Cigere, her wisa hinekên din ên ku pêştir PDK’yî bûn û niha bibûn komunîst wek Selah

Dîlan, gihîştibûn vê encamê ku divê tevahiya Kurdan di nav partiyekê de kom bibin. Wê nêrîna wan bandor li Hemîd Osman sekreterê wê demê yê Partiya Komunîst a Iraqê kiribû.

Wê hingê şaxeya Kurdistanê ya partiya komunîst ji aliyê van sê kadroyên Kurd Dr. Kemal Fuad, Salih Heyderî û Hemîd Osman ve dihat serokatîkirin, ku her sê xwedanê bîr û bawera kurdatiyê bûn û gihîştibûn vê encamê ku bîr û bawera komunîstiyê bi rewşa heyî ya Kurdistanê re biguncînin.

Wan kadroyan heta astekê bandor li Hemze Ebdullah kiribûn. Di encamê de, sala 1957'an bi cihêbûna grupa Nejad Ehmed Ezîz û Xesrew Tofîq ji partiya komunîst, Partiya Demokrat a Yekbûyî ya Kurdistanê hat avakirin.

Di encama kûrbûna wê hizrê ya nav şaxeya Kurdistanê ya partiya komunîst de li Tebaxa 1957'an, wê şaxeyê hebûna xwe hilweşand û bi temamî hat nav PDK'ê.

❖ Çi rolek te di wê yekbûnê de hebû?

Demê ku ew biryar hatibû dayîn, ez li Kurdistanê nebûm û li Festîvala Ciwanan û Xwendekaran a Cîhanê li Moskowê bûm, lewma ez zêde haj pê nebûm, dibe ku Kemal Fuad zêdetir hajî wê pirsê hebe.

Lê heta astê ku ez haj pê me, rolek mezin a Hemze Ebdullah di wê yekbûnê de hebûye, ku wê demê ji nû ve vegeriya bû nav PDK'ê û navbera wî û Nejad Ehmed Ezîz û Xesrew Tofîq baş bû. Rola Mamoste Îbrahîm Ehmed jî di wê pêvajoyê de hebûye, çimkî ji aliyê hemiyan ve wek sekreterê "**Partiya Demokrat a Yekbûyî ya Kurdistanê**" hatibû qebûlkirin.

Dema ez vegeriyam Kurdistanê, wê demê cemaeta Kurdên komunîst hatibûn nav PDK'ê. Ji aliyê xwe ve jî, partiya komunîst ji ber wê cihêbûna şaxeya Kurdistanê ya wê partiyê, daxuyaniyek gelek tundûtîj a tijî bêhurmetî, tomet û buxtan belavkirbû û tê de dijatiya wê fikirê kiribû, ya ku digot: **Divê partiya Kurd an jî pêşengê Kurd ê taybet hebe û komunîstên Kurd biçin nav wê partiyê.**

Di daxuyaniyê de, hatina wê şaxeyê ji bo nav PDK'ê mîna cihêbûnê, xizmetkirina kolonyalîzmê û dijminatîkirina Ereban hatibû zanîn.

Ev jî di demekê de bû, ku di encama navcîtiya me wek PDK'ê de, grupên komunîst bibûne yek. Ya rast, Selam Adil bi xwe gelekî pişta pêşverûyiya PDK'ê digirt û dostaniyek baş navbera wî û Mamoste Îbrahîm Ehmed hebû.

Her wisa ji ber rola Mamoste Îbrahîm Ehmed a aştiyane li Iraqê, ser pêşniyara Selam Adil, ew ji aliyê cemaeta Ensar el-Selam a Iraqê ve bi kevoka zêrîn a aşitiyê hat xelat kirin.

Her wisa Ezîz Şerîf û Ebdul Rehîm Şerîf wek du dostên kevin ên PDK'ê çûbûn nav Partiya Komunîst a Iraqê û di nav wê partiyê de, rol û bandora wan hebû, lê tevî wan yekan, gelek cihê ecêbmayînê bû, ku partiya komunîst daxuyaniyek bi wî awayî tundûtîj li dijî PDK'ê weşandibû.

Ew daxuyanî ji aliyê Şerîf Şêx ve hatibû nivîsandin, ku paşê derket kesekî xayîn bûye, çimkî li ser hevalên xwe axivî bû û agahî dabû dijmin. Her wisa piştre înkara komunîstbûna xwe kir û ji partiya komunîst vekişiya.

Wê helwesta partiya komunîst, astengiyek mezin li hember hevkariya navbera PDK'ê û partiyên erebî çê kir, çimkî wê hingê nêzîkatiyek di navbera partiya komunîst û partiyên din ên erebî de wekî Partiya Niştimanî ya Demokratîk, Partiya Serxwebûnê û Partiya Beisî ya Hevpariya Erebî hebû.

Hevdem helwesta partiya Baas li hember PDK'ê nezelal bû û nedixwest PDK di Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê de beşdariyê bibe. Partiya komunîst jî, ji ber dijatiya xwe ya bi PDK'ê re, nedixwest PDK di eniya yekîtiya niştimanî de beşdar bibe.

Di wê çarçoveyê de partiyên din ên nav wê eniyê nedixwestin çi daxwazek neteweyî ya gelê Kurd qebûl bikin, ne daxwaza xweseriyê û ne jî mafê diyarkirina çarenivîsê.

PDK jî zêde di beşdariya eniya yekîtiya niştimanî de rijd nebû, lê gotibû Kamîl Çadirçî û partiya Serxwebûnê ku divê behsa xweserî yan mafê çarenivîsê bê kirin.

Ji ber ku partiya komunîst ketibû dijminatiya PDK'ê, lewma cihê PDK'ê di nav eniyekê de nebû, ku ji aliyê Partiya Serxwebûn, Partiya Niştimanî ya Demokratîk û Partiya Komunîst a Iraqê ve hatibû pêkanîn.

Eniya
Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê

❖ Plana pêkanîna Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê çawa çêbû, çi rolek wê hebû?

Êrişa hovane ya Brîtaniya, Fransa û Îsraîlê li dijî Misirê, sedema sereke ya li hevnîzîkbûna aliyan û pêkanînan Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê bû. Ez dikarim bêjim: **Sala teqîna xebata girseyî li Iraqê bû**. Li seranserî Iraqê xelk gelek aciz û nerazî bûn, çimkî helwesta hikûmeta Iraqê li hember wê êrişê, gelek necamêrane bû.

Paşê eşkere bû, di tûjkirina Brîtanyayê de, li dijî Cemal Ebdul Nasir , destê Nûrî Seîd hebûye. Ji ber wê yekê pirsa xebata çekdarî ket rojevê, ku demek dirêj bû PDK'ê slogana wê xebatê dida. Lê komunîstan di bin bandora Kongreya Bîstem a Partiya Komunîst a Sovyetê de, slogana veguhestina aştiyane didan û digotin: **"Iraq jî bi riya aştiyê derbasî sosyalîzmê dibe."**

Tevî ku wê teoriyê, bandor li reftar û serederiya wan kiribû, lê ew bûyer bûn sedem da ku bikevin fikra xebata çekdarî û di nav bajaran de hinek caran bombeyan biteqînin.

Ew helwest û çalakî di bin bandora Radyoya Dengê Ereb de dihat kirin, ku ji Misirê ve dihat belavkirin û dixwest gelê Ereb li hember împeryalîzmê, Peymana Bexdayê, desthilata Nûrî Seîd û kevneperestiya erebî serî hilde.

Lewma wan bê Kurd di sala 1957'an de, Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê pêk anîn, ku di programa wê de tu tiştekî zelal derbarê pirsa Kurd nebû û tenê behsa biratiya Kurd û

Ereban dikir. Paşê pirsa beşdariya Kurd û Ereban, ket nav destûra demkî ya Komara Iraqê. Di rastiyê de programa wan beşek ji programa Kongreya Neteweyî ya Iraqê bû, ku ji aliyê Partiya Serxwebûnê, Partiya Nişтimanî ya Demokratîk û Eniya Gel ve pêşkêşî hikûmeta Iraqê hatibû kirin.

Wê demê hesta neteweyî him di nav Kurdan û him jî di nav Ereban de zêde belav bibû. Gelê Kurd daxwaza mafê çare-nivîsê yê zêdetir ji xweseriyê yan federaliyê li Iraqê dikir. Ji ber wê yekê eniya yekîtiya nişтimanî nêzîkî Kurdan nedibû, lewma PDK jî zêde rijd nebû li ser beşdariya di wê eniyê de.

Eniya Yekîtiya Nişтimanî ya Iraqê ji çar partiyan pêk hatibû, ku paşê hinek endamên din bi navê ciwanan û Ensar el-Selam lê zêde bûn.

Eniya Yekîtiya Nişтimanî zêdetir eniya derxistina daxuyaniyan û serastkirina rê ji bo xebatê bû, çimkî wê demê koma Efserên Azad di nav artêşa Iraqê de, mijûlî tevgera şoreşgerî bûn û xwe ji bo herifandina hikûmetê û rizgarkirina Iraqê ji des-thilata paşatiyê û qeyd û bendên împeryalîzmê amade dikirn.

Di programa eniyê de tiştek bi navê mafê Kurd nebû, zêdetir behsa demokrasî, destûr, parlamento û azadiya çalakiyên partiyan dihat kirin, hetta tê de behsa herifandina rejîmê jî nedihat kirin, belkî behsa nehîştina hikûmetê, vegeriyana Iraq nav himbêza welatên serbixwe yên Ereb û hevxebatiya gelên Ereb dihat kirin.

❖ Eniya Yekîtiya Nişтimanî ya Iraqê çiqasî berdewm kir?

Heta şoreşa 14’ê Tîrmeha 1958’an ku rejîma paşatiyê herifî û hikûmeta komarî li Iraqê hat avakirin, çalakiyên eniya yekîtiya niştimanî berdewam bûn.

Piştî şoreşa 14’ê Tîrmehê, bi armanca beşdariya PDK’ê, şandeya me bi serokatiya Mamoste Îbrahîm Ehmed ku ez jî endamê wê bûm, serdana eniya yekîtiya niştimanî kir.

Di encamê de tevahiya aliyan ji wan jî Beisiyan razîbûna xwe nîşan dan, ku em beşdariya eniyê bikin. Ev jî di demekê de bû, piraniya wan nedizanîn em kî ne û çi dixwazin?

Lê piştî ku me dest bi danûstandinê kir û me nêrînên xwe ji wan re gotin, piraniya wan nêrînên me qebûl kirin, bi taybet vê care Beisiyan pêşwazî ji beşdariya PDK’ê kirin.

Berpirsê wê demê yê Beisiyan Fuad Rikabî bû, ku piştî Şoreşa 14’ê Tîrmehê bibû wezîrê avadaniyê. Me serdana wî kir, zilamekî rûxweş û camêr dihat xuyanê ku nêrîna wî der bare pirsa Kurd gelek baş bû.

Rikabî behsa giringiya têkiliya Kurd û Ereban kir û got:

“Xwişkek min heye, me daye kurdekî û navbera min û Kurdan gelek xweş e û ez gelekî jî hejî Kurdan dikim, ya ku ji Ereban re dixwazim heman tiştî ji Kurdan re jî dixwazim.”

Piştre li navenda Rojnameya El-Cimhûriyetê em pê re civiyan.

Di civînê de ji bilî Fuad Rikabî, Elî Salih Seidî, Dr. Seidûn Hemadî û çend ciwanên din beşdar bûn. Di encamê de me karî nêrîna wan derbarê PDK’ê biguherin. Mixabin di serdema qonaxa duyem a desthilata Beisiyan de, Sedam Hisên, Fuad

Rikabî da girtinê û bi riya komployekê di girtîgehê de ji aliyê girtiyekî ve Rikabî hat kuştin.

❖ Wê demê projeya Beisiyan ji bo çarseriya pirsa Kurd li Iraqê hebû?

Nêrîna wan derbare pirsa Kurd baş bû. Gotin:

“Em dixwazin dema amadekirina destûra hertimî ya Iraqê, mafê xweseriya Kurdan bê dayîn, her wisa em razîne dema ku Iraq çû nav Komara Erebî ya Yekbûyî, Kurdistan bibe herêma çarem a wê Komarê.”

Ya rast propagandaya partiya komunîst, çepgiriya nav PDK’ê bi taybet ya piştî hatina Mela Mistefa ji Sovyetê bûn sedema têkçûna têkiliyên me û neteweçiyan.

Eger wê demê di nav neteweçiyên Ereb de, **ev rastî hatiba qebûlkirin ku mafê yasayî yê Kurdan heye û divê bê dayîn, wê demê rewş gelek cudatir dibû**, lê di encama têkçûna têkiliyan de, wan helwesta xwe guhertin û siyaseta şovênîst û dijatiya Kurdan meşandin.

Di nav Eniya Yekîtiya Nîştimanî ya Iraqê de, rolek baş a pêngava polîtburoya PDK’ê bi serokatiya Mamoste Îbrahîm Ehmed hebû. Ji aliyekî ve wek destpêkekê dihat hesabê, ji bo çêkirina têkiliyan bi Partiya Beisî ya Hevpariya Erebî û Partiya Serxwebûnê re, ji aliyê din ve çêkirina têkiliyan bû, bi riya wan digel Serokkomarê wê demê yê Misrê Cemal Ebdul Nasir.

Vê carê komunîst ketin dijatîkirina me, buxtan kirin ku xwedêgiravî polîtburoya PDK’ê bi serokatiya Mamoste Îbrahîm Ehmed û min digel Beisiyan , Partiya Serxwebûnê û Ebdul Selam Arif rêketiye, da ku Iraqê bixin ser Komara Erebî

ya Yekbûyî. Di hember de, Kurd jî serxwebûnê bidest bîne yan jî bibe komarekê yan jî bibe herêma çarem a Komara Erebî ya Yekbûyî.

Wan ew pirs gihandin Ebdul Kerîm Qasim ku gelekî ji wê pirsê ditirsiya, her wisa gihandin Mela Mistefa jî.

Ya rast anîna Mela Mistefa di çarçoveya wê siyasetê de bû û dihat xwestin nêzîkatî bi neteweçiyên Ereb re çê bibe.

Wê demê Ebdul Selam Arif wezîrê navxwe yê Iraqê bû, ji riya wî Tahîr Yehya wek piledarekî leşkerî, bû rêveberê giştî yê polîs.

Têkiliyek baş a Tahîr Yehya bi efserên Kurd bi taybet Kerîm Qerenî re hebû û me ji riya wî ve Tahîr Yehya nas kir.

Em pêştir bi Ebdul Kerîm Qasim re axivîbûn, tevî ku em ditirsiyan ew qebûl neke, lê Tahîr Yehya got: **“Ew ê di wê bare de bi Ebdul Selam Arif re biaxive.”** Piştî ku Tahîr Yehya bi Ebdul Selam re axivî, ji me re got: **“wî daxwaza we qebûl kiriye.”**

Beşa Şeşem
6
Geşbûna Xebata Kurdatiyê di Qonaxa Ebdul Kerîm Qasim de 1958-1963

- Vegera Barzanî bo Iraqê
- PDK û Şoreşa 14'ê Tîrmehê
- Derkirina Mam Celal ji polîtburoya PDK'ê
- Çapemeniya partiyê û rojnameya Xebatê
- Tevgera Şewafê li Mûsilê
- Destpêka nakokiyên Ebdul Kerîm û PDK'ê
- Nakokiyên Qasim û Barzanî
- Barzanî û Brîtanya
- Barzanî û partîtî
- Yekem plana Qasim li dijî Barzanî

Vegera Barzanî bo Iraqê

❖ Mela Mistefa kengê û çawa vegeriya Iraqê?

Wek PDK me pêşniyar da hikûmetê ku rê bidin bila Mela Mistefa vegere Iraqê û li ser riya xwe li Qahireyê Serokkomarê wê demê yê Misrê Cemal Ebdul Nasir jî bibîne, ya ku her du li ser li hev bikin, bila ew bê qebûlkirin.

Bi awayekî lezgîn pasport ji Mamoste Îbrahîm Ehmed, Nûrî Ehmed Teha, Ubeydullah Barzanî û Şêx Sadiq Şêx Babo Barzanî re hat derxistin. Ew çar kes çûn Çêkoslovakiyê û Mela Mistefa ji wê derê birin Qahireyê, piştî dîtina Cemal Ebdul Nasir , hemû bi hev re vegeriyan Iraqê [20].

Komunîstên Iraqê wek komployekê bala xwe dan wê vegerê û gotin: **PDK û Beisiyan li ser vê yekê li hev kirine, ku beşa erebî ya Iraqê bixin ser Komara Erebî ya Yekbûyî, di hember de beşa kurdî ya Iraqê jî bibe Komara Kurdistanê.**

Pêwîst e tiştekî bêjim: Piştî hatinê, Mela Mistefa gelekî li dijî me hatibû tûjkirin, hetta Ebdul Kerîm Qasim jî dijî me bi Mela Mistefa re axivî bû.

Di encama wê yekê de baskê alîgirê partiya komunîst di nav PDK'ê de peyda bû û kesên wek Nejad Ehmed Ezîz, Xesrew Tofîq, Hemîd Osman, Salih Heyderî û Hemze Ebdullah serkêşiya wê hizrê dikirin. Wan çend kesan dest bi şîretkirin û tûjkirina Mela Mistefa li dijî me kirin.

……

[20] Mela Mistefa Barzanî şeşê **Cotmeha 1958'an** gihîşte Bexdayê bi awayekî germ ji aliyê hikûmet û xelkê ve hat pêşwazîkirin. Hevalên Barzanî yên li Sovyetê mabûn, **bi keştiyekê 17'ê Nîsana 1959'an gihîştin bendera Besreyê**, ew jî bi heman awayî hatin pêşwazî kirin.

Jê xwestin ku endamên polîtburoyê biguhere û ez jî ji partiyê werim derkirin, çimkî wan wekî danerê sereke yê wê siyasetê ez didîtim

her wisa dixwestin per û baskê Mamoste Îbrahîm Ehmed bibirin û wî lawaz bikin.

Di civînekê de ku hemû amade bûn, Mela Mistefa pirsî: “Ew nûçe rast e? Çi ye û çawa ye?” Mamoste Îbrahîm Ehmed bersiv da û got: “Ya ku tê gotin, rast nîne û behsa çawaniya çûna nav Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê kir û tekez kir, qet di civînan de behsa tiştên wisa nehatiye kirin.”

Mamoste Îbrahîm Ehmed got: **“Berê PDK’ê derbarê yekîtî û yekîtiya federal, projeyek dabû partî û aliyên Îraqî, ku belgeyek dîrokî ya pir rast û bi prensîp e, niha jî em dikarin bi kar bînin.”**

Dema ku nobeta min gihîşt, Mela Mistefa ji min pirsî û got: “Celal tu çi dibêjî?” Min got: “Gelek mixabin ezbenî tiştekî wiha nebûye.” Dema min wisa got, rehmetî bi dengekî bilind keniya û got: **“Dê kerem kin, ez dibêjim dîn e, hûn bawer nakin.”**

Min got:

“Wele ger niha Ereb werin û vê peymanê bi min re îmze bikin, ku Ereb yekîtiya Ereban ava bike û Iraq biçe ser Komara Erebî ya Yekbûyî û di hember de serxwebûna Kurdistanê qebûl bikin, wê demê ez ê bi spasî peymanê îmze bikim û gelekî jî vê yekê rast dibînim, ku Kurd û Ereb li hev bikin, Kurd pişta xebata rizgarî û yekbûna Ereban bigre û neteweya Ereb jî pişta xebata rizgarî û mafê diyarkirina çarenivîsê û mafê serxwebûna Kurdistanê bigre.”

Beşek ji hevalên nav PDK'ê ku girêdayî partiya komunîst bûn di berjeweniya xwe de mifa ji rewşê wergirtin û wek kiryarek şovênîstî û rastgirane dan zanîn.

❖ Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê çi lê hat?

Mamoste Îbrahîm Ehmed, piştî beşdariya PDK'ê di Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê de, digot:

"Niha dema bêtifaqiya nav yekîtiya Iraqê nîne, divê em vê yekîtiyê biparêzin. Niha nabe di navbera Beisiyan , Komunîstan, Partiya Niştimanî ya Demokratîk û Partiya Serxwebûnê yan Kurd û Ereban de şer derkeve. Divê tevahiya aliyan bibine yek û Komara Iraqê biparêzin û bi vê yekê eniya demokrasiyê xurt bi-kin."

Her wisa em di vê baweriyê de bûn: Divê gelê Iraqê bi dilê xwe û bi serbestî nêrîna xwe bîne ziman, gelo yekîtiyê dixwaze yan bi hev re jiyanê? Ev jî girêdayî xwesta gelê Ereb e. Wê demê, me ev her du xwestek li dijî xwe nedidît.

Yekem: Heta çi astekê yekîtiya gelê Ereb dikare bidesthatina mafên gelê Kurd garantî bike.

Duyem: Heta çi astekê demokrasî û azadiyê diparêze. Ji ber wê yekê em alîgirê geşkirin û bitevkirina Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê bûn.

❖ Çima Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê hilweşiya?

Bi nêrîna min çend delîl hebûn ku bûn sedema hilweşiyana eniyê.

Yekem: Şaşiya mezin a Beisiyan di vir de bû, ku dixwestin bi dare zorê, bêyî ku nêrîna xelkê Iraqê werbigirin, bêyî ku rê

bidin hilbijartinek azad bê kirin, parlamento bê danîn û demokrasî di Iraqê de organîze bibe, dixwestin yekîtî û yekperçebûnekê ser Iraqê ferz bikin.

Duyem: Şaşiyek din a Beisiyan ev bû, dest danîn ser kursiya Ebdul Selam Arif. Di xwenîşandanan de digotin: Bijî Cemalê Iraqê Ebdul Selam Arif, bi wê yekê dixwestin, wî zilamê bêaqil, gêj, dîktator û kevneperest bikin karîzmayê xwe û sembola tevgera erebî li Iraqê. Her wisa girîngî nedayîna wan bi pirsa demokrasiyê û mafên demokratîk li Iraqê.

Mixabin heta van dawiyan jî, tevgera neteweperestiya Ereb tenê girîngî dida pirsa kolonyalîzmê û dijminatiya siyonîzmê. Tu girîngiyek nedida aliyê siyasî yê demokrasiyê ku aliyekî gelek girîng e û pêk tê ji azadiyên demokratîk, azadiya çalakiyên partiyan, azadiya ramanê, avakirina saziyên azad û azadiya rojnamegeriyê.

Beisî bi kirdeyên xwe bûn sedema hilweşiyana Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê. Partiya komunîst jî ku ji ber rûdayîna zêde ya Ebdul Kerîm Qasim destê wan vekirîtir bibû, dijatiya Beisî û neteweçiyan dikir.

Komunîstan tu girîngî nedidan eniyê û di bin slogana parastina komarê de, dijî yekîtiya Ereb û pirsa neteweyî ya Ereb dixebitîn. Her çend ji rû ve slogana yekîtiya Ereb didan, lê ji binî ve Ebdul Kerîm Qasim li dijî Komara Erebî ya Yekbûyî û Beisiyan tûj dikirin û berdidan dor canê wan.

Piştî bûyera Şewafê di sala 1959'an de li Mûsilê, ku xelkê nerazî û bêtawan yên wî bajarî hatin qirkirin, Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê hat hilweşandin.

❖ Eniya yekîtiya nîştimanî çi karên girîng kirin?

Karê herî girîng yê eniya yekîtiya nîştimanî, amadekariya siyasî bû ji bo Şoreşa 14'ê Tîrmehê, di encamê de grupa Efserên Azad li dijî rejîma paşatiyê serî hildan û herifandin.

PDK û Şoreşa 14'ê Tîrmehê

❖ Çi rolek PDK'ê di Şoreşa 14'ê Tîrmehê de hebû, gelo têkiliya PDK'ê û Efserên Azad hebû?

Têkiliyek xurt navbera PDK'ê û efserên Kurd hebû. Efserên Kurd li Kerkûkê grupek çê kiribûn ku efserên navçeyên din ên Kurdistanê jî tê de beşdar bûn, wekî Fatîh Cebarî û hejmarek efserên din ên Kurd. Nêzîkatî di navbera wê grupê û PDK'ê de hebû, xeleka têkiliya wan û partiyê jî ez bûm. Lê têkiliya rasterast a PDK'ê bi Efserên Azad re nebû.

Têkiliyek taybet a Mamoste Îbrahîm Ehmed bi du efseran ji wan Eqîd Ebdullah Seîd û Muqedem Fetah Şalî hebû, ku nêzîkatî navbera wan û Efserên Azad de hebû, lê tenê dihat zanîn ku di nav wan de tevgerek heye û dixwazin karekî bikin.

Di dawiyê de neteweçî û komunîst ketibûn dijatiya PDK'ê. Ji ber ku Efserên Azad di bin bandora komunîstan, neteweçiyan û Beisiyan de bûn, lewma tu pêwendiyek rasterast navbera wan û PDK'ê de nebû.

Lê paş Şoreşa 14'ê Tîrmehê, PDK'ê li seranserî Kurdistanê alîgirên xwe ji bo pêşwaziya wê şoreşê amade kir. Şandeyeke mezin a PDK'ê bi serokatiya Mamoste Îbrahîm Ehmed çû Bexdayê. Li wê derê him pîrozbahî li serokatiya şoreşê kir, him

jî di civînek mezin a li ber avahiya wezareta berevaniyê, piştgiriya xwe ji Şoreşa 14'ê Tîrmehê re nîşan da û daxwaza mafên gelê Kurd kir.

Ya rast ji ber ku serokên Efserên Azad kesên iraqçî yan jî neteweperestên Ereb bûn, lewma wan bîr û nêrîna PDK'ê qebûl nedikirin.

Ji ber wê yekê, di gotara xwe ya yekem de, li ber avahiya wezareta berevaniyê, Mamoste Îbrahîm Ehmed bal kişand ser vê yekê, dema çêkirina Iraqê ji aliyê Îngilîz (Brîtanyayê) ve, çawa gelê Kurd ji mafên xwe hat bêparkirin, çawa welatê Iraqê li ser bingeha newekhevî û bêpariya gelê Kurd hat avakirin.

Tekez jî kir, divê niha wê şaşiyê rast bikin. Her wisa Mamoste Îbrahîm Ehmed got: Divê Iraq li ser bingeha wekheviya rastî bê avakirin, ew jî bi îtirafkirina bi mafê rewayê gelê Kurd û mafê xweseriyê. Ev jî dibe sedem ku bingeha Iraqê ya sava bê xurtkirin.

Ew axaftina Mamoste Îbrahîm Ehmed bi dilê Efserên Azad nebû, Ebdul Selam Arif efserekî şovênîst û Ebdul Kerîm Qasim jî efserekî iraqçî bû. Di vê baweriyê de bûn, divê em wek Kurd tenê bêjin; iraqî ne, ne Kurd in û ne jî Ereb, pêdivî nake em behsa mafên neteweyî yên Kurd û Ereban bikin. Lewma ji aliyê wan ve, ev nêrîn nedihat qebûlkirin. Lê rewş dihat guhertin, hêdî-hêdî bandora PDK'ê û çalakiyên wê berfireh dibû û siyaseta rast û rewa ya PDK'ê zêdetir zelal dibû, çimkî di rastiyê de PDK bi vê yekê re nebû, ku Efserên Azad bikevin canê hev.

Her wisa PDK'ê dixwest têkiliyeke wê ya baş bi tevahiya aliyan re hebe. Armanca min ji PDK'ê, ya dema serokatiya Mamoste Îbrahîm Ehmed e, lê bi hatina Mela Mistefa bi temamî ew siyaset hat guhertin.

Wî endamên polîtburoyê jî guhertin, di encamê de, ez ji endamtiya polîtburoyê hatim derxistin û hejmara endamên polîtburoyê jî hat zêdekirin, bi awayekî ku nûnerên wê cemaetê tê de zêde bûn, ku girêdayî Partiya Komunîst a Iraqê bûn.

❖ Kê nûnertiya wê cemaetê dikirin?

Hinek kesên wekî Nejad Ehmed Ezîz, Hemze Ebdullah, Xesrew Tofîq û Hemîd Osman bûn, hatin pêş hinek bûn endamên polîtburoyê, wek Nejad Ehmed Ezîz û Hemze Ebdullah, ku rasterast girêdayî Partiya Komunîst a Iraqê bûn.

Derkirina
Mam Celal ji Polîtburoya PDK'ê

❖ Ew endam bê hilbijartin çûn polîtburoyê?

Nexêr, bi riya hilbijartinê bû. Tevlî Mela Mistefa hejmara endamên Polîtburoyê 15 kes bû, her çend ew kêmanî bûn yanî pênc kes li hember 10 kesan, lê gotin: "**Em nakin, heta hejmara endamên polîtburoyê bi qasî wê rêjeyê nebe, ya ku em dixwazin.**"

Wan karîbûn Mela Mistefa bixin bin bandora xwe, di encamê de ew jî ketibû bin bandora komunîstan, lewma Mela Mistefa

got: **“Yan ez gel we namînim, yan jî divê polîtburoyê biguherim, ji bo ku Mela Mistefa cuda nebe, me xwesta wî qebûl kir.”**

Me ji wan hevalan pirsî: “Eger demokrasî li ser bingeha piranî û kêmaniyê be, nêrîna we di wê barê de çi ye?” Wan gotin:

“Tu nêrînek me nîne, ya ku Mela Mistefa bêje, ew nêrîna me ye jî.”

Min gote wan, hûn her pênc wê gotinê dikin, em jî helwesta we ji bo dîrokê qeyd dikin. Hûn bênêrîn in, prensîpên bingehîn ên demokrasiyê wek piranî û kêmaniyê bin pê dikin. Û dibêjin: Ya ku Mela Mistefa bêje, ew nêrîna me ye jî, tevî ku dev ji polîtburoyê berdidim, lê ez ê wê yekê li ser we qeyd bikim. Piştre derketim, wan jî xwestin demkî endamtiya polîtburoyê ji min bê standin. Di encamê de endamtî ji min hat standin û heta kongreya çarem, ez di wê rewşê de mam.

❖ Standina demkiya erka te di kîjan salê de bû?

Biryara betalkirina demkî ya endamtiya min di konferansa 30’yê Hezîrana 1959’an de hat dayîn û heta kongreya çarem a PDK’ê di çarê Cotmeha wê salê de berdewam kir, ku li Bexdayê hat lidarxistin. Kongreyê ew biryar betal kir û neyasayî û nerast da zanîn û bangî min kir da ku di kongreyê de beşdar bibim.

❖ Piştî wan guhertinan PDK’ê çawa xwe bi rewşê re rêxist?

PDK’ê zêde pişta demokrasiya Ebdul Kerîm Qasim digirt, lê dijî iraqçîtiya wî bû, çimkî rê nedida Kurd dewa mafê xwe yê taybet bike.

Di wê çarçoveyê de, gotarek di rojnameya Xebatê de ser navê **“Gelê Kurd û madeya sêyem a destûra Iraqê”** hat weşandin, ku tê de behsa wê madeyê dihat kirin ya ku digot: **“Iraq beşek ji neteweya Ereb e.”**

Di wê gotara rojnameya Xebatê de, bi zelalî hatibû nivîsandin, **“Iraq beşek ji neteweya Ereb nîne, belkî gelê Ereb li Iraqê beşek ji neteweya Ereb e.”**

Paşê li ser wê gotarê, Mamoste Îbrahîm Ehmed hat darizandin, lê hejmarek ji parêzeran berevanî li wî kirin û di encamê de, hat beraetkirin, wê yekê gelek deng veda.

Çapemeniya Partiyê
Rojnameya Xebatê

❖ Çawa PDK’ê û rojnameya Xebatê îzina karkirinê standin?

Îzina PDK’ê û rojnameya Xebatê du tiştên ji hev cudan bûn. Piştî herfîna rejîma paşatiyê û avakirina Komara Iraqê, şandeyek mezin a Kurd bi serokatiya Mamoste Îbrahîm Ehmed çû Bexdayê û di serdana Efserên Azad de, serketina şoreşê li wan pîroz kir.

Piştî pêşkêşkirina gotareke dîrokî li ber avahiya wezareta berevaniyê, şandeya Kurd serdana tevahiya partiyên iraqî kir û karî piştî xebatek mezin, vê madeyê bixe nav destûra Iraqê, ya ku dibêje: **“Kurd û Ereb di welat de hevpar in û ev destûr mafên neteweyî destnîşan dike.”**

PDK’ê dixwest hevoka **“li ser bingeha xweseriyê”** lê zêde bike, lêbelê tu partî û aliyekî iraqî razî nebû, lewma ew xwest neket nav destûra demkî ya Iraqê.

Amadekirina destûrê ne li gorî nêrîna PDK’ê bû, belkî li gorî nêrîna Partiya Nişt imanî ya Demokratîk, Partiya Serxwebûnê û partiyên din ên Ereb hatibû amadekirin. Di wê çarçoveyê de rê hat dayîn, rojnameyek Kurd a siyasî ya taybetî xwe hebe.

Wê demê wezîrê çapemeniyê Sidîq Şensel bû. Kesatiyekî aqil û jîr yê Partiya Serxwebûnê dihat hesab û şêniyê Mûsilê bû, têkiliya wî bi Kurdan re baş bû û dihat gotin bi eslê xwe Kurd bûye.

Paş Şoreşa 14’ê Tîrmehê, partiyan dewa weşandina rojnameyê kirin. Me jî di wê çarçoveyê de îzina weşandina rojnameyê stand. Destpêkê îzina rojnameya Rizgarî û piştre jî, me îzina rojnameya Xebatê stand.

Eger şaş nebim, dema serdana Ebdul Kerîm Qasim, Mamoste Îbrahîm Ehmed daxwaza îzina weşandina rojnameya Xebatê lê kiribû. Lê îzina rojnameya Rizgarî her li ser razîbûna Sidîq Şensel hat dayîn.

Piştre dest bi weşandina her du rojnameyan hat kirin. Xebat bi her du zimanên kurdî û erebî dihat weşandin. Tevî çalakbûnê lê rojnameya Xebatê ji qonaxek xirab re derbas bû, di dest wê grupa alîgirê partiya komunîst de bû, bibû zurneya pesndayîna Partiya Komunîst a Iraqê.

Wek mînak; rojnameya Xebatê dinvîsî:

“Divê karker û cokarên Kurdistanê biçin nav partiya komunîst, beg û axa yên niştimanperwer û borjuwazî jî bên nav PDK’ê.”

Yanî PDK'ê bi xwe ji xelkê dixwest û digot: Neyêne nav partiyê. Manşêta rojnameya Xebatê di roja yekê Gulanê de, bi vî awayî bû: **"Silav li çîna karkeran a Iraqê û partiya wê ya pêşverû Partiya Komunîst a Iraqê."**

Wê hingê piraniya endamên serokatiya PDK'ê, kadro û endamên partiyê li dijî wê şêweya weşandinê ya rojnameya Xebatê bûn, ez di refa yekê de bûm çimkî hatibûm derkirin. Wê demê bêkar bûm, ez bajar bi bajar ji bo dijatîkirina wê grupê, digeriyam. Li dijî hilweşandina PDK'ê û wê nêrînê bûm, ku dixwest PDK bibe partiya beg û axayan. Ez di nav rêxistinê û welatiyan de diaxivîm. Min digot:

"Pêwîst e, em PDK'ê bikin partiya pêşverû, partiya karkeran, cotkar û rêncberên Kurdistanê û xwendewariya şoreşgerî."

Her wisa ez li dijî hilweşandina Yekîtiya Ciwanan, Xwendekarên Kuristanê û Yekîtiya Jinên Kurdistanê bûm.

Grupa alîgirê partiya komunîst, dixwest PDK'ê bike dêla Partiya Komunîst a Iraqê, lewma piraniya rêxistinên PDK'ê li seranserî Kurdistanê, li dijî serokatiya Hemze Ebdullah, Nejad Ehmed Ezîz, Xesrew Tofîq, Hemîd Osman û Salih Heyderî bûn.

Ji bilî Mela Mistefa tu kesekî din di nav partiyê de pişta wan nedigrit. Lê piştî ku navbera wan û Mela Mistefa jî têkçê, di civînekê de komîteya serokatiyê endamên wê grupê ji polîtburoyê derkir û li şûna wan kesên din danî. Bi vî awayî rojnameya Xebatê ket destê baskê şoreşger yê PDK'ê.

Xwedanîmtiyaz û sernivîskarê rojnameya Xebatê, Mamoste Îbrahîm Ehmed bû, lê piştî ku PDK'ê îzina weşandina fermî wergirt û dikarî rojnameyekê biweşîne, ji ber PDK'ê Mamoste

Îbrahîm Ehmed navê rojnameya xwe guhert û kir “**Kurdistan**”, ku rojnameyek rojane ya siyasiya kurdî- erebî bû, li Bexdayê dihat weşandin.

❖ Çend hejmarên rojnameya Kurdistanê hatin weşandin?

Pênc-şeş hejmarên rojnameya Kurdistanê hatin weşandin, piştre heftê carekê dihat weşandin, piştî heyamekê jî weşandina wê hat rawestandin.

Rojnameya Kurdistanê berdewamiya rojnameya Xebatê bû, ku pêştir dihat weşandin, lê hevokek nû lê hatibû zêdekirin, ew jî “**Organa Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK)**” bû û rojane li Bexdayê dihat weşandin. Sernivîskarê wê Mamoste Îbrahîm Ehmed bû, ku piraniya gotarên sereke yên rojnameyê, wî bi xwe dinvîsîn.

❖ Nivîskarên rojnameya Xebatê kî bûn?

Nivîskarên hertimî yên rojnameyê, Hîlmî Elî Şerîf, Dr. Seyîd Ezîz Şemzînî û ez bûm. Ciwanekî sûrî bi navê Xelîl Mihemed ba me bû. Lê bi burseya PDK’ê çû Moskowê û li wê der mijûlî xendinê bû.

Hwe wisa Hebîb Mihemed Kerîm, piştî nîvro li ser hinek pirsên navxwe dixebitî. Ebdul Mecîd Lotfî jî gotar dişandin, Cercîş Fethulla jî nivîskarekî din bû, ev çend kes nivîskarên sereke yên rojnameya Xebatê bûn.

❖ Yanî ji dema îzinwergirtinê rojnameya Xebatê bû organa PDK’ê?

Destpêkê rojnameya Xebatê tenê nûnertiya nêrîna PDK'ê dikir, çimkî ji aliyê PDK'ê ve dihat weşandin, xwedanê wê jî PDK bû. Kesên ku tê de babet dinvîsîn endam û dostên PDK'ê bûn.

Lê bi fermî li ser nedihat nivîsandin "**Organa Partiya Demokrat a Kurdistanê**", tevî ku bîr û nêrînên partiyê diweşand. Mijara organê paşê lê hat zêdekirin, dema ku Mamoste Îbrahîm Ehmed razî bû ji ber PDK'ê navê wê biguhere û bike rojnameya "**Kurdistan**".

Tevgera Şewafê li Mûsilê

❖ Destê PDK'ê di Tevgera Şewafê de hebû yan tenê jê agahdar bû?

Ebdul Wehab Şewaf, yek ji Efserên Azad yên serkêş û tundrê yên Iraqê bû. Ne neteweçî û ne jî rastgir bû, belkî zilamekî çepgirê şoreşgerê demokrat bû. Berê di nav Partiya Nîştimanî ya Demokratîk de xebat kiribû, serdemekê jî girêdayî Partiya Komunîst a Iraqê bû. Birayekî wî di kabîneya Ebdul Kerîm Qasim de wezîr bû.

Şewaf Fermandarê Hêza Parastina Mûsilê bû, ku **ji bilî Kerkûkê tevahiya navçeyên Kurdistanê di bin fermana wî de bûn**, ji ber wê yekê, gelek girîngiya posta wî hebû.

Ebdul Wehab Şewaf yek ji wan efserên tundrê bû, ku berî Şoreşa 14'ê Tîrmehê dixwest bi lezgînî dijî rejîma paşatiyê şoreş bê kirin, lewma hatibû dûrxistin û erk bi wî nedihat sipartin. Piştî şoreşê, xwe wekî zilmlêkirî dizanî, çimkî wek efserekî çeleng, jîr û fedakar rijd bû li ser herifandina paşatiyê.

Wê yekê gelekî dilê wî şikandibû, bi taybet ku Ebdul Selam Arif û Ebdul Kerîm Qasim nepenî li hev kiribûn ku Meclisa Serokatiya Şoreşê ava nekin. Ebdul Selam gotibû efserên xwe: **“meclisek wiha ava nakin, çimkî we şoreş nekiriye, belkî me kiriye.”**

Hinek kirdeyên zarokane û çepgirî yên komunîstan li Mûsilê bi taybet serederî yên Ebdul Kerîm Qasim û girîngî nedayîna wî bi Efserên Azad ên berê, bûne sedema nerazîbûn û acizbûna Ebdul Wehab Şewaf, da ku xwe wekî rizgarîkerê Iraqê bibîne û bikeve vê hizrê ku Iraq bi destê wî tê rizgarkirin. Ji ber wan sedeman, guhertin di mejiyê Şewaf de çêbû.

Di serdana Ebdul Kerîm Qasim de li Bexdayê, Şewaf daxwaza veguhestina erka xwe bo Bexdayê kiribû û gotibû:

“Ricayê dikim, min venegerîne Mûsilê, çimkî Kongreya Ensar el-Selam li wê derê tê lidarxistin, ku girêdayî partiya komunîst e, ji ber ku tevahiya grupan li Mûsilê ne, tirsa derketina şer heye.”

Her wisa Şewaf gotibû Ebdul Kerîm:

“Pêştir ew di nav Ensar el-Selam de bûye û wan hez dike, lê bila li Mûsilê kongreyê li dar nexin, berevajî şer dê derkeve, ew jî nikare ewlekariya kongreyê garantî bike.”

Lê Ebdul Kerîm Qasim her rijd bûye li ser lidarketina wê kongreyê li Mûsilê, ji ber wê yekê Şewaf jê xwestibû, wî venegerîne Mûsilê, lê Ebdul Kerîm ew daxwaz jî qebûl nekiribû.

Nêrînek Ebdul Kerîm Qasim hebû û digot: **“Bila ew biçin Mûsilê û li wê derê şer û alozî derkeve, piştre ez ê biçim bitemirînim.”** Lê her wê nêrînê stûyê wî şikand.

Ji aliyê din ve, Mela Mistefa ji riya Wahîd Bamernî efserê Kurd yê li îstixbaratê, hajî pirsê hebû û dizanî efserên neteweçî li Mûsilê dixwazin darbeyê bikin, lewma gotibû Ebdul Kerîm Qasim, plana wan efseran ya darbeyê heye.

Bi nêrîna min, eger Ebdul Kerîm Qasim nexwestiba ew filaket li Mûsilê biqewime, Ebdul Wehab Şewaf venedigerand, gazî wan efseran ji bo Bexdayê dikir yan didagirtinê, bi wî awayî aloziya Mûsilê nediqewimî.

Şewaf bê dilê xwe û aciz vegeriya, cemaeta Tevgera Ensar el-Selam jî çûn Mûsilê û amadekarî ji bo lidarxistina kongreyê kirin, di encamê de xelkê Mûsilê û neteweçiyan dijî wan serî hildan, ku bi navê “Tevgera Şewafê” hat naskirin.

Lezgîniya di tevgerê de û amade nebûna neteweçiyan bûne sedem, da ku di radyoyê de jî ev yek bê weşandin, ku Tevgera Şewafê bi hevkariya Komara Erebî ya Yekbûyî tê kirin.

Yên tevlî Tevgera Şewaf bibûn, digotin: Me biryar daye bi hevkariya Nazim Tebeqçelî li dijî dîktatorî û xweseriya tekane serî hildin. Lê Nazim Tebeqçelî hajî tu tiştekî nebû. Li mala xwe wê nûçeyê ji radyoyê dibihîze, dema ku êdî mesele teqiyabû. Piştre eşkere bû, piraniya beşdaran cemaeta Ensar el-Selam bûne, ku çûbûn Mûsilê, lê piraniya wan hatibûn girtin û hejmerek jî hatibûn kuştin.

Di wê navberê de Kamîl Qizancî kestiyê niştimanperwerê pêşveroyê kristiyanî, ku yek ji serokên Tevgera Ensar el-Selam bû, di girtîgehê de tevlî çend kesên din hat kuştin. Êdî xelk dijî Tevgera Şewafî rabûn ser piyan, hevdem balafirên şer ên

artêşê cemaeta Şewafê bombebaran kirin. Paş wan bûyeran xelkê li dijî efseran serî hildan.

Alîgirên PDK'ê, partiya pomunîst û yekîtiya nîştimanî ya demokratîk jî, li dijî wan efseran derketin, bi awayekî kesek Ebdul Wehab Şewaf dikuje, dema ku ew bi birîndarî çûbû dermanxaneyê.

Bi vî awayî dawî bi Tevgera Şewafê hat. Ya rast tevgerek nerêkûpêk û bêwext bû. Lê ya ecêbmayînê ev bû, Ebdul Wehab Şewaf wek kesekî pêşverû û demokratê çepgir, serokatiya tevgerek neteweçîtiyê dikir, her çend bi xwe neteweperest nebû.

❖ Bûyera Şewafê kîjan salê qewimî?

Di 8'ê Adara 1959'an qewimî. Di wê bûyerê de Kurdan êrişî Ereban, xiristiyaniyan êrişî misilmanan hejaran êrişî dewlemandan, komunîstan êrişî Beisiyan, wan jî êrişî komunîstan kirin, di encamê de rewş teqiya. Tevî ku nikarim bêjim:

"Bûyera Şewadê ji aliyê serokatiya Partiya Komunîst a Iraqê ve hatibû rêxistin û rêvebirin, lê roleke mezin a kadroyên nevçeyan ên Partiya Komunîst a Iraqê di qewmîna bûyerê de hebû."

Ew siyaseta tundûtîj a çepgiriya partiya komunîst, ji binî ve şaş bû. Wekî dozgeran hikum didan tevî ku dozger nebûn, biryar jî di dest wan nebû. Di encamê de li Mûsilê gelek kirdeyên kirêt hatin kirin, piranî jî bertek bûn. Çawa ku nivîskareka amerîkî dibêje: **"Eger birînên bin post neyên dermankirin, piştre diteqin."**

Destê hinek eşîrên Kurd bi fermana Mela Mistefa di wê bûyerê de hebû. Ya rast ez haj pê nebûm, çimkî him li kolejê

bûm, him jî erka min di nav PDK'ê de demkî hatibû rawestandin**.** Ji ber wê sedemê, tu berpirsyariyek min di nav partiyê de nebû. Tenê hajî vê yekê hebûm, ku Mela Mistefa ji eşîrên Kurd û Barzaniyan xwestiye: **"Di nehîştina Tevgera Şewafê de alîkariya Ebdul Kerîm Qasim bikin."**

Bi wî rengî, Kurd di nehîştina Tevgera Şewafê de beşdar bû, lê ne bi navê PDK'ê.

❖ Sedema qewimîna aloziya 1959'an a Kerkûkê çi bû?

Aloziya Kerkûkê di 14'ê Tîrmeha 1959'an de qewimî. Dema destpêbûna aloziyê jî, tu berpirsyariyek min di nav PDK'ê de nebû. Tevî wê yekê, hinek hevalan xwestin nêrîna min bizanin, lê min got: Ew tevger kirdeyek gelek xirab e. Lwema me Omer Debabe şandibû Kerkûkê, da ku nehêle Kurd di wê aloziyê de beşdariyê bikin.

Em di vê baweriyê de bûn, nabe Kurd di tevgerên bi wî awayî de beşdariyê bikin. Ya rast ew alozî ser xwesta serokatiya partiya komunîst hat kirin, lê Kurd jî tê de beşdar bûn.

Hinek ji kadro û endamên PDK'ê jî tê de beşdar bûn, wek Mela Mator, wî du-sê otomobîl jî revandibûn, lê Omer Debabe rexne jê girtibû û ew çend otomobîl dabû vegerandinê. Kekê Debabe gotbûyê: **"Nabe em kirdeyêm wiha bikin, ev kirde talankirine, wê demê em çawa dikarin behsa biratiya Kurd û Tirkmenan bikin."**

Aloziya Kerkûkê bû sedem, da ku Ebdul Kerîm Qasim him ji aloziya Mûsilê û him jî ji ya Kerkûkê aciz bibe. Di gotarekê de li "Dêra Mar Yûsif" li Bexdayê, wî cara yeke her du aloziyên ku

li Mûsil û Kerkûkê qewimî bûn, protesto kir û got: **“Ew bûyer li dijî şoreşê û dijî yasayê ye û nabe bê dubarekirin.”**

Ew alozî bû destpêka têkçûna têkiliyên Ebdul Kerîm Qasim û partiya komunîst.

Destpêka Nakokiyên Ebdul Kerîm Qasim û PDK’ê

❖ Kengê nakokiyên Qasim û PDK’ê destp pê kirin, sedem çi bûn?

Ji bo ku em bi wîjdan û însaf bala xwe bidin têkiliyên navbera PDK’ê û Ebdul Kerîm Qasim, divê em van xalan berçav bigirin:

1. **Têkiliya Ebdul Kerîm Qasim û Mela Mistefa**
2. **Têkiliya Ebdul Kerîm Qasim û PDK’ê wek partiyek siyasî**
3. **Têkiliya Ebdul Kerîm Qasim û PDK’ê wek bîr û bawer**

Bi nêrîna min û gelek kesên wê serdemê, têkiliya Ebdul Kerîm Qasim û Mela Mistefa bi awayekî gelek nerast û nerewa hatibû danîn. Mela Mistefa her ji roja yekem a hatina xwe ve digot:

“Ez leşkerê Ebdul Kerîm Qasim im, di dinyayê de tenê du kes hene ku bi awayekî mutleq bi wan dikim, yek Şêx Ehmed e û yê din jî Ebdul Kerîm Qasim e.”

Di xwenîşandanek girseyî de jî ku Li Silêmaniyê ji bo pêşwaziya wî hatibû rêxistin, Mela Mistefa got: **“Ez leşkerê serok Ebdul Kerîm Qasim im.”**

Ez yek ji wan kesan bûm, kêfa min ji vê yekê re nehat di peyama Newroza wê salê de, ku min bi xwe xwend, tê de

behsa Mela Mistefa wek Serokê Gelê Kurd dihat kirin. Ev jî di demekê bû, pêştir min wêneyeke wî belav kiribû û li ser pişta wêneyê nivîsîbû: **“Serokê mezin yê gelê Kurd General Mistefa Barzanî.”**

Mela Mistefa ji ber belavkirina wê wêneyê ji min aciz bibû. Di ahenga Newrozê de, Mamoste Hejar jî helbestek xwe di wê barê de xwend**.** Êdî vê carê Mela Mistefa zêde ji me her dukan aciz bû. Em ji vê tirsiyan di nav ahengê de li me aciz bibe. Lewma piştî xwendina gotar û helbestê, ez û Mamoste Hejar bilez ji hola ahengê derketin.

Gelek cihan Mela Mistefa digot: **“Ez serok nînim! Ez leşkerê Ebdul Kerîm Qasim im.”**

Me dixwest bêjinê: Tu serokê partiya neteweya duyem li Iraqê yî, Ebdul Kerîm Qasim jî serokê tevahiya Iraqê ye, ji bo me ne pirsgirêk e, ew serokê serokê me be, lê nabe tu leşkerê wî bî! Lê Mela Mistefa digot: **“Nexîr, ez leşkerê Ebdul Kerîm Qasim im.”**

Heyamek dirêj Mela Mistefa li ser wê nêrînê bû, lewma carekê xwedê jê razî Ewnî Yûsif gotê:

“Erê Cenabê Mela Mistefa pileya te nehat bilind kirin, nebûyî cîgirê serleşker? Ev çend sal in tu her di pileya leşkariyê de mayî.”

Wê hingê Mela Mistefa gelek rojan serdana wezareta berevaniya Iraqê dikir û bi gotina Ebdul Kerîm Qasim dikir. Hewl dida Ebdul Kerîm razî bike, da ku alîkariya avadankirina gundên navçeya Barzan bike û çekan jî bide Barzaniyan.

❖ Ger têkiliyên wan baş bûn, wê demê sedema têkçûnê çi bû?

Têkçûna têkiliyên Ebdul Kerîm Qasim û Mela Mistefa ji dema kuştina Ehmed Axayê Zêbarî di 14'ê Mijdara 1959'an de, dest pê kir. Ehmed Axayê Zêbarî yek ji begên xwînrêj ên eşîra Zêbarî bû. Ji Barzaniyan gelek kes bi neheqî kuştibû. Yek ji wan kurê "Olo Beg" qehremanê şoreşa Barzan bû, ku şevekê dabû kuştin.

Wê kuştinê bandorek mezin li Mela Mistefa û Şêx Ehmed kir, di encamê de wan bi tundî dest bi dijatiya eşîra Zêbarî kirin.

Wê hingê Şêx Ebdul Silêman kurê Şêx Ebdul Selam Barzanî hevrikiya Mela Mistefa dikir û digot: Qaşo Mela Mistefa di bin bandora hevjîna xwe Hemayîl xanim keça Mehmûd Axayê Zêbarî de ye.

Ev jî di demekê de bû, Mela Mistefa li Bexdayê pêşwazî li Mehmûd Axayê Zêbarî kiribû û alîkarî jî dabûyê. Ew karê Mela Mistefa bû sedem Şêx Ehmed jê aciz bibe, lewma Mela Mistefa ji bo razîkirina Şêx Ehmed, bi tundî dest bi dijatiya Zêbariyan kir û soz da Şêx Ehmed ku tola kurê Olo Beg hilde.

Nakokiyên Qasim û Barzanî

❖ Mela Mistefa çi sozek dabû Şêx Ehmed?

Mela Mistefa sê kes ji zilamên xwe bi navên Nege Ser Asin, Îsa Siwar û Mela Hesen, şandibû Mûsilê, piştre wan Ehmed Axayê Zêbarî kuştin, hikûmetê jî fermana girtina wan da.

Wek PDK me dixwest pirsgirêk bi riya darazê bê çareserkirin, Mamoste Îbrahîm Ehmed û hejmarek parêzerên din amade bûn, da ku berevaniyê ji wan bikin. Lê Mela Mistefa bi riyek din ew pirsgirêk çareser kir, ez bi xwe şahidê wê yekê bûm.

Dema birîndarbûna Ebdul Kerîm Qasim di êrişekê de, min û Mela Mistefa li nexweşxaneyê serdana wî kir. Ebdul Kerîm ji hatina me kêfxweş bû. Behsa bûyera kuştina Ehmed Axayê Zêbarî hat kirin. Mela Mistefa got: Xelk hatine girtin.

Ebdul Kerîm Qasim jî wek serokê encumena wezîran axivî û got: **"Tawanek hatiye kirin û kesek hatiye kuştin, divê ji aliyê darazê ve bê çareserekirin, bila em li bendê bin da ku bibînin daraz çi biryarekê dide [21]."**

Mela Mistefa got**: "Wele min ew kar kiriye û min ew çend kes şandibûn."** Di hember de Ebdul Kerîm Qasim got:

"Na Mela Mistefa te neşandiye tu zilamî û karên bi vî awayî nakî, tu dostê minî û li dijî yasayê naxebitî, bêguman kîn di dilê wan sê xortan de hebûye."

……

[21] Bi fermana **Mela Mistefa** serokê eşîra Xoşnaw **Sidîq Mîran** di riya navbera Korê û Şeqlaweyê **hat kuştin**, ku têkiliyek wî ya baş bi Ebdul Kerîm Qasim re hebû. Kuştina Sidîq Mîran û Ehmed Axayê Zêbarî, wek du serokên eşîrên dostê Qasim **wek dijatîkirina hikûmeta wî dihat zanîn**.

Vê carê Mela Mistefa got:
“Nexêr, min ew şandibûn, wan bi fermana min ew kar kirine.”

Ebdul Kerîm Qasim li ser Mela Mistefa de qîjiya û got: **“Nexêr te kes neşandine.”**
Ebdul Kerîm Qasim gelek bi acizî bersiv da. Bi rastî Mela Mistefa li benda acizbûneke wiha nebû, tevî ku tiştek negot, lê
gelekî nerehet bû. Ebdul Kerîm Qasim got: **“Yasa û edalet heye û edaket li ser her kesî re ye, ew ê werin darizandin.”**
Bi nêrîna min ev destpêka têkçûyîna têkiliyên Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim bû.

❖ Ya ku tu behsa wê dikî kengê bû?

Piştî ku roja 7’ê Cotmeha 1959’an li Res el-Qeriye êrişa çekdarî li dijî Ebdul Kerîm Qasim hat kirin, eşîra Zêbarî û hinek eşîrên din serdana wî kirin û gotin: Tên çewsandin, cemaeta Barzaniyan wan dikujin, gazinde jî kiribûn, wî çek dane Barzaniyan lê nedaye wan. Di hember de Ebdul Kerîm Qasim hejmarek çek dabû Zêbariyan û gotibû: Ev çek tenê ji bo xweparastina we ye. Mela Mistefa gelekî ji dayîna wan çekan tore bibû, çimkî xwe wekî leşkerê Qasim dizanî û bawer nedikir ku wiha hêsan wî bifroşe caşan.

Em vegerin nexweşxaneyê, piştî wê torebûnê Ebdul Kerîm Qasim, bi aramî axivî û hinek gotin anîn bîra Mela Mistefa û got:

“Mela Mistefa, bîra te tê ku ji Misrê hatî, min ji te re got: ‘Piştî bicihbûna Komara Iraqê divê em hemû bira bin, divê kîn û dijmnnatiya kevin nemîne,’ divê tu niha wek serokê partiyekê û

serokê neteweyekê serderiyê bikî ne wek serokê eşîrekê. Pêwîst e tu wan eşîran bibaxşînî, ku şerê te kirine. Divê tu xelkê komî dor hev bikî û wan li hev bînî, biratiyê navbera wan de çê bikî, nek dijminatiyê vejînî."

Piştî wê yekê hêdî-hêdî têkiliyên navbera Mela Mistefa û hikûmetê têk çûn, di hember de hikûmetê dest bi alîkarîkirina Zêbariyan kir.

Sedema duyem a têkçûna têkiliyên Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim, girîngîdayîna zêde ya Mela Mistefa bi serokê eşîran û wan axa û began bû, ku di encama reforma çandiniyê de ziyan dîtibûn. Di encamê de, wan serokên eşîran, axa û began êdî xwe mezin didîtin lewma ketin hizra hevdîtina Ebdul Kerîm Qasim bi wê meremê di nav xwe de şandeyek pêk anîn û şandin Bexdayê.

❖ Wek kesên demokrat û çep çi rolek we di wê pirsgirêkê de hebû?

Me li dijî wê helwesta wan axa û began û zilamên Nûrî Seîd, gotarek weşand û tê de zelal kir gelo destê Înglîz tê de heye? Destê Kolonyalîzmê tê de heye? Çima di qonaxek hesas wek niha de, helwestek wiha li hember komareke nûavabûyî digrin ber? Me bal kişand ser vê yekê, çi rolek wan nemaye, ew qet dostê Kurd nebûn, tu deman jî kurdperwer nebûn. Her tim kevneperest, sîxur û xayîn bûne û dostaniya Nûrî Seîd, Salih Cebir û kesên mînanî wan kirine.

Him Mela Mistefa, him ew axa û beg û him jî yên bi wan re bûn, ji vê gotarê aciz bûn. Zeyd Ehmed Osman, Mesûd Mihemed û Heme Xaneqa ji gotarê dilgiran û aciz bûn ku xwedî

bîr û nêrîna rastgir bûn û hinekên din jî kevnenûnerên Nûrî Seîd bûn. Lê Kake Heme û Kake Ziyad ji ber me biguman bala xwe didan wê pirsgirêkê. Lê Mela Mistefa pişta wan digirt.

Ebdul Kerîm Qasim jî, ji ber wê helwesta Mela Mistefa aciz bû û digot:

Çima Mela Mistefa rê nîşanî wan axa û kevneperestan dide û pişta wan digre? Hêdî-hêdî nakokiya navbera Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim, kûrtir bû di dawiyê de teqiya.

Di wê rewşê de, Mela Mistefa ji bo beşdariya salvegera Şoreşa Oktoberê ya Yekîtiya Sovyetê hat vexwendin. Lê serdana wî ji şeşê Mijdara 1960'an dest pê kir û heta 13'ê Kanûna 1961'an kişand. Ya rast Mela Mistefa ji bo alîkarî xwestinê çû Sovyetê, lê vexwendina wan ji bo ve yekê bû, ku şîretan li Mela Mistefa bikin, da ku dijatiya Ebdul Kerîm Qasim neke û dostaniya wî bike. Her çend biryar bû, ez di serdanê de bi wî re bam, lê pasport nedan min û Mela Mistefa tenê çû.

Li wê derê Sovyetiyan jê xwest bûn têkiliyên xwe bi Ebdul Kerîm Qasim re têk nede. Dema ku ew vegeriya, wan hinek pere dabûnê, lê Mela Mistefa ditirsiya ku li balafirxaneyê wan pereyan jê pistînin. Lewma em çûne nav balafirxaneyê, du çente pê re bûn, me jê wergirtin û ji rêyek din ve anîn derve û me nehîşt biçe sehkirinê. Dema ku polîs hat, min gotê: "Ew Mela Mistefa ye, Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê û serokê gelê Kurd e, pêwîst bi sehkirinê nake."

Piştre, Mela Mistefa serdana Ebdul Kerîm Qasim kir û gotê: Li hember çekên ku wan berê teslîmî Yekîtiya Sovyetê kiribûn,

wek qerebû pere danê, lê ji ber ku têkiliyên Mela Mistefa û Qasim têkçûbû, êdî bi wan karan baş nedibû.

Wê demê, hinek serokên eşîrên Kurd ji bo Mela Mistefa têkilî bi Îranê re danîbûn. Yek ji wan Hebas Axayê Mamend Axa bû, ku ji ber xizmatiya bi Elî Ebdullah re, ji aliyê wî ve çûbû serdana Kolonel Kerîm Verehram[22] ku wê demê hakimê parêzgeha Urmiyeyê bû.

Kolonel Kerîm Verehram soz dabûyê, eger tevgerekê bikin, wê demê Îran dê alîkariya wan bike. Piştre belgeyan nîşan dan, di wê serdemê de balyozê Brîtanyayê yek-du caran bi Mela Mistefa re hevdîtin kiriye.

Di wê barê de Ubeydullah Barzanî kurê Mela Mistefa gotibû Hîlmî Elî Şerîf, ku bavê wî (Mela Mistefa) du caran balyozê Brîtanyayê dîtiye.

Carekê Şêx Ehmed Mela Mistefa biriye cem balyozê Brîtanyayê û carek din jî balyozê Brîtanyayê aniye cem Mela Mistefa.

Piştî belavbûna gotinên balyozê Brîtanyayî, derket Mela Mistefa û Şêx Ehmed ji Brîtanyayê xwestbûn, wan biparêze û alîkariya wan bike.

……

[22] Kolonel Kerîm Verehram fermandarekî leşkerî û siyasetmedarekî îranî bû. Kerîm Verehram di sala 1909'an de li **gundê Bedel Awayê girêdayî bajarê Xoyê** (**Kelaxwê**) li Parêzgeha Urmiyeyê, di malbatek **tirk** a cotkar a dewlemend de ji dayik bûye.

Kerîm Verehram di sala 1927'an de derbasî Koleja Leşkerî bû û piştî wergirtina pileya efseriyê, ji bo **Leşkergeha Mihabadê** hat veguhestin. Ji ber şiyana leşkeriyê, Verehram di sala 1944'an de **bi pileya kolonel bû serokê serkana liqa Artêşa Îranê li Parêzgeha Urmiyeyê**.

Dewam dike →

Lê balyozê Brîtanyayê bersiv dabû: “**Niha wek berî nikarin li Iraqê tiştekî bikin, lê ew her du teşwîq kiribû, ku li dijî hikûmeta Iraqê bixebitin.”**

Hinek kes dibêjin: Brîtanya û hinek welatên din dixwestin karekî bikin da ku Kurd û Mela Mistefa dijatiya hikûmeta Iraqê bikin û bi wê yekê Ebdul Kerîm Qasim bikeve bin fişarê û bikarin wî ji desthilatê rakin.

Paş vegera Mela Mistefa ji Sovyetê, Ebdul Kerîm Qasim wek berê rû nedidayê: Piştî wê rewşê, Mela Mistefa Bexda bi cih hîşt û çû navçeya Barzan û li wê derê nîştecê bû.

Têkiliyên Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim bi vî awayî têkçû. Qasim li gelek cihan bi xirabî behsa Mela Mistefa dikir.

❖ Mesûd Barzanî di prtûka “Barzanî û Tevgera Rizgariya Kurd” de dibêje: “Sovyetiyan soz dabûn di serdan yekem a Barzanî de çekan jê re bişînin? Tu çi dibêjî?

Nexêr, tiştekî bi wî awayî nebû. Berevajî Sovyetiyan dixwestin Kurd bi Ebdul Kerîm Qasim re pêk were.

……

→ Dewama [22]

Paş hingê Verehram ji sala 1948’an-1953’yan fermandarê liqa Artêşa Îranê li Parêzgeha Urmiyeyê bû.

Hikûmeta şahê Îranê Kolonel Kerîm Verehram **ji bo kontrolkirin û serkutkirina navçeyê û lawazkirina dengê netewexwaziya gelê Kurd û çavdêrîkirina serkirdeyên xwecihî şandibû Mihabadê**.

Di nav xelkê de wek **hakimekî tundûtîj û xirab** tê naskirin û dibêjin; **Gelek caran rê li ber xwendinê, weşandin û civînên taybetî gelê Kurd digirt**.

Di dawiyê de, li **sala 1978’an** ji aliyê General Oveysî ve wek **waliyê** rejîma şahê Îranê yê dawî ji bo **Parêzgeha Urmiyeyê** hat destnîşankirin. Lê **piştî du mehan wî îstifa kir û çû Fransayê**. Kerîm Verehram sala 1991’an di 82 saliyê de li Parîsê wexera dawî kir.

Ji ber ku piştî serdana Moskowê Barzanî ditirsiya Sovyet rê nede vegere Iraqê. Lewma me planek danî û jê xwest ji bo beşdariya konferansa PDK'ê
vegere. Derbarê alîkariyên Sovyetê jî dikarim bêjim: Wan bi pere alîkariya me dikirin, ne bi çek û cebilxaneyan.

❖ Her di wê pirtûkê de Mesûd Barzanî dibêje: Barzanî sê hezar çek bi pereyê Sovyetê kiriye?

Tu bingehek wê nîne, çimkî heta sala 1963'yan hetta tevahiya Şoreşa Kurd xwedanê sê hezar çekan nebû. Ji bilî wê yekê hetta hejmara çekdarên me jî ew qas nebû. Her wisa pereyên ku Sovyetê dida me, ewqas zêde nebû ku em bikarin, wê hejmara zêde ya çekan pê bikirin.

Barzanî û Brîtanya

❖ Têkiliya Barzanî û Brîtanyayê çawa û kengê dest pê kir?

Rojekê Ezîz Eqrawî ku efserê îstixbarata firqeya sêyem bû, her wisa endamê PDK'ê bû, bi lez hat bargeha partiyê û got: Îro wek zabitên firqeya sêyem, wan serdana Ebdul Kerîm Qasim kirine. Wî di civînê de gotiye:

"Di navbera Mela Mistefa û Brîtanyayê de têkilî heye, di wê barê de belge hene û min hemû xwendine."

Piştî wê civînê, Ebdul Kerîm Qasim ew belge û name belav kirin, ku Mela Mistefa ji zabitên brîtanî re şandibûn. Her wisa Ebdul Kerîm Qasim gotibû:

“Belge nîşan didin ku Mela Mistefa zilamê Brîtanyayê ye û bi xwesta Brîtanyayê tevdigere, dijî artêşa Iraqê ye, tevî ku min pêştir ew baxşand û anî, lê bêfayde bû. Dest bi tevgerê kiriye û têkilî bi axa û began re daniye, ji ber wê yekê ez neçar im rojekê wan belgeyan li ser wî belav bikim.” Piştre di axaftinekê de Ebdul Kerîm Qasim behsa vê yekê kir:

“Her tim Brîtanya li dijî artêşa Iraqê bûye û xwestiye artêşê lawaz bike. Avakirina Tevgera Bekir Sidqî li sala 1936’an di wê çarçoveyê de bû. Carek din sala 1941’an xwest li artêşa Iraqê bide, ango xwestiye her tim artêşa Iraqê gîro û lawaz bike. Armanca serhildana hinek tevgerên cudaxwaz li Kurdistanê jî, lawaz kirina artêşa Iraqê bû.”

Di berdewamiya axaftina xwe de, Ebdul Kerîm Qasim got:

“Eger ez wan belgeyan belav bikim, rûyê wan kesan û kurê wan reş dibe yên behsa nîştimanperweriyê dikin. Dê şerm bikin bên nav xelkê, çimkî xizmetkirina wan a ji bo împeryalîzmê û Brîtanyayê eşkere dibe.”

Tevî ku bi temamî me nedizanî belge hene yan na? lê me wek PDK bersiv da wan gotinên Ebdul Kerîm Qasim. Ew bersiva me ya tund di rojnameya Xebatê de hat weşandin.

Di berteka gotinên Serokê Encumena Wezîran a Iraqê (Ebdul Kerîm Qasim) de, me behsa wan tevgeran kir û got:

“Wan tevgeran ne tenê xizmeta kolonyalîzmê nekirine, berevajî tevahiya wan tevgerên kurdî li dijî kolonyalîzmê bûne lewma ji aliyê kolonyalîzmê ve hatine serkutkirin.”

Her wisa me behsa vê yekê jî kir:

“Çawa Tevgera Şêx Mehmûd ji aliyê General Frayzer ve hat jinavbirin.” Me bi bîr anî:

“Wê demê artêşa Iraqê hêzeka bê ser û ber bû. Hêza Mûsa Kazim ji 200-300 çekdaran pêk dihat, xîret nedikirin ji Bexdayê derkevin. Lê hêzên Brîtanyayê çûn ser Şêx Mehmûd, di encamê de hejmarek mezin ji welatiyan canê xwe ji dest dan û birîndar bûn, Silêmanî hat bombebarankirin û Brîtanyayê bi darê zorê Kurdistan xist nav sînorên Iraqê.”

Her wisa me diyar kir:

“Şoreşa Barzan jî di encama bombebaranên balafirên şer ên Brîtanyayê de hat serkutkirin, lewma mafê kesî nîne zirtan bike qaşo wan tevgerên kurdî serkutkirine. Yan jî ev ne cihê şanaziyê ye ku di bin fermandariya General Ringney yê brîtanî de, biçe devera Barzan dagîr bike.”

Me got: Em bêminet in her belgeyek heye, belav bikin. **Ya rast me nedizanî belge heye**! **Me wisa dizanî hemû propaganda û derew in**.

Têkiliyek baş a Ebdul Kerîm Qasim bi serokatiya PDK’ê bi taybetî jî Mamoste Îbrahîm Ehmed re nebû, çimkî wî mafê xweseriyê dixwest, Ebdul Kerîm jî iraqçî bû. Mamoste digot:

“Iraq li ser bingeha kolonyalîzmê û ji aliyê Brîtanyayê ve hatiye avakirin.”

Lê piştî ku PDK’ê derbarê plana hevpar a Brîtanya û Îranê ya dijatîkirina Komara Iraqê agahî bi dest xist û Mamoste Îbrahîm Ehmed, ew agahî gihand Ebdul Kerîm Qasim, kêmekî navbera wan baş bû.

Ebdul Kerîm eşkerekirina wê planê ji aliyê PDK'ê ve wek dilsozî û hezkirina Komara Iraqê da zanîn. Ew jî li cem Ebdul Kerîm Qasim hemû tiştek bû. Ebdul Kerîm li ser wê wêneyê ya ku wê hingê digel Mamoste Îbrahîm Ehmed kişandibû, bi vî awayî nivîsî bû:

Bira Mamoste Îbrahîm Ehmed, spas ji bo dilsoziya wî ya mezin a ku ji Komara Iraqê ya hertimî re heye.

(الى الاخ الاستاذ ابراهيم آحمد تقديرا لاخلاصة الكبيرللجمهورية العراقية الخالدة)

❖ We çawa dixwest nakokiyên PDK'ê û Ebdul Kerîm Qasim çareser bikin?

Derbarê têkçûna navbera Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim, **du nêrîn di nav PDK'ê de hebûn:**

Nêrîna yekem a Ewnî Yûsif bû. Bi nêrîna min dema wê yekê hatiye mirov bêje, da ku nivşên paşerojê rastiyê bizanin.

Ewnî Yûsif endamê serokatiya PDK'ê bû. Bi fermana Mela Mistefa hatibû hilbijartin û bibû wezîr. Rojekê Ewnî Yûsif got: Hevalno Mela Mistefa karên xirab dike, ji ber van sedeman:

Yekem: Komkirina eşîran, xwedîkirina axa û began.

Ev kirdeya wî li dijî bîr û bawera me ye, dijî tevahiya wê xebatê ye ku bi dehan sal in PDK dike.

Duyem: Li dijî bîr û bawera me ye.

Sêyem: Li dijî komarê ye.

Çarem: Li dijî pêşveroyê ye.

Ewnî Yûsif got: Mela Mistefa wek PDK an kurdperwer tu bihayekê nade me, lewma divê em ji wan kirdeyên wî re çarçoveyekê dayînin û bêjnê: Em nêrîn û reftarên te baş nabînin.

Nêrîna duyem a Mamoste Îbrahîm Ehmed bû û digot: Ebdul Kerîm Qasim dixweze bêtifaqiyê bixe nav partiyan. Çawa ku bibû sedema parçebûna Partiya Nîştimanî ya Demokratîk.

Digot: Niha dixwaze wê bêtifaqiyê bine serê PDK'ê jî û me û Mela Mistefa ji hev cuda bike û her yekî ji me di aliyekê de bibe. Ev siyaseta çêkirina bêtifaqiyê ye, nabe em bihêlin bi me bilîze.

Wek hevalên polîtburoyê me pişta nêrîna Mamoste Îbrahîm Ehmed digirt û digot: Nabe em pişta Mela Mistefa berdin.

Barzanî û Partîtî

❖ Barzanî wek serok bi PDK'ê re çawa serederî dikir?

Heta sala 1960'an ku PDK'ê îzna fermî ya xebata siyasî stand û di pêncê Gulana 1960'an de kongreya pêncemîn li dar xist, Mela Mistefa razî nebû ji bo beşdariya kongreyê ji devera Barzan were Bexdayê.

Ji ber wê yekê şandeyek partiyê çû devera Barzan û ji Şêx Ehmed xwest bi Mela Mistefa re biaxive û wî razî bike da ku di kongreyê de beşdar bibe. Dema beşdariyê, Mela Mistefa di nav kongreyê de gelek gotinên kirêt kirin. Gelekî li dijî hizbatiyê axivî. Got: **"Hizib (partî) bela ye, sedema bêtifaqiyê ye, hizbatî yanî têkdana gelê Kurd."**

Mela Mistefa berê xwe da Ebdullah Mam Resûl ku xelkê Qeladizê û kadroyê partiyê li Pişder bû û gotê: Kurê sê, kurê kerê, bêşeref çima axa tê bargeha partiyê tu derdikî?

Wî jî got: Min kî der kiriye? Mela Mistefa got: Te Mîna Axa derkiriye. Ebdullah bersiv da:

"Qurban navûdengê Mîna Axa gelekî xirab e, eger Mîna Axa bê bargeha partiyê û xelk me wek partiya kesên wek Mîna Axa bi-zane, tu kes bi me re namîne!"

Mela Mistefa gotê: Kurê seyê wek te bi me re namîne. Hezar gotinên kirêt gotê, ji ber ku axayek derkiribû.

Di berdewamiya axaftina xwe ya di nav kongreyê de Mela Mistefa got:

"**Yên ku hûn jê re dibêjin axa û beg, ez hejî wan dikim, ew Kurd in. Got: Wele razî me bêjne min bibe filan tiştî… , lê nebêjin bibe hizbî. Bêjne min biçe filan cihê xirab … gelek çêtir e, bêjin biçe baregeha partiyê."**

Keko dev ji min berdin[23]**!**

Ji ber wan serederiyan, civîn têk çû û hejmarek ji xortên kerk-ûkî ji civînê vekişiyan. **Ewnî Yûsif got: "Hevalno werin em di kongreyê de bêjnê: Xatirê te, bila biçe."**

Ya rast Mamoste Îbrahîm Ehmed her li ser nêrîna xwe ya kevin bû û digot: Ebdul Kerîm Qasim dixwaze di nav me de bêtifaqiyê çê bike.

……

[23] Di hevpeyvînekê de bi rojnamevanê brîtanî David Adamson re, dema destpêka nakokiyên navbera polîtburoya PDK'ê û Barzanî, di bersiva pirsekê de gelo ew serokê PDK'ê ye? Mela Mistefa Barzanî dibêje: **Ez serokê PDK'ê nînim**, Ebdul Kerîm Qasim bi zorê ew berpirsyarî xistiye stûyê wî.

Bitaybetî ku Ewnî Yûsif ji encumena wezaran hatibû, em wisa difikirîn ku hikûmetê ew şîret kiriye.

Ji aliyê din ve Ebdul Kerîm Qasim bersiva Mamoste Îbrahîm Ehmed dabû û gotibû: **“Ez li dijî PDK’ê nînim, lê Mela Mistefa ber bi xirabiyê ve diçe, baştir e ku hûn xwe tevlî karûbarênnn eşîrtiyê nekin.”**

Mamoste Îbrahîm Ehmed di bersivê de gotibû: **“Mela Mistefa serokê me ye, em hemû yek in.”**

❖ Çima PDK’ê di salên pêncî û şêstan de Barzanî gelek mezin didît?

Wê demê wisa bû. Ez bi xwe yek ji wê nivşa nû bûm, ku gelekî di bin bandora Mela Mistefa de bûm.

Yekem Plana
Qasim li Dijî Barzanî

❖ Gelo Ebdul Kerîm Qasim hewl da tu dijatiya Barzanî bikî?

Ebdul Kerîm Qasim ez nas dikirim. Du caran me hev du dîtibû. Hinek caran ez ji bo hevpeyvînên rojnamevanî diçûm cem wan. Piştre ku efserê îhtiyat bûm, Mela Mistefa û Îbrahîm Ehmed çûbûn ba Qasim û jê xwestibûn ku min ji karê leşkeriyê bibaxşîne, ji ber ku pêwîstiya partiyê bi karkirina min heye. Mela Mistefa gotibû Qasim: “Çar firqeyên artêşa Iraqê hene û PDK jî firqeya ya cenabê te ya pêncem e, rê bide bila Mam Celal li şûna firqeya çarem di firqeya pêncem de bixebite”.

Ez li firqeya çarem a zirêxê bûm. Ebdul Kerîm Qasim ferman da û got: Bişînin firqeya pêncem a çiyan. Piştre ji bo spasiyê min serdana Ebdul Kerîm kir, bi wê yekê wî ez nas dikirim.

Plana hevpar a Brîtanya û Îranê ya li dijî Komara Iraqê jî, ji aliyê min ve hatibû eşkerekirin û ji rêya Mamoste Îbrahîm Ehmed ve gihîştibû Ebdul Kerîm Qasim, ew hejî wê pirsê jî hebû.

Ji bilî wê yekê, di mijara rojnamegeriyê de jî ez çeleng bûm, her wisa ez endamê Desteya Rêveber a Sendîkaya Rojnamevanên Iraqê bûm.

Ji ber wan çend sedeman Ebdul Kerîm Qasim ez nas dikirim û nameyek ji min re şandibû, min jî bi tundî bersiv da. Ya rast niha ez ji wê berisva xwe poşman im ku min got wî kesî yê ku name anîbû, bêjê: **“Wele em ê Kurdistanê jê re bikin Viyetnam, eger baş di cihê xwe de rûnenê! Mela Mistefa serokê me ye, baştir e têkiliyên xwe bi wî re têk nede.”**

Eger wê hingê niyeta me derbarê Mela Mistefa baş neba yan em zêde dilsozê wî nebana, ji xwe mecalek serast bibû û Mela Mistefa bi xwe ji nav PDK’ê derdiket û Ebdul Kerîm Qasim jî bi wî awayî dijatiya PDK’ê nedikir. Çimkî tenê ji rikê Mela Mistefa ve wî dijatiya partiyê dikir.

Dema ku partî li rex Mela Mistefa sekinî û pişta wî girt, Ebdul Kerîm Qasim jî êdî dest bi dijatiya PDK’ê kir, di encamê de serokatiya PDK’ê têk çû.

❖ Nakokiyên hizrî yên navbera PDK’ê û Ebdul Kerîm Qasim çi bûn?

Her ji roja yekem ve Cudahiyên hizrê di navbera Partiya Demokrat a Kurdistanê û Ebdul Kerîm Qasim de bi zelalî xuya dikirin. Ew zilamekî iraqçî bû, ne baweriya wî bi neteweya Ereb hebû û ne jî bi neteweya Kurd hebû.

Ebdul Kerîm digot:

“Komara Iraqê ya hertimî (الجمهورية العراقيه الخالدة) **em hemû iraqî ne, Iraq axa Ereb û Kurd bûye, ji Iraqê Kurd çûne cihên din ên cîhanê, her bi wî awayî Ereb jî ji Iraqê ve çûne cihên din, ev Iraq hetaheta dimîne, lewma nabe feriq û cugahî navbera Kurd û Ereban de hebe.”**

Ya rast di praktîkê de jî Ebdul Kerîm Qasim cudahî nedikir, baweriya wî bi wekheviya Kurd û Ereban hebû. Di navbera şîe û sunniyan, misilman û xiristiyaniyan de cudahî ne dikir, iraqçiyekî tam bû.

Bêguman em wiha nebûn, em dijî kosmopolîteyê bûn, partiyek nîştimanperwer û kurdperwer bûn. Em di vê baweriyê de bûn ku neteweyên kurd û ereb li Iraqê hene, di vir de newekheviya hizrê di navbera PDK’ê û Ebdul Kerîm Qasim de serî hilda .

Nakokiyên navbera PDK’ê û Eddul Kerîm di wê astê de neman, belavî gelek cihan bûn, hetta di nav destûrê de jî reng veda. Tevî ku wî soz dabû sala 1960’an di Iraqê de demokrasiyê organîze bike û sala 1961’an hilbijartinê li dar bixwe, lê ew sozên xwe di praktîkê de bi cih neanîn.

Me li ser wan pirsan dinivîsî û dida nav çavên wî û berevaniya demokrasiyê û mafê rewa yê gelê Kurd dikir.

Rewş gihîşt astekê ku gotara “Klovîs Meqsûd” di rojnameya Sewre ya Iraqê de hat weşandin, bê ku bizane naveroka wê çi ye û çawa behsa kêmaniyên neteweyî dike? Rojnameyê gotina Michel Aflaq belav kiribû, ku dibêje: **“Kêmaniyên neteweyî li welatê erebî, eger nebin ereb divê bên pelçiqandin.”**

Me li ser wê gotarê helahelayek mezin çê kir, peyam û nameyên nerazîbûnê ji tevahiya aliyan re şand û zêdetir pirs mezin kir. Me wisa kir da ku Ebdul Kerîm Qasim wê nerazîbûn û acizbûnê li dijî xwe bibîne.

Beşa Heftem
7
Destpêkirina Şoreşa Îlonê

- Xebata çekdarî
- Şoreşa Îlona 1961’an
- Peyama Şêx Ehmed ji Ebdul Kerîm Qasim re
- Yekem bombebarana Kurdistanê
- Xweamadekirin bo xebata çekdarî
- Vekişîna Barzanî ji şoreşê û çûyîna Tirkiyeyê
- Slogana şoreşê û navê pêşmerge
- Darayiya şoreşê çawa hat peydakirin?
- Yekem çalakiya pêşmergeyan li devera Silêmaniyê
- Ji xebata siyasî heta şoreşa çekdarî
- Pirsa Kurd û demokrasî
- Geşbûna şoreşê û meseleya caştiyê
- Barzanî û partîtî
- Xurtbûna pêşmergeyan û vejîna encumenên gundan
- Du xetên siyasî di nav partiyekê de

Xebata Çekdarî

❖ Nakokiyên PDK’ê û Ebdul Kerîm Qasim wek destpêka Şoreşa Îlonê tê zanîn?

Di berdewamiya kûrbûna nakokiyên navbera PDK’ê û Ebdul Kerîm Qasim de, sala 1961’an di bin bandora Mela Mistefa de hinek eşîrên Kurdistanê dest bi serhildanê kirin û li Derbendîxanê li hev kom bûn.

Di aliyê din de, şerek di navbera eşîrên Zêbarî û Barzanî de qewimî. Di wî şerî de me eşîr kom kirin, da ku biçin ser Zêbariyan. Ji ber wê yekê di hemû aliyan de şer di navbera eşîra Zêbarî û eşîra Barzanî de derket. Hikûmet ket navbera wan û her du alî gumanbar kirin, ku alozî çêkirine. Ji ber wan sedeman êdî têkiliyên navbera Mela Mistefa û hikûmetê bi temamî têk çûn.

Wê demê PDK bi temamî nehatibû qedexekirin. Fermana girtina Mamoste Îbrahîm Ehmed li ser kuştina Sidîq Mîran hatibû dayîn, ku ew kar li ser xwesta Mela Mistefa hatibû kirin. Çend kesan wek Mehmûd Kawanî, Mam Teha û Mela Mator, Şemsedîn Muftî ew fermana Mela Mistefa bi cih anîbûn, bêyî ku PDK jê agahdar be.

Hikûmetê biryara girtina Mamoste Îbrahîm Ehmed dabû, lewma me xwe veşart, Omer Debabe û Salih Yûsifî hatin girtin. Wê hingê PDK’ê bi awayekî nîveşkere xebat dikir, ji ber wan girseyên eşîran PDK ket navbera du agiran.

Derbarê serhildan û girseyên eşîran de, du nêrîn di nav PDK’ê de hebûn:

Nêrîna yekem a Mamoste Îbrahîm Ehmed, Dr. Ezîz Şemzînî, Dr. Murad û Nûrî Şaweys bû. Wan digot: Ev girseyên eşîran, girseyeke biguman a kevneperesta bê ser û ber e, tenê heya-mekê berdewam dibe û dîroka Kurd nîşan daye, ku tevgerên eşîran serketî nabin. Her wisa eger destê biyaniyan di wan serhildan û girseyan de hebe, nabe em pişta wan cure tevgeran bigirin.

Nêrîna duyem a bi serokatiya Mela Mistefa bû û digot: Em li hinek cihan pişta eşîran bigirin, ne ji bo serhildana şoreşê, belkî ji bo vê yekê da ku hikûmet nekarbe wan serkut bike û di dawiyê de ji bo çareserkirinê Dê neçar bibe ji me alîkariyê bixwaze.

❖ Çima hûn neçûn bi Barzanî re diyalogê bikin?

PDK'ê ez şandim cem Mela Mistefa. Min ji aliyê partiyê ve gotê: Divê em van pirsgirêkan çareser bikin, eger tu dixwazî em şoreşê bikin, wê demê pêwîst e em çend cihan wek Hewlêr, Silêmanî, Rewandiz û Koyeyê bigirin. Bi wê yekê em dikarin him çekan û him jî pereyan bi dest bînin. Eger naxwazî şoreşê bikî, divê em van karan rawestînin, çimkî dibe sedema çêbûna şer di navbera me û hikûmetê de.

Wê demê Mela Mistefa li Çiyayê Şîrîn bû û wiha bersiv da û got: **"Nexêr, nêrîna polîtburoyê şaş e û serhildan û girseyên ne-razîbûnê baş in, pêwîst e berfireh bibin. Bila eşîr têlên telefonê bibirin û piran biteqînin, wê demê hikûmet neçar dibe ji bo ça-reseriyê ji me alîkariyê bixwaze."**

Mela Mistefa wiha behsa senaryoya xwe kir: "Hikûmetê ji bo çareserkirina vê serhildanê bi taybetî piştî berfirehbûnê, çend

kesatiyan ên wek Kemal Osman, Mesûd Mihemed û yên din bişîne Kurdistanê, kes ji wan dê nekaribe pirsê çareser bike, lewma di dawiyê de hikûmetê neçar bibe ji me bixwaze, em Mamoste Îbrahîm Ehmed peyda bikin û bişînin Bexdayê. Wê demê, em ê jî Mamoste Îbrahîm Ehmed bişînin Bexdayê.

Ebdul Kerîm Qasim dê ji mamoste bipirse pirsgirêk çi ye û çawa çareser dibe? Ew ê jî bêje: Ez nikarim vê pirsgirêkê çareser bikim, baştir e hûn biçin ba Mela Mistefa çareser bikin. Wê demê Ebdul Kerîm Qasim, Mamoste Îbrahîm Ehmed û Ehmed Salih Ebdî dê bi balafirê bên vê derê û destê xwe dirêj kir û got: Dê werin wê meydanê û bi me re rûnên, wê hingê em ê şertên xwe bi wan bidin qebûlkirin û pirsgirêkan çareser bikin."

❖ Nêrîna we li hember wê nêrîna Barzanî çawa bû?

Ez, Omer Debabe û Elî Eskerî di vê baweriyê de bûn, ew serhildan tevgereke xelkê ye, eger em tevlî wê serhildanê nebin, wê demê em ji xelkê dûr dikevin, çimkî serhildanê bala xelkê kişandiye û bi heman navî li hember hikûmetê sekiniye û Mela Mistefa jî pişta wan digre. Eger em li dijî wê serhildanê derkevin, wê hingê PDK wek grupeke tirsek tê hesibandin, wisa diyar dibe ku em naxwazin ji bo xelkê xebata çekdarî û şoreşê bikin. Bi taybetî di nav me de jî, hinek kes hebûn wek Mela Mator û Osman Efendî, wan ew hizir belav dikirin, bêyî ku bifikirin pişta Mela Mistefa digirtin.

Ji ber wan sedeman, em tirsiyan ku PDK rastî parçebûnê were, ew grup bibe baskê şoreşger û kurdperwer, em jî bibin

baskê lawaz û serbejêr. Lewma me biryar da em serperestiya wan girse û serhildanan bikin.

Piştî ku min bersiva Mela Mistefa gihand polîtburoya PDK'ê, wan nameyek ji şaxeya PDK'ê ya Silêmaniyê re şand, ku wê demê ez berpirsê wê şaxeyê bûm. Di nameyê de behsa vê yekê hatibû kirin, ku serhildana eşîran karekî baş nîne û encama wê çi dibe. Her wisa ew axa û begên li dijî yasaya reforma çandiniyê sekinîne, dibe ku ser xwesta biyaniyan wî karî dikin.

Ya rast ew axa û beg li dijî yasaya reforma çandiniyê bûn, tevî ku PDK digel yasaya reforma çandiniyê bû, lê Mela Mistefa li dijî wê yasayê bû û pişta wan axa û began digirt û di vê baweriyê de bû, yasayek xirab e û dijî şerîetê ye.

Şoreşa Îlona 1961'an

❖ Şoreşa Îlonê çawa dest pê kir, yekem gule kengê û li ku derê hat avêtin?

Dema ku PDK'ê xwest serhildana şeşê Îlona 1930'yan bi bîr bîne, Ebdul Kerîm Qasim em agahdar kirin, lê hevalên Behdînan bê agahdarkirina komîteya navendî, di nehê Îlona 1961'an de êrişî Zaxoyê, Amêdî û hinek cihên din kirin û girtin.

Ebdul Kerîm Qasim piştî wan êrişan ji vê yekê tirsiya ku li navçeyên din jî êrişên bi wî awayî biqewimin. Lewma roja 11'ê Îlonê bi fermana wî serhildan û girseyên nerazîbûnê li Derbendîxan û Xelekan hatin bombebarankirin. Di encamê

de dawî bi girseyên nerazîbûnê hat. Piştre her yek ji wan vegeriyan malên xwe û peyam ji Ebdul Kerîm Qasim re şandin û dilsoziya xwe ji wî re tekez kirin.

Li vir pêwîst e behsa du mînakan bikim. Berî 11'ê Îlonê ez çûm Şarbajêr li gundê Tepî Sefa tevhiya eşîrên wê navçeyê kom bûn. Di civînê de wan sonda bi Quranê xwar ku dostaniya şoreşê û PDK'ê bi serokatiya Mela Mistefa bikin.

Lê tenê kesekî bi navê Hacî Muşîr sonda bi Quranê nexwar û di nav wê civîna girseyî de rabû û got: **"Mam Celal min bi Quranê sond nexwar lê soz didim heta tu hebî ez ê bi te re bim û heta mirinê pişta te digrim, lê yên sond xwar hemû derewan dikin, kes ji wan pişta we nagre."**

Dema êrişê dest pê kir, kes ba me nema, tenê ew zilam nebe. Her wisa li navçeya Dola Xelekan û Bazyanê ku piranî eşîr bûn, hemû reviyan û çûne malên xwe, tenê endamên PDK'ê man, bêyî ku amadekarî hatibe kirin û çek û pere hebin.

❖ Piştî wê şikesta Pêşmerge û PDK'ê çi helwesteke Barzanî hebû?

Mela Mistefa û Şêx Ehmed peyama piştgiriyê ji hikûmetê re şandin û gotin: "Em pişta hikûmetê û pergala komariyê digirin".

Piştre hikûmetê daxuyaniyek da û bi balafirê ew daxuyanî bi ser eşîrên navçeyên Pişder û Raniyeyê de belav kir. Di daxuyaniyê de hikûmetê nivîsîbû: **"Mela Mistefa û Şêx Ehmed dilsoziya xwe ji komarê û serok Ebdul Kerîm Qasim re ragihandine, hûn jî çi tevgerekê nekin wek welatiyên normal û asayî di cihên xwe de rûnên.**

Peyama Şêx Ehmed
ji Ebdul Kerîm Qasim re

❖ Barzanî piştî 11'ê Îlonê peyam ji Ebdul Kerîm Qasim re şand?

Belê, peyama Mela Mistefa û Şêx Ehmed piştî êrişa esmanî ya hikûmetê hat belavkirin. Tevger ji neh heta 18'ê Îlonê bêdeng bû. Ew helwesta Mela Mistefa bû sedema şikista Behdînan.

Wê demê Elî Hemdî, Elî Eskerî û Ehmed Ebdullah li Behdînan bûn, hêzeke wan a mezin hebû, Zaxo, Amêdî û çendîn cihên din hatibûn girtin, hejmarek mezin polîs tevlî me bibûn, hêzeke me ya tam mezin li wir çêbibû.

Şoreşê ser navê PDK'ê û Mela Mistefa dest pê kiribû, lê Mela Mistefa ew peyam belav kir. Xelkê digot: "**We fêl li me kir, destê me birî û mala me kavil kir**".

Lewma xelkê dev ji me berdan û teslîmî hikûmetê bûn.

Yekem
Bombebarana Kurdistanê

❖ Kengê şer dest pê kir û sedema wê çi bû?

Nizanim sedema destpêkirina şer çi bû, lê 18'ê Îlonê Ebdul Kerîm Qasim şaşiyeke dîrokî ya mezin kir, ew jî bombebarankirina navçeya Barzan bû. Piştre haydarî da Şêx Ehmed û got: **"Divê Mela Mistefa yan xwe teslîm bike yan jî ji wê navçeyê**

derkeve." Eger Ebdul Kerîm Qasim fermana bombebarankirina navçeya Barzan neda, tu tiştek nediqewimî û pirsgirêk jî bi dawî dibû.

Piştre meseleyek hat arê û bû sedem ku Mela Mistefa gelekî giliyê ji Nûrî Ehmed Teha bike, ku perpirsê PDK'ê yê milê Pêncwênê bû. Eşîrên wê navçeyê gotibûnê:

"We fêl li me kir û got, Mela Mistefa bi me re ye û em ê şoreşê bikin, lê wiha nebû ka Mela Mistefa? Me serhildan kir û mal û halê me kavil bû, di demekê de Mela Mistefa ji xwe re rûniştiye û ji hikûmetê re peyaman dişîne."

Nûrî Ehmed Teha jî, wek henek gotibû wan:

"Mela Mistefa tola xwe ji we kiriye, we sala 1945'an soz da ku hevkariya şoreşê bikin, lê we nekir niha jî hûn rabûne lê Mela Mistefa bersivê nade, ev tolhildana wê demê ye."

❖ Helwesta Şêx Ehmed li hember xwesta Ebdul Kerîm çi bû?

Mela Mistefa ser daxwaza Şêx Ehmed bi 300 çekdaran ve ji navçeya Barzan derket û çû Behdînan. Şêx Ehmed jî dilsoziya xwe ji Ebdul Kerîm Qasim re ragihand û peyama piştgiriyê jê re şand û serdana Ebdul Kerîm Qasim jî kir û got**: "Niyeta me dilpakî ye û karê me li tiştekê neketiye."**

❖ Di heyameke kurt de bûyerên girîng qewimîn?

Belê, nehê Îlonê PDK'ê li Behdînan êrişî bajaran kir, 11'ê Îlonê bi fermana Ebdul Kerîm Qasim Derbendîxan û Derbenda Bazyanê hatin bombebaran kirin, piştre li Dola Xelekan girseyên eşîran hat bombebarankirin, **18'ê Îlonê jî bi fermana Ebdul Kerîm Qasim, navçeya Barzan hat bombebaran kirin**.

Ebdul Kerîm Qasim piştî 11'ê Îlonê di konferanseke çapemeniyê de hinek belge derbarê Mela Mistefa belav kirin. PDK'ê mesele çareser kir û got: Ew belge li derveyî yasayê ne û dest danîn li ser milkê partiyê tê hesabê.

Piştî çend mehan Ebdul Kerîm Qasim daxwaza dîtina serkirdeyekî PDK'ê kir. Piştî razîbûna polîtburoyê, xwedê jê razî Nûrî Şaweys çû serdana Ebdul Kerîm.

Bi gotina Nûrî Şaweys Ebdul Kerîm daxwazên wî qebûl nekiribû, polîtburoyê jî daxwazên Ebdul Kerîm qebûl nekir.

Ji ber wê yekê di dawiya sala 1961'an de têkiliyên navbera Ebdul Kerîm Qasim û serokatiya PDK'ê bi temamî qut bûn û dawî pê hat.

Xweamadekirin bo Xebata Çekdarî

❖ Gelo dawîbûna têkiliyên Ebdul Kerîm û PDK'ê dibe destpêka Şoreşa Îlonê?

Heyamekê berî destpêkirina Şoreşa Îlonê, eşîrên Kurd li gelek cihan li ser banga Mela Mistefa li deverên Silêmanî, Sûrdaş, Baziyan, Şarbajêr, Xoşnawetî û Çiyayê Sefînê serhildan. Ew serhildan ji aliyê Mela Mator, Mehmûd Kawanî, Ehmed Kawanî, Mam Teha û hejmarek kesatiyên din ve dihat rêvebirin.

Her wisa hejmarek ji polîsan çek dan serhildêran û di encamê de wan hêzek çekdar li Sefînê pêk anî. Di aliyê din de, li Dola Xelekan axayên navçeya Pişderê, Şêx Hisên Boskên û Hebas Axayê Mamend Axa li hev civiyan. Li Koyeyê jî

Mehmûd Axayê Ziyad Axa û hejmarek kesên din li Heybet Sultan û çend cihên din baregeh danîn.

Polîtburoya PDK'ê tenê hajî tevgera Behdînan hebû, ku wê derê bêyî razîbûna polîtburoyê dest pê kiribû. Elî Eskerî berpirsê PDK'ê yê wê deverê bû, digel Elî Hemdî û Ehmed Ebdullah ji xelkê xwestibûn ku serhildin. Lê belê li deverên din tu rolek me ya rêvebirinê nebû. Tenê li parêzgeha Silêmaniyê ku wê hingê ez berpirsê şaxeya PDK'ê bûm, me hejmarek kadro şandin nav xelkê. Me tenê karî wî karî bikin, çimkî ne çekdarên me hebûn û ne jî desthilat û ne jî biryara serokatiyê di dest me de bû.

Her wisa polîtburoya PDK'ê, di vê baweriyê de bû, li gorî tecrubeyên dîrokî tevahiya tevgerên eşîrtiyê bêencam in. Ji bilî wê yekê piraniya serhildêran axa û beg bûn, ku ji yasaya reforma çandiniyê ziyan dîtibûn û dixwestin careke din desthilata xwe ya axatî û eşîrtiyê vegerînin. Ji ber van sedeman, polîtburoyê serhildana eşîran di berjewendiya gelê Kurd de nedidît, tevî ku dijatiya serhildanê nedikir, lê pişta wê serhildanê jî nedigirt. Berevajî polîtburoyê Mela Mistefa eşîr teşwîqî berdewamiya serhildanê dikir û li her derekê pişta wan digirt û ji berpirsên partiyê dixwest pişta serhildêran bigirin û bi wan re bin.

Çawa ku min pêştir got, Mela Mistefa di vê baweriyê de nebû, ku serhildan diteqe û dibe şoreş, digot:

"Tenê fişarkirineke li ser Ebdul Kerîm Qasim, di encamê de Ebdul Kerîm neçar dibe daxwazên me qebûl bike."

Di aliyê din de, polîtburoya PDK'ê hewl da nerazîbûna xelkê Kurdistanê li hember dîktatoriyê û neheqiyên ku li gelê Kurd dihatin kirin, vegerîne xebatek siyasî. Polîtburoyê mifa ji salvegera şeşê Îlonê wergirt û pêşniyar kir, bi wê helkeftê li seranserî Kurdistanê li bajaran girev dest pê bike û xebat were veguhestin nav bajaran tenê li gundan nebe.

Her di wê çarçoveyê de roja şeşê Îlonê ser daxwaza PDK'ê li bajarên Kerkûkê, Silêmanî, Hewlêr, Koye, Raniye, Zaxo, Amêdî, Şêxan, Etroş û bajarên din ên Kurdistanê gireva gelemperî ya serketî birêve çû. Welatiyên nerazî bi girev û xwenîşandanan daxwazên xwe di qaliba peyaman de ji hikûmeta Bexdayê re şandin.

❖ Piştî wan bûyeran, Hêza Pêşmerge çawa çêbû?

Hêzên çekdar bi vî awayî bûn; wek mînak 150 heta 180 çekdarên Hebas Axa hebûn. Em li navçeya Çemê Rêzanê bûn, hejmara me 12 kes bû lê tenê sê çekên me hebûn. Li wê navçeyê şêniyên gundan û eşîran em xwedî nedikirin û digotin; we bi xwe re alozî aniye, lewma balafir bi dû we ne, ji ber wê yekê rê nedihat dayîn em li tu gundekî bimînin, bi neçarî em çûn navçeya Çemê Rêzanê, çimkî tu gundek lê nebû û kes jî lê nedijiya.

Me li Çemê Rêzanê bingehek danî, hevalên din wek Heme Hacî Tayer û Kuwêxa Ebdul Kerîm Mawetî jî ku reviyabûn, li navçeya Qamîş û Dirê bi cih bibûn, ku hejmara wan 10 -15 kesan bû. Kadroyên din ên PDK'ê li Qeredaxê û Deşta Şarezûrê belav bibûn. Hîlmî Elî Şerîf û hêza wî ji navçeya Xaneqînê çûbûn navçeya Horîn û Şêxan û li Çiyayê Bemo bi

cih bibûn. Nêzîkî 30 çekdarên PDK'ê li wê navçeyê bûn, lê hêj bi fermî ferman nehatibû dayîn ka em ê dest bi şoreşê û şerê çekdarî bikin yan na?

Vekişîna Barzanî
ji Şoreşê û Çûyina Tirkiyeyê

❖ Dema van bûyeran Mela Mistefa li Ku derê bû?

Me nedizanî ka Mela Mistefa çi dike? Me ji riya rêxistina PDK'ê ya Behdînan zanî, ku Mela Mistefa çûye wê derê lê dixwaze biçe Tirkiyeyê yan Sûriyeyê bibe penaberê siyasî.

Nûçeyên ku gihîştibûn polîtburoyê nîşan didan, Mela Mistefa naxwaze şer an şoreşê bike. Li Behdînan gelek kesan hewl dabûn da ku wî razî bikin, dev ji plana penaberiyê berde.

Bi taybetî Elî Eskerî, Elî Hemdî, Ehmed Ebdullah, Es'ed Xoşewî, Elî Xelîl û hinek kesên din gelek hewl dabûn da ku Mela Mistefa razî bikin neçe Tirkiyeyê, lê ew rijd bûye li ser wê xwesta xwe heta ku Tirkiyeyê daxwaza wî ya penaberiya siyasî qebûl nekir. Piştre hewl da biçe Sûriyeyê lê hikûmeta Şamê jî daxwaza wî ya penaberiya siyasî qebûl nekir. Di dawiyê de bi neçarî li Kurdistanê ma[24].

……

[24] Dr. Mehmûd Osman ji zarî wî dibêje: **Mela Mistefa** got: **Şêx Ehmedê birayê min got: "Ez naxwazim carek din navçeya min bê kavilkirin û dev ji me berde**". Min jî biryar da ku biçim Sûriyeyê lê piraniya eşîran bi taybetî Berwariyan riya me girtin. Me bi neçarî şerê wan kir, hinek revîn Tirkiyeyê, hinekan xwe teslîmî hikûmeta Iraqê kirin û bûne caş, hinek jî hatin ba me. Min jî ji xwe re got: **Şerm e ji welat derkevim û meydana xebatê vala bikim, lewma zivirîm navçeya Balekayetiyê**.

Em li parêzgehên Silêmanî û Hewlêrê man, lê me nedizanî çi bikin, lewma me ji komîteya navendî ya partiyê xwest civînekê saz bike da ku derbarê rewşê biryarê bide.

Piştî ku hinekê rewş aram bû, Kanûna 1961'an piraniya Komîteya Navendî ya PDK'ê li gundê Ewdalan nêzîkî Çemê Rêzanê civiya. Di wê civînê de bi gelemperî biryar li ser destpêkirina şerê çekdarî hat dayîn, lê ne wek şoreş bekî li ser navê "Tevgera Çekdariya Berevaniyê".

Di wê civînê de tenê du endaman dengê na dan destpêkirina şoreşê û xebata çekdarî, ew jî Elî Ebdullah û Nûrî Ehmed Teha bû. Elî Ebdullah digot: "**Dibe ku Ebdul Kerîm Qasim bi neçarî girîngiyê bide demokrasiyê û di vê baweriyê de bû baştir e li cihê şer û xebata çekdarî, em hewl bidin bi hikûmeta Iraqê re li hev bikin.**"

Nûrî Ehmed Teha jî digot: **"Mela Mistefa serokatiya her tevgerekê bike, encama wê şikiste, çimkî tecrubeya min a karkirina bi Mela Mistefa re heye. Hewlên Mela Mistefa ji dema vegera ji Sovyetê heta niha nîşan didin, ew karê siyasî naxwaze û dijî partîtiyê ye,**

dostaniya axa û began dike û wan wek hêza xwe dizane, lewma pêwîst nake em dest bi xebata çekdarî bikin, baştr e em bi hikûmetê re li hev bikin û ji pirsa xwe re çareseriyê peyda bikin."

❖ Nêrîna we derbarê destpêkirina şoreşê çawa bû?

Tevahiya hevalên serokatiya PDK'ê yên wek Mamoste Îbrahîm Ehmed, Nûrî Şaweys, Mela Mator, Umer Debabe, min û Celal Ebdul Rehman, me deng da destpêkirina şoreşê

û xebata çekdarî. Li wê derê cara yekem me slogana xebata çekdarî da, min biryar û qirarên civînê kom kir, Mamoste Îbrahîm Ehmed jî ew komnivîs serast kir.

Slogana Şoreşê û Navê Pêşmerge

❖ Sloganên serhildana xebat û şoreşa çekdarî çi bûn?

Di rojnameya Xebatê de ew slogan hatin belavkirin wek; **“Bê demokrasî tu çareseriyek çê nabe, bê mafê Kurd jî demokrasî serî nagre.”** Hinek slogan derbarê xweseriya rastî û slogana “**Yan Kurdistan yan neman**” di rojnameyê de hatin belavkirin, ku piştre gelekî deng vedan.

Helbet slogana “Yan Kurdistan yan neman” ser pêşniyara min hat pejirandin. Ya rast min ew slogan ji şoreşa Kobayê wer-girtibû, ku slogana wan bi vî awayî bû “Nişttiman yan mirin”, lê bi alîkariya Mamoste Îbrahîm Ehmed, me iew slogan guhert û kir **“Yan Kurdistan yan neman.”**

Her wisa me ji bo Pêşmerge jî cil destnîşan kir, parçeyekî rengê xaliyê bû, Mamoste Îbrahîm Ehmed navên kurdî wek pel, liq û … li Yekîneyên Hêza Pêşmerge kir.

Darayiya Şoreşê
Çawa Hat Peydakirin?

❖ Darayiya şoreşê ji ku derê dihat peydakirin?

Me hewla peydakirina pereyan dida û demek bû em li ser planekê dixebitîn û me dixwest em dest dayînin ser pereyên riya Koye- Hewlêrê, ku serê her mehê dihat. Mela Mator ber-pirsê wê planê bû û digot: "Divê destpêkê em du kesan bişînin û em hajî wan bin, piştî hatinê me agahdar bikin û em dest pê bikin". Wî wisa kar dijwar dikir da ku neyê kirin. Di civînê de min got: Keko bi riya ku Mela Mator dibêje; qet ew kar nayê kirin bispêrin min da ku ez bi xwe wî karî temam bikim.

Em gelekî li ser axivîn, di dawiyê de Mamoste Îbrahîm Ehmed got: "Mam Celal bi xwe dixwaze wî karî bike, bişînin bila bike, eger ser ket gelek baş e, eger ser jî neket wê demê bi xwe mandî dibe".

Wan nîzîkî 30 Pêşmergeyan dane min. Pştî rojekê em gihîştin ser riya Koye- Hewlêrê. Roja 25'ê Kanûna 1961'an me ji bo bi dest xistina wî pereyî kemîn dianî ku Berpirsê Darayî yê Ko-yeyê Tahîr Ebdullah ji Hewlêrê dianî. Em amade bûn, biryar bû piştî yekem guleya min, heval êrişê bikin çimkî otomobîlek û şeş polîs bi wan re bû, reşaşek li ser otomobîlê bû, min di yekem guleyê de destê polîsê ser reşaşê nîşane girt da ku ne-kare guleyan bireşîne. Êdî êrişê dest pê kir û sê kes ji polîsan hatin kuştin û yên din hatin girtin.

Çuwalek tijî pere bû, me wisa dizanî 150 hezar dînar e lê tenê 30 hezar dînar bû, ji ber ku pereyên hûr bûn zaf dihat xuyanê.

Tevî ku Berpirsê Darayî yê Koyeyê, bi xwe jî endamê PDK'ê bû, lê hajî meseleyê nebû, piştî ku em dûr ketin, min jê pirsî: "Pere çiqas e?" Got: "30 hezar dînar e." Min jî sîleyek lê da! Bi rastî şaş mam, min wisa dizanî 150 hezar dînar e, her çend wê serdemê 30 hezar dînar jî pereyekî zaf bû. Got: **"Bavo çima li min didî? Me kêm aniye, dereng hatine?"** Piştre ew gotin di nav partiyê de belav bû (Me kêm aniye, dereng hatine).

Em gihîştin navçeya pişt Dola Kotel, ku hêza Omer Debabe û hevalên me lê bûn. Me ew 30 hezar dînar par vekir, 10 hezar dînar ji polîtburoyê re şand. 10 hezar dînar ji Mela Mistefa re şand ku li Behdînan bû. 10 hezar dînarê mayî jî me ji xwe re hilda. Em bi wî pereyî jiyan, ya rast tu tiştekî me nebû. Me zêdetirî 3'yê dînaran da ji Pêşmergeyan re cil û pêlav kirî.

❖ Em dikarin wê qonaxê wek destpêka rêxistina Hêza Pêşmerge bizanin?

Belê, li ser biryara Komîteya Navendî ya PDK'ê me dest bi pêkanîna Hêza Pêşmerge, peydakirina çekan û xwea-madekirina ji bo şoreşa çekdarî kir.

Mela Mistefa li Behdînan bû. Me ji destpêka sala 1961'an ve plana girtina bajarê Silêmaniyê danîbû, hetta me şeva bicih-kirina planê jî diyar kiribû. Biryar bû em di Adara 1962'yan de bajêr bigirin. Beriya ku em dest bi bicihanîna planê bikin, Nûrî Şaweys û Mamoste Îbrahîm Ehmed di nav bajêr de bûn.

Nûrî Ehmed Teha û Nûrî Şaweys bi polîsên girêdayî PDK'ê re axivî bûn û polîsan soz dabûn hevkariya me bikin. Hejmara wan polîsan nêzîkî 180 kesî dibû, ji bilî ku hinek kesên me di nav hikûmetê de hebûn, hêza me bi xwe jî nêzîkî 70'ê kesî

dibû. Omer debabe û hevalên din li navçeyên Dola Balîsan û Dole Reqe hejmarek çek kom kiribûn. Hêza me bi tevahî dibû nêzîkî 150 kesî.

Em ketin nav Silêmaniyê û di du astan de belav bûn. Lê polîsên girêdayî PDK'ê poşman bûn. Ji ber wê yekê me nekarî planê bi cih bînin, bi mandîbûneke zaf em paşde vegeriyan lê baş bû hikûmet ji me nehisiya.

Piştre em vegeriyan navçeya Şedeleyê. Me li wê navçeyê hêza xwe rêxist, nêzîkî 90 Pêşmergeyên PDK'ê ba min bûn, hinek hêzên eşîran jî hatin ba me; wek Hêza Şêx Ebdul Xaliq Şedele, Hêza Hacî Îbrahîm Çermega û Heza Mecîd Rostemê birayê wî. Hêza me ser hev bû nêzîkî 150 kesî.

Ez çûm navçeya Şarbajêr û me plana girtina wê navçeyê di şeva Newrozê de danî. Ez gelek bi hêvî bûm, çimkî eşîrên wê navçeyê dostê me bûn û pişta me digirtin.

Yekem Çalakiya
Pêşmergeyan li Devera Silêmaniyê

❖ Çawa çalakiyên Pêşmergetiyê li devera Soran dest pê kir?

Heme Hacî Tahîr bi 15-20 çekdaran ve li navçeya Dolbêşk bû. 120-130 kesan ba min bûn. Ya girîng endamekî din yê PDK'ê bi navê Erîf Mecîd Şuwanî bû, ku paşê ji aliyê Barzanî ve hat kuştin. Ew fermandarê bingeha Gapîlon bû ku 10 polîs pê re bûn. Her wisa pênc-şeş polîsên din jî di nav bingeha leşkerî ya nihênî de rêxistibû.

Me plan danîbû, ew bingeha xwe bigre. Piştre bi polîsên xwe û her bi cilên polîs ve birevin nav baregeha leşkerî û bêjne wan ku ji ber serhildêrên çekdar revîne û bikevin nav wê baregehê û bi alîkariya polîsên din wê baregehê jî bigirin.

Wê demê me nêzîkî 40 çekan bi dest xist, me 20 kes gel xwe birin, 20 kesên din jî li benda Şêx Mehmûdê Karêzeman man da ku çekan bi ser wan de parve bike. Bi wê yekê hejmara wan dibû 40 kesan, ser hev 50 çekdarên Şêx Mehmûd hedibûn û dikarî "Ezmere Rûte" bigre.

Ez ji Çiwarta çûm Şarbajêr, me Kuwêxa Kerîm Mawetî şandibû da ku gundê "Şanaxsê" girêdayî navçeya Mawetê bigre. Her wisa me hêzeke din a Pêşmerge jî bi fermandariya Erîf Heme Salih û Ebdullah Ehmed Resûl şandibû da ku gundê "Basnê" bigre.

Biryar hatibû dayîn, şeva Newrozê ango 20 li ser 21'ê Adarê Pêşmerge tevahiya wan cihan bigre. Girtina Çiwartayê di plana me de nebû, lê pêwîst bû bihata dorpêçkirin da ku em bikarin tevahiya bingehên din bigirin. Me li Çemê Tegeranê çeper çêkirin û hêzeke me ya mezin li wê derê bi cih bû, da ku dema hatinê hêzên hikûmetê bikevin kemînê.

Ji şeva 19'ê heta êvara roja 20'ê mehê, tevahiya wan cihan hatin girtin ku di planê de hatibûn destnîşankirin. Lê şeva 21'ê mehê me nekarî Çiwartayê bigirin, bingeha ewlekariyê gelek qahîm bû, çekên me yên giran jî nebû, da ku lêbidin û biherifînin, lewma me bingeh dorpêç kir, her polîsek bihata derve me digirt.

Nîvro hikûmet ji êrişa me hisiya, hêza polîs a Silêmaniyê gihîşt Çemê Tegeranê lê ji rûyê bêbextiyê yek ji hevalên me bi navê Hacî Şêxe, mijûlî nimêjkirinê bû, wê demê fermandarê polîs dibîne kesekî çakdar nimêj dike, bêgîrobûn fermanê dide û hêzên polîs gule li me reşandin, di encamê de şer navbera me û wan de dest pê kir, heta êvarê rewş di bin kontrola me bû û hêzên hikûmetê bi temamî ketin dorpêçê. Hejmarek mezin kuştî û birîndar hebû, çar otomobîlên wan bi çek û cebilxaneyan ve ketibûn dest me.

Hêzên hikûmetê xwe veşatibûn, me dixwest bibe êvar em êrişî wan bikin û hemiyan bigirin lê berêvarê balafir hatin û di şer de Hemîd Kawanî şehîd bû ku berpirsê PDK'ê yê navçeyê bû. Ji ber bêtecrubeyiya şer, wê demê her gavê serkirde yan fermandarek şehîd biba, Pêşmerge morala xwe ji dest dida û ji navçeya şer vedikişiya.

Ji ber şehîdbûna Hemîd Kawanî û vekişîna Pêşmerge ji aliyekî dorpêçê, hêzên hikûmetê karîn xwe xilaz bikin û vegerin Silêmaniyê lê ziyana wan mezin bû. Me agirê Newrozê bi şewitandina otomobîlên wan vêxist. Bi hezaran fîşek, wek cara yekem hawan û reşaşa "Dîktaryof" ket destê me. Bi giştî di wî şerî de me çek û çebilxaneyek mezin bi dest xist.

Şeva Newroza 1962'yan bingeha Basnê bi 19 kesan û bingeha Şanaxsê bi 42 kesan ve hatin girtin. Wan serketinên me gelek deng vedan. Yekem çalakiya mezin bû ku me karî çek, çebilxane û pere bi dest bixin. Bi wê yekê em di nav xelkê de bûn xwedan heybet û hurmetek mezin.

Piştre ji bo girtina Pêncwênê, me berê xwe da wê navçeyê bi hevkariya polîsan me Pênciwên jî girt .Cîgirê Polîsê Pênciwên

Kemal Şêx Xerîb teslîm bû. Di wê operasyonê de li nalparêzê "Mela Resûl Gurun" hat şehîdkirin. Bi vî awayî di aliyê me de şoreşê dest pê kir. Li parêzgeha Hewlêrê jî, serketinên baş hatin bi destxistin. Hevalên me Biharê çûn Sefînê, Hîran, Nazenîn û navçeyên din. Kekê Omer Debabe û hevalên din li wan navçeyan hêzek kom kirin û li wê derê jî şoreş xut bû.

Hêza me jî li Çemê Rêzanê ji 12 kesên bêçek bû hêzeka mezin, ber bi xurtbûnê ve çû, hejmarek mezin ji çekan di dest me de bû û têkiliyên me jî berfireh dibûn, xelkekî zaf serdana me dikirin.

Wê salê me hêzêk bi serokatiya Kemel Muftî şand navçeya Qeredaxê, di encamê de navçeya di bin desthilata me de berfirehtir bibû. Li navçeya Bemo hêza bi serokatiya Hîlmî Elî Şerîf jî mezin bibû, roj bi roj hatina xelkê zêde dibû, bi wê yekê şoreşê dest pê kir.

Ji Xebata Siyasî
Heta Şoreşa Çekdarî

❖ Çi roleke PDK'ê di qonaxa berî destpêkirina şoreşê de hebû?

Xebata siyasî ya eşkere ya PDK'ê piştî 14'ê Tîrmehê dest pê kir, tevî ku pêştir jî PDK'ê xebat dikir, lê bi awayekî nepenî bû. Piştî serketina Şoreşa 14'ê Tîrmehê, yekser PDK hat meydanê û dest bi karkirina eşkere kir, bi taybet bi weşandina belavokan, helwest wergirtinan û têkilî danînên bi xelkê re.

Ji ber wê yekê em dikarin bêjin: Ji Şoreşa 14'ê Tîrmehê heta serhildana Şoreşa 11'ê Îlona 1961'an, qonaxa xebata PDK'ê ya

siyasî bû. Di wê qonaxê de, PDK'ê xebata xwe ya siyasî bi weşandina rojnameyan, belavokan, berfirehkirina têkiliyan û hevkarîkirina partiyên din di çarçoveya Eniya Yekîtiya Niştimanî ya Iraqê de, dest pê kir û xurt bû.

Berî Şoreşa 14'ê Tîrmehê, PDK'ê xwe ji bo şerê çekdarî amade dikir û dixwest li gelek cihan grupên çekdarî çêbike, bi awayekî di wê barê de têkilî bi Sûriyeyê re jî hatibû danîn. Derbarê wê mijarê min û Ebdul Rehman Zebîhî û Kemal Fuad bi hinek berpirsên Sûriyeyê re hevdîtin kir. Armanca me ev bû, eger me dest bi xebata çekdarî kir, hikûmeta Sûriyeyê bi çek, radyo û awayên din alîkariya me bike.

Lê piştî Şoreşa 14'ê Tîrmehê, êdî armanca sereke ya tevahiya partiyên siyasî bi PDK'ê ve jî, parastina şoreşê, komara sava û xurtkirina wê komarê bi awayekî demokratîk bû. Helbet armancek din a PDK'ê jî hebû, ew jî demokratîkbûna Iraqê bû, da ku di saya wê de, gelê Kurd bikare bigihîje mafên xwe yên neteweyî.

Awayekî girîng yê xebata wê serdemê, xebata hizrî û siyasî bû, ku di qaliba rojname, kovar û çalakiyên din de dihatin kirin, da ku komara Iraqê bê parastin û pergalek demokratîk di welêt de bi cih bibe. Lê di mijara demokrasiyê de, bîr û bawerên partiyan cuda bûn.

PDK'ê dixwest demokrasiya heyî bê berfirehkirin da ku mafê Kurd jî bigire nav xwe. Di edebiyata PDK'ê de dihat gotin ku **pirsa Kurd tenê bi riya demokrasiyê tê çareserkirin û bê garantîbûna mafên gelê Kurd, demokrasî nuxsan dibe. Ev jî guhertinek girîng di sloganên PDK'ê de dihat hesabê**.

Pirsa Kurd û Demokrasî

❖ PDK'ê demokrasiyek çawa dixwest, demokrasiya kîjan welatî dipejirand?

Di bin bandora şoreşa Îndonezya de PDK'ê daxwaza demokrasiya gel û demokrasiya rêberkirî dikir.

Di serdema xebata Îndonezya de bi serokatiya Ehmed Sukarno hêzên çepgir, demokrat û pêşverû ji bo parastbûna hikumdariya pêşverû hevkariya Sukarno dikirin, di encamê de pergala pêşverûyiyê di wî welatî de geş bû.

Di Iraqa piştî Şoreşa 14'ê Tîrmehê de, ji ber rola dîrokî ya Ebdul Kerîm Qasim di wê şoreşa de ew wek rizgarker, rêveberê şoreşê, demokrat û pêşverû dihat naskirin, **lewma PDK'ê û partiyên din ên pêşverû yên Iraqê, daxwaza pêvajoya demokrasiya rêberkirî dikirin.**

Lê cudahiya me û partiyên din ên Iraqê di vir de bû, me digot**:** **Bê qebûlkirina mafên Kurd, bê rêveberiya xweser, bê mafên neteweyî û rêveberî û siyasî yên Kurd, qet Iraq nabe welatekî demokratîk**, berevajî her tim tevlîhev û alozî dibe.

Di nêrîna me de, tenê aliyekî pêvajoya demokrasiyê nebû, belkî du aliyên wê hebûn. Niha jî şaşiya yekalîdîtina demokrasiyî di nav partiyên pêşverû yên Iraqê de dubare dibe. Her tim vê gotinê dubare dikin û dibêjin: **Bê demokrasiyê mafên Kurd garantî nabe**, tevî ku bandorek mezin a demokrasiyê li ser çarserkirina pirsa Kurd heye û hejmarek mafên demokratîk û neteweyî yên Kurd bi riya demokrasiyê tên bi dest xistin, lê ev tenê aliyekî meseleyê ye, **aliyê din ev e, ku bê çareserkirina pirsa Kurd, bê qebûlkirin û îtirafkirina bi mafên Kurd, demokrasî serî nagre.**

Eger girîngî tenê bi aliyekî demokrasiyê bê dayîn, ew pêvajoya demokrasiyê ne temam û nuxsan dimîne. PDK'ê di nivîsîn û belavokên xwe de zêde girîngî dida vî aliyê demokrasiyê. PDK'ê dixwest ji nû ve li ser bingeha wekhevî û qebûlbûna mafên her du gelan, bi dest hatina armancên dûr û nêzîk yên wan, biratiya Kurd û Ereban pêk bîne.

Wê demê em di vê baweriyê de bûn, Yekîtiya serdema paşatiyê, bi darê zorî, biryara koşka paşatiyê û biryara kevneperestane hatibû pêkanîn. Wê helwesta me bandor li Ebdul Kerîm Qasim kiribû, bi awayekî di gotinên xwe de li şûna **"Yekîtiya Kevin a Iraqê (الوحدة العراقية القديمة)"** wî digot: **"Yekîtiya rasteqîne ya Iraqê (الوحدة العراقية الصادة)."**

Lê wek PDK em di vê baweriyê de bûn, piştî Şoreşa 14'ê Tîrmehê, guhertinek mezin di Iraqê de çêbûye, bi awayekî ku bandor li Kurd jî kiriye, çimkî pêştir Kurdan xema hukimdariya Iraqê nedixwarin.

Ebdul Kerîm şoreş kir, hevpariya Kurd û Ereban qebûl kir, behsa çareserkirina pirsgirêkên çandiniyê dikir, ji ber wan helwestan piraniya gelê Kurd sala yekem pişta komarê û Ebdul Kerîm Qasim digirt.

❖ Di xebata siyasî de PDK'ê çend awayê xebatê bi kar dianî?

Yek ji awayên xebata siyasî ya PDK'ê danîna têkiliyan bi partiyên din re bû. Wê demê serokatiya partiyan li Bexdayê bûn, lewma bi awayekî normal têkilî navbera wan de hebû. Wek mînak heftane û dem bi dem têkilî, danûstandin, bi hev re karkirin û hizirkirin di navbera PDK'ê û Partiya Nîştimanî ya

Demokratîk, Partiya Nîştimanî ya Teqedum, partiya komunîst û rizgarîxwazên din de hebûn, ku dixwestin komara Iraqê ava bikin. Beşdarîkirina PDK'ê di rêxistinên iraqî de, awayekî din yê xebata siyasî bû, wek beşdarîkirina di sendîkaya parêzeran, aborînasan, endazyaran, mamosteyan û rojnamevanan, ku ez bi xwe di desteya rêveberiya sendîkaya rojnamevan de nûnerê PDK'ê bûm.

Her wisa wê hingê PDK'ê dixwest rêxistinên kurdistanî yên wek yekîtiya xwendekaran, ciwanan û jinan ava bike, lê ji ber zêhniyeta iraqçîtiya Ebdul Kerîm Qasim serî negirt. **Partiya Komunîst a Iraqê bi berfirehî dijatiya avakirina wan rêxistinan dikir û wek cudaxwazî, bêtifaqî û xizmetkirina dijminên komarê dida zanîn.**

Ya rast wê demê, Partiya Komunîst a Iraqê tevî ku di warê siyasî de peymanek bi PDK'ê re îmze kiribû û mafê xweseriyê qebûl kiribû, **lê li hember daxwaz û mafên neteweyî yên gelê Kurd gelek bi nerewa tevdigeriya**.

Wek mînak PDK'ê daxwaza perwerdeya kurdistanî dikir, lê wan tirane dikirin û digotin "Perwerdeya Qilyasanê," **tiranê xwe li peyva Kurdistanê û xwestekên gelê Kurd dikirin**. Hetta rêza wê peymanê nedigirtin ku bi PDK'ê re îmze kiribûn.

Hevkariya du alî li ser xwesta partiya komunîst bû sedem PDK sloganên xwe biguhere, slogana **xweseriyê** ket şûna federaliyê yan mafê diyarkirina çarenivîsê, ev jî guhertinek mezin di siyaseta PDK'ê de bû.

Çimkî bû sedem **PDK ji mafê çarenivîsê, dewleta federal û konfederal, dakeve ser xweseriyê**.

Yanî wiha hizir dihat kirin, Komara Iraqê ya Kurd û Ereba ye û li deverê keleha dijî împeryalîzê û kevneperestiyê ye.

Ji bo parastina wê komarê pêwîs e nêrîna xwe li hev nêzîk bikin. Ji hinek xwestekên xwe dakevin xwarê, dibe ku bi wê yekê bikarin di çarçoveya vê komarê de, wan armacan bi dest bînin yên dikevin çarçoveya mafê xweseriyê.

Di encama Şoreşa 14'ê Tîrmehê û fişara helwesta nerewa ya Partiya Komunîst a Iraqê de, slogana xweseriyê vegeriya nav Tevgera Rizgariya Kurdistanê. Her wisa serokatiya PDK'ê bi taybetî Mela Mistefa wê demê gelek caran dijî Kurdistanê û kurdatiyê diaxivî.

Piştî vegriyana ji Yekîtiya Sovyetê, Mela Mistefa dema pêşwaziya xelkê di axaftinekê de got: **"Em hemû iraqî ne, hemû bira ne, tu ferqek navbera Kurd, Ereb, misilman û xiristiyaniyan de nîne û hemû leşkerê Ebdul Kerîm Qasim in."**

Gelek caran digot: **"Xwastina her tiştekê ku bibe sedema cudahî û nakokiyan, bê tifaqiye."** Carekê dema pêşwaziya ciwanan, xwendekaran û jinan li Silêmaniyê gotibû: **"Ev cudahî çima heye? Ciwanên Kurdistanê vê yekê naxwazin û em hemû iraqî ne."**

Nêrîna Mela Mistefa derbarê biratiyê gihîştibû astekê, razî nebû tu daxwazekê bike, ku bêhina cudabûnê bide. Dema gotûbêja Mela Mistefa û Ebdul Kerîm Qasim li ser îzna fermî a karkirina PDK'ê, ji bo Mela Mistefa ne şert bû, ku navê Kurd an Kurdistanê pêve be.

Ew helwestên Mela Mistefa ji aliyekî ve û fişarên Partiya Komunîst a Iraqê û iraqçîtiya Ebdul Kerîm Qasim ji aliyê din

ve, bûn sedemm, hinek ji sloganên kevin ên PDK'ê bi awayekî bên guhertin ku bi rewşa nû ya Iraqê û xebata siyasî ya PDK'ê re biguncin. Her di wê çarçoveyê de bû, ku Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Kurdistanê û Yekîtiya Ciwanan a Iraqê bibin yek û ser navê Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Iraqê çalakiyan bikin. Her wisa di Havîna 1959'an de bi wî navê nû di yekem kongreya ciwanan de beşdar bin.

❖ Wê demê têkiliyên PDK'ê bi welatên sosyalîst re çawa bûn?

Têkiliya PDK'ê bi piraniya wan welatên sosyalîst re hebû ku li Bexdayê balyozxaneyên wan hebûn. Serdanên du alî vexwendin û mêvandarî navbera wan de hebûn, her wisa hinek caran şandeya PDK'ê ji bo wan welatan ve dihat vexwendin.

Rojnameyên me nûçeyên wan welatan diweşandin ku têkiliyên wan bi PDK'ê re hebûn bi taybetî PDK'ê girîngiyek taybet dida têkiliyên bi Sovyet û Çînê re. Di nav welatên sosyalîst de girîngiyek taybet a Almanya Demokratîk (Almanya Rojhilat) ba PDK'ê hebû ku wê demê hêj wek welatekî fermî nedihat naskirin, ji ber wê yekê tenê konsulxaneya wê li Bexdayê hebû.

Me her tim nûçeyên Almanya Demokratîk belav dikirin û me dixwest Almanya Demokratîk bi fermî bê naskirin. Ew helwesta me bibû sedem da ku têkiliyek taybet navbera PDK'ê û Almanya Demokratîk de çê bibe. Di encamê de, Mamoste Îbrahîm Ehmed ji bo Berlîna Rojhilat hat vexwendin.

Beriya ku PDK îzina fermî ya xebatê bistîne, li tevahiya navçeyên Kurdistanê bi navê rojnameya Xebatê, baregeh hatin vekirin. Ya rast ew baregehên PDK'ê bûn. Di wan baregehan de çalakî, civîn û rêxistinên partiyê dihatin lidarxistin. Lê dema ku dihat gotin baregeha Xebatê, her kesî dizanî Xebat organa Partiya Demokrat a Kurdistanê ye û ew cih baregehên partiyê ne.

Roj bi roj çalakiyên PDK'ê zêde dibûn, bi hezaran kes bûne endamên partiyê bi hezaran kes tevlî rêxistinên yekîtiya ciwanan, xwendekaran û jinan bûn, wan jî di hemû astan de dest bi çalakiyan kirin. Li gelek cihan di nav cotkaran de çalakiyên partiyê hebûn, di encamê de piraniya herî zaf a yekîtiya cotkaran li Kurdistanê ket dest partiyê û alîgirên partiyê di hilbijartinê de serketin. Girîngiyek mezin a wan serketinan hebû, çimkî piraniya xelkê Kurdistanê cotkar bûn û tevgera nişتimaniya wê serdemê, di bingehê de wek tevgera cotkaran dihat naskirin.

Beşek din a cotkaran jî di bin bandora Partiya Komunîst a Iraqê de bû, lê di hilbijartinê de li gelek cihan PDK serdiket, ji ber wê yekê li Hewlêr, Silêmanî û heta astekê jî li Kerkûk û Mûsilê, cotkar zêdetir di bin bandora PDK'ê de bûn.

Wê serdemê çalakiyên partiyê ji civînên bi welatiyan re, komkirina xelkê û rêxistinan pêk dihat. Her wisa di helkeftên wek Newrozê, damezrandina PDK'ê, Şoreşa Berzan, Şoreşa 14'ê Tîrmehê, serhildanan, bîranînên nişتimanî, iraqî û neteweyî de mîtîng dihatin lidarxistin.

Di wan civîn û mîtîngan de berpirsên PDK'ê beşdar dibûn û ji xelkê re diaxivîn û bîr û nêrîn û helwestên PDK'ê ji wan re

şirove dikirin. Baregeha PDK'ê li Bexdayê di nav Kurdên Feylî û şêniyên Kurd ên wî bajarî de hebû û rolek girîng di rêxistina mîtînga Newrozê û bîranînên din ên niştimanî de didît.

Sala yekem û duyem a serokwezîriyê, Ebdul Kerîm Qasim bi xwe di wan helkeftên me de beşdar dibû û gotar pêşkêş dikir û bi germî ji aliyê cemaeta PDK'ê ve dihat pêşwazîkirin. Her wisa roja 21'ê Adara 1959'an hikûmetê Newroz bi navê "Cejna Darê" wek helkeftek fermî ragihand.

Wê serdemê PDK'ê hewl dida hevkarî û dostanî di navbera partiyên Iraqê de hebe û dixwest wan li hev nêzîk bike. Lê helwesta partiya komunîst bibû sedem partiyên din jî wek Partiya Niştimanî ya Demokratîk girîngiyê nedin wê hewla PDK'ê.

Têkiliyên PDK'ê bi partiyên din ên Iraqê re baş bûn, lê Partiya Komunîst a Iraqê bi xwe têkliyên xwe bi wan re têk dida, bi taybet wê partiyê du reftarên gelek xirab kirin.

Yekem: Dema Partiya Niştimanî ya Demokratîk çalakiya xwe ya siyasî rawestand, partiya komunîst grupek biçûk ji wê partiyê cihê kir û wek Partiya Niştimanî ya Demokratîk da nasîn, lê Partiya Niştimanî ya Demokratîk a sereke ew karê partiya komunîst red kir.

Duyem: Partiya komunîst di nav PDK'ê de jî hewl da Hemze Ebdula, Nejad Ehmed Ezîz, Xesrew Tofîq û Hemîd Osman û yên din ku bi biryara kongreyê ji partiyê hatibûn derkirin, mezin bike û bêje: Ev PDK'yiyên resen in.

Piştî konferansa heftê Cotmeha 1959'an ku li Bexdayê hat li-darxistin, şandeyek PDK'ê bi serokatiya Omer Debabe

serdana Partiya Komunîst a Iraqê kir, da ku hajî wan biryaran bin, ku di kongreya PDK'ê de hatibûn dayîn. Li gorî biryarên kongreyê her yek ji Hemze Ebdullah, Hemîd Osman, Salih Heyderî, Nejad Ehmed Ezîz, Xesrew Tofîq û Cemal Heyderî ji PDK'ê hatibûn derkirin.

Serokatiya Partiya Komunîst a Iraqê kaxiza ku biryarên kongreyê tê de hatibûn nivîsandin, gelek bi tundî û ne dostane avêtibûn û gotibûn: **"Di bingehê de em qet îtirafê li we nakin û hûn partî nayên hesabê, partiya sereke ya Hemze Ebdullah û hevalên wî ye."**

Omer Debabe jî bi tundî bersiva wan dabû û rabibû were, wê demê Ezîz Mihemed ku di civînê de bûye, diçe û Selam Adil ji meseleyê dihisîne. Selam Adil yekser tê Omer Debabe vedigerîne û dibêje **"Nexêr, hûn partî ne, gotina wan kesan nêrîneke kesî ye, kongreya we her biryarek dabe, em wek partiya komunîst rêzê lê digrin."**

Ya rast eger ew helwesta Serokê Partiya Komunîst a Iraqê Selam Adil neba, têkiliyên PDK'ê û partiya komunîst bi temamî têk diçûn. Helbet rolek baş a her yek ji Selam Adil û Ezîz Mihemed di berdewambûna têkiliyên PDK'ê û partiya komunîst de hebû.

Çalakiyek din a PDK'ê ev bû ku cara yekem kongreya xwe ya eşkere bi amadebûna ajansên biyanî li dar xist. Mixabin min nekarî di wê kongreyê de beşdar bim, çimkî wê hingê li ketîbeya çarem a tangan ez efserê îhtiyat bûm.

Her wisa her yek ji Dr. Ezîz Şemzînî û Nûrî Ehmed ku efser bûn, ew jî bi min re bûn, me her sêkan bi cilên leşkerî ji dûr

ve temaşeyî kongreyê dikir, mafê me yê beşdariyê nebû, lê ji dûr ve me rola xwe dît û ya pêwîst kir[25].

……

[25] Di pirtûka xwe ya bi navê “Siyaseta Yekîtiya Sovyetê li hember Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurd 1945’an-1968’an” de **Mêvan Mihemed Hisên Reşîd Bamernî** dibêje:

Yekîtiya Sovyetê pişta **serhildana Şoreşa Îlonê** li dijî desthilata Ebdul Kerîm Qasim nedigirt û di vê baweriyê de bû, **ev şer di demek ne maqûl de qewimiye**, dibû bi riya siyasî û aştiyane pirsgirêk bi Ebdul Kerîm Qasim re bihata çareserkirin, ne ji riya leşkerî. Tevî wê yekê **Yekîtiya Sovyetê pişta xwe neda Tevgera Rizgariya Gelê Kurd**, belkî heta astek baş alîkariya wê tevgerê kir.

Geşbûna Şoreşê û Meseleya Caştiyê

❖ Şoreş di kîjan warî de baş pêş çû yan astengî jê re çûbû?

Şoreşa Îlonê ya 1961'an şoreşeke bêplan bû ku di encama girseyên eşîran de serî hilda û PDK rastî şer anî. Eger Mela Mistefa ew siyaseta ne rast li hember girseyên eşîran negirtiba ber, dibû ku me bikarîba di çend mehan de xwe ji bo şoreşeke gelek baştir amade bikira.

Me dikarî çend bajar û navendên leşkerî bigirin yan ji leşker û polîsan bixwazin tevlî me bibin, di encamê de me dikarî bi hezaran çek, bi dehan top û cebilxaneyek mezin bi dest bixin û bi plankirî dest bi şoreşê bikin, ne bi wî awayî ku destpêkê girseyên eşîran rabûn û paşê jî bi revê û şikistê dawî pê hat.

Bi nêrîna min, her serhildanek çekdarî ku rastî şikistê hat, bi hêsanî nikare rabe. Pêwîst e her ji destpêkê ve planek maqûl û rast ji şoreşê re bê danîn, çimkî yek ji şertên serketina şoreşê ev e, pêngavên wê roj bi roj ber bi serketinê û pêşketinê bên avêtin. Eger li destpêkê rastî şikistê hat û neçarî paşvekişînê bû, mîna ya ku li serê girseyên eşîran hat, ew bi xwe dibe sedema daketina morala xelkê û him jî dibe sedema nemayîna şertên şoreşê.

Çimkî yek ji şertên şoreşê serhildan û xwenîşandanên girseyî ye, dema digihîje astekê ku êdî xelk nikarin wek berê jiyana xwe derbas bikin, wê demê tevgera xelkê bi temamî ji bo xe-bat û fedakariyê amade dibe.Taktîka Mela Mistefa di komkir-ina eşîrên Kurd de ji ber ku bi hûrî nehatibû nirxandin, rastî

hejmarek astengan hat ji wan ez dikarim balê bikişînim ser van xalan:

Yekem: Berî destpêkirina şoreşê, girseyên eşîran gelek hêsan di encama êrişeke hikûmetê de hat şikandin, çimkî serhildanek bê coş û sist û sar bû.

Duyem: Mela Mistefa di dema xwe de yanî roja 11'ê Îlonê pişta serhildêran negirt, berevajî roja paştir Şêx Ehmed û Mela Mistefa peyama piştgiriya Ebdul Kerîm Qasim belav kirin. Piştre ku hikûmetê êrişî ser wî bi xwe kir, wê demê Mela Mistefa ji navçeya Barzan vekişiya.

Sêyem: Mela Mistefa li ser danîna plana serhildana şoreşê bi PDK'ê re neşêwirî, belkî hewl da li Tirkiyeyê û Sûriyeyê sitargehekê ji xwe re peyda bike.

Çarem: Li her cihekî ku PDK xurt bibûya û hêza çekdar çê bibûya li şûna vê yekê ku di bin serperestî û çavdêriya endamên partiyê de ba, Mela Mistefa dixist bin destê Barzaniyan an eşîran. Ev jî şaşiyeke din bû ku li hember xurtbûna şoreşê astengî çêkirin.

Ji ber wê yekê çêbûna Hêza Pêşmerge nebû sedema berfirehbûna rêxistinên PDK'ê berevajî li gelek cihan bû sedema şikist û lawazbûna desthilata partiyê.

Wek mînak, li Behdînan rêxistineke PDK'ê ya berfireh hebû, eger Mela Mistefa ew yek qebûl kiriba û pişta xwe bi rêxistinên partiyê, Hêza Pêşmerge, endam û alîgirên partiyê wek cotkaran ve girê bida, di encama wê siyasetê de partî û şoreş dê belavî tevahiya navçeyên Kurdistanê biban.

Di aliyekî din de, li parêzgehên Silêmanî û Kerkûkê bi pêşengiya PDK'ê xebata Hêza Pêşmerge serî hilda, rêxistina partiyê jî vejiya û ew rêxistinên ku ji kar ketibûn, carek din zindî bûn û dest bi çalakiyan kirin.

Barzanî û Partîtî

❖ Wê demê baweriya Barzanî bi xebata partîtiyê nebû?

Di demekê de ku li gelek navçeyên Kurdistanê Hêza Pêşmerge hatibû pêkanîn lê li devera Behdînan di bin serokatiya Mela Mistefa bi xwe de, Hêza Pêşmerge bi awayekî eşîrtî dihat rêvebirin. Barzanî her yek ji kesên nêzîkî xwe kir berpirsekî, Elî Xelîl (Elî Xelîl Xoşewî) kir berpirsê navçeya Duhokê, Îsa Swar kir berpirsê navçeya Zaxoyê, Heso Mîrxan kir berpirsê navçeya Şêxan û Es'ed Xoşewî jî kir berpirsê tevahiya deverê.

Barzanî tevahiya rêxistina partiyê xist bin desthilata xwe û kesên girêdayî xwe. Taybetiyek din a nebaş a Mela Mistefa ev bû, di her cih û civînekê de, li cihê ku wek serokê PDK'ê berevanî bikira, êrişî partiyê dikir. Eger kadroyekî partiyê karekî şaş kiriba yan bi gotina berpirsê xwe nekiriba, di her civînekê de eşkere behsa wî kesî dikir û digot: Filan kadroyî ew kar kiriye.

Ya rast civînên Mela Mistefa bibû cihên dijûn dayîn, bêhurmetîkirina bi PDK'ê û kadroyên wê û belavkirina vê gotinê ku hebûna partiyê tê wateya bêtifaqiyê. Hez nedikir kesek behsa xirabiya navbera axa û cotkaran, karker û dewlemendan bike. Yasaya reforma çandiniyê gelek xirab didît, tenê di vê

baweriyê de bû, divê jiyana eşîrtiyê bê vejandin, bi xwe jî ji bo wê yekê hewl dida.

Wek mînak balê dikşînim ser çend mînakan: Sala 1962'yan Mela Mistefa hat navçeya Balekayetiyê, berpirsê wê navçeyê endamekî PDK'ê bi navê Mela Teha bû, xelkê gelek piştgiriya wî dikirin, lê Mela Mistefa ew rakir û axayek dianî şûna wî û kir berpirsê navçeya Bêtwate û Dola Baleyan.

Her wisa Omer Debabe ku endamê komîteya navendî ya PDK'ê bû rakir û li şûna wî Enwer Begê Bêtwateyê dianî ku caşekî navdar bû.

Li Sefînê kadroyê partiyê rakir û li cihê wî Mehmûd Kawanî dianî û kir berpirsê wê navçeyê. Bi kurtî Mela Mistefa biçûya her derekê desthilat ji kadroyê partiyê stand û dida axa û eşîran.

Mela Mistefa şikandin û rakirina kadroyê partiyê ji berpirsyariyan ji xwe re kiribû erkek girîng.

Ji ber wê yekê di Şoreşa Îlonê de, rêxistin û hizbatî kirin karekî hêsan nebû, him li destpêka şoreşê û him jî dema serhildana wê.

Tevî wan astengiyan, li parêzgehên Kerkûkê û Silêmaniyê ku ez berpirsê partiyê bûm, navçeyên me di warê pêşmergetiyê de pêşket û heta astekê ew pêşketin li parêzgeha Hewlêrê jî pêk hat, heta wê demê ku Mela Mistefa nehatbû, piştî hatina wî rewşa wê derê jî têk çû.

❖ **Xwendewariya Barzanî di çi astekê de bû, name û daxuyaniyên ser navê wî dihatin weşandin, bi xwe dinivîsîn yan kesên din?**

Ya rast Mela Mistefa Barzanî zilamekî jîr bû, têgihîştina wî ji siyaseta navdewletî û ya welatên deverê gelek baş bû. Barzanî bi wî awayî nebû ku ew çar efser behsa wî dikin. Lê Barzanî nivîskar nebû ku babetan binivîse û dabirêje.

Ew di vê baweriyê de bû, gelek ji serokan li cîhanê nivîskarên wan hene û ji wan re dinivîsin. Ez bi xwe di vê baweriyê de me, wek gelek ji serkirdeyên cîhanê, kesên ku cihê baweriya wî bû, gotinên wî dinivîsîn. Li Bexdayê ez kesekî nêzîkî Barzanî bûm, hinek caran min gotinên wî dinivîsîn.

Dema ku rojnamevanan pirs jê dikirin, digote min bi vî awayî bersiva wan binivîse, min jî li gorî gotinên wî bersiva rojnamevanan dinivîsî. Serdemekê jî Hemze Ebdullah lê nêzîk bû û bersivên wî yên nivîskî didan.

Dema dawiya şoreşê, nizanim kê bersiva wan name û nivîsan jê re dinivîsîn, ku jê re dihatin. Yanî bi xwe nivîskar nebû ku bikare bi zimanê kurdî û erebî bi başî binivîse, lê xalên sereke yên nivîsê bi xwe destnîşan dikirin. Piştî temambûna nivîsê, pêwîst bû carekê jê re bixwînî, eger hinek hevok bi dilê wî neban, digot bi vî awayî biguhere.

Xurtbûna Pêşmergeyan û Vejîna Encumenên Gundan

❖ Çawa Hêza Pêşmerge hat rêxistin û xurt bû?

Di heyama sal û nîvekê de li parêzgehên Silêmanî û Kerkûkê rêxistina Pêşmerge hat pêşxistin û bi hezaran pêşmerge di warê cil û bergan û pêdiviyên din de, bi navê nû hatin rêxistin

û bi ser liq, pel û desteyan de hatin parvekirin, her wisa curek nû ya bêtêlê ji wan re hat kirin.

Di salên yekem û duyem de, Mela Mistefa bikaranîna bêtêlê wek pêwsîtî li me qedexe kir û digot: Hûnê çi li bêtêlê bikin? Hikûmet guh didê. Nedihîşt bi riya bêtêlê nûçe bên belavkirin.

Berî hatina Mela Mistefa, karûbarên navçeyên parêzgeha Hewlêrê baştir bû. Li parêzgeha Silêmaniyê hejmara endaman zaf bû, ji rûyê leşkerî jî PDK xurt bibû. Lê piştî ku Mela Mistefa hat, rewş hat guhertin bi taybetî Mela Mator ku kesekî serkêş û zimanxirab bû çendîn şaşî kirin.

Di encama reftarên Mela Mator û Mela Mistefa de ziyaneke mezin li PDK'ê ket, karên ku me li parêzgehên Hewlêr, Silêmanî û Kerkûkê kiribûn hemû bi heder çûn, em naçar bûn carek din dest pê bikin.

Hêzeke baş a pêşmerge hatibû pêkanîn, çalakiyên me di astek baş de li çiya û nav bajaran berdewam bûn, rêxistinên partiyê di nav gundan de jî zêde bibûn, kadroyên ku li ser siyaseta PDK'ê û bîr û nêrînên wê dixebitîn, hejmara wan zêde bibû. Her wisa careke din encumenên gundan vejiyan. ji bo rêvebirina karûbarên her gundekî, encumenek jê re dihat hilbijartin. Du qezencên wan encumenan hebûn:

Yekem; xelk hînî demokrasiyê û hukimdariya xwe dikir.

Duyem; rê li ber dubarebûna pergala begatî, axatî û eşîrtiyê digirt.

Her wisa bi rêxistina nû me karî xebata bajaran û gundan bi hev re girê bidin.

Helbet li ser pêşniyara min ji aliyê komîteya navendî ve ava-kirina encumenên gundan bi piraniya dengan hat pejirandin û ket praktîkê.

Bi riya rêxistina xwe ve, me karî rêxistinên nav bajaran pêş bixin, bi taybetî bi teşwîqkirina serbaz û polîsan da ku dev ji hikûmetê berdin û bêne nav refên Pêşmerge.

Roleke mezin a polîsan di destpêka şoreşê de hebû, gelek ji wan endamên PDK'ê bûn û roleke wan a baş di hevkarîkirina pêşmerge û teslîmkirina bingehên leşkerî de hebû.

Du Xetên Siyasî di Nav Partiyekê de

❖ Gelo xelk ji cudahiya nav serokatiya şoreşê yan navbera partiyê û Barzanî hisiya bû?

Belê, xelkê eşkere du siyaset di nav şoreşê de didîtin. Siyasetek ku Mela Mistefa rêve dibir û dijî xebata partîtî û rêx-istina bi awayekî nû bû, her wisa pişta tevgera eşîrtiyê û des-thilata mutleq digirt.

Siyaseta din jî, siyaseta PDK'ê bû ku dixwest bi awayekî nû pêşmerge rêxistin bike û girseyên xelkê ji bo xebatê amade û rêberî bike.

Mixabin demek zêde derbas nebû ku Mela Mistefa hat navçeya Soranê. Ya rast eger ew her li Behdînan ba baştir dibû, wê hingê parêzgeha Hewlêrê jî di warê rêxistinê de mîna Silêmaniyê lê dihat, bi awayekî modern şoreş û partî pêş diket lê piştî hatina wî, encam ew bû ku me dît.

Bi van her du xetên siyasî, cureyek ne zelalî him di serokatiya partiyê de, him di rêxistinê de û him jî di serederîkirina bi xelkê re ketibû rojevê.

Di heyameke kurt de cudahiya navbera Mela Mistefa û partiyê hat hiskirin. Wek mînak, carekê Ebdul Kerîm Qasim lêbuhurînek ji bo Kurd derxist bi vî şertî ku navê xwe ji bo operasyona rizgarkirina Kuweytê qeyd bikin.

Wê demê Kuweytê serxwebûna xwe ragihandibû, Ebdul Kerîm jî red kir û digot: Kuweyt beşek ji Iraqê ye û ji aliyê xwe ve, bi derxistina fermanekê mîrê Kuweytê wek qaymeqam danasîn.

PDK'ê dijî wê lêbuhurînê daxuyaniyek weşand û ragihand; pirsa Kurd ne meseleya lêbuhurînê ye, belkî meseleya qebûlkirina mafê Kurd, demokrasî û azadiyê ye.

Lê berevajî PDK'ê, Mela Mistefa li Behdînan lêbuhurîna Ebdul Kerîm qebûl kir û şandeyek pêkhatî ji Elî Eskerî û du kesên din şand cem qaymeqamê Şêxan û hikûmet agahdar kir, ku amade ne navê xwe qeyd bikin û bi xwebexşî şerê rizgarkirina Kuweytê bikin.

Ebdul Kerîm Qasim piştî wê helwestê, Hesen Ebûdî şand cem Mela Mistefa, lê piştî ku Hesen Ebûdî ji navçeyê vegeriya, bi fermana Ebdul Kerîm navçe hat bombebarankirin, bi wê yekê bêbawerî ket navbera Ebdul Kerîm Qasim û Mela Mistefa.

Beşa Heştem
8
Diyalog û Xebata Dîplomatîk

- Têkiliya Beis û PDK’ê
- Yekem wezîrên Kurd
- Destpêka nakokiyên PDK’ê û Barzanî
- Barzanî û nasnavê “Mamoste”
- Darbeya Sibata 1963’yan
- Diyaloga PDK’ê û Beisiyan

Têkiliya Beis û PDK’ê

❖ Pêş darbeya Beisiyan a 1963’yan tu hewleke wan a têkiliyê bi PDK’ê hebû?

Havîna 1962’yan grupek efseran bi riya efserê Kurd Kerîm Qerenî têkilî bi PDK’ê re danîn ku piraniya wan neteweçî, Nasirî û Beisî bûn. Wisa nîşan didan, ku Efserên Azad in û ji bo rakirina Ebdul Kerîm Qasim ji desthilatê xwe amade dikin, lê dixwazin PDK û Kurd hevkariya wan bikin.

Polîtburoya PDK’ê jî ji bo dayîna bersiva wê grupê, Mamoste Îbrahîm Ehmed, Nûrî Şaweys, ez û Omer Debabe wek şandeyekê em rê kirin, cem Mela Mistefa da ku nêrîna wî di wê barê de bizanin.

Wê hingê Mela Mistefa û Elî Eskerî li parêzgeha Hewlêrê bûn. Dema em gihîştin, dubare Mela Mistefa dest bi êrişa ser PDK’ê kir û dijûn da partiyê, kadroyan û rêxistinê.

Piştre ku em hatin ser meseleyê, me gotê: Grupek efseran daxwazek wiha ji PDK’ê kirine, em hatine da ku nêrîna cenabê te di wê barê de bizanin.

Di bersivê de Mela Mistefa wiha got:

“Bêjin em hejar in, Misilman in, zilm li me tê kirin, divê zilm li ser me nemîne, ji bilî vê yekê em tiştekî din naxwazin.”

Lê me got: Em dixwazin dewa xweserî û demokrasiyê bikin.

Vê carê Mela Mistefa wiha bersiv da:

“Ev gotinên pûç çi ne? Xweseriya çi? Hema bila tenê vê zilmê li ser me rakin!”

Yekem Wezîrên Kurd

❖ PDK'ê çi pêşniyarek ji hikûmeta Beisiyan re kir?

Wê grupa efseran daxwaza navê çar kesan ji bo beşdariya me di çar wezaretan de kiribû. Ji bo wê yekê me navê çar kesan da Mela Mistefa û me gotê:

Navên kesên hizbî ew dayîne, wî jî navên van kesan diyar kir: Babe Elî, Fuad Arif, Bekir Ebdul Kerîm, Celal Talebanî û Elî Eskerî û got: **"Bila hikûmet ji nav van pênc navan, çar kesan hilbijê re."**

Tevî ku me rica lê kir, navê min û Elî Eskerî tê de nebe, lê wî qebûl nekir. Lewma bi wî awayî ku me dixwest, me nav ji hikûmetê re şand.

❖ We çi bersivek di wê barê de da Beisiyan ?

Dawiya Mijdara 1962'yan em ji cem Mela Mistefa vegeriyan. Wek polîtburo em civiyan û me biryar da, şertên xwe bi vî awayî ji Beisiyan re bişînin:

- **Yekem: Piştî serketinê divê Mela Mistefa bibe Serokê Herêma Xweser a Kurdistanê.**
- **Duyem: Bi fermî îtirafê bi xweseriya Kurdistanê bikin.**
- **Sêyem: Demokrasî û azadiyê bidin xelkê Kurdistanê û meseleya caştiyê jî çareser bikin.**

Piştre Tahîr Yehya bersiv da û got: Daxwazên we hatine qebûlkirin.

Destpêka
Nakokiyên PDK'ê û Barzanî

❖ Di vir de nakokiyê di navbera Barzanî û we de dest pê kir?

Di vê pirsê de nakokiya navbera partiyê û Mela Mistefa zêdetir eşkere bû. Êdî di her civînekê de, xelkê behsa wê nakokiyê dikirin.

Her di wê çarçoveyê de rojnamevanê amerîkî Dana Adams Schmidt sala 1962'yan serdana Kurdistanê kir.

Ya rast **wek PDK di asta navdewletî de me nedixwest, têkiliyê bi Amerîkayê re dayînin** û di vê baweriyê de bûn, pêwîst e berî hertiştekî, nêrîna Sovyetê di wê barê de bizanin.

Lê Mela Mistefa gelekî hewl dida, têkiliyê bi Amerîkayê re dayîne.

❖ Dîroka caştiyê kengê û çawa dest pê dike?

Beriya serhildana Şoreşa Îlonê jî caştî hebû. Piştî ku hikûmetê ragihand**:** Mela Mistefa dijatiya komarê dike, eşîrên ku pêştir di navbera wan û Barzanî de dijminatî hebû, çûn û çekên caştiyê ji hikûmetê wergirtin.

Ya rast Ebdul Kerîm Qasim ji nû ve caştî zindî kir. Wî tevahiya eşîrên mîna Zêbarî, Herkî, Sûrçî, Nêrweyî û Biradostî kom kirin ku dijminatiya kevin di navbera wan û Barzanî de hebû û piştre ew çekdar kirin.

Li navçeyên Soran, Ebdul Kerîm caş afirand wek mînak **li parêzgeha Silêmaniyê Mehmûd Feqê Mihemed Hemewendî wek yekem caş çekê hikûmetê hilgirt**. Her wisa hinek cotkarên

girêdayî partiya komunîst bi hinceta berevaniya ji komarê çek hilgirtin û şerê şoreşê kirin.

Ji bo çareseriya caştiyê me plana "**Hukmê Gel**" bi kar anî. Di wê çarçoveyê de Mehmûd Feqê Mihemed Hemewendî ji aliyê Pêşmerge Selam Mela Sabîr ve di nav bajarê Silêmaniyê de hat kuştin. Tevî ku piştî kuştina wî caştî kêm bû, lêbelê li navçeyên din caştiyê serî hilda û bi hezaran kes bi taybetî dijminên Barzanî bûne caş.

Li parêzgehên Silêmanî û Kerkûkê caştî gelek kêm bû. Diyardeya caştiyê piştî hatina Beisiyan berfireh bû û navê "**Fersan Selahedîn** (فرسان صلاح الدين)" lê kirin ku tê wateya Siyarên Selahedîn.

Beisiyan hejmarek mezin ji eşîrên Ereb li Kurdistan û navçeyên din bi cih kirin, her wisa tevahiya eşîrên Kurd yên dijî Barzanî çekdar kirin. Bi darê zorê xelk çekdar dikirin, mafê wan çekdaran hebû, her tiştekî talan bikin. Gelek kes bi taybetî eşîrên Ereb ji bo talankirinê dihatin Kurdistanê. Beisiyan talankirina mal û milkê Kurdan helal kirin, tevahiya wan kiryaran bi navê caştiyê dihatin kirin û navê "**Fersan Welîd**" li wan kiribûn.

Nakokiyên navbera Barzanî û eşîrên neyarên wî, sedema sereke ya serhildana caştiyê bû. Bi awayekî di sê salên destpêkê yên şoreşê de, tenê neyarên kevin ên Barzanî caştî dikirin. Her wisa hinek serokên eşîrên ku pêştir pişta Barzanî digirtin, paşê xwe teslîm kirin û bi pere caştî kirin.

❖ Çi rolek caşan di nakokiya navbera Barzanî û PDK'ê de hebû?

Payîza 1962'yan dema ku nakokiya navbera PDK'ê û Mela Mistefa gihîşte astek gelek metirsîdar, caştî li Kurdistanê peyda bû, çimkî Mela Mistefa digihîşt her derekê rêxistina partiyê hildiweşand, kadroyên partiyê digirt an bi dû wan diket.

Hêza Pêşmerge dixist bin destê kesên eşîr, ji nû ve axatî ve-dijand. Ji ber wan kiryaran, Komîteya Navendî ya PDK'ê li "Şikefta Malumeyê" civiya da ku çareseriyekê peyda bike.

Barzanî û Nasnavê Mamoste

❖ Gelo rast e Mela Mistefa hez nedikir bêjnê "Mamoste"?

Belê rast e. Çîroka wê bi vî awayî ye. Civîna Komîteya Navendî ya PDK'ê ya Malumeyê biryar da, şandeyek pêkhatî ji Elî Eskerî, Omer Debabe, Ebdul Hisên Feylî, Haşim Eqrawî û min serdana Mela Mistefa bike û hewl bide, da ku razî bibe destwerdana xwe
di nav rêxistina partiyê kêm bike.

Wê hingê Mela Mistefa li maleka gundekî Bêtwateyê bû. Dema em derbasî malê bûn, Mela Mistefa li ber me rabû û ji Ebdulhisên xwest li hember wî rûnê, bixêrhatina Ebdul Hisên kir, wî jî nedizanî Mela Mistefa ji peyva "mamoste" tore dibe.

Mela Mistefa halê Ebdul Hisên pirsî; wî jî got:

"Destê te maç dikim mamoste gelek baş im."

Dema got mamoste, Mela Mistefa aciz bû û got: **"Tu bi xwe kurê sêyî."**

Ebdul Hisên şok bû û got: **"Mamoste min ku bêedebiyek li cenabê te nekir."**

Demek derbas bû rengê Ebdul Hisên spîçolkî bibû, got:
“Baş e mamoste min ci got, tu evqasî li min aciz bûyî?”

Mela Mistefa jî got: “Tu bi xwe kurê sêyî, hez dikî heta êvarê bêje min kurê sê, ez ê jî bêjme te tu bi xwe kurê sêyî.”

Lê Ebdul Hisên got: **“Axir ka min wisa gotiye?”**
Mela Mistefa got**: “Yê ku bêje min mamoste, wekî vê ye bêje kurê sê, ez ne mamoste me, mamoste wisa ye wisa ye!”**

Lê Hebas Axa digot: Ji ber ku niha mamoste zêde bûye, lewma Mela Mistefa hez nake jê re mamoste bêjin, ew nasnavekî dixwaze ku gelek kêm be yan tenê ji wî re bê gotin.
Piştî nanxwarinê Mela Mistefa tenişta min destê xwe dişûşt, bala xwe da min û got:
“Celalê dîn tu Xwedê ma ez rast nabêjim! Evqasî dibêjim xelkê nebêjine min mamoste, lê her dibêjin; ez jî wiha bersiva wan didim”. Min jî got: Ezbenî mafê te ye, li cem me jî derwêşek heye her çiqasî mirov bêje degal, ew … tiştekî din bibêje.
Dema min ew gotin kir, Barzaniyê rehmetî bilind keniya û acizbûna wî danî. Ya rast kêfa wî ji henekan re dihat.

❖ Diyar e wê demê têkiliya kesane te bi Barzanî re xirab nebûbe?

Têkiliya min bi Barzanî re gelek baş bû, nêrîna wî jî derbarê min baş bû. Wî tişt bi erênî ji min werdigirt. Bi awayekî derbarê meseleya Ebdul Hisên jî ku min behsa wê kir, min karî pê re biaxivim û bêjmê: Hinek caran mirov ji ber adetkirinê bi hinek peyvan, bi rastî dikeve şermê.

❖ Rast e Barzanî tu wek sekreterê PDK'ê pêşniyar kirî, lê paşê poşman bû?

Barzanî ji aliyê xwe ve guhertin di nav Hêza Pêşmerge de kir û biryar da, ez bibim cîgirê fermandarê giştî, yanî cîgirê wî bi xwe, min jî nekir. Piştre pêşniyar kir ez bibim sekreterê giştî yê PDK'ê li şûna Mamoste Îbrahîm Ehmed, lê min maqûl nedît û nekir, mesele bi wî awayî bû.

❖ Encama serdana we ya cem Barzanî hebû?

Di encama wan axaftinan de çareseriyek hat danîn ku daxwaz bê kirin cudahî di navbera pêşmerge û yên din de nemîne, me got: **"Bavo me jî wek eşîrekê bihesibîne, em jî bi te re ne."**

Wê demê ji bo hinek karên din ez li cem Mela Mistefa mam. Roja 14'ê Remezanê em ji navçeya Hebas Axa serê sibehê ber bi Pişderê ve diçûn. Mela Mistefa berî min gihîştibû, dema ez nêzîk bûm Mela Hesen sekinîbû, radyo di destê min de bû û min guhdariya nûçeyan dikir.

Çawa ku min berê got, kêfa Mela Mistefa ji henek û pêkenokan re dihat. Pêştir di nav xwe de me navê "Hemedok" lê kiribû. Li bajarê Koyeyê ji wî kesî re ku gotinên xweş û henekan bike "Dok" dibêjin. "Hemedok" li Koyeyê zilamekî baş û serokeşîr bû, me di nav xwe de jê re "Hemedok" digot, wî bi xwe jî dizanî em jê re "Hemedok" dibêjin.

Min gazî Mela Hesen kir: Hemedok razaye yan rabûye? Wî jî got: Dîno were rabûye. Min gotê: Bêjê mizgîniya min heye, darbe qewimiye. Êdî radyo vekirin "Darbeya Sibatê" qewimîbû û Ebdul Kerîm Qasim ji desthilatê hatibû rakirin.

Darbeya Sibata 1963'yan

❖ PDK agahdarî Darbeya Sibatê bû, têkiliya wê bi darbeçiyan re hebû?

Belê, PDK haj pê hebû. Bi du awayan têkilî di navbera PDK'ê û darbeçiyên Sibatê de hebû.

Yekem: Efserên darbeçî ku navê Efserên Azad li xwe kiribûn bi riya Efserê Kurd Kerîm Qerenî têkilî bi Sekreterê Giştî yê PDK'ê Mamoste Îbrahîm Ehmed re danîbûn. Mamoste û yek ji wan efseran bi navê "Tahîr Yehya" bi hev re axivîbûn, wî razîbûna xwe derbarê mafê xweseriya Kurdan nîşan dabû.

Duyem: Pêştir jî bi hevdîtina Salih Yûsifî û Elî Salih Seidî têkilî di navbera PDK'ê û Partiya Beis a Sosyalîst a Ereb de çê bibû. Salih Yûsifî heman daxwaz jê kiribû ku ji van xalan pêk dihat:

- **Qebûlkirina xweseriya Kurdistanê**
- **Bicihkirina mafên demokratîk**
- **Rêvebirina Kurdistanê ji aliyê PDK'ê ve**
- **Qebûlkirina Mela Mistefa wek Hakimê Giştî yê Kurdistanê**

Wek destpêk her du aliyan li ser pirsa xweseriyê li hev kiribû. Aliyê Beisî gotibû: Em amade ne xweseriyê bidin û îzna fermî ya xebatê jî bidin PDK'ê.

Aliyê Beisî gotibû: **"Li Kurdistanê rola me her çi be, li navçeyên erebî yên Iraqê jî rola we heman dibe."**

Şahidê wan sozan Dr. Celal Etasî bûye. Di pêşgotina pirtûka "Ereb û Kurd nêrîneke erebî derbarê pirsa Kurd" de ew dibêje:

"Piştî Şoreşa Sibatê (Darbeya Sibatê) em wek şandeyekê ji Şamê çûn Bexdayê, me Elî Salih Seidî dît."

Mi jê pirsî: **“Derbarê pirsa Kurd çi tişt heye?”**
Wî jî wiha bersiv da:
“Me soz dabû xweseriyê bidin Kurdan, lê niha em dixwazin tiştekî din bidin wan, eger qebûl kirin baş e, eger qebûl nekirin, em ê di nav du yan çar hefteyan de wan ji nav bibin.”
Min jî gotê**: “Kurd bi wî awayî ji nav naçe, ew riyeke şaş e.”**

Ev belgeyek e, şahid kesekî Beisî yê rêzdar e ku rastiya helwesta wê demê ya Beisiyan zelal dike, çimkî belgeya me ya nivîskî nebû, wan tenê ji riya Kerîm Qerenî ve têkilî danîbû. Şahidekî din jî heye, ku di hizûra Cemal Ebdul Nasir de behsa wê pirsê kiriye.

Piştî Darbeya Sibatê, Salih Yûsifî û Fuad Arif peyama pîrozbahiyê belav kirin. Helbet di belavkirina peyamê de Salih Yûsifî lez kir. Çimkî du xalên neyênî tê de hebûn.

- **Ew peyam û siyaseta polîtburoya PDK’ê bi hev re nedigun-can.**
- **Peyam bû sedem ku efserên Kurd li her derî pişta darbeyê bigirin.**

Wek mînank, bajarê Besreyê di dest kolonel Ebdul Qadir Fayîq de bû, ew jî rewşenbîrekî navdar bû, piştî peyama pîrozbahiyê, wî jî bi neçarî piştgiriya xwe ragihand. Çimkî peyamê wisa nîşan dida ku her du şoreş (Şoreşa Îlonê û Darbeya Sibatê) bi hev re girêdayî ne, tevî ku piraniya xelkê Iraqê peyama me ya pîrozbahiyê qebûl nedikirin.

Bandoreke xirab a wê peyama pîrozbahiyê jî hebû. Ew efserên ku li Kurdistanê bûn û girêdayî Ebdul Kerîm Qasim bûn, nêrîneke wan a pêşverû ya dijî Beisiyan hebû û dixwestin berevaniyê bikin, lê piştî peyamê bê hêvî bûn.

Wê demê Fermandarê Navçeya Mêrgesorê Kolonel Nebewî bû. Wî dixwest bi Lîtenanta xwe ve tevlî şoreşa Îlonê bibe, lê piştî belavbûna peyama pîrozbahiyê poşman dibe, bi çend leşkeran ve ji deverê direve. Wî digot:

"Eger ew peyama pîrozbahiyê neba û min bizanîba PDK dijî darbeya Beisiyan e, wê demê em ê tevlî DPK'ê ban."

Ev gotin, min ji zarê fermandar Nebewî bi xwe bihîst. Lê nêrîna min di wê barê de bi vî awayî ye:

Yekem: Salih Yûsifî ew peyam di bi bandora coça wê peymanê de dabû, ku pêştir digel Beisiyan hatibû kirin. Ji wê cemaetê bû ku baweriya wan a tam bi sozên Beisiyan hebû, hewl didan karekî bikin, rola wan di beşdariyê de hebe, da ku bikarin minetê bidin serê Beisiyan û destkeftiyekê bi dest bînin. Di demekê de çi roleke me wek PDK di wê serhildan û darbeya Beisiyan de nebû.

Duyem: Eger wê demê di navbera PDK'ê û Partiya Komunîst a Iraqê de hevkariyek tam heba û bi hev re planek bi vî awayî kiribana, eger li Bexdayê darbeyek leşkerî hat kirin, çawa bi hev re li Kurdistanê kar bikin? Wê demê me dikarî dest dayînin ser piraniya herî zede ya navçeyên Kurdistanê.

Helbet dema Darbeya Sibatê jî du nêrîn di nav PDK'ê de hebûn:

Yek ji wan nêrîna Polîtburoyê bû û di nameyekê de Mamoste Îbrahîm Ehmed ji Mela Mistefa re şandibû ku bi vî awayî nivîsîbû:

*"***Eger şerê Ebdul Kerîm Qasim û Beisiyan dewam bike, baştir e em bikevin nav bajarên Kurdistanê û piraniya navçeyan bixin bin kontrola xwe û dest bi çekdarkirina xelkê bikin**."

Her wisa di nameyê de hatibû gotin:
“Eger hikûmeta nû şertên me qebûl kir, gelek baş dibe lê eger qebûl nekir, wê demê çek, pere û gelek tişt di destê me de dibin, her wisa efserên ku dijî hikûmeta nû ne, tevlî me dibin.”
Nêrîna duyem a Mela Mistefa bû û wiha digot:
“Van karan nekin û baştir e, em firsetekê bidin hikûmeta nû.”

Ya rast ez jî wek Mela Mistefa difikirîm, di vê baweriyê de bûm, nêrîna polîtburoyê nakeve praktîkê. Lê paşê bûyeran derxist nêrîna polîtburoyê gelek dûrbîn û rast bû.
Lê niha ez bi vî awayî difirîm, eger roja darbeyê PDK’ê bangewaziyek bida û biketa nav bajaran di heyama wan du-sê rêjan de ku şer di navbera Ebdul Kerîm Qasim û Beisiyan de dewam dikir, dibû gelek kes bihatana nav PDK’ê û gelek kesan jî alîkariya me kiribana û me dê karîba çend bajarn bigi-rin, lê eger Salih yûsifî ew peyama pîrozbahiyê nedaba.
Wê demê em û Mela Mistefa li navçeya Pişderê bûn. Sê rojan şer dewam kir, Ebdul Kerîm Qasim hat kuştin, Beisiyan dest danîn ser Bexdayê. Wê rojê Salih Yûsifî ji Bexdayê hat ku Lo-qmanê kurê Mela Mistefa jî pê re bû û ji girtîgehê revîbû.

Her wisa Kerîm Qerenî jî hat navçeya ku Mela Mistefa lê bû.
Wê êvarê Mela Mistefa li mala Elî Hesen Axa li gundê Şerwêtê mêvan bû, hat agahdarkirin ku mêvanê wî hatiye û dixwazin PDK şandeyekê bişîne Bexdayê da ku digel des-thilata nû danûstandinê bike ka we çi heye û hûn çi dixwazin?

Diyaloga PDK’ê û Beisiyan

❖ Beisiyan dixwestin bi Kurdan re danûstandinê bikin?

Belê, Kerîm Qerenî wek nûnerê Hikûmeta nû hatibû, me gotê: “**Hikûmet çi dide Kurd**”. Wî jî got: Beriya hatinê wî û Tahîr Yehya hevdu dîtiye. Tahîr Yehya gotiye: **“Em li ser sozên xwe mane û bi cih dînin.”**

Wê demê Tahîr Yehya fermandarê giştî yê artêşê û endamê Meclisa Serkirdatiya Şoreşê bû. Salih Yûsifî jî her di wê baweriyê de bû, ku ew ê sozên xwe bi cih bînin.

Derbarê pêkhateya şandeya danûstandinan, Mela Mistefa got:

“**Bila şandeyeke eşîran pêkhatî ji Şêx Hisên Boskên Ebas Mamend Axa û hinek rusipiyên navçeyan biçin Bexdayê.”**

Lê Şêx Hisên Boskên wiha bersiv da:

“Cenabê Mela Mistefa, tu her derekê bêjî em ê biçin, lê em hajî pirsan nînin û siyasetê jî nizanin, yên ku hatine ser desthilatê kesên siyasî ne, ji bo wî karî şandeyeke pispor a siyasî pêwîst e.”

Mînak jî anî û got: **“Ji bo wî karî kesekî wek Mam Celal baş e**.”

Ebas Mamend Axa jî got: **“Rast dibêje”**. Kesên din ên eşîr jî ku li wir bûn, heman gotin kirin. Piştre Mela Mistefa got: **“Baş e bila Mam Celal biçe.”**

Bi pêşniyara kesatiyên eşîr, ez bûm nûnerê PDK’ê û Barzanî ji bo danûstandinê bi desthilatdarên nû yên Bexdayê re. Bi peyamekê min polîtburo jê agahdar kir, wan jî nûnertiya min pejirandin, piştre him wek nûnerê Barzanî û him jî wek nûnerê polîtburoya PDK’ê, ez çûm danûstandinê. Em çûn

Qeladizê, li wê derê me serî li fermandarê hêza parstina bajêr da, efserekî Kurd bi navê Hemîd Hacî Tayer bû, wî otomobîlek ji me re girt da ku me bighîne Silêmaniyê, şev em li Silêmaniyê man. Sibehê em ji bo kirîna kincan çûn bazarê. Ez her bi cilên kurdî hatibûm, pêlaveka lastîk di piyê min de bû. Xelkekî zaf berafî dora me bûn, hewar kirin û slogan dan û gotin: Bijî û biherife.

❖ Ew yekem diyaloga fermî ya PDK'ê bi darbeçiyan re bû yan pêştir diyalog navbera wan de hebû?

Belê. Piştî kirîna kincan, em çûne cem Fermandarê Hêza Parastina Silêmaniyê Zeîm Sidîq, wî bi helîkopterê em şandin Kerkûkê, ji wê derê ve em bi otomobîlê çûne Bexdayê.

Ez, Salih Yûsifî û Kerîm Qerenî bi hev re bûn, lê şande tenê ji min û Salih Yûsifî pêk dihat. Kekê Salih ji ber şarezabûnê bi me re hatibû, şande ser navê min bû. Wan êvarê em birin Hotêl Bexdayê ku wê demê ya herî baş bû.

Her wê êvarê Fuad Arif û Tahîr Yehya serî li me dan. Tahîr Yehya got: **"Wisa diyar e hûn ji bo bicihanîna sozan hatine."**
Û got**: "Her ew e ya em li ser rêkeftibûn, ew jî xweserî ye û tiştekî nû nîne."**
Min jî gotê**: "Belê her xweserî û bicihanîna wê ye."**
Wî jî got: **"Ew karekî hêsan e, gelekî bi xêr bî."**

Pêşwaziya wî gelekî bi germî bû, min jî gazinde kir û got**: "Çima di Meclisa Serkirdatiya Şoreşê de tu Kurdek nîne?"** Wî jî wiha got: **"Ne wisa ye."**

Got: **“Çawa dibe ku Kurd tê de nebin? Hingê ez çi me? Ez Kurd im** (شلون ما بيها آكراد، لعد شنو انا، آنا كرد)**”**. Paşê diyar bû ku Tahîr Yehya bi eslê xwe Kurd e.

Roja paştir serê sibehê wan her bi kincên kurdî, ez birim cem Serokkomar Ebdul Selam Arif.

Cara yekem bû ku min ji nêzîk ve ew didît. Bi xêrhatina me kir, bi erebî behsa Kurdistanê kir û got: “**Gelê me li Kurdistanê û birayên me çawanin** (شعبنا فی كردستان و آخوان شلونهم).”

Ya rast ez mat mam, çawa dibe Ebdul Selam bi vî awayî biax-ive, çimkî kesekî neteweçî, neteweçiyekî nasyonalîst û şovênîst bû.

Piştre Ebdul Selam wiha axivî:

“Em girêdayî sozên xwe ne derbarê wê peymanê ya ku me pêştir li ser li hev kiribû, em ê bi we re rûnên û bi cih bînin.”

Paş hingê min Ehmed Hesen Bekir û Salih Mehdî Emaş dît, wan gelek bi germî pêşwaziya me kirin û Salih Mehdî Emaş ku wê demê wezîrê berevaniyê bû, bi vî awayî axivî: **“Em li ser sozên xwe ne, em ê bi hev re rûnên, înşallah wan karan temam bikin.”**

Paşê gotin: Em dixwazin bi hev re bişêwirin. Me jî got gelek baş e.

Ya rast min hez nedikir, tenê di danûstandinan de beşdar bim, lewma ji bilî Salih Yûsifî, min ji Babe Elî û Fuad Arif xwest, ew jî beşdar bin (Wê hingê her du di hikûmeta nû ya Beisiyan de wezîr bûn).

❖ Bê agahdariya PDK’ê ew kiribûn wezîr yan berbijarê PDK’ê bûn?

Pêştir Mela Mistefa navên çar kesan dabû lê wan du kes hil-bijartibûn, Baba Elî û Fuad Arif. Şukur em tê de nebûn, çimkî paşê derket ew hikûmet kevneperest û xwînrêj e .

Civîna danûstandinan dest pê kir. Li aliyê me Ez, Salih Yûsifî, Babe Elî û Fuad Arif û li aliyê wan jî, Elî Salih Seidî, Salih Mehdî Emaş û du kesên din beşdar bûn. Min behsa daxwazî û lihev-kirina me û wan kir, lê Elî Salih Seidî behs guhert û got:

“Niha komunîst direvin û tên cem we, hûn jî wan xwedî dikin, ew jî nabe, helwesteke dijminatî ye.”

Min jî wiha bersiv da:

Yekem: Em ji bo pirsa xweseriyê hatine, ne ji bo meseleya komunîstan.

Duyem: Edetek me ya eşîrtiyê heye, her kes berê xwe bide me, em nikarin wî bigirin û teslîm bikin.

Sêyem: Em li dijî siyaseta qirkirina komunîstan e û wek siyaseteke xirab û kevneperest dizanin, hûn bi xwe jî dê ro-jekê jê poşman bibin. Hûn dizanin çiqasî cudahî navbera me û partiya komunîst de heye. Dema Ebdul Kerîm çiqasî li dijî me bûn? Çi anîn serê me? Lê ew kuştin û ji nav birin ne çarederî ye.

❖ Naveroka civînan li ser çi bûn, çi pirsgirêk hebûn?

Roja yekem, meseleya partiya komunîst bû sedema têkçûna civînan, lewma em negihîştin tu encamekê.

Roja duyem, Ehmed Hesen Bekir, Salih Mehdî Emaş û çend kesên din beşdarî civînê bûn. Gotin: **“Ew gelekî amade ne da ku sozên peymanê bi cih bînin.”**

Gelek axaftin hat kirin, ya rast Salih Mehdî Emaş, berevajî wê gotara xwe ya ku tê de dibêje: “**Êrişkirina ser Kurdistanê wek seyranekê ye ji bo bakurê,”** lê vê carê axaftinek din kir û got:

“Gelê Kurd tu çaxan ji nav naçe, mirov kesekî dikuje, heta roja qiyametê jê re dibêjin kujer, çawa em dikarin li dijî neteweyekê derkevin? Ji ber wê yekê girîng e mafê gelê Kurd bê dayîn, em dijî dayîna mafê gelê Kurd nînin. Hetta em hêvî dikin rojekê ji rojan tevahiya Kurdistanê rizgar bibe û bibe yek û Komara Kurdistanê bê avakirin.”

Lê yê ku baştir axivî, Hazim Cewad bû. Wê demê wek kesatiyekî diyar yê Partiya Beis dihat hesabê. Hazim Cewad wiha axivî:

“Li ser xweseriyê tu pirsgirêkek min nîne, ji ber ku ez dixwazim Komara Kurdistanê ya Sosyalîst bê avakirin. Ez pişta daxwaza mafê zêdetir ji bo birayên Kurd digrim, lê pirs ev e, çawa û kengê vî karî bikin?”

Nîqaş li ser vê yekê hat kirin, niha be yan were paş xistin yan neyê kirin?

Beşa Nehem
9
Ebdul Nasir û Kurd
Xebata Kurdî-Erebî

- Ebdul Nasir û pirsa Kurd
- Serdana Mam Celal a Qahireyê
- Navcîtiya Ebdul Nasir di navbera Kurd û hikûmetê de
- Serdana Mam Celal a Cezayîrê
- Serdana duyem a Bexdayê
- Têkiliya kurd û Amerîkayê
- Serdaneke din a Qahireyê, Tahîr Yehya û hikûmet
- Destpêkirina şer, piştgiriya cîhanê bo Kurd
- Rola Sovyetê, Ewropaya Rojava û Ereban
- Darbeyeke nû û diyalogeke nû
- Lihevkirina Şêx Ehmed û hikûmeta Iraqê
- Pirsa Kurd, nakokiyên Sovyetê û Çînê

Ebdul Nasir û Pirsa Kurd

❖ Çima hikûmeta Beisiyan nedikarî biryarê bide?

Piştî ketin şermê û rijdbûna min li ser daxwaziyan, wiha gotin: “**Em nikarin bêyî Cemal Ebdul Nasir karekî wiha girîng bikin û divê em wî pê bihisînin.”**

Ehmed Hesen Bekir got:
“Yekser dê bêjin; Beisiyan Iraq parçe kirin, cuda kirin û dê gelek gotinên din bikin, lewma divê em serdana Cemal Ebdul Nasir bikin.”

17’ê Nîsana 1963’yan bû, rêûrisma salvegera Yekîtiya Sûriyeyê û Misrê dihat lidarxistin. Hemûyan gotin:
“Em ê biçin ba Ebdul Nasir tu jî gel me were, li wê derê em ê behsa vê pirsê bikin. Piştre jî em ê serdana Cezayîrê bikin, ji Ehmed Bên Bêlla re jî behsa pirsê bikin, eger me piştgiriya erebî (ji xweseriya Kurdistanê re) bi dest anî, wê demê bi weşandina daxuyaniyekê em ê rabigihînin.”

Ya rast tiştekî wek telefon, bêtêl û yên din ba min nebû, da ku ez Mela Mistefa pê bihisînim, min hez nedikir jî bêyî hajpêbûna Mela Mistefa û polîtburoya PDK’ê biçim, lê min ew serdan gelek girîng didît, demek kurt jî di ber destê min de bû.

Wê serdanê derfetek çêkiribû, tê de me dikarî Cemal Ebdul Nasir û Ehmed Bên Bêlla bibînin û nêrîna xwe ji wan re bêjin, da ku cemaeta Beisiyan tenê neçin û di berjewendiya xwe de behsa pirsa Kurd nekin.

Ji bilî wê yekê, ez niha û wê demê jî di vê baweriyê de bûm, divê em pirsa Kurd ji rewşa pirseke navxwyî ya Iraqê derxînin,

bigihînin asta erebî û piştre jî asta cîhanî, ev jî pêşxistina pirsa Kurd e.

Ez dixwazim behsa vê yekê bikim, di pirtûka xwe ya bi navê (Journey Among Brave Men) de ku di sala 1965'an de hatiye weşandin, û Cercîş Fethulla wergerandiye ser zimanê erebî û bi kurdî dibe "Serdana Zilamên Wêrek Li Kurdistanê" rojnamevanê amerîkî Dana Adams Schmidt wiha dibêje:

"Di nav tevgera Kurd de du hizir hebûn, yek Mela Mistefa li ser dixebitî ya din jî Celal Talebanî."

Dibêje nêrîna Mela Mistefa bi vî awayî bû: **"Ew li dijî têkiliyên bi wî awayî û serdana Ebdul Nasir bû."** Û dema zanî Celal Talebanî çûye Misrê hêrs bû û got:

"Çi karê me li Ebdul Nasir û Bên Bêlla ketiye? Çi têkiliya me bi Ereban re heye? Ev çi ye? Ew çima çûye? Min ew ji bo wan karan neşandibû."

Hetta Dana Adams Schmidt dibêje:

"Ez li balafirxaneya Bexdayê bûm ku Celal Talebanî ji Misrê vegeriya, min gotê Mela Mistefa ji çûyîna te nerazî ye, tirsiya û rengê wî spîçolkî bû."

Ew dibêje; nêrîna duyem a nav tevgera kurdî ya Celal Talebanî ye û bi vî awayî ye:

"Talebanî di vê baweriyê de ye, ew serdan ji bo Kurdan gelek girîng e, eger bikare pirsa xwe bi ereban binasîne û bikare bala Cemal Ebdul Nasir û Ehmed Bên Bêlla bikşîne. Nêrînek wiha helwesteke dûrbîn e, di wir de jîrî û dûrbîniya Celal Talebanî derdikeve."

Serdana
Mam Celal a Qahireyê

❖ Rast e Dana Adams Schmidt tu li balafirxaneyê dîtibû?

Belê. Bi rastî jî wisa bû. Dema ku vegeriyam gelekî tirsiyam, çimkî Mela Mistefa gef li min kiribû, ez jî ji vê yekê ditirsiyam, nebe Mela Mistefa li cem rojnamevanan bêje; êdî ew ne nûnerê me ye, bi wê yekê jî tevahiya pirsê têk diçû.

Mela Mistefa li cem Dana Adams Schmidt yek-du rojnamevanên fransî behsa wê yekê kiribû, lê gelekî eşkere nebibû. Ji aliyekî ve min hez dikir biçim Misrê, ji aliyê din ve Beisî gelek rijd bûn.

Min Babe Elî û Fuad Arif dîtin. Ji wan pirsî: "Ez jî bême Misrê?" Lê min îzin ji partiyê wernegirtiye?

Wan jî gotin: "Hatina te ya Misrê gelek baş dibe."
Min got: "Ez jî wisa difikirim, lê ji Mela Mistefa ditirsim.
Wan gotin: "Em ê çareser bikin."
Min got wan: "Baş e, lê bêjnê ku we ez şandime."
Min li ser wê bingehê çûyîna Misrê qebûl kir. Dema em gihîştin Qahireyê her kincên kurdî li ber min de bûn, ya rast li Bexdayê ez pê re negihîştim qatek cilê fermî bikirim. Bi kurtî min tu tiştekî rêwîtiyê bi xwe re nebiribû.

❖ Kengê we Ebdul Nasir dît helwesta wî li hember pirsa Kurd çawa bû?

Cemal Ebdul Nasir pêşwaziya me kir û behsa çend pirsan kir. Baştir e, ez li vir balê bikişînim ser wan pirsan: Ebdul Nasir got: **"Qet min hez nedikir ew kuştin li Iraqê biqewimiya."**

Got jî**:**

“Hetta li hember kuştina Ebdul Kerîm Qasim jî ez ne kêfxweş im, çimkî di serhildana şoreşê û pêkanîna grupa Efserên Azad de rola wî hebû, heq nebû aqibeta wî kuştin ba. Ez dijî wê yekê me, ku Ebdul Kerîm Qasim xelk kuştiye yan dijî we bûye, lê li hember kuştina wî dilgiran im, tenê li hember kuştina kesekî dilgiran nînim, ew jî Mehdawî ye (لانه سب فی آعراضنا و شرفنا).**”**

Kincên kurdî li min bûn, Ebdul Rehman Bezaz ez dam naskirinê û got: “Ev Celal Talebanî ye, parêzer e, ji kincên wî yên kurdî matmayî nebin, rasterast ji gerê hatiye.”Bezaz got:

“Li Koleja yasayê xwendekarê min bûye.”

Min jî got: “**Belê, wî li ser te ez salekê ji xwendinê bêpar kirim.”** Ebdul Nasir got: **“Li ser min?”**

Min got: “**Belê dema êrişa sêalî li ser Misrê, wê hingê ez li Koleja yasayê xwendekar bûm, me xwenîşandan kir û min gotar xwend, lewma li ser wê yekê wan salekê ji xwendinê bêpar kirim. Wî bi xwe gazî min kir û got: Salekê ji xwendinê bêpar dibî, ji ber ku te di xwenîşandanê de beşdarî kiriye.”**

Piştre Ebdul Rezaq Zahîr wek serokê parêzeran ku di hilbijartina neteweçiyan de ser ketibû, bersiva wan gotinên Ebdul Nasir da û wiha got:

“Cenabê serok tevî ku ez neteweçî me û ne Beisî me, komunîstan gelek zilm li me kirin, gelek kiryarên xirab kirin, bi nêrîna min ji ber wan kiryaran, divê bi vî awayî reftar bi wan re bê kirin. Serok û berpirsên wan bên bidarvekirin.

Navendên kar ji kadroyên wan re bên vekirin da ku mejiyê wan bê paqijkirin. Cezayê girtinê jî li alîgirên wan bê birîn.”

Min jî wek henekpêkirinekê got:

“**Cenabê serok mamoste Ebdul Rezaq wek serokê parêzeran wê gotinê dike, karê parêzer ev e ku ji prensîpên xwe berevaniyê bike** (المتهم برئ حتى يدان).”

Bêguman min henekê xwe lê kir, min got: Ew wek serokê parêzeran wan gotinan dike. Ebdul Nasir keniya û wiha got: **“Yekem: Ez wan nêrînan red dikim.**

Duyem: Ez kuştina komunîstan gelek xirab dizanim, bi wê yekê welatên sosyalîst û yên din dikevin dijatiya me. Di asta nav-dewletî de jî me wek tevgereke kevneperest nîşan dide.

Sêyem: Xelkê bêpar nekin (عندما تحاربون الناس فى آرزاقهم و معيشتهم) **neçar dibin dijatiya we bikin, her wisa dorpêça civakî jî ki-ryareke xirabe.”**

Derbarê pirsa Kurd jî şandeyê gote Ebdul Nasir , ev Celal Tal-ebanî ye û dixwaze di wê barê de bi te re biaxive û dixwaze piştre nêrîna cenabê te jî bizane.

Me li hev kir di civîneke taybet de ez û Fuad Arif li ser pirsa Kurd jê re biaxivin. Min silava Barzanî û polîtburoya PDK’ê gi-handê û di hizûra hemûyan de min wiha got:

“Gelek hêviya me bi cenabê te heye û gelekî jî bi hêvî ne ku wek rêberekî mezin ê Ereb têgihîştineke te ya rastî ji pirsa Kurd û edaleta pirsê hebe û pişta me bigrî.”

Navcîtiya Ebdul Nasir
di Navbera Kurdan û Hikûmetê de

❖ Di hevdîtinê de we çi ji Ebdul Nasir xwest?

Me dixwest ew bibe dadwer, min gotê: Em dixwazin tu dadwerekî alîgirê me bî, ji ber ku em birayê biçûk û yê mezlûm in û mafê me li ser wan heye.

Wî jî got: “Ez ê we bibînim.”

Roja paştir bi min û Fuad Arif re civiya. Alîkarê Serokkomar Zekeriya Mihêdîn û Serokê Encumena Wezîran Elî Sebrî jî beşdar bûn. Min behsa pirsa Kurd û peymana navbera me û hikûmeta Bexdayê kir.

Wî jî derbarê çawaniya xweseriyê ji min pirsî û got:

“Gelo artêş û têkiliyên derve jî di nav çarçoveya xweseriyê de ne?”

Min got:

“Na, serokatiya welat, darayî ya gişti, artêş, têkiliyên derve, pere û hinekên din di dest hikûmeta navendî de ne, em ê tenê karûbarên navxweyî yên xwe bi rêve bibin.”

Ebdul Nasir got: **“Yanî mîna Yugoslavyayê?”**

Min got: **“Belê, eger ji Yugoslavyayê kêmtir jî be em razî ne.”**

Min wiha berdewamî da axaftina xwe:

“Tecrubeyên sê welatan di ber destê me de ne, her yek ji wan maqûl be, em qebûl dikin, Yekem Yugoslavya, duyem Hindistan û sêyem Lîbyaya serdema Senûsî ku ji sê eyaletên Berqe, Bengazî û Trîpolî (Trablus) pêk dihat.”

Min got: **“Her yek ji wan mînakan baş bizanin, em razî ne. Mînaka erebî, mînaka Asyayî û mînaka sosyalîst ku ya dostê we bi xwe ye.”**

Razîbûn ji rûveta Ebdul Nasir ve xuya bû lê bersiv neda, tenê got: **“Heta hûn ji Cezayîrê vegerin, ez ê jî binirxînim.”**

Pirsî: “Gelo em starê didin komunîstan?” Her wisa derbarê daxuyaniyên Îsmet Şerîf Wanlî pirs kir, ku hinek gotinên bê wate kiribû.

Min got: **“Berpirsyariya me li hember gotinên wî nîne, ew ji bo xwe diaxive.”**

Ebdul Nasir got:

“**Ew gotin ziyaneke mezin digihîne we, daxuyaniyên xirab in.”**

Min jî got**: “Wela ew ji bo xwe diaxive û nêrîna wî ya taybet e.”**

Di wê civînê de, min bandorek baş li wî kiribû, bi awayekî pştî dîtina min, gotibû: Nêrînên Celal Talebanî bandorek baş li min kir, ez pênaseya wî ya xweseriyê, têkiliya Kurd û Ereban baş dibînim.

Min di axaftina xwe de behsa biratiya dîrokî ya Kurd û Ereban kir û min wiha got:

“Em hêvî dikin tu bibî Selahedînê vê serdemê, Kurd û Ereb her tim bira bûne, bi qebûlkirina xweseriyê û garantîkirina mafê Kurdan, biratiya Kurd û Ereb xurtir dibe. Ne tenê nabe sedema cudabûnê, berevajî mafxwarin, binpêkirin û zeftkirina mafan, sedemên cudabûnê xurtir dike.”

Wê demê Kurd wek dagirker bala xwe dide Ereban, lewma hewl dide bi cudabûnê xwe rizgar bike.

Gelek kêfa Cemal Ebdul Nasir ji wan axaftinên min re hatibû. Dr. Cemal Etasî di wê barê de û di pêşgotina pirtûka Munzir Mûsilî de wiha nivîsiye:

“Ew dibêje, piştî hevdîtina Ebdul Nasir û Celal Talebanî, wî Ebdul Nasir dîtiye ku gelek ji gotinên Talebanî kêfxweş bûye, ji ber ku di çarçoveya nêrîn û stratejiya wî de bûye, lewma gotiye wan: Gotinên wî ciwanî bi projeya stratejiya neteweyî ya erebî re diguncin.”

Tevî ku me jî razîbûna wî his dikir, lê me bersivek rasterast wernegirt. Ebdul Nasir got:

“Rast e niha wek Tevgera Neteweçîtiya Ereb em gelekî behsa sosyalîzmê û nêrîna neteweyî ya Ereb dikin, lê heta niha ew bîr û nêrîna me nehatiye dahûnan û amadekirin. Wek mînak dema ku ji marksîstekî dipirsî: ‘Helwesta te li hember pirsa neteweyî çi ye?’ Pirtûkek Lenîn an Stalîn tîne û dibêje wan wiha gotiye, lê niha tiştên me yên wiha nîne, lewma divê em binirxînin, heta hûn ji Cezayîrê vegerin, ez ê jî binirxînim û hûn hatin, em ê li ser biaxivin.”

Nîvro em vexwendin Nadî Cezîre, Serok Ebdul Nasir bi xwe jî hatibû û ew û Elî Salih Seidî li hember hev rûniştibûn. Li aliyê din wezîrên berevaniyê yên Misrê û Iraqê rûniştibûn.

Ferîk jî anîn, min ji Emîn Howeydî ku balyozê Misrê li Iraqê bû pirsî: “Ew Frîk e yan Ferîke?” Çimkî li Kurdistanê jî heye û jê re Qerexerman dibêjin (xermanê nû).

Ebdul Nasir ji min pirsî: Çima?”

Min jî got: **“Di kurdî de ferîk yanî pêş dema pêgihîştinê.”**

Ebdul Nasir got: **“Celal dibe ku Selahedîn bi xwe re anîbe vê derê.”** Her di wê çarçoveyê de got:

“Celal bibin bila şûnwarên bapîrên xwe bibîne û tiştên wan nîşan bidinê.”

Min jî got: **“Înşalla me tiştên baş bi cih hîştibin.”**

Ebdul Nasir got: **“Belê, we şûnwarên gelek baş bi cih hîştine.”** Yanî hinekê lihevkirin navbera me de çêbû.

Serdana
Mam Celal a Cezayîrê

❖ Çima û kengê we serdana Cezayîrê kir?

Piştî serdana Qahireyê, em çûn Cezayîrê li wir me Ehmed Bên Bêlla dît. 24 yan 25’ê Nîsana 1963’yan û yekem roja Cejna Remezanê bû. wan ji bo nimêja cejnê em birin bajarê Bilêdeyê.

Piştre em vegeriyan û me Ehmed Bên Bêlla dît, tevî ku serokkomar bû lê kesekî gelek sade dihat xuyanê. Bi dîtina wî, pêşmergetiya min hat ber çavê min.

Em rûniştin, Serokkomarê Cezayîrê Ehmed Bên Bêlla îşaretî min kir û pirsî: “Ew kî ye?” Gotin: “Celal Talebanî ye.” Dema min behsa Pirsa Kurd kir, ya rast leztir û vekirîtir ji Cemal Ebdul Nasir axivî, negot ku ez ê binirxînim, belkî rasterast wiha got:

“Kurd miletekî misilman e û ji kevin ve dostê me ne û bi me re bûne. Bi nêrîna min baştir e zûtir mafê wan bidinê, mafê wan e

ku xweseriya wan hebe, eger xweseriyê nedin, ji bilî ku şerê dewam bike, welatên din wek Îranê dê dest li pirsê werbidin, piştî wê yekê, êdî bi dayîna xweseriyê razî nabin û dê dewa serxwebûnê bikin. Em li Cezayîrê razî bûn ku Fransa mafê xweseriyê bide me, lê wan nedan, em jî berdewam bûn heta me serxwebûn bi dest anî."

Gotinên Bên Bêlla gelekî bi dilê me bû, min gelek spasiya wî kir û ez gelekî kêfxweş bûm, ku ew wiha eşkere û baş li ser gelê Kurd diaxive.

❖ Piştî Cezayîrê hûn çûne ku derê?

Piştî dîtina Ehmed Bên Bêlla em vegeriyan Qahireyê. Me Abdul Nasir dît, wî got: Min xwestekên we nirxandin û nêrîna min bi vî awayî ye:

"**Yekem:**

Ez di vê baweriyê de me, divê hûn bi her bihayekê biratiya Kurd û Ereb, yekîtiya têkoşîna Kurd û Ereb û yekperçetiya axa Iraqê biparêzin.

Duyem: Pêwîst e hikûmeta Iraqê mafê we yê xweseriyê bide, bi wî awayî ku we ji min re şirove kir.

Sêyem: Pêwîst e hûn her du alî bi aştiyê pirsê çareser bikin. Ne hûn hizira şoreşê bikin û ne jî hikûmet hizira şer bike. Aliyê ku di destpêkirina şer de pêşengiyê bike, Komara Erebî ya Yekbûyî pişta wî aliyî nagire. Divê hûn û hikûmeta Iraqê wê yekê baş fêm kin.

Çarem: Ez wek bira, ne wek Serokê Komara Erebî ya Yekbûyî ji we dixwazim hajî şahê Îranê hebin, ew dijminê Kurdan e,

çimkî beşek mezin ji gelê Kurd di bin destê wî de ye. Dixwaze we bikar bîne, dibe ku hewl bide têkiliyê bi we re deyne, alîkarî û hinek karan ji we re bike, da ku we bixe şerê dijî Ereban, heta wê demê ku armanca xwe bi dest dîne. Têkiliyên bi wî awayî di berjewendiya Kurdan de nînin."

Min jî bi vî awayî bersiva Ebdul Nasir da û got:

"Heta niha hikûmeta Iraqê digel Îranê û Tirkiyeyê dijî me dixebite, niha eşkere dibe ku hikûmeta Iraqê ji bo dorpêçkirina me bi Îran û Tirkiyeyê re li hev dike. Tu têkiliyek me wisa bi Îranê re nîne, heta niha ji asta diyalogê derneketiye û tu encameke wê nebûye. Bi ser çavan, em ê şîretên te bigihînin hevalên xwe."

❖ We behsa rola Kurd dema Yekîtiya Misr, Iraq û Sûryeyê kir?

Belê, di civînek giştî de me behsa wê yekê kir, eger yekîtiya navbera Misrê, Sûriye û Iraqê pêk hat divê Kurd çi bikin? Çi helwestek Kurd hebe?

Min bala xwe da Ebdul Nasir û gotê:

"Cenabê serok ew heval Ereb in, em jî Kurd in, ew beşek ji neteweya Ereb in, em jî beşek ji neteweya Kurd in. Her demê gelê Ereb yê bira bigihîje armanca xwe ya neteweyî, gelê Kurd dê kêfxweş bibe. Erebê Iraqê çiqasî di yekîtiya erebî de garantiyê bixwaze, em nîvê wê garantiyê dixwazin. Bi wê gotinê, Ebdul Nasir gelekî keniya."

❖ Çi bandorek gera we li ser danûstandinên PDK'ê û Hikûmetê hebû?

Piştî ku em ji Misrê vegiyan Bexdayê, min ji hikûmeta Iraqê xwest zû bersivekê bide.

Di encamê de civînek li cem Salih Mehdî Emaş hat lidarxistin. Di civînê de ji bilî min û Salih Yûsifî, du dostên me yên kevin û rewşenbîr bi navên Eqîd Mistefa Ezîz û Heme Se'îd Xefaf, her wisa Babe Elî û Fuad Arif û çend wezîrên din ên Beisî de beşdar bûn.

Di civînê de Salih Mehdî Emaş got:**"Em daxwaza we ya xweseriyê qebûl dikin, lê pêwîstiya me bi demê heye û em hêvî dikin hûn wê mecalê bidin."**

Got jî:**"Tu şertên xweseriyê di projeyekê de binivîse, ez ê îmze bikim, piştre Meclisa Serokatiya Şoreşê jî dê îmze bike, lê niha em nikarin belav bikin, çimkî pêdiviya me bi şeş mehan heye, ji bo ragihandinê tenê çar mehan li benda me bin."**

Ya rast ji ber du sedeman, min dixwest em qebûl bikin:

- Yekem: **Di dest me de dibû belgeyek dîrokî.**
- Duyem: **Bi îmzekirina tevahiya endamên Meclisa Serokatiya Şoreşê, daxwaza xweseriyê dibû mafekî rewa.**

Lê min gotê: "**Divê bi Mela Mistefa re biaxivim û bê razîbûna wî nikarim tu belgeyekê îmze bikim."**

Dema ez vegeriyam hotêlê, Mela Mistefa xeber şandibû û gotibû bêje hikûmetê: **"Yan bila niha qebûlkirina xweseriyê rabigihînin yan jî dayîna tu mecalekê qebûl neke û lez vegere."**

Ez vegeriyam cem Mela Mistefa û ji re behsa hemû tiştî bi taybetî serdana xwe ya Cezayîrê kir, ew jî kêfxweş bû, bi wî awayî dijî gera min a Misrê û Cezayîrê derneket, ku Dana Adams Schmidt behs dikir.

❖ Gelo hikûmetê tu gav di berjewendiya Kurd de avêt?

Piştî ku ez vegeriyam Kurdistanê hikûmeta Iraqê tu daxuyanî derbarê xweseriyê belav nekir. Sarbûnek ket navbera Kurdan û hikûmetê, Polîtburoya PDK'ê jî, di wê barê de hinek şirove weşandibûn, ku guman li ser dayîna mafê Kurdan ji aliyê hikûmeta Iraqê çêdikir.

Hikûmet, ku hajî wê yekê bibû, şandeyek bi serokatiya Tahîr Yehya şand cem Mela Mistefa. Her du alî li gundê Kanîmaranê civiyan. Hinekê li ser mijarê axivîn, lê encam tenê ev bû ku şandeya hikûmetê got: "**Em diçin û şandeyek din dişînin."**

Piştre hikûmetê şandeyek sivîl a pêkhatî ji hejmarek kesatiyên iraqî şand, ku Zeyd Ehmed Osman wek kesatiyê Kurd di nav wan de bû. Wê şandeyê li Çwarqurneya Raniyeyê bi Mela Mistefa re hevdîtin kir. Mela Mistefa daxwazek berfireh wek pergalek federaliyê pêşkêş kir, ku ji aliyê çend kesên nêzîkî wî bi taybet Eqîd Kafî û Omer Debabe û min ve hatibû amadekirin.

Lê ji ber ku tê de behsa artêşê dihat kirin û bi gelemperî berfirehtir ji pergalek xweser bû, rastî matmayîna şandeya hikûmetê hat û şande vegeriya Bexdayê. Piştre gotin bila şandeya Kurd jî were Bexdayê.

Di wê çarçoveyê de, Me biryara lidarxistina mîtîngekê di roja 18'ê mehê li Koyeyê da, ku tê de eşîr, Kesatî, endamên PDK'ê û fermandarên pêşmerge beşdar bûn. Her di nav mîtîngê de, civînek mezin hat lidarxistin û bi pêşniyara Mela Mistefa min serperestiya civînê kir.

Beşdarên civînê biryar dan, şandeyek ji bo danûstandinê biçe Bexdayê, dubare Barzanî got: “**Bi nêrîna min baştir e Mam Celal serokatiya şandeyê bike.”**

Di civînê de 14 endamên şandeyê hatin hilbijartin, heft kes ji wan şandeya sereke û heft kesên din jî şandeya şêwirmend bûn. Endamên şandeyê ev bûn:

Ez, Salih Yûsifî û Mistefa Ezîz. Ji kesatiyên Kurd jî Hisên Xaneqa, Mihemed Se’îd Xefaf, Reşîd Arif, Mesûd Mihemed, Babekir Mehmûd Hacî Axa, Hebîb Kerîm û çend kesên din beşdar bin.

Piştî Newrozê wek şande em çûn Bexdayê. Di heman demê de civîna komunîstan bi serokatiya Ezîz Mihemed li Koyeyê hat lidarxistin. Wî daxwazek kiribû û gotibû: Dixwaze Mam Celal bibîne. Min jî wek rêzgirtinekê wiha got: Nabe, ez ê bi xwe serdana te bikim.

Wê demê Partiya Komunîst a Iraqê di rewşek baş de nebû, berevajî polîtburoyê û Mela Mistefa, min dixwest em alîkariya wan bikin. Dema min serdana Ezîz Mihemed kir, gelek kêfxweş bû, min gotê:

“Kekê Ezîz, her karek ji destê min were, ez ê ji bo we bikim. Min wek dostekî xwe yê herî nêzîk bihesibîne, ez li ser vê helwestê dimînim heta rewşa we baş bibe. Ez dostê we yê kevin û rastî me, lê piştrast im piştî ku rewşa we baş bibe, hûnê werin guhertin.”

Keniya û got: “Zilamê qenc, ne wisa ye! Ya rast cara dawî ku Ezîz Mihemed ez dîtim, bi rêzek mezin wiha got: “Ez wî karê te qet ji bîr nakim.”

Serdana
Duyem a Bexdayê

❖ Destketa serdana we ya duyem a Bexdayê Çi bû?

Cara duyem ku em çûn Bexdayê, me his kir hikûmet hinekê sar bûye. Wek mînak asta hotêlê daxistibûn. Wan berê em dibirin Hotêl Bexdayê, lê vê carê em birin Hotêl Semîr Emîs. Her wisa wan jî şandeyek sivîl ji bo danûstandinê pêk anîbûn. Endamên şandeya wan ev bûn:

Mihemed Reza Şebîbî, Fayeq Samerayî, Hisên Cemîl, Dr. Ebdul Ezîz Dûrî, Feysel Hebîb Xeyzeran û çend kesên din.

Dema civînê di navbera her du şandeyan de dest pê kir, min pirsî: **“Hûn kî ne? Gelo nûnerên fermî ne? Desthilata we heye? Eger danûstandin bigihîje encamê çi dibe? Gelo pêbendî peymanê dibin, ya ku bi me re îmze dikin?”**

Gotin: “Nexêr, desthilata me ya îmzekirinê nîne, em encamên gotûbêjan kom dikin û didin hikûmetê.”

Me jî got**: “Eger wiha be dê gelekî bikişîne, çawa dibe em û hûn danûstandinê bikin, piştre hûn biçin di wê barê de bi hikûmetê re biaxivin, paşê hikûmet wan encaman bibe Meclisa Serokatiya Şoreşê da ku biryar li ser bê dayîn?”**

Hêdî hêdî wan astê pirsê dadixistin. Tevî wê yekê danûstandina me bi wan re dewam kir. Serokê şandeya wan Fayeq Samerayî bû, dema gotûbêja me gihîşt ser sînorê herêma xweser, min wiha got:

“Madem ku hûn di pirsa sînorê Kurdistanê de Fayeq Samerayî wekî dadwer qebûl dikin, ez jî ser navê şandeya Kurd wî qebûl dikim.”

Samerayî dixwest biaxive, min got:

Te gotina xwe li cihekî din kiriye. Ji ber ku Fuad Rikabî naveroka wê belgeyê dabû min ku Rikabî û Fayeq Samerayî tevlî hejmarek neteweçî yên Ereb derbarê pirsa Kurd li Qahireyê dabûn Ebdul Nasir .

Min ew belge nîşan da û got:

“Ev heman belge ye, Fayeq Samerayî bi xwe li şûna wan îmze kiriye û dibêje, sînorê Kurdistanê ji Çiyayê Hemrîn dest pê dike û digihîje başûrê Mendeliyê.”

Endamên şandeya wan gotin nabe. Min jî got: Çima nabe? Ma hûn nabêjin em gotina Samerayî qebûl dikin? Ev jî îmzeya wî bi xwe ye. Lê gotin: **“Bila wisa gotibe.”**

Min jî got**: “Ew nivîs ji bo Ebdul Nasir bûye, ne ji bo henekkirinê!”** Tevî ku bi wan gotinên min gelekî ketin şermê, lê di dawiyê de ne wan gotina Samerayî qebûl kirin û ne jî me gotina wan qebûl kir.

Dema dîtina Ebdul Nasir min gotibû: **“Em tiştekê dixwazin ku neteweçiyên Ereb beriya bigihîjin desthilatê qebûl kiribûn, lê niha ji soza xwe poşman dibin, di demekê de nêrîna wan bi xwe ye.”**

Wan bi qest pirs paşde dixistin û her carê gotinek dikirin. Rojekê gotin biçim ba Elî Salih Seidî, ku wezîrê hundur bû. Dema wek şandeya Kurd em gihîştin ba wan, Elî Salih Seidî û Salih Mehdî Emaş rûniştibûn, lê li ber me ranebûn. Lewma min jî

dest neda wan û li ser kursiyê aliyê serê rûniştim. Hinek hevalên me dest nedan, lê hinekan dest dan.

Elî Salih Seidî qure qure axivî û got: “Me çend caran gotiye we, ku me dost û dijminê xwe destnîşan kiriye, welatên komunîst dijminê me nin.”

Min jî wiha bersiv da: “Em xweseriyê dixwazin, peymanek navbera me û we de hatiye îmzekirin, pêştir te (Elî Salih Seidî) û Salih Yûsifî li ser li hev kirine.”

Min gotê: “Em digihîjin encamekê, lê tu pirsê diazirînî û me bi pirsek biçûk ve mijûl dikî.”

Wî jî got:

“Ne wisa ye, ba me pirsek sereke ye, hata hûn helwesta xwe zelal nekin, em nikarin tu tiştekî bikin.”

Min jî got: “Wisa nîne, hûn bi çavekî biçûk li pirsa Kurd dihêrin.”

Bi van gotinan, gotûbêja navbera me tund bû. Vê carê min wiha got:

“Ev reftar nîşan dide, ku hûn naxwazin pirsa Kurd bi aşitiyê û riya siyasî çareser bikin, xuyaye niyeta we ya xirab heye û dixwazin bi şer çareser bikin. Lê hûn şaş in, pirsa miletekî bi şer nayê çareserkirin. Gelê Kurd ne xelkê Bexdayê ye ku hêsan kontrol bikin. Kurdistan hemû çiya û banî ye, dîrokê îsbat kiriye em xurt in û ji nav naçin.”

Beriya ku Elî Salih Seidî bersivê bide, Salih Mehdî Emaş hat nav axaftinê û wiha got:

“Keko tu niyetek me wisa niye. Tenê me hewla jinavbirina zilamekî da, ew jî Ebdul Kerîm Qasim bû ku nihe li ser me bûye lekeyek reş, dibêjin hûn zilamkuj in, eger em hewla kuştina net-eweyek mîna Kurd bidin, wê demê dê çi ji me re bêjin? Em bîr û baweran nakujin û bi karê xwe jî nizanin, kiryarên wisa di nav bîr û bawera me de cih nagre. Her wisa em dixwazin pirsgirêkan çareser bikin û me soz jî daye peymana ku navbera me de heye, bi cih bikin.”

Wî bala xwe da min û got:

“Tê bîra te, wê demê min bi xwe got; em xweseriyê qebûl dikin û tu naveroka projeya xweseriyê binivîse û em ê îmze bikin, lê şeş mehan li bendê bin, çimkî pêwîstiya pirsê bi demê heye.”

Di encama axaftina Emaş de, rewşa civînê aram bû, me dest bi gotûbêjkirina mijarê kir. Wan gotin: Sibe şandeyek din destnîşan dikin, ji ber ku hûn û Elî Salih Seidî li hev nakin. Roja paştir şandeyek bi serokatiya Hazim Cewad hat pêkanîn, ku cîgirê wezîrê derve bû.

❖ Gelo tu encamek mayîn û danûstandinên we li Bexdayê hebû?

Gelek kêm. Me Hazim Cewad serokê şandeya nû dît û wî wiha behsa mafê xweseriyê kir:

“Careke din jî min gotibû, ez Komara Kurdistanê ya Sosyalîst dixwazim, tu pirsgirêkek min bi mafê xweseriyê re nîne lê pirsgirêk di vir de ye, kengê û çawa tê bicih anîn? Ez piştgiriya daxwaza we dikim lê partiya me û dewlet û Meclisa Serokatiya Şoreşê razî nabin, naveroka wê projeyê qebûl bikin ya ku Mela Mistefa pêşkêş kiriye. Em dixwazin demek ji me re bê dayîn da ku em bikarin wê bicih bikin.”

Min jî got:

"**Em çawa dikarin çareser bikin? Hûn dibêjin; pêwîstiya me bi şeş mehan heye. Ji me re bêjin, ji daxwazên ku Mela Mistefa kîjanê qebûl dikin û kîjanê qebûl nakin? Da ku em jî ji wî rûyî ve rewşa xwe diyar bikin.**"

Wî jî bersiv da û got: **"Ev gotinek maqûl e."**

Wan şandeyek pêk anîn da ku projeyekê amade bikin û bersiva me bidin.

❖ Li Bexdayê we hewl da têkiliyê bi alî û kesayetiyan re dayînin?

Li Bexdayê me serdana gelek kesatiyan kir. Destpêkê me serî li Kamîl Çadirçî da. Li wir ew pêkenoka navdar belav bû, ku Kamîl Çadirçî ji Reşîd Arif pirsî: **"Ma hûn daxwaza Mûsilê dikin? (آنتم تطالبون بالموصل؟)"** wî jî bersiv da: Na, na.

Piştre, Kamîl Çadirçî li hotêlê serdana me kir. Her wisa me serdana Mehdî Kubbe jî kir. Serdana Ayetullah Uzma Seyîd Muhsîn el-Hekîm a herî girîng bû. Wê demê Ayetullah Uzma û lêvegerê hemû şîeyên cîhanê bû.

Bi riya Seyîd Mehdî yê kurê wî, yê ku Beisiyan destpêka 1988'an li Sûdanê kuştin, me karî bi Seyîd Muhsîn el-Hekîm re hevdîtinê bikin.

Li Necefê, ez, Hisên Xaneqa, Mela Cemîl Rojbeyanî û Zeyid Ehmed Osman, me serdana Seyîd Muhsîn el-Hekîm kir. Wî gelek bi germî pêşwaziya me kir.

Tevî ku kesatiyên wisa di civînên giştî de kêm diaxivin, lê wî ji me re duayê xêrê kir û wiha axivî:

“Mafê we ye, hûn dewa mafê xwe bikin. Hûn neteweyek in, bûne qurbanî. Înşalla zordariya li ser we namîne. Divê mafê we bê dayîn. Şer li dijî we ne rewa ye. Di buhuriyê de jî ez dijî şerê li hember Kurdan bûme.”

Me jî spasiya wî kir û me got:
“Hêvîya me li Kurd û şîeyan heye, her tim em birayên hev bûne, zilm li me her duyan hatiye kirin, pêwîst e em li Kurdistanê û hûn jî li başûrê Iraqê, pişta hev bigirin û alîkariya hev bikin.”

Gelekî kêfa wî hat û got: “Girîng e, têkiliya di navbera me de dewam bike.”

Têkiliya navbera Barzanî û Seyîd Hekîm di encama wê serdanê de çê.

Bi nêrîna min, ew serdan pêngaveke girîng bû ji bo avakirina têkiliyên di navbera me de.

Ji aliyê din ve, hikumetê şandeyek pêk anî û çû Qahireyê. Hevdem tevgera Yekîtiya Sêalî di navbera Iraq, Sûriye û Misrê de dest pê bibû.

Di nav şandeya Iraqê de tu kesekî Kurd nebû. Lewma di 8’ê Nîsana 1963’yan de me daxwaznameyek derbarê pirsa Kurd da civînên Yekîtiya Sêalî, ku ji aliyê Mesûd Mihemed ve hatibû nivîsandin.

Şandeya me li Hotêl Semîr Emîs civiya da ku em hûnanek baş ji bo daxwaziyên xwe bikin, piştî amadebûnê min îmze kir. Wêneyek wê di nav pirtûka min a bi navê **Tevgera Neteweyî ya Kurd (الحركة القومية الكردية)** heye.

Di wê wêneyê de naveroka wê daxwaznameyê heye ya ku me pêşkêşî Gotûbêjên Yekîtîya Sêalî **(محادثات الوحدة الثلاثية)** kir.

Di wê daxwaznameyê de me bi zelalî gotiye: Eger Iraq wek xwe bimîne, em xweseriyê dixwazin û wê asta xweseriyê qebûl dikin, ku Meclisa Serokatiya Şoreşê biryar li ser daye. Çimkî piştî vegera min a Qahireyê, Meclisa Serokatiya Şoreşê daxuyaniyek weşand û tê de wiha gotibû:

“Kurd û Ereb her tim bira bûne, gelê Kurd ji berê ve mezlûm bûye û heta niha jî tê çewsandin, em mafê gelê Kurd li ser bingeha nenavendiyê qebûl dikin.”

Wê demê li Misrê jî behsa nenavendiya siyasî dihat kirin. Di serdema Osmanî de jî nenavendî heman xweserî bû, lê bi fermî jê re “hikûmeta xweser” nedihat gotin, tevî ku armanca wan heman naverok bû.

Me got:

Eger Iraq wek xwe bimîne, em ê xweseriyê bixwazin. Eger Iraq bibe beşek ji Yekîtiya Federaliya Erebî, em ê nenavendî û xweseriyek berfirehtir bixwazin.

Eger Iraq bibe beşek ji Komara Erebî ya Yekbûyî, em dixwazin bibin “Herêma Çarem a Kurdistanî” wek Herêma m
isrî, Herêma sûrî û Herêma iraqî.

Her wisa me tekez kir; em li dijî xwestên gelê Ereb nînin, me her tim pişta wê yekê girtiye da ku gelê Ereb mafê xwe bi dest bîne û yekîtiya xwe ava bike. Me hewl jî daye di rizgarî û pêkhatina yekîtiya erebî de rola me hebe.

Me daxwazname ji Misrê û tevahiya Kurdan re şand, kopiyek jî da balyozxaneya Misrê li Bexdayê. Ev yek ji karên me yên girîng di wê heyamê de bû.

Têkiliya
Kurd û Amerîkayê

❖ Gelo Amerîkiyan tu hewlek dan têkiliyê bi PDK'ê re deyînin?

Belê. Rojekê Elî Heyder Silêman, cîgirê wezîrê derve yê Iraqê li otêlê serdana min kir. Ew yek ji kesatiyên rewşenbîr ên Kurd bû, ku bi şiyana xwe pêgihiştibû.

Wê demê çend caran bibû wezîr û nûnerê Iraqê li Neteweyên Yekbûyî û balyozê Iraqê li Washingtonê. Du caran jî bibû wezîrê derve. Hat ba min û got:

"Kekê Celal, Amerîkiyan bi fermî daxwazek dane hikûmeta Iraqê û dixwazin te bibînin."

Min jî got: Ser çavan bila werin.

Me roja paştir ji bo hevdîtinê destnîşan kir. Elî Heyder Silêman û du amerîkî hatin; yek ji wan (William Eagleton) bû ku wê demê sekreterê yekem li balyozxaneya Amerîkayê bû. Yê din jî (James Hicks) bû. Em bi hev re rûniştin. Wan gotin:

"Hikûmeta Amerîkayê daxwazek fermî daye Wezareta Derve ya Iraqê. Em ê ji te re bixwînin lê nadine te, tu dikarî jê notan wergrî û ji serokatiya partiya xwe re bişînî."

Di daxwaznameyê de hatibû gotin:

"Hikûmeta Amerîkayê kêfxweşiya xwe ji serkeftina Sibatê nîşan dide û hikûmeta Iraqê wekî hikûmeteke baş û dostê xwe dibîne, dilxwaziyê nîşan dide ku hikûmet ser bikeve û bi domdarî bimîne. Ji bo ku ev mesele pêk werin, pêdivî ye pirsa Kurd bi aqilmendî bê çareserkirin û hikûmeta Iraqê di wê barê de gavan biavêje."

Ji wê demê ve bi wan her du kesan re dostaniya min dewam dike. Gelek caran di rêwîtiyên min ên Amerîkayê de her duyan dibînim.

Yek ji wan bû balyoz li Erebistana Siûdî, piştre jî bû şêwirmendê Nixon li Koşka Spî. Yê din jî malnişîn bû lê niha mamosteyê zanîngehê ye[26].

❖ Çi helwesteke Amerîkayê li hember şerê Kurd û hikûmetê hebû?

Di wê hevdîtinê de wan gotin:

“Pêdivî ye, Kurd li dijî vê hikûmetê şer nekin, eger şerê hikûmetê bike, ji piştgiriya Amerîkayê bêpar dibe.”

Bi kurtî, peyama wan ev bû, ji her du aliyan dixwestin bi aşitiyê li hev bikin û bi aqilmendî pirsgirêkan çareser bikin.

Min got:

Em vê yekê wek nîşana dostaniyê dibînin. Hêvîdar in Amerîka fişara li ser hikûmetê zêde bike da ku aştiyane daxwazên me pêk bîne, ji ber ku niha bandora we ya mezin li ser hikûmetê heye û gel, hikûmetê wek dostê we yê nêzîk dibîne.

Keniya û got: “Bi Xwedê tiştekî ecêb e, gel wisa dibêje.”

……

[26] Di pirtûka “**Dîroka Têkiliyên Kurd û Amerîkayê**” ya **Wirya Rehmanî** de hatiye:

Di 01.04.1963’yan de balyozxaneya Amerîkayê li Bexdayê, nameyek Mela Mistefa şandiye wezareta derve ya wî welatî ku tê de hatiye gotin: Celal Talebanî ev peyam daye balyozxaneyê.

Di peyamê de **Mela Mistefa pêşniyara têkiliya dostane daye Amerîkayê, daxwaza alîkarîkirina Şoreşa Kurd kiriye, her wisa xwestiye bi nûnerê Amerîkayê re hevdîtinê bike**.

Di bersivê de berpirsekî balyozxaneyê gotiye Celal Talebanî: **Amerîka pirsa Kurd wek pirseke navxweyî ya Iraqê dizane û alîkariya Kurdan nake** û tu berpirsekî Amerîkayê jî nikare bi Mela Mistefa re hevdîtinê bike.

Min got: **“Pêdivî ye, hun bi her awayî fişarê bikin. Em soz didin ku şer ji aliyê me ve dest pê neke, lê em ditirsin hikûmet dest bi şer bike.”**

Min ji wan re rewşa Iraqê şirove kir û got: Demek e guhdariya me nakin. Rojê şandeya Kurd bi tiştekî ve mijûl dikin. Hikûmet li ser avakirina yekîtiyek sêalî dixebite, lê tu nûnerekî me bi wê şandeyê re nebirine da ku em jî nêrîna xwe bêjin û beşdar bibin.

Lê min tekez kir:

“Em çareseriya siyasî baştir dibînin û şer red dikin. Lê eger şer li ser me bê ferzkirin, em ê berevaniyê ji xwe bikin. Mafê xwe-parastinê mafekî pîroz e. Bawer jî bikin hikûmeta Iraqê nikare gelê Kurd bişkênîne û ji nav bibe.”

❖ Paş wan gotûbêjan heta kengê tu li Bexdayê mayî?

Dema ku şandeya Iraqê çû Qahireyê, ez jî vegeriyam Kurdistanê piştî vegera şandeyê, ez jî vegeriyam Bexdayê. Vê carê Ehmed Hesen Bekir û Salih Mehdî Emaş pêşwazî li me kirin ku aliyê nerm yê desthilatê dihatin hesb.

Hinekê ez û Ehmed Hesen Bekir axivîn. Piraniya wan axaftinan Dana Adams Schmidt ji zarê Şewket Eqrawî di pirtûkên xwe de nivîsandiye.

Quranek di destê Ehmed Hesen Bekir de bû, wî destê xwe danî ser Quranê û got: **“Bi vê Quranê tu niyetek me ya xirab li hember we nîne. Em hez dikin bi riya aşitiyê pirsgirêkan çareser bikin.”**

Min jî destê xwe danî ser wê Quranê û wiha got:

“Bi vê Quranê niyeta we li hember me baş nîne, xwe ji bo şerê me amade bikin.”

Serdanek Din a Qahireyê
Tahîr Yehya û Hikûmet

❖ Çima we nekarî bi wê şandeyê re herin Qahireyê? Kê rê li we girt?

Mesele bi vî awayî bû. Min di wê civînê de rexne li wan girt û got: Çima we nehîşt em biçin civîna sêalî ya Qahireyê? Tahîr Yehya jî wiha got: “Tu biçe, bizane kî rê li te digre?

Min got: Pasporta min bidin.

Wî jî got: “Ser çavan.”

Piştî çend rojan pasporta min amade bû û gotin: **“Tu jî biçe bi Ebdul Nasir re axaftina xwe bike, karê me li te neketiye.”**

Min wekî firsetekê dît, heta serdana Ebdul Nasir bikim, kanê karên me gihîştiye ku derê? Her wisa em ji Bexdayê bê hêvî bibûn û me xwest bi riya Ebdul Nasir têkiliyên me û hikûmetê ji nû ve dest pê bikin. Li vir pêwîst e behsa tiştekî dîrokî yê pir girîng bikim:

Sekreterê Tahîr Yehya hat pasaporta min bir û derketina min amade kir û bilêtek jî ji min re birî, hinek pere di nav pakêtekê de danîbû, wisa bizanim bi qasî hezar dînarî bû. Lewma min telefon kir û got: “Kekê Tahîr bê zehmet tu dikarî sekreterê xwe bişînî ba min?” Sekreterê wî hat û **min pakêt dayê**, ji bo bilêtê jî min spas kir. Piştre Tahîr Yehya telefon kir û got: “Dixwazim te bibînin.”

Hat Hotêlê û ez ji hevalan cuda kirim û got:

“Bi şerefa xwe, ez te wek heval û dostê xwe dizanim, ez Kurd im û Ebdul Nasir jî hez dikim, dizanim tu jî wî hez dikî, ez ne bi vê hikûmetê re me. Ez baweriya xwe li te dînim, peyamek min heye dikarî bigihînî Ebdul Nasir?”

Min jî got: “Serçavan.” Tahîr Yehya got: Ji Ebdul Nasir re wiha bêje:

“Ew ne bi hikûmetê re bû. Ew amadekariyan dikirin ku rojekê ji wê hikûmetê rizgar bibin. Ew hîn jî dost û dilsozên te ye. Niyeta wê hikûmetê ne digel te (Ebdul Nasir) û ne jî digel Kurdan baş nîne.”

❖ Ew hevok çi bû?

Naveroka wê di bîra min de nemaye. Dema ku ez gihîştim Qahireyê destpêka meha Gulanê bû, Şewket Eqrawî jî bi min re bû. Em hatin agahdarkirin ku Ebdul Nasir gelekî mijûl e, gotin: Ew ê here Eskenderiyeyê, li wir kongreya welatên Ereb heye. Piştre dê biçe Addis Ababayê, li wir jî kongreya netewe yên Afrîkayê heye.

Sekreterê Ebdul Nasir , Ebdul Mecîd Ferîd gote min:

“Ebdul Nasir gotiye; eger Celal Talebanî gelek lez bû, bila bi Muşîr Ebdul Hekîm Amir re biaxive. Lê eger lez nebû bila li Qahireyê bêhna xwe vede, dema ku vegerim, ez ê wî bibînim.”

Min bersiv da: Her duyan dixwazim, him dîtina Muşîr Ebdul Hekîm Amir û him jî li benda serok dimînim.

Wî jî got: “Gelek baş e.”

Me serdana Muşîr Ebdul Hekîm Amir kir, wî bi germî pêşwaziya me kir û gelek hezkirin li hember Kurdan nîşan da û got:

“Ew Beisiyên sextekar derewan dikin û tiştekî nadin we. Lê hûn dest bi şer nekin û bi dû aştiyê bin. Bila berpirsiyarî li hember neteweya Ereb û cîhanê di stûyê wan de bimîne. Got jî: Ya rast, ez jî gihîştim vê baweriyê ku tiştekî nadin we û niyeta wan li hember we ne baş e.”

Ez li Qahireyê mam. Di wê heyamê de du bûyerên girîng di jiyana min de qewimîn.

Ya yekem: Mihemed Hîlmî Paşa bû. Ew kesatiyekî navdarê Kurd li Tirkiyeyê bû. Di dewleta Osmanî de wezîr bû, paşê ser navê Kurdan di sala 1947’an de, daxwaznameyek dabû Net-eweyên Yekbûyî û dewa mafê Kurdan kiribû, her wisa li Misrê ew xizmê malbata şahbanûyê dihat hesab û li wê derê mabû. Wî gelek belge û pirtûk dane me.

Ya duyem: Dîtina Kurên Mihemed Elî Ewnî bûn. Navê yek ji wan wî Selahedîn û yê din navê wî Îsamedîn bû. Xwişkek wan jî bi navê Dûriye hebû. Me ew jî dîtin û wan jî gelek pirtûk dane me. Mixabin ew pirtûk ba Şewket Eqrawî bûn, nizanim çi li wan kir? Ku belgeyên dîrokî yên herî baş dihat hesab.

Wê demê bi nivîsandina wê pirtûkê re mijûl bûm ku paşê bi navê **“Kurdistan û Tevgera Rizgariya Gelê Kurd”** hat weşandin. Ereban derbarê Kurdan gelek kêm dizanîn, lewma min dest bi nivîsandina wê pirtûkê kir. Bi taybet ku Fuad Rikabî pêşniyar kir û got: **“Pêdivî ye pirtûkek were nivîsandin ku bi awayekî rast، zelal, demokratîk û pêşverû behsa pirsa Kurd bike da ku Ereb pirsa Kurd fem bikin.”**

Dema ku ez li Qahireyê bûm, şandeya Kurd her li Bexdayê bû. Hikûmetê her carê tiştek digot wan û bersiveke rast û maqûl nedida. Şandeya hikûmetê projeyek dabû wan, ku

naveroka wê pir betal bû û tê de behsa pirsa rewa ya Kurd nedihat kirin, zêdetir li ser nenavendiya îdarî disekinî heta ya siyasî.

Endamên şandeya Kurd Ji ber tengavbûna şert û mercan, neçar bibûn ku dûr bikevin, hinek ji wan li Bexdayê mabûn û hinek jî vegeriyabûn Kurdistanê, çimkî ditirsiyan hikûmet dest bi şer bike û wan jî bigre.

Piştî ku Ebdul Nasir vegeriya Qahireyê gazî me kir. Roja 29 an 30'yê Gulanê bû, ku ez û Şewket Eqrawî çûn dîtina Ebdul Nasir . Min ji Ebdul Nasir re behsa rewşa danûstandinan kir ku çi hatiye kirin û çawa bûye? Min behsa tirsa me ji niyeta hikûmetê ya destpêkirina şer kir.

Ebdul Nasir wiha axivî: **"Ez tevahiya gotinên te baş dibînim û dizanim ku helwesta wan li hember we nebaş e."**

Paşê bal kişand ser hevdîtina me ya berê û got: Pêştir te got, Beisî hincetê digrin û dibêjin: "Em nikarin mafên Kurd bidin, ji ber ku Ebdul Nasir dê me tawanbar bike û li dijî me bisekine." Wê hingê min ji te xwest ji wan re bêjî? Te çi kir?

Min got: "Belê, min ew yek ji wan re got, lê bê feyde bû."

Pêşniyarên Ebdul Nasir bi vî awayî bûn:

Bila ew li ser bingeha xweseriyê bi we re bigihîjin lihevkirinekê, hûn her du alî lihevkirinê îmze bikin, lê ranegihînin û werin Qahireyê, ez ê jî îmze bikim û bi awayekî fermî wê lihevkirinê rabigihînim û piştgiriya xwe nîşan bidim, da ku pêşiya wan hincetan bigrim.

Ebdul Nasir jî wiha axivî:

“Ew ne derbarê yekîtiya Ereban rast dibêjin û ne jî derbarê çareseriya siyasî ya pirsa Kurd. Mixabin ew ji goşeyek teng a partiya xwe li pirsan dinêrin. Dixwazin Iraq, Sûriye û Misrê bixin bin kontrola xwe. Got jî: Ez ji şer ditirsim, ricayê ji we dikim hûn şer nekin, bila di şer de ew pêşeng bin.”

❖ Ebdul Nasir pişta çareserkirina pirsa Kurd digirt?

Belê. Ebdul Nasir got:

“Ez piştgiriya vê yekê dikim ku mafê we yê xweseriyê bê dayîn. Bi nêrîna min pirsa Kurd ji xweseriyê mezintir e, gelê Kurd rastiyeka dîrokî ye.”

Her wisa Ebdul Nasir got: **“Çawa ku Çemê Nîlê rastiyeke cografî û hebûnek e û nayê înkar kirin, gelê Kurd jî rastiyeke dîrokî ye, tu kes nikare înkar bike.”**

Got jî: **“Bi nêrîna min pirsa Kurd bi dayîna mafê diyarkirina çarenivêsê tê çareserkirin.”**

Wî mînaka Yugoslavyayê anî û got**: “Yugoslavya mînakek baş e, ku tê de komarên yekbûyî dikarin bi hev re bijîn, niha dema wê yekê hatîye.”**

Piştre wiha axaftina xwe berdewam kir:

“Yekem: **Divê tu biçî Beyrûtê konferanseke rojnamevanî li dar bixî, em ê jî alîkariya te bikin. Hinek rastiyan ji gelê Ereb re zelal bikin û nîşan bidin ku hûn dixwazin bi aştiyê pirsa xwe çareser bikin ne bi şer, ji bo wê armancê jî we şer rawestandiye.**

Duyem: **Pêwîst e hûn nîşan bidin dijî neteweya Ereb nînin berevajî pişta neteweya Ereb digrin.**

Sêyem: **Nîşan bidin hûn ne tenê asteng nînin li hember yekîtiya neteweyî ya erebî, belkî alîgirê yekîtiya erebî ne.**

Çarem: Kurd û Îsraîlê bi hev re qiyas bike, ji ber ku Beisî dixwazin bi hinek gotinan Ereban bixalifînin. Balê bikişînî ser vê yekê ku cudahî di navbera we û Îsraîlê de heye:

Hûn neteweyek misilman in, ew ne wisa nin, hûn neteweyek resen in, ew ji cihekî din hatine, hezaran sal in hûn li ser axa xwe dijîn, lê ew dagirker in. Hûn dost û piştgirê Ereb in, ew dijminê Ereb in."

Piştî wan axaftinên Ebdul Nasir, min spasiya wî kir û got: Şîretên te gelek baş û bi feyde bûn.

❖ Tu dostaniya Misrê û dijminatiya Sûriyeyê bi Kurdên Iraqê re çawa dinirxînî?

Ji ber Kurdan, Misrê dev ji Ereban ber nedida, tenê dixwest di çarçoveya welatekî Ereb an Yekîtiya Ereb de mafê Kurdan bê dayîn.

Misr dijî şerê bi Kurdan re bû, yanî nedixwest Beisî şerê Kurdan bikin û Sûriye jî artêşê bişîne ser Kurdên Iraqê. Şahidê wê yekê heye. Wê demê min û Şewket Eqrawî serdana Ebdul Nasir kir, me behsa şer kir. Wî wiha got:

"Venegere Iraqê çimkî agahiyên me hene, hikûmet dixwaze şandeya we bigre, eger te jî bigirin dê te bikûjin."

Eger me bi gotina Ebdul Nasir nekira, dibû ku dema vegerê em li Bexdayê rastî pirsgirêkan bihatan.

Her wisa di serdana min a yekem de, Ebdul Nasir got: "Ez pişta mafê xweseriya Kurdan digrim" û li cem rojnamevanan pişta daxwazên şandeya Kurd girt.

❖ Çima tu venegeriyayî Iraqê, çûyî Beyrûtê?

Roja paştir balyozê Misrê li Iraqê Emîn Howeydî serdana min kir û got: **“Ebdul Nasir gotiye bila venegere Bexdayê li gorî agahiyên me dê bigirin û piştre jî bikujin.”**

Yekê Hezîranê li Beyrûtê bi amadebûna 80’ê rojnamevanan bi taybetî Hîşam Ebû Zehr û çend rojnamevanên alîgirên Ebdul Nasir, min li Hotêl Brîstol konferanseke rojnamevanî li dar xist û bal kişand ser maf û xebata gelê Kurd û vê yekê ku çima îtirafkirina bi mafên gelê Kurd dibe sedema xurtbûna dostanî û biratiya Kurd û Ereban û xurtbûna yekîtiya niştimanî.

Dema ez li Misrê bûm, Ebdul Nasir got: **“Bi riya hevalên xwe bêje Mela Mistefa bila sozên şahê Îranê bawer neke çimkî ya ku şahê Îranê dixwaze bide Kurdan, wekî jehrê ye di nav şekir de, hajî xwe hebin û nekevin teleya Îranê ku encama wê ji bo we gelek xirab dibe.”**

Rojekê li Beyrûtê min Dr. Nûredîn Baban dît ku dostê min yê kevin bû. Wî got: “General Teymûr Bextiyar li te digere”. Teymûr Bextiyar pêştir Serokê Rêxistina Îstixbarat û Ewlekariya Îranê (SAVAK) bû, ji ber dijatîkirina rejîma şah reviyabû Lubnanê. Piştre çûbû ziyareta Necef û Kerbelayê, li Bexdayê Salih Yûsifî dîtibû, Yûsifî jî ji riya wî nameyek ji min re şandibû. Min name jê wergirt, bi wê yekê me hev nas kir.

Salih Yûsifî di nameyê de nivîsîbû: “Em li Bexdayê di xeterê de ne, tu jî venegere. Ez bi neçarî çûm Ewropayê, destpêkê çûm Viyenayê. Li wê derê bûm ku Hikûmeta Iraqê li dijî gelê Kurd şerê îbadî ragihand, bi wê yekê şer dest pê kir û danûstandina me û Beisiyan rastî şikistê hat.

Destpêkirina Şer
Piştgiriya Cîhanê bo Kurd

❖ Piştî şerê Beisiyan dijî Kurd, welatên cîhanê hatin ser xetê, gelo PDK'ê karî sûdê ji wê derfetê bigre?

Belê. Ya rast ew şer destpêka navdewletîbûna pirsa Kurd bû. Piştî herifîna Ebdul Kerîm Qasim, ez û Salih Yûsifî çûne Bexdayê.

Gelek rojnamevanên iraqî, erebî û biyanî serdana me kirin û dixwestin bizanin çi helwestek şoreşa Kurdistanê û PDK'ê li hember hikûmeta nû heye?

Encama wê danûstandinê digihîje ku derê? Her di wê çarçoveyê de rojê bi dehan rojnamevanan serî li me didan.

Hejmarek rojnamevanan jî, ji riya hikûmetê ve serdana Mela Mistefa dikirin. Piraniya rojnamevanên ku bi Mela Mistefa re hevpeyvîn pêk dianîn, encama karê xwe digihandin asta navdewletî, bi wê yekê pirsa Kurd bi berfirehî di cîhanê de deng veda.

Sedema duyem a dengvedana Şoreşa Kurdistanê li cîhanê, qirkirina komunîstan ji aliyê Beisiyan ve bû.

Ji ber wê yekê tevahiya welat û partiyên sosyalîst û partiyên komunîst hikûmeta Iraqê bi tundî protesto kirin.

Her wisa li welatên sosyalîst rojane medyayê behsa Iraqê û kuştina komunîst û demokratan, şerê dijî Kurd û xebata gelê Kurd dikirin.

li Piraniya welatan bibû manşêtên rojnameyan[27].

❖ Gelo şerê dijî gelê Kurd û kuştina komunîstan wek pêwîst di cîhanê de deng veda?

Belê. Çawa ku dema kîmyabarana Helebceyê gelek bi berfirehî behsa pirsa Kurd, xebata rewa û tawanên rejîmê dihat kirin, wê demê berfirehtir behsa pirsa Kurd dihat kirin.

Tevahiya partiyên komunîst û rojnameyên wan li Ewropayê gelek bi berfirehî behsa Iraqê û Kurd dikirin.

ji bilî wê yekê tevahiya partiyên komunîst û saziyên girêdayê wan mîna yên ciwanan, jinan, karkeran û xwendekaran bi yekdengî dijatiya rejîma Beisî dikirin.

Rojnameyên navdar ên cîhanê gelek girîngî didan pirsa Kurd. Wek mînak rojnameya New York Times pêştir Dana Adams Schmidt şandibû Kurdistanê, piştî herifîna Ebdul Kerîm jî carek din Schmidt şand Kurdistanê.

Rojnameya Le Monde a fransî jî rojnamevanê xwe yê navdar Eric Rouleau şandibû Kurdistanê, dema hikûmeta Ebdul Kerîm Qasim herifî, Eric Rouleau ba me bû, dizî ve ji riya Îranê ve hatibû, piştre me bi nepenî bi xwe re bir Bexdayê.

Nûnerê rojnameya fransî ya Le Figaro li wir bû. Hetta rojnamevanên Tirk jî serdana me kirin û wêneya min belav kirin û behsa Kurd û Şoreşa Kurdistanê kirin.

……

[27] Komara Gel a **Moxolistanê** rêja sê Tîrmeha 1963'yan di gera 18'an a civîna giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, daxwazek derbarê qirkirina Kurdan li Iraqê pêşkêş kir, **lê nekarî piştgiriya navdewletî bi dest bîne**, piştre bi xwe daxwaza xwe vekişand.

Rola Sovyetê
Ewropaya Rojava û Ereban

❖ Çi roleke Sovyetê û welatên Ewropa Rojhilat di pişt-giriya gelê Kurd de hebû?

Wê demê me danûstandin qebûl kir, Amerîka û Sovyetê jî pişta diyalogê digirtin. Rojane têkiliya min bi kesekî sovyetî re hebû ku rola şêwirmendiyê ji bo min didît.

Sovyetê gelek baş pişta pirsa Kurd digirt û hez dikir, bi danûstandinê em bikarin tiştekî baş bi dest bînin. Sovyet ji vê yekê ditirsiya Iraq, Tirkiye û Îran bibin yek û Kurdan ji nav bibin. Wê demê jî hikûmeta Beis gelek hovane tevdigeriya.

Wê serdemê Sovyetê hez nedikir şoreşa me ji nav biçe, Amerîkayê jî dixwest pirsa Kurd bi aştiyê bê çareserkirin. Wê demê min nûnerên Fransa, Almanya û welatên din ên sosyalîst didît, her wisa min û balyozê Çînê jî hevdîtin kir.

Ji ber ku helwesta wî li hember pirsa Kurd baş nebû, zêde pişta hikûmeta Iraqê digirt, hinekî devojenî di navbera me de derket. Piştre di şahiya balyozxaneya Çînê de em bi hev re axivîn, min gotê: **Hîn jî tu dijatiya mafê çarenivîsa gelan dikî?**

Wî got: “Ne wisa ye.” Min got: helwesta te dijatîkirina mafê çarenivîsa gelan û piştgiriya hikûmetek dîktator a komunîstkuj e. Lê wî got: “Ew komunîst nînin, rêvîzyonîst in.”

Min jî got: Keko ew li ser komunîstiyê tên kuştin, yên hikûmeta Iraqê birêve dibin, marksîst-lenînîst nînin, berevajî rêvîzyonîst in. Piştî wê nîqaşê di nav şahiyê de nepenî bû.

Lê helwesta balyozê Fransayê gelek baş bû. Min jê xwest peyama min bigihîne General De Gaulle wî jî qebûl kir. Piştre got: **“General we hez dike û dixwaze pirsa we ser bikeve.”**

❖ Çi bandorek dostaniya Misrê û Kurd û şerê Beis dijî Kurd, li ser têkiliyên Iraq û Misrê hebû?

Hikûmeta Iraqê bi fermî li hember bikaranîna peyva “Şoreşa Kurd” ji aliyê rojnameya El-Ehram a misrî ve nerazîbûn nîşan da.

Li Ewropayê jî pirsa Kurd deng vedabû. Dema ez çûm Ewropayê rewş amade bû, ya rast hevalên me jî li wê derê çalak bûn. Wê demê “Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê” çalak bû. Wek mînak, dema ez gihîştim Viyenayê Dr. Wirya Emîn Rewandizî û hejmarek hevalên din hatin pêşwaziya min, rojnamevan jî anî bûn. Kanalên televîzyonî, radyo û çendîn ajansên nûçeyan li balafirxaneyê bûn.

Di medyayê de gelek baş behsa pirsa Kurd dihat kirin, her li Awistryayê min bi berpirsên hejmarek partiyan re hevdîtin pêk anî.

❖ Helwesta Ewropaya Rojava li hember pirsa Kurd çawa bû?

Dema şer dest pê kir, ez çûm Parîsê. Li wê derê jî rojnamevan hatibûn balafirxaneyê. Gotarên cur bi cur derbarê pirsa Kurd hatin weşandin û ez ji aliyê sernivîskarê rojnameyên navdar ên ku nûnertiya wan li Kurdistanê hebû ji bo mêvaniyê hatim vexwendin.

Wek mînak sernivîskarê rojnameya Le Figaro ku rojnameyek muhafezekar û xwedan bandor li Fransayê bû, ji ber min

vexwendinek koktêl rêxist, ku bi dehan rojnamevan û kesatiyên fransî hatibûn bangkirin.

Her wisa sernivîskarê rojnameya L'Humanitê ya Partiya Komunîst a Fransayê jî ez vexwendim ku di mêvandariyê de şerabek taybet danîbû û got: Ev şerab taybetî mêvanê gelek hêja û hezkirî ye. L'Humanitê mîna rojnameya me bû, hemû tiştên me diweşand.

Rojnameya Le Monde a fransî jî li ser min mêvandarî kir û piraniya amadekarên nûçeyan ên ronameyê jî vexwand.

Bi gelemperî girîngiyek mezin didan me. Wê demê tenê hikûmeta Brîtanyayê rê neda ku ez serdana wî welatî bikim û gotin: Tu dê aloziyê bixî nav têkiliyên me û Iraqê.

Lê min nameyek ji Serokê wê demê yê Partiya Karkeran a Brîtanyayê ya opozisyon "Harold Wilson" re şand û tê de behsa pirsa Kurd kir, wî jî bersivek gelek baş da û got: **"Em ê li Parlamentoyê behsa pirsa we bikin,"** wisa jî bû.

Her wisa di bersivê de gotibû: **"Niha li parlamentoyê behsa vê yekê dikin, çima Brîtanya çekan dide hikûmeta Iraqê lê vîzeyê nade Celal Talebanî."**

Piştî salekê, partiya karkeran hat ser desthilatê, ez li Berlînê bûm, ji konsulxaneya Brîtanyayê min vîze xwest, lê konsul got: Divê tu soz bidî, karekî nekî ku di têkiliyên me û Iraqê de pirsgirêk çêbibin.

Min jî got: **"Ez vîzeyekê dixwazim ku tam serbest bim yan jî naxwazim."** Wî jî qebûl nekir.

Piştre min nameyek ji Harold Wilson re şand ku bibû serokwezîr û tê de min got: Dema desthilata muhafezekaran, wan vîzeya Brîtanyayê nedane min û te jî wê hingê rexne li hikûmeta muhafezekaran girt û bi riya nameyekê te bersiva min da.

Piştî du-sê rojan name gihîştibû destê wî. Konsulê Brîtanyayê têkilî bi min re danî û got: **“Ji me re emir hatiye da ku vîzeyê bidine te,”** keniya û got: **“Ji ber ku te gilî kiriye.”**

Li Brîtanyayê me çalakiyên baş kirin. Endamên parlamentoyê civînek mezin ji me re rêxistin. Di nav avahiya parlamentoyê de ez û Wilson rastî hev hatin, wan ez bi Wilson dam naskirin.

Wê serdemê girîngiyek mezin bi pirsa Kurd dihat dayîn. li seranserî cîhanê behsa pirsa Kurd dihat kirin. Ez jî li Ewropayê bi aqilmendî û aramî li ser pirsa Kurd dixebitîm. Ya rast ji bo nasandina pirsa Kurd di asta cîhana erebî de jî, Cemal Ebdul Nasir gelekî bi me re alîkar bû. Hetta Eniya Muhafezekarên Ereb jî mîna Şah Hisên pişta me digirt.

Dubare dikim, giringiya pirsa Kurd wê serdemê her derek girtibû. Min vîzeya Amerîkayê xwest, yekser dane min. Civînek xwendekarên Kurd li Bexdayê hebû, du kes ji balyozxaneya Amerîkayê hatibûn û gotibûn Mam Celal vîze xwestiye, vîzeya wî amade ye bila sibe were yan pasporta xwe bişîne. Ser daxwaza min hatin û em ba hev rûniştin. Wan gotin: Vîzeya te hatiye, eger biçî Amerîkayê dikarî bi wezareta derve re hevdîtinê bikî, lê nikarî biçî Koşka Spî û serok bibînî, lê birayê serok “Robert Kennedî” dê te bibîne.

❖ Gelo Sovyet hajî wan têkiliyan hebû, tu çûyî Ewropaya Rojhilat?

Belê. Di hemû mijaran de em bi Sovyetê re dişêwirîn. Piştre min serdana Berlîna Rojhilat kir. Li wê derê pêşwaziyek germ li min hat kirin. Ez bi endamê polîtburoya wan re civiyam. Wan avahiyek taybet a Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Almanya (SED) li derveyî Berlînê dabûn me. Wê demê wek alîkarî 100 hezar Markên almanî dan me û gotin: Hûn bi xwe dizanin çawa xerc bikin, lê tenê di nav Almanya Demokrat de xerc bikin.

Berpirsên Çêkoslovakyayê û Almanya Demokrat gotin: **"Çiqas çek ji we re pêwîst be, em ê bidin lê çawaniya birînê li stûyê we bi xwe ye."**

Berî ku biçim Moskowê, Radyo û Televîzyona Moskowê li Parîsê hevpeyvînek bi min re kir. Li Moskowê jî min bi hinek berpirsên Sovyetê re hevdîtin kir. Li Moskowê min zanî, projeya Moxolistanê ya piştgiriya Kurd li Neteweyên Yekbûyî serî nagre. Sovyetiyan gotin:

"Tu welatek li Komeleya Neteweyên Yekbûyî amade nîne pişta daxwaza Moxolistanê ya protestokirina Iraqê bigre."

❖ Rast e te sala 1963'yan bi Shimon Peres re li Parîsê hevdîtin kiriye, şandeyeke PDK'ê serdana Îsraîlê kiriye?

Nexêr. Her du agahî nerast in. Mesele bi vî awayî bû. Ez li Parîsê serokê şandeya Kurd bûm. Li her welatekî bibam bi kesekî sovyetî re dişêwirîm. Li Parîsê jî Sovyetiyan kesek bi wê armancê ji min re destnîşan kiribûn.

Rojekê li Parîsê Kamiran Elî Bedirxan serdana min kir û got: Cîgirê wezîrê berevaniya Brîtanyayê û Şah Hisênê Urdinê dixwazin te bibînin. Min jî qebûl kir. Di wê barê de ez bi Sovyetiyan re axivîm, ew jî razî bûn. Piştî heyamekê Kamiran Bedirxan got: **"Şaş bûye, wezîrê berevaniya Brîtanyayê nebûye, belkî wezîrê berevaniya Îsraîlê bûye."**

Min jî got: Ezbenî divê razîbûnê ji nav welêt werbigrim. Piştre ez bi wî sovyetî re şêwirîm, razî nebû. Paş hingê min bersiva Kamiran Bedirxan da û got: **"Hevalên nav welêt razî nebûne ez wê hevdîtinê bikim."**

❖ Tu derbarê serdana Mamoste Îbrahîm Ehmed a Îsraîlê çi dibêjî?

Ew jî her ji bingehê ve ne rast e. Ne Mamoste Îbrahîm Ehmed û ne jî Omer Debabe serdana Îsraîlê nekirine yan bi berpirsên îsraîlî re hevdîtin pêk neanîne. Tenê Mela Mistefa, Şemsedîn Muftî û Dr. Mehmûd çûn Îsraîlê. Ew jî dema ku nakokî navbera me û Mela Mistefa de hebû.

❖ Te serdana Amerîkayê kir?

Ji ber du sedeman ez neçûm Amerîkayê.

Yekem: Ji ber ku tu welatek amade nebû pişta projeya Mox-olistanê ya protestokirina Iraqê bigre.

Duyem: Ji Kurdistanê ji min xwestin vegerim, çimkî rewş xirab bibû û ew cihê ku ez berpirsê wê bûm ji aliyê hikûmetê ve hatibû girtin, gotin: Tu bi xwe werî baştir e.

Lê niha dibêjim: Xwazî min ew serdan kiribûya, çimkî gelek sûda wê ji bo pirsa Kurd hedibû û alîkariya pêşxistina wê di qada Amerîka û Neteweyên Yekbûyî de dikir.

❖ Wê demê çi rolek Kurd di nasandina pirsa Kurd hebû?

Yek ji sedemên dengvedana pirsa Kurd li Ewropayê çalakiyên Komeleya Xwendekarên Kurd bû. Wê serdemê Komeleya Xwendekarên Kurd çalakiyên baş li Ewropayê dikirin, him civîn rêdixistin him xwenîşandan dikirin û him jî têkiliyek wan baş bi medyayê re hebû.

Di wan salan de pirsa Kurd gelek baş pêşde diçû, Dana Adams Schmidt behsa wê qonaxê û rola me bi başî dike û gelek girîng dihesibîne û dibêje:

"Cara yekem e, Kurd pirsa xwe bi berfirehî dînin qada navdewletî bi awayekî rojane kanalên televîzyonî û medya bi başî behsa wê hewlê dikin. Kurd bi awayekî dîplomatîk û jîrane projeya çareseriya pirsa xwe pêşkêş dike da ku ji aliyekî ve raya giştî ya ewropî û amerîkî, ji aliyê din ve raya giştî ya Erebî razî bike. Li cem sosyalîstan wiha behsa pirsa xwe kirin, li cem Ewropa û cîhana demokratîk jî bi curekî din, da ku hemû pirsê qebûl bikin."

❖ Şerê dijî Kurd çiqasî kişand, hatina Ebdul Selam Arif firset bû ji bo diyalogê?

Di rojên 8,9 û 10'ê Hezîrana 1963'yan de, desthilata wê demê ya Beis dest bi êrişan ser Kurdistanê kir, ku heta Cotmehê dom kir. Di wê heyamê de Beis bi hovîtiyek tam hat Kurdistanê û wek cara yekem di dîroka nû ya Iraqê de siyaseta kavilkirin û veguhestina bi zorê pêk anî. Li navçeyên derdora Kerkûkê û navçeyên ku petrol tê de hebûn, wek cara yekem bi dehan gundên Kurdan kavil kirin, bi wê hincetê ku dixwazin xetera li ser tesîsên petrolê nehêlin.

Sala 1963’yan wek destpêka siyaseta kavilkirina gundên Kurdistanê û veguhestina bi zorê ya xelkê Kurd tê zanîn, ku bi destê Partiya Beis hatiye kirin.

Bi nêrîna min ew siyaset, berhema bîr û nêrîna Mîşêl Efleq bû, ku di madeyeke programa Partiya Beis de dibêje:

“Eger kîmaniyên neteweyî nexwestin bibin ereb û di nav miletê ereb de bihelin, wê demê divê bên helandin yan jî ji welat bên derxistin, ji ber ku vir axa ereb e.”

Ew nêrîn li ser esasa şovênîstiyê hatiye danîn. Wek mînak axa Kurdistana Iraqê axa Ereban nîne, çimkî Kurdên Iraqê ne ereb in, belkî beşek ji neteweya Kurd in, çawa ku Erebên Iraqê beşek ji neteweya Ereb in. Her wisa axa Kurdistana Iraqê beşek ji axa Kurdistana Mezin e û milkê neteweya Kurd e, çawa ku axa beşa erebî ya Iraqê beşek ji axa neteweya ereb e.

Lê ew siyaseta şovênîstî di sala 1963’yan de ket praktîkê û hinek eşîrên ereb hatin teşwîqkirin da ku ji bo talankirinê bên Kurdistanê. Her çend wê salê Beis gelekî hewl da lê nekarî serketinek mezin bi dest bîne ji ber ku navçeyên sereke û girîng ên Kurdistanê di dest Kurd de man, ji bilî ku navçeyên rizgarkirî, her di destê Kurd de bûn.

❖ Tu şiyan û rola Hêza Pêşmerge ya wê serdemê çawa dinirxînî?

Bi gelemperî pêşmerge rola xwe bi camêrî û qehremanî bi cih dianî. Tenê hinek fermandarên pêşmerge yên Mela Mistefa danîbûn, bêşiyanî û tirsekiya xwe nîşan dan.

Li vir behsa mînakekê dikim. Ew jî Ezîz Eqrawî ye. Gelekî xwe mezin nîşan dida ku zilamekî netirs e, lewma bûye berpirsê eniya Hewlêrê. Di şerê “Serê Reş” de Ezîz Eqrawî şikist anî, tevî ku cihekî gelek asteng û dijwar bû.

Ji wê derê heta Çiyayê Sefînê ku çiyayekî asteng bû û bi hêsanî nedihat girtin û hejmarek mezin pêşmergeyan jî lê bû, dikarî bi dehan rojan şer bikirana, lê vekişiyan hatin pişt Xwanzada Soran û Geliyê Elî Beg.

Ezîz Eqrawî gelek bi xirabî şikiya û hêza wî parçe parçe bû, di encamê de Hacî Omeran û Geliyê Elî Beg bê şer teslîmî hikûmeta Iraqê kir.

Di demekê de Gliyê Elî Beg cihek e, ku mirov dikare çendîn mehan lê şer bike. Piştî wê şikistê Ezîz Eqrawî di nav xelkê de şikiya û jê re “Generalê Hezîmetê” ango generalê rev û teslîmmê dihat gotin.

Li navçeyên din ku berpirsên pêşmerge kesên hizbî bûn, gelek bi mêrxasî şer hat kirin. Hikûmetê nekarî li wan navçeyan tu cihekî bigre.

Li Payîzê Çemê Rêzanê hat girtin. Rast e Çemê Rêzanê bi xwe cihekî dolek e, lê pişta wê li ser banê Çemê Rêzanê heta Agcelerê deştek xuya ye û tank dikare hilkişe ser girê jorê.

Tevî wê yekê, piştî çend hefte şer, ziyaneke mezin a canî, hêzên hikûmetê karîn bigirin, lê nekarîn zêde lê bimînin, neçar man vekişin. Hêzên hikûmetê her wisa nekarîn navçeya Qeredaxê, Çiyayê Bemo, Şarbajêr û Mawetê bigirin, çimkî polîtburo li wê derê bû. Tevî ku hinek navçe wek Barzan hetin

girtin, ji ber ku li wê navçeyê şer nehat kirin, lewma hikûmetê nekarî serketina leşkerî bi dest bîne.

Darbeyeke Nû
û Diyalogeke Nû

❖ Çi helwestek PDK'ê li hember derkirina Beisiyan û hatina neteweçiyên şovênîst hebû?

Piştî ku di encama darbeya 18'ê Mijdara 1963'yan de Beis herifî, hikûmeta nû yekser têkilî bi me re danî.

Bi nêrîna min hikûmetê ew kar di bin bandora Ebdul Nasir de kir, çimkî Ebdul Selam Arif xwe alîgirê Ebdul Nasir dizanî, her çend nasiriyekî sextekar bû. Ebdul Nasir gotibûyê nabe şerê Kurd bikin. Her wisa hajî vê yekê jî hebû, ku Ebdul Nasir dijî şerê berê yê Beisiyan dijî Kurdistanê bûye.

❖ Yanî carek din danûstandina bi hikûmetê re dest pê kir?

Belê. Dema Beisiyan şerê me dikirin, rojnameyên m

isrî li dijî wî şerî bûn, hetta Ebdul Nasir bi xwe jî li dijî şer daxuyanî dida. Ev jî di demekê de bû, efserên xwedan desthilat di nav hikûmeta Beisiyan de, dizanîn Ebdul Nasir li dijî wî şerî ye, her çend xwe wek alîgirên Ebdul Nasir nîşan didin!

Şandeya hikûmetê hat Kurdistanê û got:

Em dixwazin danûstandinê bikin. Wê demê ez ku li navçeya Şedele û Sûrdaşê bûm, wek henek min gote şandeya hikûmetê, vegerin Bexdayê şandeya me ya danûstandinan li

wê derê ye. Çimkî dema ez çûbûm derveyî welêt, Beisiyan li şûna ku bi şandeya Kurd re danûstandinê bikin, endamên şandeyê girtibûn.

Endamên girtî yên şandeya Kurd ev bûn: Salih Yûsifî, Babekir Mehmûd Hacî Axa, Mesûd Mihemed, Hisên Xaneqa û Reşîd Arif. Min gote şandeya hikûmetê: **"Şandeya me di girtîgeha we de ye, biçin wan ji girtîgehê derxînin û danûstandinê bi wan re bikin."**

Di aliyê din de vekirina ofîsekê yek ji wan westan bû ku pêştir me ji Ebdul Nasir kiribû, wî jî qebûl kirbû, tevî ku gelekî rikê Iraqiyan hat û gotin bila nav li ser avahiya ofîsê nebe. Lê min got: Mafê min ê danîna nûner nîne, heta ez Mela Mistefa û polîtburoyê agahdar dikim, bila Şewket Eqrawî li vir bimîne.

Şewket bi wî awayî û li ser vê bingehê ku ziman dizanî, kesekî rewşenbîr û civakî bû, her wisa zimanê înglîzî jî bi başî dizanî, wek nûnerê PDK'ê li Qahireyê ma.

❖ Mela Mistefa li ser danîna Şewket Eqrawî wek nûner li Misrê razî bû?

Mela Mistefa gelek aciz bû û got: **"Celal tu hinek caran karê dînan dikî tevî ku xwe dostê Ebdul Nasir dihesibînî."**

Bala xwe da min û got: "Te çima şewket li Qahireyê daniye."
Min jî got: Wele li wê derê kes nebû.
Got: Dizanî Şewket li wê derê çi dike? Şewket ne nûnerê Kurd e!
Min jî got: Nûnerê kê ye?
Mela Mistefa got: **"Şewket li ser Ebdul Nasir sîxuriya Brîtanyayê dike."**

Rehma xwedê lê be, her nav li xelkê dikir. Tevî wan gotinan, lê Mela Mistefa Şewket di cihê xwe de hîşt.

Wê demê ku Şewket li Misrê bû, Ebdul Nasir bangî wî kiribû û gotibû: Yên niha li Iraqê hatine ser desthilatê dostên me nin. Bêje partiya xwe:

“Ez amade me navbeynkariyê bikim, kefaletê jî bikim. Peymana ku tê îmzekirin garantî bikim û xweseriyê ji we re bistînim. Bi wî awayî ku Celal ji min re şirove kiriye.”

Bi nêrîna min Şewket Eqrawî şaşiyek teknîkî kir, li şûna vê yekê ku ji Ebdul Nasir bixwaze ji riya Bexdayê ve vegere Kurdistanê, ji riya Tehranê ve vegeriya. Li Tehranê çend rojan gîro bû, Îraniyan jî bi qest ew gîro kirin.

Wê demê berfek zêde li bajarê Serdeştê barî bû. Mamoste Îbrahîm Ehmed û yên din jî li wê derê bûn. Em bi bêtêlê bi hev re diaxivîn. Me bi bêtêlê peyamek şand û me got: **Gelek girîng e Şewket lez vegere, karekî me yê gelek girîng bi wî heye.**

Mela Mistefa dixwast ew zû vegere lê Şewket peyamek şand bi kurtî bi vî awayî bû: **“Sebir bikin spartiya Ebdul Nasir bi min re ye.”**

Ev jî di demekê de bû, li Raniyeyê navbera me û hikûmetê de danûstandin hebû. Min peyama Şewket gihand Mela Mistefa û min gotê:

“Peyama Ebdul Nasir bi Şewket re ye û dibêje tu karî nekin, peyamek gelek girîng bi min re ye, li bendê bin heta ez hatim.”

Şewket Eqrawî ji tirsa Îraniyan nedikarî eşkere behsa naveroka peyama Ebdul Nasir bike, çimkî Îraniyan hez nedikirin têkilî navbera PDK’ê û Ebdul Nasir de hebe. Ji ber wê yekê

Mela Mistefa guh neda wê xwesta Ebdul Nasir . Wê rojê ku Şewket hat, danê sibehê lihevkirin navbera me û hikûmetê de hatibû îmzekirin.

Dema me naveroka peyama Ebdul Nasir dît, me li serê xwe da, ku çi derfetek mezin û girîng ji dest me çûye, **ew jî garantîkirina bicihkirina peymanê ji aliyê Ebdul Nasir ve bû.**

❖ Kengê û çawa danûstandinê di navbera Barzanî û hikûmeta nû de, dest pê kir?

Destpêkê şandeyek ji Bexdayê hatibû navçeya Dêgeleyê, kesek bi navê Eskender Eczaçî yê ermenî di nav şandeyê de bû, ku di anîna dermanan de şirîkê Babe Elî bû. Ew hatibû ji zarê Babe Elî û Amerîkayê ji Mela Mistefa re diaxivî û pesnê hikûmetê dida û digot; girîng e Mela Mistefa şoreşê rewestîne û bi hikûmetê re li hev bike.

Bi nêrîna Mela Mistefa spartiya Babe Elî û Amerîkayê ji ya Ebdul Nasir girîngtir bû, lewma li benda Şewket Eqrawî nema ku peyama Ebdul Nasir bi pê re bû. Her di wê çarçoveyê de ez û Nûrî Şaweys wek nûnerên polîtburoyê çûne cem Mela Mistefa da ku bêjnê; erd di dest hikûmet de ye, em çi bikin? Wê demê Mela Mistefa li Dolereqeyê bû. Wek şahidên dîrokî, Mamoste Selîm Fexrî û Dr. Sidîq Etroşî li wê bûn.

Rojekê kesekî leşker ji Rewandizê hatibû, hevalan gotin; Ji aliyê hikûmetê ve hatiye, Mela Mistefa gazî me hemiyan kir û got: Em çi bikin? Selîm Fexrî jî wiha bersiv da û got:

“Cenabê Mela Mistefa, kesekî leşker di wê astê de nîne ku tu bibînî, kesekî bişîne da ku bizane çi dibêje?”

Mela Mistefa pirsî: “Hûn çi dibêjin?” Me jî heman nêrîn dubare kir, lê Mela Mistefa got: “**Na keko, ez kesekî feqîr im, şivan im, gavan im, ez xwe wek rêber nabînim, ez her kesekî dibînim.”** Lewma bi xwe ew kes dît û derket ji aliyê hikûmetê ve hatiye û hikûmet dixwaze parêzgarê Silêmaniyê bişîne ji bo danûstandinê.

Lihevkirina
Şêx Ehmed û Hikûmeta Iraqê

❖ Bandora daxuyaniya Şêx Ehmed li ser diyaloga PDK’ê û hikûmetê çi bû? Barzanî ser daxuyaniyê çi got?

Hikûmeta Iraqê fêleka mezin kir. Hikûmet diçe ser Şêx Ehmed û dibêjê: Tu gel me yî? ew jî dibêje: Belê.

Piştre daxuyaniyekê bi dengê Şêx Ehmed qeyd dike û bi riya radyoyê belav dike, ku tê de Şêx Ehmed dibêje:

“**Dev ji wê tevlîhevî û şaşiyê berdin, werin malên xwe û di nav malbatên xwe de rûnên.”**

Ew daxuyanî gelek rûxêner bû û hemû rojan ji riya Radyoya Kurdî ya Bexdayê ve dihat belav kirin. Hikûmet bi wê yekê jî nesekinî û Şêx Ehmed anî ser me, lê me nedizanî çima hikûmet wê yekê dike?

Bi taybet ez ku şarezayê rewşa civakî û siyasiya Barzanî nebûm. Min nedizanî, li cihê ku Şêx Ehmed lê be, Mela Mistefa nikare biaxive. Hetta di hizûra Şêx Ehmed de Mela Mistefa nikare rûnê, divê li ser piyan bisekine heta wê demê ku Şêx Ehmed îzna rûniştinê bidê! Çimkî erf û edeta eşîrtiya wan bi wî awayî bû.

Helbet Mela Mistefa bi xwe eşkere digot:

“Di temenê xwe de, min tenê bi emrê mutleq yê du kesan kiriye, yek Şêx Ehmed Barzanî û yê din jî Ebdul Kerîm Qasim e, ji bilî wan min bi emrê tu kesên din nekiriye.”

Ez çûm ba Mela Mistefa û min gotê: Ezbenî ez hajî çawaniya têkiliya te û Şêx Ehmed im, lewma baştir e çareseriya pirsgirêkê ji min re bihêlî, bila bêarî û bêedebiya wê yekê ji min re bimîne, ez ê biaxivim û aciz bibim, tu tiştekî neke, wî jî got: “**Baş e, lê ez nikarim bi gotina birayê xwe yê mezin nekim.”**

Min jî got: Baş e, lê dema ez nerazî bûm, tu li min aciz nebe. Got: “Baş e, ez li te aciz nabim.”

Her di wê demê de, helîkopter daket parêzgarên Hewlêr û Silêmanî, yek- du kesên din wek nûnerên hikûmetê hatibûn.

Em li Raniyeyê civiyan. Wê demê Raniye di dest me de bû. Gotin ji bo danûstandinê hatine, dest bi qewl û qiraran kirin.

Di civînê de, ku Nûrî Şaweys, Ebas Ako, Ziyad Axayê Koye û Mela Mesûm amade bûn, dema axaftinê ez rabûm û min got: “**Me şoreş kiriye, em dewa mafê Kurd dikin û ji bo xweseriyê me xebat kiriye.”**

Lê Mela Mistefa got: **“Celal tu bêdeng be, tu her rewşê xirab dikî.**

Hacî Ebdul Rezaq got: **“Tu bêdeng be, tu her meseleyê dijwar dikî, tu xortî û xwîna te germ e, kes hesabê ji bo gotina te nake. Ez hatime cem vî zilamî yanî to bêdeng be.”**

Min got: Keko li vir partî heye.

Wî got: “Na na, partîbûn û tiştên wiha nîne.”

Wê serdemê wan ragihandibûn:

Tu hebûnek wek partiyê nîne: Yanî Kirdeya hevpa, kirde ya neteweyî ya yekgirtî. **(العمل المشترك، العمل القومى الواحد)**

❖ Piştî wê rûniştinê, encama civînan gihîştine ku derê?

Di heyama çendên civînan de, wan bi taybet Hacî Ebdul Rezaq rê nedida ez biaxivim, her digot: Tu bêdeng be.

Di encamê de, wan peymanek gelek lawaz û xirab bi Mela Mistefa dan îmze kirin. Di demekê de em wek polîtburo razî nebûn ku peymanek wiha bê îmzekirin.

Wan Quranek wek diyariya Ebdul Selam Arif ji Mela Mistefa re anîbûn. Di civînê de ku Mela Mistefa û Hacî Ebdul Rezaq rûniştibûn, ew Quran jî danîbûn, Hacî Ebdul Rezaq her nedihîşt ez biaxivim, min Quran rakir û got: Hecî ber xatirê vê Quranê bihêle ez du xulekan biaxivim. Di encamê de min dest bi axaftinê kir.

Ya rast Mela Mistefa ew peyman di bin bandora Babe Elî û Eskender Eczaçî de îmze kir, ku Şêx Ehmed jî razî bû, qaşo Amerîka jî razî bûye.

Mela Mistefa ji ber ku bi xwe jî mandî bibû, bi nêrîna min dixwest partiyê tesfiye bike û serokatiya PDK'ê hilweşîne, lewma di vê baweriyê de bû, êdî danûstandin bes e, ji wê zêdetir bi dest nayne û dewletên mezin pişta wî nagrin. Çimkî **baweriyek wî ya mezin bi lobîgeriya navdewletî hebû, li cihê wê yekê ku pişta xwe bi gel ve girê bide û bi teşwîqkirina xelkê, serokatiya wan bike.**

❖ Çi helwesteke partiyên iraqî li hember wê lihevkirinê hebû, wek mînak partiya komunîst?

Dema biryardanê ez û Nûrî Şaweys razî nebûn îmze bikin. Li vir dixwazim ji bo dîrokê behsa tiştekî bikim.

Wê serdemê Şaxeya Kurdistanê ya Partiya Komunîst a Iraqê an jî serokatiya Partiya Komunîst a Iraqê li Kurdistanê bû, wek Ezîz Mihemed, Kerîm Ehmed, Omer Mela Elî û çend kesên din ku li Qeladizê bûn û her roj me hev du didît. Hemû rojan ji bo civînê em Ji Qeladizê diçûn Raniyeyê, hemû şevan jî me hev du didît.

Selîm Fexrî û Dr. Sidîq Etroşî jî li wê derê bûn. Ew derbarê lihevkirinê bi Ezîz Mihemed re axivî bûn, nêrîna wan jî mîna me bû, hetta ew dijî lihevkirinê bûn ku bi navê "Lihevkirina Muşîr- Barzanî" hat naskirin û îmzekirin.

Wê demê Partiya Komunîst a Iraqê daxuyaniyek derbarê li-hevkirinê weşand û ragihand:

"Li gorî lihevkirinê tu tiştek nedane Kurd[28]."

Hîn daxuyaniya îmzekirina Peymanê nehatibû weşandin, peyama pîrozbahiya Serokê wê demê yê Yekîtiya Sovyetê Nîkîta Krûşçev gihîşt destê Ebdul Selam Arif û tê de gotibû:

"**Lihevkirina we û tevgera Kurd û peydakirina çareseriya aşiti-yane û siyasî berhema dewletmedarekî navdar e**

(عمل من آعمال الرجل الدولة البارز)."

……

[28] Rojnamevanê amerîkî **Dana Adams Schmidt** derbarê "**Lihevkirina Muşîr-Barzanî**" di peyamekê de ji bo Rojnameya New York Timesê behsa vê yekê dike ku **çawa Barzanî piştî 29 mehan şerê dijwar, lihevkirinek bi vî awayî digel hikûmetê îmza kir.**

❖ Piştî peyama Krûşçev helwesta Partiya Komunîst a Iraqê çawa bû?

Serokatiya Partiya Komuîst a Iraqê, tet lez û bezê û daxuyaniya xwe neweşand û nêrîna xwe derbarê peymanê guhert. Piştî daxuyaniyê, pişta peymanê girt û ket hincetanînê û behsa xetera nakokiya cîhanî kir. Sala 1964'an bû, wê demê cîhan bi ser du cemseran de par ve bibû, yek Amerîka û ya din jî Sovyet bû.

Wê serdemê xeta Krûşçev li Sovyetê xurt bû, ku baweriya wê bi xebata çekdarî nebû û di vê baweriyê de bû, dibe ku şoreşên çekdarî belavî navçeyên din ên cîhanê jî bibin, lewma pêwîst e bi lezgînî pêşiya wan şoreşan bê girtin û agirê wan bê vemiranidin.

Pirsa Kurd
Nakokiya Sovyet û Çînê

❖ Çima di wê qonaxê de helwesteke Sovyetê ya nedostane li hember pirsa Kurd hebû?

Wê serdemê wek polîtburoya PDK'ê baweriya me bi xebata çekdarî hebû. Lewma ji rûyê hizirî newekhevî navbera me û xeta Sovyetê de hebû.

Wê hingê ji xeta Sovyetê re digotin: **Bi hev re jiyana aştiyane û veguherîna aştiyane (التع-ايش السلمي و الانتقال السلمي).**

Em jî xeta şoreşger bûn û di vê baweriyê de bûn, pirsa neteweyî bi xebata çakdarî û girseyî tê çareserkirin.

Wê demê di navbera Sovyet û Çînê de nakokî hebûn. Sovyetiyan bêyî ku me agahdar bikin, em xistibûn ser eniya Çînê. Rojnameya Pravda ya Sovyetê gotarek li ser nakokiya navbera polîtburoya PDK'ê û Barzanî weşandibû û nivîsîbû, polîtburoya PDK'ê cemaeteke çepgira serkêş in, tenê baweriya wan bi xebata çekdarî heye, **Ew ruhê demê fe m nakin û siyaseta wan bi siyaseta komên belavbûyî yên di çerxa kolonyalîzmê de li hev digrin.**

(لايفهموم روح العصروتلتقى خطوطهم مع خطوط الاوسات المطفرقة ڤى دەوائرلااستعمارية.)

Her wisa difikirîn, em li ser xeta Çînê û di bin bandora wan de ne. Partiya Komunîst a Iraqê di bin bandora Sovyetê de bû, tevî ku nêrîna me ya her du aliyan mîna hev bû.

Lê ji ber bandora Sovyetê û xeta bi hev re jiyanê ya Sovyetê, her wisa vê xwestê, ku xeta Sovyetê bi temamî qebûl kiribûn, xwe di nav yekîtiya sosyalîstî de didîtin.

Her wisa amade bûn partiya komunîst hilweşînin. Wan yekîtiya sosyalîstiya xwe wek navendekê ji bo tevahiya hêzên pêşvero dizanîn û di bin bandora xeta Krûşçev de bûn û teoriya geşbûna bê kapîtalîzmê qebûl kiribûn (التطور اللارأسمال) .

Nêrînên partiya komunîst di aliyê hizirî û naverokê de nêzîkî xeta Mela Mistefa bûn. Curek hevgirtin navbera wan û Mela Mistefa de hebû, lê di aliyê hizrî û naverokê de, newekhevî navbera me û Mela Mistefa de hebû.

Dana Adams Schmidt di pirtûka xwe de bi berfirehî û dirêjî behsa wan nakokiyan dike, çimkî wê demê ew li Raniyeyê bû. bi komek rojnamevan re hatibûn. Mela Mistefa çûbû nêçîrê,

min bi xwe pêşwazî li wan kir û şev û rojekê ez gel wan bûm. Gelek baş behsa nêrînên min dike û dibêje: **Nakokiyek zelal di nav Kurdan de heye.**

Beşa Dehem
10
Destpêka Nakokiya
Navbera Polîtburo û Barzanî

- Lihevkirina Barzanî û Ebdul Selam Arif
- Kûrbûna nakokiyên Barzanî û polîtburoyê
- Polîtburo û Barzanî
- Çareseriya nakokiyên Barzanî û polîtburoyê
- Barzanî û şoreş
- Biryara karnekirina gel Barzanî
- Pêşniyara Barzanî ya guhertina navê PDK'ê
- Parçebûna PDK'ê
- Şerê navxweyî yan şerê birakujî

Lihevkirina
Barzanî û Ebdul Selam Arif

❖ Çi kêmasiyên peymana navbera Barzanî û hikûmetê hebûn?

Di peymana navbera Mela Mistefa û Muşîr Ebdul Selam Arif de, ku 10 Sibata 1964'an hat îmzekirin, îtiraf bi tu mafekî sereke yê Kurd nehatibû kirin. Daxuyaniya nû ya hikûmetê ya derbarê paymanê, li gorî daxuyaniya pêştir a "Meclisa Serokatiya Şoreşê" ku bi serokatiya Ebdul Selam bi xwe hatibû weşandin, pavekişîn tê de hebû.

Wek mînak, di daxuyaniya berê de navê Kurd wek "**Gelê Kurd**" (الشعب الكردى) hatibû anîn, lê di daxuyaniya nû ya hikûmetê de navê "Gel Kurd" wek "**Birayên me yên Kurd**" (آخواننا الكراد) hatibû anîn.

Her wisa Barzanî soz dabû hikûmetê ku behsa "**Xweseriyê**" neke û PDK'ê jî hilweşîne, bi riya projeya hikûmetê ya bi navê "**Çalakiya Neteweyî ya Hevpar**" (العمل القومي المشترك) xebatê bike û tevahiya partiyan di nav wê projeyê de bên helandin, bi gotinek din tu partiyek nemîne bi PDK'ê ve jî.

Di daxuyaniyekê de ku ji aliyê wî bi xwe ve bi zimanên erebî û kurdî hatibû weşandin, Mela Mistefa gotibû:

"Baweriya wî ya tam bi Ebdul Selam heye ku wek kesekî misilman û momin e (والمومنون موتمنون**) cihê baweriya gelê Kurd e, lewma ji gel dixwaze bi karûbarên xwe yên asayî re mijûl bibin."**

❖ Mela Mistefa ew daxuyanî tenê yan digel polîtburoyê weşand?

Belê, wî bi tenê ew daxuyanî da. Daxuyaniya ku ez behsa wê dikim, Mela Mistefa di 10'ê Sibata 1964'an de dabû weşandin. Wisa xuya dikir, hema hikûmetê bi xwe daxuyanî nivîsîbe. Li hember pêşmergeyan cureyek îhanet tê de hebû.

Ji wan dixwest **"vegerin cihên xwe û bi kar û kasbiya xwe ya azad û birûmet re mijûl bibin"** wek ku "**pêşmergetî**" ne karekî azad û birûmet be!

Her çiqasî me dixwest bêjinê: Ev karê te kiryarek baş nîne, lê bi rastî Barzanî li ser nêrîna xwe rijd bû.

❖ Çi helwesteke we wekî çepên nav partiyê hebû?

Wê serdemê min nêrîna xwe eşkere digot hetta li cem rojnamevanên biyanî jî min behsa nêrîna xwe kiribû. Carekê li Raniyeyê 14 rojnamevanên biyanî hatibûn, yek ji wan Dana Adams Schmidt bû. Di pirtûka wî ya bi navê "**Serdana Zilamên Wêrek Li Kurdistanê" (رحلة إلى رجال شجعان في كردستان)** de behsa wê gotûbêja bi min re hatiye kirin, ji bilî nûnerên ajansên (TAS), (Xinhua), (Reuters) û (Asharq Al-Awsat) û ajansên din.

Li wir min bi serbestî behsa nêrîna xwe kiriye û gotiye:

"Tu baweriya min bi hikûmeta Ebdul Selam Arif nîne, ew hikûmetek dîktator e û qet mafê Kurd nade. Pêdivî ye em li ser xebata çekdarî rijd bin, heta mafên me werin pejirandin. Nabe em dev ji xweseriyê û mafên xwe yên demokratîk berdin."

Her wisa min gotibû:

"Ez dijî helandina tevahiya partiyan di nav partiyekê de me. Partiya me bi xwe heye ango Partiya Demokrat a Kurdistanê,

em partiya xwe diparêzin, em wê hilnaweşînin û Hêza Pêşmerge jî hilnaweşînin, berevajî wê yekê ku di peymana Barzanî û hikûmetê de hatiye, em ê Hêza Pêşmerge xurt bikin, perwerde û hejmara wan jî zêde bikin."

Hûrgiliyên wê hevpeyvînê di pirtûka Dana Adams Schmidt de hatiye weşandin.

Dema hevpeyvînan, min fem kir kêfa nûnerên ajansên nûçeyan ên Sovyetê û welatên girêdayî Sovyetê bi wan gotinên min re nayê, ji ber ku ew li ser rêbaza Krûşçev bûn ango rêbaza çareserkirina tevahiya pirsgirêkan bi aştiyê, rêbaza vemirandina tevahiya şoreşên cîhanê, rêbaza vemirandina serhildanan, ne ku fîşekek an birûskek biherike nav gelan û şewat derkeve û cîhan bişewite! Ji ber vê yekê wan him di aliyê siyasî û sivîl de him jî di aliyê praktîkê de pişta Mela Mistefa digirtin.

❖ Weşandina wê daxuyaniyê wek destpêka eşkerebûna nakokiya navbera Barzanî û polîtburoyê tê hesibandin?

Belê. Roj bi roj nakokiyên di navbera Polîtburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê û Serokê Partiyê General Barzanî zêdetir belav dibûn, bi taybet dema ku mesele gihîşt ser bicihanîna wê peymanê ya ku di navbera Barzanî û hikûmetê de hatibû îmzekirin. Bi taybetî pirsa teslîmkirina navçeyên rizgarkirî ji bo me xalek pir girîng bû.

Li gorî wê peymanê, pêwîst bû hikûmet vegere tevahiya wan deveran ên ku di bin desthilata şoreşê de bûn; wekî bajarên Qeladizê, Raniye, Çiwarta, Pêncwên, Qeredax, Sengaw û gelek navçeyên din.

Hikûmetê hêdî hêdî ji Barzanî dixwest di praktîkê de dest bi bicihanîna peymanê bike, Barzanî jî ferman dida pêşmergeyan ku biryarê bicih bînin. Di hember de polîtburoyê ferman dida ku navçeyên rizgarkirî teslîmî hikûmetê nekin û bila di dest me de bimînin.

Ev jî bû xalek sereke ya pevçûna bi Barzanî re. Ji aliyê xwe ve Barzanî ew biryara polîtburoyê wekî redkirin û qebûlnekirina biryarên xwe didît.

Yekî digot: "**Bila leşker û polîs vegerin cem hikûmetê**", yekî din jî digot: **"Bila venegerin."** Di wê rewşê de Barzanî fersend peyda kir û hinek efser û polîs kir berpirsên pêşmergeyan.

❖ Barzanî alîgirên polîtburoyê yên dijî peymanê ceza kirin?

Pêştir rêxistina partiyê hebû, xebat kiribû, Hêza Pêşmerge ava kiribû. Ew ji nav partiyê rabibûn, bi çelengî û bi ruhê partîtiyê dixebitîn, li gorî şiyan û xizmetê, erk bi wan hatibû sipartin.

Lê kesên ku Mela Mistefa anîbûn, dixwestin tevahiya karûbarên Hêza Pêşmerge bikeve destê wan. Mela Mistefa jî ew xwesta wan wekî fersendekê bikar anî û rewşeka darbeyê afirand. Wek serokê partiyê ferman da, ku hinek berpirs werin rakirin û yên wî anîbûn li şûna wan werin danîn.

Wekî mînak, Elî Eskerî rakir û li şûna wî Ebdul Wehab Etrûşî danî, Kemal Muftî rakir û li şûna wî Nurî Mela Marif danî, Omer Debabe rakir û li şûna wî Ezîz Eqrawî danî. Bi vî awayî guhertinek mezin pêk anî.

❖ Ev guhertin di kîjan salê de hatin kirin, çi guhertinên din hatin kirin?

Di sala 1964'an de, di meha Gulanê de hat kirin. Hetta ez ku gelekî nêzîkî wî (Barzanî) bûm, ji fermandariya Hêza Rizgarî rakirim û li şûna min Reşîd Sindî danî. Li destpêkê Eqîd Namîq Ebdullah Hewêzî danîbû, lê dema Eqîd Namîq qebûl nekir û got:

"Ez cîgirê wî bûme û ji bo min ev ne baş e", wê hingê Reşîd Sindî danî. Li hinek deveran hinek efser rakir û cîgirên wan yên polîs li şûna wan danî.

Barzanî zilamên xwe dişand wan deveran ku tê de guhertin dihat kirin, da ku bi zorê wan kesan biguherin ên razî nabin, bi wê yekê tu kesek nikaribe li hember ferma wî bisekine.

Ya rast ew guhertin destpêka darbeyekê di nav Hêza Pêşmerge de bû, ne tenê bê razîbûna polîtburoyê yan jî komîteya navendî dihat kirin, belkî berevajî biryarên polîtburoû Komîteya Rêveber a PDK'ê bû.

Mela Mistefa dest bi hilweşandina Hêza Pêşmerge û danîna wan zabitan kir, ku rasterast li dijî partiyê bûn, lê tenê girêdayî wî bûn, da ku kar ji destê partiyê derbixe.

Xalek din jî ev bû, Mela Mistefa li her derekê digot: Partî ango hizib xerab e, divê partî nemîne, em bi hikûmetê re lihevhatine û mesele bi dawî bûye. Li hember wê tundûtîjiya Mela Mistefa, bi nêrîna min û ji bo dîrok dibêjim: **"Ji aliyê polîtburoyê ve jî tundûtîjiyek hebû."**

Kûrbûna Nakokiyên
Barzanî û Polîtburoyê

❖ **Çima polîtburoyê nekarî bi aramî pirsgirêkê çareser bike, di polîtburoyê de kî tund bûn?**

Tundûtîjiyek ji aliyê hinek endamên polîtburoyê ve hebû, bi taybet ji aliyê Mamoste Îbrahîm Ehmed, Dr. Seyîd Ezîz Şemzînî, Nûrî Şaweys, Elî Ebdullah û hinek endamên din û yên komîteya navendî wekî Nûrî Ehmed Teha û Mela Mator.

Ev kes li hember Mela Mistefa pir tund bûn, hetta Nûrî Şaweys di gelek cih û civînan de gotinên ne baş ji Mela Mistefa re digot.

Elî Ebdullah û Nûrî Şaweys digotin: Divê sînorek ji Mela Mistefa re bê danîn û hînî dîsîplînê were kirin.

Carekê di navbera min û Elî Ebdullah de nîqaşek çêbû. Li ser vê yekê ku min got: “Nabe destûra navxwe ya partiyê bi ser Mela Mistefa de bê ferzkirin, çimkî baweriya Mela Mistefa bi destûra navxwe û partîtiyê nîne, ew kesatiyekî dîrokî yê Kurd e, di şert û mercekî taybet de derketiye qada xebatê û bûye serok. Ji ber vê yekê, ew ne endamekî normal yê partiyê ye û ne jî endamekî normal yê rêberiyê ye, ku bi riya hilbijartinê hatibe danîn.”

Elî Ebdullah ji min re got:

“**Tu xatirê wî digirî, tu dixwazî xwe li ber wî şirîn bikî, wisa nabe divê em destûra navxwe bi ser de ferz bikin û sînorekî jê re deynin.”**

Polîtburo û Barzanî

❖ Wê demê nerîna te û polîtburoyê derbarê Barzanî ne wek hev bû?

Belê, wisa bû. Ya rast nêrînek min a taybet hebû. Niha dixwazim bi dirêjî behsa nêrînên xwe yên wê demê bikim ku bi vî awayî bûn:

Min digot: Her çend tevahiya helwestên Mela Mistefa berevajî jiyana partiyê û şoreşê ye, lê dîsa jî divê em guh bidin axaftina wî û bi cih bînin. Wekî din dê bibe sedema lawazbûn û nemana şoreşê û partiyê. Lê şêwaza polîtburoyê li hember Mela Mistefa, şêwazek çepgirî û cudaxwazî bû.

Ez wiha difikirîm:

Yekem:

Divê polîtburo vê rastiyê qebûl bike ku Mela Mistefa ji bo şoreşa Kurd pêwîstiyekî dîrokî ye, çimkî em bi hinek eşîrên kêm desthilat û serokên eşîran re kar dikin. Ji ber wê yekê pêdiviya me bi kesatiyekî mezin wek Mela Mistefa pir zêdetir e. Nîşandana vê yekê ku em dikarin Mela Mistefa ji şoreşê derxînin an jî nîşan bidin ku êdî pêwîstiya me pê nemaye, karekî ne realîst û ne rast e.

Duyem:

Ez di vê baweriyê de bûm, polîtburo li himber derketina Mela Mistefa bi hêza pêşverû dike, ne bi hêza girseyî ya gel. Yanî ewqas sebira wê komê nîne, li bendê be da ku xelk fem bikin, Mela Mistefa dixwaze “aş betal bike”, ango PDK’ê hilweşîne û navçeyên rizgarkirî teslîmî hikûmetê bike.

Min digot:

“Gava xelk bi tevahî tê bigihîjin, dê bi xwe li dijî wê siyaseta nerast a Mela Mistefa derkevin û jê bixwazin dev ji serokatiya partiyê berde.”

Polîtburoyê rûbirûbûna xwe bi hêza endam û kadroyên partiyê dikir. Wê demê ji sedî 90’ê wan li dora polîtburoyê bûn û wiha difikirîn, bi wê hêza partiyê dikarin li hember siyaseta Mela Mistefa rawestin û wî paşde bidin.

Sêyem:

Li gorî min şaş bû, li şûna peydakirina çareseriyek siyasî ji bo pirsgirêka Mela Mistefa, polîtburoyê heqaret li hember wî bikar dianî.

Çarem:

Şaşiya kujer a kûrkirina nakokiyan, Nûrî Şaweys bû. Bi rastî bi xweserî û yekalî tevdigeriya. Çend caran behsa vê mijarê hatiye kirin lê niha ez dixwazim wê zelaltir vebêjim.

Ew jî bi vî awayî bû:

Piştî ku hinek kesên navdar ên Kurd ketin navbera PDK’ê û Mela Mistefa, Mamoste Îbrahîm Ehmed di Adara 1964’an de li Sengeserê serî li Mela Mistefa da. Ez û çend hevalên din jî pê re bûn.

Em çûn cem Mela Mistefa û me behsa hinek nepenî û giliyan kir. Me karî bi çareseriyeke navend Mela Mistefa razî bikin, ku pêşniyara wê çareseriyê min pêşkêşî wî kir.

Çareseriya Nakokiyên
Barzanî û Polîtburoyê

❖ Ji bo çareserkirina nakokiyan we çi pêşniyarek da Mela Mistefa?

Pêşniyara min ev bû, ji bo çavdêriya hilbijartinên kongreyek rastîn a PDK'ê, komîteyek bêalî were damezrandin. Di kongreyê de divê nakokiyên navbera Mela Mistefa û polîtburoyê, helwestên li hember hikûmetê û peymana ku bi hikûmetê re hatiye îmzekirin werin gotûbêj kirin. Wê demê yan Barzanî biryara kongreyê qebûl dike yan qebûl nake û nakokî dikevin çarçoveya yasayî ya xwe de.

Mamoste Îbrahîm Ehmed û Elî Ebdullah bi wê pêşniyarê razî bûn. Mela Mistefa ji min xwest ku ez navê çend kesan ji bo pêkanîna komîteya çavdêriyê pêşniyar bikim. Min nav danê, wî jî pejirand.

Ya rast baweriya piraniya endamên wê komîteyê bi rêbaza partiyê hebû û bi xeta partiyê re bûn, ne bi xeta Barzanî re.

Kesên ku hatin diyarkirin ev bûn:

Cemal Şalî, Hebîb Mihemed Kerîm, Yedulla Feylî, Ebas Hisên, Celal Ebdul Rehman, Omer Bamernî û kesekî din ku navê wî di bîra min de nemaye.

Ew kes hatin destnîşankirin da ku çavdêriya hilbijartinên kongreyê bikin. Me daxuyaniyek nivîsand ku piranî min nivîsî, Mamoste Îbrahîm Ehmed jî serast kir û min da Mela Mistefa. Piştî guherînên ku wî dixwestin, me daxuyanî ji nû ve nivîsand.

Mela Mistefa daxuyanî îmze kir, Mamoste Îbrahîm Ehmed jî li şûna polîtburoyê îmze kir. Me daxuyanî da Hebîb Kerîm û Yedulla Feylî û me şandin cem Nûrî Şaweys, ku wê hingê li baregeha polîtburoyê li Xezêneya Mawetê bû, da ku li wir were çapkirin û weşandin.

Nûrî Şaweys gelek bi tundî li dijî Mela Mistefa bû. Ez nizanim kîjan hêzê pişta wî digirt? An kê ew teşwîq dikir, an jî armanca wî çi bû? Li wê derê li wan her du hevalan hêrs dibe, gotinên kirêt ji wan re dibêje, daxuyaniyê ji wan distîne û parçe parçe dike û dibêje: **"Her in, hûn her du girtî ne."** Û wan dixe girtîgehê.

❖ Çi helwesteke Barzanî li hember wê kiryara Nûrî Şaweys hebû?

Destpêkê Mela Mistefa ji dil ve nedixwest kongre bê lidarxistin. Lewma piştî wê kiryara Nûrî Şaweys, hinceta vê yekê anî, qaşo partî lihevkirin û kongreyê naxwaze, polîtburo jî naxwaze kongre bê lidarxistin. Lewma divê bi xwe ji bo lidarxistina kongreyê bixebite.

Wî dest bi nivîsandina nameyan kir ji bo her aliyekî û digot: Hewl bidin bila di kongreyê de koma Îbrahîm Ehmed ser nekeve.

Yek ji wan nameyan, wî ji Eqîd Kafî re şandibû Balekayetiyê, ku ket destê me piştî kopîkirinê me jê re şand.

Bi kurtî mijar bi vî awayî bû: Eger peymana ku min, Mamoste Îbrahîm Ehmed û Elî Ebdullah bi Mela Mistefa re li Raniyeyê li ser li hev kiribû, serî girtiba, dibû ku berê bûyerên paşê biguherta aliyekî din.

❖ Ew bûyer di kîjan salê bûn?

Tevahiya wan bûyeran di Gulana 1964'an de qewimîn. Eger lihevkirina Mela Mistefa û polîtburoyê cih girtiba, wê demê bi rastî kongreyek dihat lidarxistin û pirsgirêka navbera partiyê û Mela Mistefa dihat çareserkirin.

Wê hingê piranî yan ji sedî 95'ê partiyê pişta nêrînên polîtburoyê û helwestên wê digirt, nêrînên ku derbarê çawaniya çareserkirina pirsa Kurd bûn.

Min li hember kiryara Nûrî Şaweys li cem Mamoste Îbrahîm Ehmed gilî kir û min got: Bi rastî ew kiryarek gelek xirab e, her wisa min pişta pêwîstiya lidarxistina kongreyê jî girt. Ya rast min pişta wan helwestên tundûtîj ên polîtburoyê nedigirt, ne digel helwesta Nûrî Şaweys, ne jî digel qutkirinê bûm. Hîn jî têkiliya min bi Mela Mistefa re her baş bû. Min xwe da aliyê polîtburoyê û bi wê xetê re meşiyam ji ber van sedeman:

Yekem:

Li gorî prensîpa rêxistinê divê kêmanî li hember biryarên piraniyê razî be, di polîtburoyê de çar bi yek bûn.

Duyem:

Carekê Elî Ebdullah bi gotinek tûj rexne li min girt ku gelekî bandor li min kir û yek ji wan sedeman bû, ku ez kişandim aliyê polîtburoyê. Wî got:

"Mam Celal çi li te hatiye? Ma tu dîn bûyî? Tu wiha bûyî hekîm, dixwazî bi aramî û nermî pirsgirêkan bi Mela Mistefa re çareser bikî."

Nêrîna min û Hîlmî Elî Şerîf li hev nêzîk bû, ji ber wê yekê Elî Ebdullah got: "Hîlmî her tim kesekî aram bûye, lê tu çima?"

Wê demê Mela Mistefa wisa belav kiribû, ku dixwaze min bike sekreterê PDK'ê, Elî Ebdullah wisa nîşan da, ku ji ber wê yekê ye, helwesta min ewqas nerm bûye.

❖ Gelo sozek wisa dabû te ku bibî sekreterê PDK'ê an te xwe ji bo wê erkê amade kiribû?

Nexêr, qet tiştekî wisa nebû ku ez bibim sekreterê PDK'ê. Ji bo ku ez nîşan bidim ew gotin nerast e û niyetek min wisa nîne, min xwe da aliyê polîtburoyê, tevî ku baweriya min bi biryarên wan nedihat.

Sêyem:

Ev sedem jî ya kesane bû ku bandor li min kir. Mela Mistefa darbeyek leşkerî kir, erka Fermandarê Hêza Rizgarî ji min stand, wisa danîbû, min bike Cîgirê Fermandarê Hêza Şoreşger a ku ew bi xwe fermandarê wê bû. Wê yekê jî darbeya Ebdul Selam dianî bîra min. Ebdul Selam Arif li dijî Beisiyan darbe kir û Ehmed Hesen Bekir kir cîgirê serokê komar, da ku ba wî be, Herdan Tikrîtî jî kir cîgirê fermandarê giştî, da ku ew jî ba wî be.

Lewma min ew erk qebûl nekir, lê ji vê ditirsiyam ku min gumanbar bike bi vê yekê, ku ez dixwazim xwe pêş bixînim û di demên tengasiyê de hevalan tenê bihêlim, bi ser laşê wan re derbas bibim, xwe li serkeftinê nêzîk bikim û pêş bikevim.

Çarem:

Ez bi awayekî taybet bi Mela Mistefa re civiyam. Wê civînê jî bandor li nêrînên min kir. Berî civînê ez dudil bûm, gelo digel polîtburoyê bim an bêalî bimînim? Wê civînê nêrînên min aliyekî xist. Bi rastî ew jî civînek taybet bû. Rehma Xwedê lê be,

heta wê demê jî, Mela Mistefa gelek derfet dida, da ku ez behsa her tiştî jê re bikim, bi kurtî lutfek wî ji min re hebû.

Tevî ku ji sala 1964'an ve, ew lutf hinekê kêm bibû. Sedemek sereke nav derxistina min a piştî sala 1963'yan bû, ku ez bûm serokê şandeya danûstandinan. Hemû radyo û kanalên televîzyonan behsa min dikirin û digotin: Celal Talebanî wiha got, serdanan Ebdul Nasir kir, bi filan berpirsê Ewropî re civiya.

Carekê rojnameya Izvestiya di gotarekê de nivîsîbû: General Celal Talebanî. General! Min got xalî serê min … cihê du generalan di nav şoreşa me de nabe! Ev jî sedemek din a sarbûna wê têkiliyê bû.

Ji ber newekheviya nêrînan, di navbera me de nakokî derket. Li gorî min, ew civîn yekalîker bû ku li Sengeserê çûm mala Mela Mistefa û min gotê:

"Bi rastî ez vê şevê hatime ku hinek gotinên girîng û taybet ji te re bikim. Hêvî dikim wek hemû caran rê bidî, serbest biaxivim û serbest jî bersivê bistînim."

Wî jî got: "ser çavan".

Gelekî axivî û got: **"Tu li cem min ezîz î û ji kurên min nêzîktir î. Ya ku tu ji min re dibêjî, kesî newêraye ji min re bêje."**

Min jî gelek spasiya wî kir û got:

"Ez bi wê gotina te serbilind im."

Berê jî min gotibû, heta wê demê Mela Mistefa li cem min tenê serokê PDK'ê û şoreşê nebû, belkî têkiliyek ruhî jî di navbera me de hebû.

Dikarim bêjim**: Min wekî bavê ruhî temaşeyî wî dikir (**الاب القائد**).** Lê ew têkilî hinekê derizîbû, sedem jî helwesta min a li hember peymanê bû, tevî ku deriz dikarî çê bibe.

Lewma min pirsî:

“Ev peyman me dibe ku derê? Plana te çi ye? Ev taktîk e ji bo dirêjkirina demê bi hikûmetê re yan bi rastî baweriya te bi vê meseleyê heye? Em ê çi bikin û armanca vê çi ye?”

Barzanî û Şoreş

❖ Yanî baweriya Barzanî bi şoreşê lawaz bibû?

Mela Mistefa bersiv da û got:

“Ez nêrîna xwe bi awayekî zelal dibêjim, çawa ku tu jî dizanî ji roja yekem ve me şoreş nedixwest, hikûmetê bi ser me de ferz kir. Niha derfetek çêbûye, em rê bidin xelk vegerin ser karûbarên xwe. Hikûmet navçeya Dûkanê ji me re vala dike. Em ê biçin li wê derê nişteçê bin, jiyan û debara me peyda dibe, piştî wê yekê jî em ê bala xwe bidinê û bizanin Xwedê çi dike.”

Min jî pirsî: **“Çi li pirsa xweserî û rola PDK’ê tê?”**

Mela Mistefa wiha bersiv da:

“**Bi Xwedê, Celal tu nêrîna min dizanî, ez xweseriyê wek xeyalekê dibînim û nayê bi dest anîn. Derbarê partiyê jî dibêjim: Bi Xwedê Ebdul Kerîm Qasim û we bi zorê ez kirim hizbî, çimkî ne berê ez hizbî bûm, ne jî baweriya min bi hizbê heye. Ji ber wê yekê siyaseta min bi vî awayî ye, ez wê peymanê rast dibînim.”**

Ev kurtasiya gotinên wî bû. bi wê gotûbêjê, ez gihîştim vê baweriyê ku Mela Mistefa dixwaze “**Aşbetal**” bike.

Niha jî nêrîna min ji bo dîrokê bi vî awayî ye: **Mela Mistefa du caran “Aşbetal” kir (du caran tevgera Kurd rastî şikistê anî): Ca-rekê di sala 1975’an de û carekê jî di sala 1964’an de.**

Biryara
Karnekirina gel Barzanî

❖ Tu wê hevdîtina xwe û Barzanî wek destpêka dawîbûna têkiliyên bi wî re dizanî?

Wê şevê û piştî wê gotûbêjê, min biryara dawî da. Tiştekî wê şevê di bîra min de ye: Mesûdê kurê wî xort bû, hat cem bavê xwe, Mela Mistefa gotê: “Mesûd, çima dayika xwe nabî cem doktor?” Li wir min zanî ku dayika Mesûd nexweş e.

Ji ber wê sedemê rêzek min a taybet ji bo dayika Mesûd hebû û heman rêz heta niha jî heye, bi rastî jineka pir hêja û giran e.

ji ber ku têkiliyek min a ruhî bi mala Mela Mistefa re hebû rexne li min dihat girtin. Ji sala 1984’an heta 1988’an bi razîbûna Kekê Newşîrwan Mistefa û polîtburoya YNK’ê, min ji bo hevjîna mezin a Mela Mistefa, Mehbûbe Xan (dayika Ubeyd û Luqman) alîkarî dişand. Me alîkariya malbatên binemaleya Mela Mistefa, mala Ubeyd, mala Şêx Sadiq û herdu keçên Şêx Ehmed dikir. Ew têkilî dewama têkiliya dostaniya min a kevn bû.

Ew şev, yek ji şevên herî nexweş ên jiyana min bû. Ez pir xemgîn bûm, lê di vê baweriyê de bûm, ku divê ez helwesta xwe yekalî bikim. Lewma min biryar da, bi partiyê re bimînim, her çend partiyê dikarî bi Mela Mistefa re bigihîje lihevkirinê, lê pêwîst bû biryara piraniyê jî bê qebûlkirin.

❖ Li polîtburoyê yan komîteya navendî hevhizrên te hebûn?

Belê. Ya rast di wê barê de Hîlmî Elî Şerîf û Ehmed Ebdullah wek min difikirîn. Wan digotin: Dem nehatîye em li dijî Mela Mistefa rabin. Hîlmî tevî ku rêberê siyasiyê tevahiya Hêza Pêşmergeya Kurdistanê bû, digot: Di praktîkê de jî, em nikarin wî şerî bikin û xelk jî ji me re wî şerî nake.

Lê Nûrî Şaweys digot: Ez ê reşaşekê li ser pira Mawetê daynim yan dê li ser laşê min re derbas bibin yan jî nahêlim derbas bibin, ez ê bi dehan û sedan ji wan bikujim.

Ya rast em di vê baweriyê de nebûn ku pevçûna çekdarî yan siyasî bi Mela Mistefa re karekî rast e, belkî me wek kiryarek bêwext a ne li dema xwe de didît. Ba me ya girîng ev bû, bi her awayekî, em nehêlin biqewime, çimkî him PDK pêdiviyek dîrokî bû, him jî Mela Mistefa rastiyek û pêwîstiyek dîrokî bû.

Him Mela Mistefa him jî PDK ji bo şoreşê û Kurdatiyê pêdivî bûn. Ji ber wê yekê pêwîst bû bi hev re rê biçin. Nakokiyên di navbera wan de, nakokiyên di nav rêzên gel de bûn, lewma diviya bi riya axaftin, danûstandin, hevkarî û xwerexnekirinê bihatan çareserkirin. Diviya her du alî biqasî hev di parastina prensîp û bingehên giştî de daketina xwarê.

Min ew lihevhatin jî rast didît ku bi riya axaftinê serî bigre, ne bi wê riyê ya ku dijminatî û nakokiyan di nav rêzên gel de zêde dike.

❖ Destê kes an aliyan di kûrkirina nakokiyên Barzanî û polîtburoyê de hebû?

Bi rastî destên din jî di xirabkirina têkiliyên di navbera partiyê û polîtburoyê de hebûn. Komunîstan di kûrkirina nakokiyan de rolek xirab dîtin. Li gorî min rolek Îranê jî ya nebaş hebû. Îraniyan dixwestin PDK'ê ji qada têkoşînê derxînin her çend bi

fêlkirinê ew kar kirin. Her wisa xalek din jî hebû, diviya jê re hesab bihata kirin, ew jî ev bû ku tevahiya eşîr, axa û begên Kurdistanê ji ber van du sedeman ji PDK'ê aciz bûbûn:

Yekem: Partiyê desthilata wan nehiştibû. Rêxistinên partiyê mezin bibûn, hejmara kadro û endamên partiyê zêde bibû, dibûn xwedanê desthilatê, hêza çekdar a Pêşmerge jî di destê wan de bû.

Duyem: Damezrandina encumenên gundan ne di ber-jewendiya axa û began de bû. Encumenên gundan desthilat dida cotkaran. Ji ber wê yekê tevahiya axa û began hetta yên ku dostên me yên nêzîk bûn, li seranserî Kurdistanê xwe dan aliyê Mela Mistefa û şerê polîtburoyê kirin.

Pêşniyara Barzanî ya Guhertina Navê PDK'ê

❖ Eger baweriya Barzanbi bi partîtiyê nebû çima dixwest partiyeke nû ava bike?

Hinek kesên xwendewar ên derdora Mela Mistefa ku wê demê tiştek nebûn, dixwestin zû bigihîjin pile û payeyan. Wan dora Mela Mistefa girtibûn û ew teşwîq dikirin, bi taybetî jî efseran digotinê: Dev ji partiyê bernede, çawa dibe ku gişt wê serwerî û navûdengê partiyê bidî polîtburoyê? Xelkekî zaf pişta partiyê ye, lewma partiyê bixe destê xwe û bi navê partiyê bixebite.

Di encamê de Mela Mistefa ket dû wê hizrê ku ji nû ve dest bi xebata siyasî bike. Di destpêkê de dixwest navekî din li

PDK’ê bike, ji ber ku di vê baweriyê de bû ku navê partiyê xirab bûye û pêdivî bi navekî nû heye. Mistefa Qeredaxî yek ji wan kesên nêzîkê wî bû ku pêşniyara navê “Partiya Gelê Kurd” da Mela Mistefa.

Destpêkê navê partiyê kir, “Partiya Gelê Kurd”, paşê nizanim çawa bû ku navê kevin ê partiyê bi kar anî. Bi nêrîna min di bin bandora Haşim Eqrawî û Ezîz Eqrawî de vegeriya ser navê partiyê yê kevin.

Haşim Eqrawî û Ezîz Eqrawî ji wan kesên derdora wî bûn, ku di berjewendiya xwe de Mela Mistefa teşwîq dikirin, wek serokê partiyê û li ser navê partiyê kongreyekê li dar bixe.

Parçebûna PDK’ê

❖ Lidarxistana wê kongreyê polîtburo û Barzanî ji hev cuda kir?

Belê. Barzanî di 1’ê Tîrmeha 1964’an de civînek bi navê kongreyê li Mawetê li dar xist. Zêdetirî 400 kesan vexwend civînê, ku zêdetirî nîvê wan ne endamên PDK’ê bûn.

Bi vê hincetê ku PDK partiya her Kurdekî ye û kongre jî ya gel e û her Kurdek dikare tê de beşdar bibe.

Di wê kongreyê de 15 kes ji 17 endamên komîteya navendî hatin derkirin, tenê du endam man, ew jî Mela Mistefa bi xwe û Haşim Eqrawî bû. Di kongreyê de biryar hat dayîn, partî pişta siyaseta Barzanî bigre, polîtburo bê hilweşandin û hêz biçe ser polîtburoyê.

Eşîran di milê Asosê de êrişî polîtburoyê kirin; di milê Çiwartayê de jî, hêzekê bi serokatiya Ebdul Wehab Etrûsî bi alîkariya axa û begên Şilêr û Sîweylê û hêzeka din jî bi serokatiya Reşîd Sindî û bi rêvekirina hikûmeta Iraqê, ji nav bajarê Silêmaniyê re derbas bû, da ku biçe ser polîtburoyê.

Belgeyên ku paşê ketin dest me, nîşan didan ku hikûmetê fîşek û kelûpelên din dane wan, da ku êrişî ser polîtburoyê bikin.

❖ Yanî hikûmeta Iraqê hewl dida pirsgirêkên nav PDK'ê kûrtir bibin?

Bêşik, hikûmeta Iraqê yek ji sedemên kûrbûna nakokiyên navbera Barzanî û polîtburoyê bû. Hikûmetê polîtburo wek astengekê li ber lihevkirina bi Mela Mistefa re didît û di vê baweriyê de bû, eger polîtburo nebe wê demê Mela Mistefa dev ji pirsa Kurd berdide û tenê xwestên wî yên kesî dimînin ku dikarin jê re pêk bînin.

Hikûmeta Iraqê Mela Mistefa teşwîq dikir, ew jî razî bû. Di civîna Xelekanê de ku Tahîr Yehya wek serokwezîr û fermandarî firqeya duyan, efser Îbrahîm Feysel Ensarî digel hejmarek kesên din beşdar bûn, Mela Mistefa gihîştibû vê baweriyê ku dikare bi hikûmetê re li hev bike. Mela Mistefa civînek girseyî li Xelekanê li dar xistibû.

Wî gazî Mamoste Îbrahîm Ehmed, min û çend hevalên din jî kiribû. Di civînê de ji me xwest em biaxivin. Wî bala xwe da Tahîr Yehya û got: **"Ez tiştekî naxwazim, ev Mamoste Îbrahîm Ehmed û hevalên wî ne ku mafên Kurd dixwazin."**

Mamoste Îbrahîm Ehmed di axaftina xwe de gelek hişk û rijd li ser mafê xweseriyê, partiyê û li dijî wan pêngavan axivî ku dixwestin li Iraqê tenê partiyek hebe û mafên Kurd nedin. Piştre Tahîr Yehya axivî û got:

“Niha ji me re derket, polîtburo dijî lihevkirinê ye, lê Mela Mistefa lihevkirinê dixwaze! Hûn naxwazin partiya xwe hil-weşînin û dev ji xweseriyê berdin.”

Mela Mistefa di wê civînê de, bi jîrî hikûmet û PDK berda canê hev û xwe li dûr sekinî, bi hikûmetê da femkirin; ew zilamekî baş e û tiştekî naxwaze yên şer dixwazin cemaeta PDK’ê ne, bi taybet Mamoste Îbrahîm Ehmed ku sekreterê PDK’ê bû.

Destpêka Şerê
Navxweyî yan Şerê Birakujî

❖ Kengê nakokiya siyasiya navbera we bû şerê navxweyî?

Mela Mistefa di 13’ê Tîrmeha 1964’an de li Mawetê avêt ser baregeha polîtburoyê û xwest cara yekem di dîroka gelê Kurd de nakokiya siyasî bi şer çareser bike. Bi çekan û bikaranîna hêzê çareser bike.

Cara yekem di dîroka Kurd de, serokê partiyekê bi komkirina axa û began, leşker û efserên reviyayî êrişî polîtburoyê, komîteya navendî û endamên partiya xwe kir, ez wê êirişê wek tawaneka dîrokî dizanim.

Ew êriş destpêka wê nakokiya pir nexweş bû ku jê re “Şerê Birakujiyê” tê gotin. Di encama wê êirişê de çendîn kes hatin kuştin û hêzên polîtburoyê bi neçarî vekişiyan aliyê Îranê.

Bi wî awayî têkiliya Mela Mistefa û PDK’ê têkçû. Sibeha wê şevê ya ku Mela Mistefa êrişî ser polîtburoyê kir, daxuyaniyek ji aliyê Mamoste Îbrahîm Ehmed ve, di Radyoya PDK’ê[29] de hat xwendin û tê de wî behsa metirsî, zerer û zaniyanên wê êrişa Mela Mistefa kir û ji hevalan xwest ku teslîm nebin û berevaniyê bikin.

……

[29] Bi gotina Celal Talebanî, **Sovyetê** pêştir ew **radyo** wek diyarî pêşkêşî polîtburoya PDKîê kiribû, ku ji riya Bexdayê ve Seyîd Ezîz Şemzînî ji Sovyetê wergirtibû.

Beşa Yazdehem
11
Ji Hemedanê Heta Bexdayê

- Çûyîna Îranê
- Têkiliya Barzanî û Îranê
- Yekem Diyaloga Barzanî û polîtburoyê
- Rola Îranê di tevgera Kurd de
- Destpêkirina şerê hikûmetê û PDK'ê
- Lihevhatina demkî ya Barzanî û polîtburoyê
- Ragihandina şerê li dijî polîtburoyê
- Diyaloga polîtburoyê û Bexdayê
- Peymana 29'ê Hezîrana 1966'an
- Beşdariya du baskên PDK'ê di hikûmetê de
- Cemaeta Melayî û Celalî yan Cemaeta 66'an
- Kongreya Cezayîrê ya 1967'an û pirsa Kurd
- Avakirina baskê çep di nav PDK'ê de

Çûyîna Îranê

❖ Ji bilî çûyîna bi Îranê tu çareyeka we din nebû?

Wê demê tu çareya me nebû; yan diviya em bihatina kuştin an jî diviya em derbasî wî aliyê sînor biban.

❖ Îranê çawa rê da hûn ji sînor derbas bibin?

Tu hêzeke îranî li ser sînor nebû, hatin û çûyîn jî li ser wî sînorî nebû. Hejmara me nêzîkî 400-500 kesî bû. Piştre hêzên Îranê hatin em dorpêç kirin.

❖ Çima berî şer hûn cuda nebûn? An digel Iraqê rêneketin an ji Barzanî dûr neketin?

Me Barzanî wekî cudabûyî dihesiband, em bi xwe partî bûn û tevahiya komîteyên navçeyan û şaxeyên partiyê gel me bûn, ji sedî 90'ê kadroyan ba me bûn, bê zêdegavî ji sedî 5'ê endam û kadroyan ba Barzanî nebûn. Tevahiya partiyê li aliyekî bû, Mela Mistefa li aliyê din, ji 17 endamên komîteya navendî, em 15 kes li aliyekî bûn, Mela Mistefa û Haşim Eqrawî tenê li aliyê din bûn.

❖ Eger piraniya partiyê gel we bû, çima hûn şikiyan û Barzanî bû xwedanê partiyê?

Du sedemên şikiyanê hebûn:

Yekem: Ew şikiyan ji ber bikaranîna hêzê bû. Pêştir jî min gotibû; Mela Mistefa destpêkê darbeya leşkerî di nav Hêza Pêşmerge de kir û hêza leşkerî xist destê xwe.

Duyem: Tevahiya eşîran kişandibû aliyê xwe, tenê hezar pêşmerge gel polîtburoyê mabûn.

Hezar pêşmergeyî jî nedikarî li hember pênc hezar kesî bisekine, lewma ew şikiyaneke leşkerî bû ne ya siyasî.

Heta roja êrişê jî, em li bendê nebûn ku li dijî me hêzê bikar bîne û zêdetir me wek gefekê dihesiband. Me nedizanî ku Mela Mistefa bi şer, hêzê û eşîran dixwaze nakokiya gel me yekalî bike.

Me digot; eger nakokî berfirehtir bibe, dibe ku her yek ji me bibe partiyekê û cihê kar bike. Dema wî dixwest "**Partiya Gel**" ava bike, me dijatî nekir, eger ava jî kiriba, me dê pîrozbahî lê kiriba, lê dema bi navê PDK'ê dest bi kar kir, em hemû li dijî wî derketin.

Beriya ku Mela Mistefa kongreyê li dar bixe, polîtburoyê di navbera 4-9 Nîsana 1964'an de konferansek li Mawetê li dar xist. Endamên komîteyan ji seranserî Kurdistanê tê de beşdar bûn. Di wê konferansê de bi tevahiya dengan biryar hat dayîn, tevahiya desthilatan ji Mela Mistefa bê standin. Kesên ku dema dawiyê vegeriyan aliyê Mela Mistefa, wan jî deng dabûn wê biryarê, wek Elî Sincarî, Hebîb Mihemed Kerîm û Yedulla.

Ez di konferansa Mawetê de beşdar nebûm, çimkî min dizanî tê de biryarên tund tên dayîn û ez jî bi wê rewşê re nebûm. Di konferansê de biryar hat dayîn ku şandeyekê bişînin cem Mela Mistefa lê wî red kir û got: **"Ez bi xwe partî me hûn hemû derkirî ne."**

Wê demê polîtburoyê hêza xwe gelek mezin dihesiband lê hêza Mela Mistefa wisa nedidît, di vî baweriyê de jî bû Mela

Mistefa nawêre şerê birakujiyê bike û hêzê ji bo çareserikirina nakokiyan bikar bîne, lê Barzanî kir û guh jî neda ti tiştekî.

Cemaeta polîtburoyê digotin: Pêşmerge bi fermana Mela Mistefa nake û nayê ser polîtburoyê lê dema ku Mela Mistefa bi çend sed Barzaniyan û du-sê hezar kes ji eşîran êriş kir, pêşmerge jî neçar kir ku beşdar bibe.

Ya rast hejmarek kes bê dilê xwe beşdar bibûn; hinekan name dinivîsîn û digotin; em bi zorê anîne, em hez nakin şerê we bikin. Wî ji ber mezinahiya meydana şer, nedikarî çav-dêriya hemiyan bike, lewma li hinek cihan gule nedihatin avêtin.

Dema êrişî baregeha polîtburoyê hat kirin, tenê du rê li ber me mabûn; yan diviya em şer bikin û hevdu bikujin an jî diviya vekişin gundê Alanê li aliyê Îranê, ku jê re Alana Iraqê û Îranê tê gotin. Di navbera wan de tenê çemekî biçûk heye, em lê derbas bûn û çûn Alana Îranê.

Li aliyê Îranê, em li çiyayê pişta Bêtûşê bi cih bûn; eger Mela Mistefa bixwesta êrişê bike, diviya tevahiya hêzên xwe ji riya Silêmaniyê veguhestiba Qeladizê û ji wê derê ve êriş bikira.

Di wê navberê de efserekî Kurd bi navê “Simko Eliyar” hat cem me û got: Hêzên leşkerî yên Îranê dê çarhêla we bigirin. Dema sibehê em rabûn, hêzên Îranê çarhêla me girtibûn. Şandeyeke Îranê hat ba me û gotin: “Çima hûn derbasî nav sînorê Îranê bûne?”

Me jî got: “Em neçar bûn.”

❖ Kengê hûn derbasê Îranê bûn, çawa nehatin derkirin?

Tîrmeh bû, ez, Omer Debabe û Elî Eskerî gel wan axivîn. Me got: Em neçar bûn, çimkî ev 600-700 kes an dihatin kuştin an jî diviya Kurd, Kurd bikuje; lewma me derbasbûna nav axa Îranê baş zanî û tu niyeteke me ya xirab li hember Îranê nîne.

Wan jî destûr dan lê gotin: Divê heta 48 demjimêran ji vir derkevin, me jî got: Ev heyam gelekî kêm e, em mandî ne û pêwîstiya me bi bêhnvedanê heye. Di dawiyê de qebûl kirin ku em hefteyekê li wê derê bimînin, wan jî tevahiya riyan girtibûn da ku em nikaribin têkiliyê bi tu aliyekê re deynin an bizavekê bikin.

Her di wê demê de bû ku şandeyek bi serokatiya Salih Yûsifî ji bo navcîtîkirinê serdana me kir.

❖ Çima Salih Yûsifî li aliyê Barzanî mabû?

Salih Yûsifî li wê derê mabû lê tu çalakiyên wî nebû û neçûbû kongreya Mela Mistefa. Ji endamên serokatiyê jî tu kes di kongreyê de beşdar nebibû; hetta Hebîb Kerîm jî beşdar nebibû, ku piştre berpirsyarî wergirt.

❖ Encama serdana Salih Yûsifî çi bû, we tu peyamek a lihevkirinê ji Barzanî re şand?

Me du pêşniyar dan şandeya Mela Mistefa:

Yekem: Me xwest Mela Mistefa rê bide da ku em biçin Navçeya Barzan û li cem Şêx Ehmed bimînin; eger Mela Mistefa şerê hikûmetê kir, em ê dubare bibin yek, eger Mela Mistefa bi hikûmetê re li hev kir, wê demê em serbest dibin her karekî bikin, lewma Mela Mistefa ew şert qebûl nekir.

Duyem: Me pêşniyar kir ku em li navçeyekê bimînin wek navçeya Bemo an Qeredaxê yan jî li her cihekî din. Her aliyek karê xwe bike û her du alî jî navê partiya xwe biguherin.

❖ Gelo Barzanî şertên we yên lihevhatinê qebûl kir?

Barzanî tevahiya şert û pêşniyarên me red kirin, danûstandin bi wî re bêfeyde bû, tenê rijd bû li ser nêrîna xwe. Mela Mistefa dixwest em teslîm bibin û me li her cihekê datînin û çi li me dikin, em razî bin.

Piştî ku heyama diyarkirî bi dawî bû, Îranê rê da û em vegeriyan Kurdistanê û li Çiyayê "**Sûrkêw**" bi cih bûn ku dikeve ser sînorê navbera Şarbajêr û bajarê Baneyê. Piştî hefteyekê, dubare Mela Mistefa hêz anî ser me, dîsa şer derket.

Piştî heyamekê ji ber şer û hevkuştinê, me bi neçarî têkilî bi Îranê re danî û me ji wan xwest rê bidin ku em biçin nav axa Îranê, ew jî razî bûn û gotin: Em ê we li ser sînor deynin.

Em çûn nav axa Îranê, roja paştir hêzeka Îranê em dorpêç kirin û gotin: "Em ê we bibin navçeya Şinoyê." Wan em veguhestin. Em wisa difikirîn, ew der ji bo me baştir e, çimkî em li Şêx Ehmed nêzîk dibûn, Mela Mistefa nediwêra êrişî me bike.

Ji bo me baştir bû, em li navçeya Barzan penahê bibin Şêx Ehmed li şûna vê yekê ku penahê bibin Îranê. Lê wan li şûna Şinoyê em birin bajarê Seqizê û li wê derê, em di rewşa dest biseriyê de bûn.

Têkiliya
Barzanî û Îranê

❖ Wê demê Barzanî hewl da têkiliyê bi Îranê re dayne?

Di wê heyamê de Rêveberê Rêxistina Îstixbarat û Ewlekariya Îranê ku bi SAVAKê dihat naskirin, Hesen Pakrevan serdana Mela Mistefa kiribû. Di hevdîtinê de Mela Mistefa gotibû wî:

“Ez dostê Îranê me û Îranê hez dikim, cemaeta din çep û marksîst in, ez ji bo lihevkirina gel we amade me, eger alîkariya min bikin, ez ê li hember hikûmetê rawestim, lê barê wan ango cemaeta polîtburoyê li ser milê min rakin.”

Bi wî awayî wan li hev kiribûn. Piştre Kurdekî xelkê Sineyê bi navê Îsa Pêjman ew agahî da me ku di rêxistina SAVAKê de albay bû û gelekî hejî me dikr. ji ber wê yekê jî, ji hemû tştekî hat dûrxistin.

Wê demê SAVAKê du Kurd şandibûn cem me, yek ji wan Kurdekî Sineyê bi navê Elî Muderisî bû. SAVAKê ew du kes ji bo pirsa Kurd taybet kiribûn. Her duyan hejî me dikirin û digotin: Hûn kesên rêxistinkirî ne, Mela Mistefa kesekî eşîr e û tevgera eşîrtiyê tu çaxan sernakeve. Îsa Pêjman got: Ez ê tiştekî ji we re bêjim, eger eşkere bibe, dê min bidarve bikin. Me jî soz da ku nepenî bimîne.

Wî got: **“Şahê Îranê biryar daye bi Mela Mistefa re li hev bike; ez di civîna bi wî re bûm. Şah wisa difikire ku Mela Mistefa tekane kes û serokeşîrek e, li hev kirin bi wî re hêsantir e ji yên din, çimkî yên din siyasî ne, rojekê partiya wan dê biryarê bide û Îbrahîm Ehmed ji sekreteriyê rake û Nûrî Ehmed Teha li şûna**

wî deyne. Ew rêxistin in û fêl li wan nayê kirin, lê serederî bi serokeşîrekî re baştir e ku tekan ye. Wekî din jî, cemaeta polît-buroyê ser bîr û nêrîna çep kurdatiyê dikin lê Mela Mistefa li ser şêwazekê dimîne, lewma şah biryar daye bi wî re li hev bike[30].”

Mela Mistefa gotibû: Nabe cemaeta polîtburoyê li Kurdistana Îranê bimîn. Ji ber wê yekê Îraniyan şevekê bi zorê em veguhestin Hemedanê. Hejmara me 400-500 kes dibû, em li kampekê danîn û gotin: Hûn li vir penaber in, çek ji me standin, êdî em ketin nav teleya Îranê.

❖ Çawa çûyîn û mayîna li kampa Hemedanê we qebûl kir, çima we şandeyek neşand cem Barzanî?

Hinek ji me dixwestin ji wê derê rizgar bibin. Min, Hîlmî Elî şerîf û çend hevalên din me dixwest vegerin Kurdistanê karê û karê
Siyasê bikin. Elî Ebdullah, Elî Eskerî û Omer Debabe digel Hêza Pêşmergre bimînin. Kemal Muftî, Hemed Emîn Ferec û çend hevalên din serperstiya wê hêzê bikin, Mamoste Îbrahîm Ehmed jî li Tehranê bimîne.

……

[30] Selah el-Xersan di pirtûka xwe ya bi navê “**Bizavên Siyasî li Kurdistana Iraqê**” de dibêje: Destpêka **têkiliya PDK’ê yan Barzanî bi Îranê re, vedigere sala 1962’yan**, ku ji riya balyozxaneya Îranê ya li Bexdayê dest pê kir. Di wê çarçoveyê de **“Şemsedîn Muftî”** çû bajarê Qesra Şîrîn girêdayî parêzgeha Kirmaşanê li wê derê bi efserekî SAVAKê re hevdîtin kir. Ew têkilî li ser destûra Polîtburoya PDK’ê bû, tenê **Nûrî Şaweys** li dijî wê têkiliyê derket.

Her wisa **Mam Celal** di hevpeyvîna bi Elî Kerîmî re, bi vî awayî behsa têkiliya Kurd û Îranê dike û dibêje: Têkiliya PDK’ê û Îranê wê demê dest pê kir ku di dawiya sala 1961’an de Mela Mistefa şandeyek bi serokatiya **“Ebdul Rehman Rûte”** ku kadroyekê çeleng yê PDK’ê bû **şand Mihabadê cem Kolonel Verehram** da ku têkiliyê bi Îranê re çê bike.

Yekem Diyaloga
Barzanî û Polîtburoyê

❖ We kî destnîşan kir wek nûner sedana Barzanî bike?

Hezîrana 1964'an bû; min pêşniyara endamên şandeyê bi vî awayî kir. Min got: ji ber van du sedeman bila Seyîd Ezîz Şemzînî biçe:

Yekem: Seyîd Ezîz hevalê Barzanî û ji malbata şêxê Nehrî ye, Mela Mistefa gelekî hurmeta wan digire, ji rûyê olî ve jî Barzanî girêdayî wan bû.

Duyem: Seyîd Ezîz dema bi Barzanî re diaxivî, digotê; Mela Mistefa, lê me digotê; ezbenî yan cenab, lê ew wekî hevalekî pê re diaxivî.

Wekî din min got: Bila Elî Ebdullah biçe, ji ber ku wî her tim behsa vê yekê dikir ku pêwîst e, sînorek ji Mela Mistefa re bê danîn. Lewma min got: Bila biçe prensîbên xwe bixe praktîkê. Her wisa me Kemal Mihêdîn jî bi wan re şand.

Şandeyê serdana Mela Mistefa kir, ne tenê rêneketin, belkî Mela Mistefa hêrs bû û Elî Ebdullah û Kemal Mihêdîn da girtinê, lê ji ber ku Seyîd Ezîz Şemzînî ji malbata Nehrî bû siwarî otomobîlekê kir û şand Hacî Omeranê û teslîmî Îranê kir. Bi wî awayî Seyîd Ezîz Şemzînî ji Iraqê hat derkirin.

Mela Mistefa mecala tu çareseriyekê neda, Elî Ebdullah jî her di girtîgehê de hîşt, heya wê demê ku em çûn, ew her girtî bû. piştre bi kefaletê hat berdan û jiyana xwe li navçeya Koyeya Hewlêrê derbas kir.

Ew hewla dawî ji bo yekbûnê bû, da ku têk neçin, lê dema min û Hîlmî Elî Şerîf xwest em vegerin Kurdistana Iraqê, Îranê nehîşt. Ji ber wê yekê min gireva birçîbûnê girt û min gote wan:

“Heta bimirim di gireva birçîbûnê de dimînim an min bixin girtîgehê an jî eger ez girtî nînim, min azad bikin û bihêlin ez biçim.”

Heta roja sêyem guh nedan gireva min, lê roja çarem rewşa tendirustiya min têk çû û hatin û gotin: Ev karekî baş nîne ku tu dikî. Lê min got: **“Yan dimirim an jî bihêlin ez ji Îranê biçim.”** Ji bilî wan, kêfa hevalên me bi xwe jî ji wê helwesta min re neht. Min ji Îraniyan re got:

“Çi ji destê we tê bikin, dikarin du tiştan bikin; an min teslîmî Iraqê bikin, wê demê ez ê biçim girtîgeha Nugre Selman, ew der gelekî ji min re çêtire yan jî diçim Ewropayê.”

Roja heftem rewşa min gelekî xirab bû, hatin gotin:

“Ji ber ku şah razî bûye, em li ser şerefa şah soz didin, lewma tu jî gireva birçîbûnê bişkênîne, em ê te bişînin derveyî welat, lê tu bi xwe divê pasportê ji xwe re peyda bikî.”

Min jî qebûl kir û gireva birçîbûnê şikand.

Pasport jî min bi vî awayî peyda kir, Celal Begê Caf konsulê Iraqê li Kabûlê bû. Serdar Caf ku li Îranê kar dikir xizmê wî bû, me xercê çûyîna wî da û me şand cem Celal Begê Caf li Kabûlê, wî jî du pasport ji me re şandin.

Îraniyan rê dan ez û Seyîd Ezîz, em biçin derveyî Îranê lê rê nedan Hîlmî Elî Şerîf.

❖ We tu hewlek da têkiliyê bi Îranê re deynin, têkiliya Barzanî bi Îranê re hebû?

Ji bo rastiyê û dîrokê dibêjim: Ez behsa wê peywendiyê dikim, çi bû sedem ku me dijatiya Ebdul Kerîm Qasim kir. Cemaeta me ku bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Polît-buro dihat naskirin, tu têkiliyeke me bi Îranê re nebû.

Berevajî vê, Mamoste Îbrahîm Ehmed, Nûrî Şaweys û Hîlmî Elî Şerîf dijî siyaseta Îranê bûn, di nivîsan de jî gelek bi tundî behsa kolonyalîzmê û Îraniyan dikirin.

Mela Mistefa berî serhildana şoreşê bi riya hinek eşîrên Pişderê û Hebas Axayê Mamend Axa têkilî bi Îranê re danîbû. Wê demê Mela Mistefa, Ebdul Rehman Rûte şandibû cem "Kolonel Verehram" li Mihabadê.

Ebdul Rehman Rûte kadroyekî PDK'ê û kurê xalê Elî Ebdullah bû, bi xwe ji Elî Ebdullah re vegotibû. Gotibû wî: Tiştekî wiha bûye, tevahiya hevalan dizanin lê gotin nehêlin belav bibe û veşêrin.

Ew yek mehekê pêş şoreşê bû, piştî serhildana şoreşê Mela Mistefa careke din têkilî bi Îranê re danî lê nizanîm bi riya kê ve bû. Yekî digot: Ji riya axayekî herikî bûye, bi taybet wê demê Mela Mistefa li navçeya Hacî Omeranê û li nêzîkî Îranê bû ji wê derê ve têkilî bi wan re danîbû lê nizanim encama wê çi bû.

Nişkeve du bûyer qewimîn. Yek ji wan ev bû ku Salih Yûsifî nameyek ji Bexdayê ve şandibû û tê de digot:

"Min li Mala Burhan Begê Caf kadroyekî leşkeriya Îranê dît ku Kurdekî Sineyê bi navê Îsa Pêjman bû. Behsa vê yekê kir, em

amadene radyoyê bidine we û alîkariya we jî bikin, eger hûn têkiliyê bi me re deynin.”

Di civîna polîtburoyê de ku Hîlmî Elî Şerîf tê de beşdar bû, behsa wê yekê hatibû kirin, Mamoste Îbrahîm Ehmed, Nûrî Şaweys, Elî Ebdullah û Nûrî Ehmed Teha li dijî wê têkiliyê axivîbûn û gotibûn em naxwazin bi tu awayekî têkiliyê bi Îranê re deynin. Lê ez di vê baweriyê de bûm, ku em têkiliyê dayînin û komîteya navendî civînekê saz bike û tê de biryar li ser bê dayîn.

Lê şertê hevalan ev bû, Sovyet razî be çimkî wê demê têkiliya me û Sovyetê gelekî baş bû û me alîkarî jê werdigirt.

Min got: Em şêwrê bi Sovyetê re bikin ka ew çi dibêjin? Li ser bingeha nêrîna wan em dikarin tevbigerin. Bêguman min nêrîna Mela Mistefa jî dizanî, ku ew jî bi wan cure têkiliyan re ye.

Me bersiv ji Salih Yûsifî re şand û me got: Hîn polîtburo li ser wê têkiliyê razî nîne, bila bimîne heta ku civîneka berfireh di wê barê de tê lidarxistin.

❖ Pêştir têkiliya Barzanî bi Îranê re hebû?

Belê. Mela Mistefa sala 1962’yan têkilî bi Îranê re danîbû û hewl dabû Elî Eskerî wek nûnerê xwe bişîne cem wan, lê Îraniyan gotibûn: Baştir e partî (baskê polîtburoyê) jî bi wan re be lewma pêşniyar kiribû Omer Debabe jî wek nûnerê polîtburoyê biçe.

Mamoste Îbrahîm Ehmed bersiv da û got: Em naxwazin nûnerê xwe bişînin , eger Mela Mistefa bi xwe dişîne, wê demê li ser berpirsyariya wî bi xwe ye. Wê serdemê Mela

Mistefa di vê baweriyê de bû, Mamoste Îbrahîm Ehmed bê destûra Rûsan avê jî venaxwe, lewma bi destnivîsa xwe nameyek jê re şandibû û tê de wiha gotibû: **"Birayê min ê hêja Îbrahîm, tu li ser berpirsyariya min Omer bişîne, eger rûsan gilî kirin, bêje Mela Mistefa gotiye."** Yanî ew li hember Sovyetê berpirsyar dibe.

Bi nêrîna min Mela Mistefa di wê barê de bi Sovyetiyan re axivî bû û wan razîbûn nîşan dabûn. Çimkî dema ku sala 1963'yan ez çûm Moskowê, min xwest nêrîna wan derbarê têkilliya me ya bi welatan re bizanim, Sovyetiyan gotin: Ji bilî Îsraîlê hûn dikarin têkiliyê bi hemû welatan re deynin, tenê bi vî şertî ku me agahdar bikin.

Rola Îranê
di Tevgera Kurd de

❖ Ew serdan di çi salekê de bû, tu encameke wê hebû?

Di sala 1962'yan de bû, tu tiştek ji wan re nekiribûn û gotibûn: Her tişt girêdayî hatina Îbrahîm Ehmed e bo Îranê; çimkî sekreterê PDK'ê ye, şah tenê dikare wî yan jî Mela Mistefa bibîne. Em civiyan; bi tekezî Mela Mistefa nedikarî biçe, dema jê hat pirsîn: "Got bila Mamoste Îbrahîm Ehmed biçe."

❖ Îranê tu hevkariyeke şoreşê kir?

Me bi piraniya dengan biryar li ser çûyîna Mamoste Îbrahîm Ehmed a Îranê da, lê di wê serdanê de wî şah nedîtibû û tenê hinek berpirsên din ên Îranê dîtibûn.

Wan jî soz dabûn alîkariya me bikin. Lê ji ber ku şah hajî amadekariyên darbeya li dijî Ebdul Kerîm Qasim bû, lewma nexwestibû sozên xwe bi cih bîne, tenê 100 çekên Bernoyê pêşkêş kiribû, ku bi vî awayî hatin parvekirin.

Me 50 çek ji Mela Mistefa re û 25 jî ji Şêx Ehmed re şand û me 25 jî ji bo partiyê hildan. Ev tevahiya wê têlikiliyê bû ku di navbera me û Îranê de hebû, heta wê demê ku Darbeya Si-batê qewimî û hikûmeta Ebdul Kerîm Qasim hat herifandin û piştre jî Darbeya Beisiyan hat kirin.

Îranê helwesta xwe guhert, ji ber ku pişta darbeyê digirt, bi taybetî hez dikir baskê Beisiyan li hember alîgirên Ebdul Nasir ser bikeve, ji ber ku Îran gelekî li dijî Ebdul Nasir bû.

Amerîka, welatên Ewropayê û hinek welatên Ereb bi taybetî Kuweytê pişta wê darbeyê digirtin. Wan dixwast Ebdul Kerîm Qasim ji desthilatê bê rakirin û wek welatekî serbixwe îtiraf bi Kuweytê bê kirin.

Îran ji tevahiya sozên xwe vekişiya, li hember serdana min a Ebdul Nasir jî nerazî bû. Yek ji sedemên ku Mela Mistefa ji serdana min a Ebdul Nasir û Ehmed Bên Bêlla aciz bû, ji ber Îranê bû, çimkî wî digot:

“Îran hez nake têkiliya me bi Misr û Cezayîrê re hebe, li ser wê yekê di navbera me û Îranê de pirsgirêkê derkevin.”

Mela Mistefa eşkere li dijî wê serdana min daxuyanî dida; da ku nîşanî Îranê bide ku ew li dijî wê serdana ye.

❖ Berjewendiya Îranê di têkiliya bi Barzanî re bû, çima têkilî bi we re danî?

Mela Mistefa têkiliyek rasterast bi Îranê re çê kiribû. Îranê qebûl kir, me wek penaber werbigre. Lê nêrîna wan derbarê min xirab bû û digotin xortekî tundrê yê çepgir e. Tevî ku wê serdemê ez wek sofiyan bûm, min meşrûb venedixwar, nediçûm sînemayê, tenê mijûlî pirtûkxwendinê û xwendingehê bûm. Wan ez wek xeterekê didîtim, lewma li cem wan navê min di lîsteya kesên tundrê û çepgiran de bû.

Piştî me, têkiliya wan bi Mela Mistefa re ma û gelekî jî ber-firehtir bû.

Dema ku me ew serederiya xirab a Îranê dît, me ev helbesta Salm li ber kir:

Legel dil şerte salim ger necatm bê le Tarana
Beheşt er bête deştî rey, be Îran da guzer nakem

Li ser vê bingehê ku têkiliya bi Iraqê re gelekî ji têkiliya bi Îranê re baştir e, ez hatim derve; çimkî serederiya Îraniyan bi me re gelekî xirab bû.

Gelek ji hevalan ber bi wê xetê çûn, digotin: Her çi be, hikûmeta me bi xwe gelekî ji ya Îranê baştir e. Aliyê kêm girêdayî Ebdul Nasir e, nîştimanî ye, li dijî kolonyalîzmê ye, di eniya gelan de ye û dostê Sovyetê ye, lê Îran kevneperest e, endamê Peymana SENTO'yê ye, siyaseta kolonyalîzmê dimeşîne û Qazî Mihemed kuştiye.

❖ Ji bo rizgarbûnê we tu hewlek da têkiliyê bi Iraqê re deynin?

Ew nêrîn di nav me de peyda bû, ku baştir e em bi hikûmeta Iraqê re biaxivin. Hîn ez li Tehranê bûm, ataşeyê leşkerî yê

balyozxaneya Iraqê hatibû mala Serdar Caf û daxwaza dîtina min kiribû, heval jî razî bûn ku ez wî bibînim. Kesekî Samerayî bû, min gotê:

“We wiha anî serê me, Tahîr Yehya poşman bû û şaşiyeke mezin kir, ez bi xwe girtîgeha Nugre Selman a Iraqê baştir ji mayîna li Îranê dizanim.”

Ataşeyê leşkerî yê konsulxaneya Iraqê ji wan gotinên min matmayî ma û rabû ez maç kirim û got: **“Ev nîştimanperweriya herî mezin e, ez ê vê meseleyê bighînim Bexdayê.”**

Helwesta Îranê bandorek nebaş li me kir, her wisa bû sedem em bi Iraqê re li hev bikin.

Tevahiya hevalên me ku ji Îranê vegeriyan, ji ber serederiyên Iraniyan dilê wan tijî kul û keder bibû. Rast e wê demê hikûmeta Iraqê ya Ebdul Selam Arif dîktator bû, lê wek nîştimanperwer dihat hesabê, dostê Ebdul Nasir bû û di nav welatên rizgarîxwaz de cih digirt.

❖ Piştî ku te li Îranê pasport stand, ku de çûyî?

Rasterast çûm Berlînê û li Berlîna Rojavayê ji bo mayînê min odeyek kirê kir û heta sala paştir ango sala 1965’an li wê derê mam.

Destpêkirina
Şerê Hikûmetê û PDK'ê

❖ Çi helwesteke we li hember şerê hikûmetê û Barzanî yê 1965'an hebû?

Bihara wê salê têkiliyên hikûmetê û Mela Mistefa têkçû; hikûmetê şer ragihand û roja 3'yê Gulana 1965'an dest bi şerê Mela Mistefa kir. Me yekser şandeyek şand cem Mela Mistefa û me got: **"Em amade ne werin û di bin serokatiya te de xebatê bikin."**

Wî jî wiha bersiv da: Bi xêr bin. Lê me du şert danîn. Mela Mistefa jî got: **"Werin an piştî şeş mehan em ê li hev bikin û partiyê bikin yek an jî partiya xwe ava bikin."**

Wê demê ez li Brîtanyayê bûm, tevahiya hevalan vegeriyan Iraqê. Bi wî awayî em li Îranê neman û çûne ba Mela Mistefa li Kurdistana Iraqê.

❖ Piştî ku hûn vegeriyan Kurdistanê, we hewl da bi Barzarî re li hev verin?

Piştre ez ê behsa wê yekê bikim. Destpêkê hikûmetê dest bi êrişan kir, çimkî hikûmetê dixwestibû Barzanî teslîm bibe, wî jî qebûl nedikiribû.

Piştî destpêkirina şer, hevalên me têkilî bi Barzanî re danîn û gotin: Niha sedemek sereke ya cudahiya navbera me nemaye û em amade ne bi hêza çekdarî ve werin û beşdariya şer bikin.

Şeşê Tîrmeha 1965'an, şendeyeke pêkhatî ji Elî Eskerî, Omer Debabe, Hîlmî Elî Şerîf û çend hevalên din çûn ba Mela Mistefa û li ser van xalan bi Mela Mistefa re li hev kirin:

Yekem: Divê tevahiya hevalên me parastî bin, ango Mela Mistefa kesî negire, azar nede û nekuje.

Duyem: Heta sê mehan em li ba Mela Mistefa dimînin, an hewl didin bibin bi partiyekê yan em bi xwe serperetiya xebata xwe dikin, mîna Partiya Komunînst a Iraqê, ku li Kurdistanê çalakî dikir. Lê nêrîna Mela Mistefa bi vî awayî bû, em biçin ba wî û bibin yek û pirsgirêkan çareser bikin.

Seyem: Pêşmerge yên girêdayî polîtburoyê bi ser navçeyan de bên dabeşkirin û bi serokatiya hevalên me bixwe û li gorî şiyanên wan di nav hêzan de erk bi wan bê spatin. Radyo jî ku ba me bû, bidin wan da ku ji bo şoreşê were bikaranîn.

Me sozên xwe bi cih anîn; radyo jê re şand, hevalên me çûn û çekên me yên zêde jî bi xwe re birin, da ku bi ser hêzên wan bên parvekirin. Hevalên me bi ser navçeyan de hatin dabeşkirin, erkên ku bi wan hatin spartin gelek bi başî bi cih dianîn. Di şer de rolek wan a jîrane hebû, ji ber ku wan ji dil ve xebat dikirin, tevî ku ez hinekê egile bûm, lê ez jî li Ewropayê her digel hevalan bûm.

Her çend navbera me û Mela Mistefa baş nebû, lê dema ku ez li Londonê bûm, min tu gotinek xirap li ser wî nekir, Min got: **"Pirsgirêkên navbera me cudahiyên malbatekê ne û yên çareserkirinê ne, em ê hewl bidin di demek nêzîk de çareser bikin. Min behsa vê yekê jî kir, hikûmeta Iraqê hikûmeteke şerxwaz e."**

Dema şer jî, ku min li wê derê propagandaya pirsa Kurd kir, tu tiştekî xirab min li ser Mela Mistefa negot. Di hevdîtinên xwe de bi berpirsên Brîtanyayê bi taybet berpirsên Partiya

karkeran û partiyên din, her wisa berpirsên wezareta derve ya wî welatî û rojnamevanan, min pir dostane behsa têkiliyên me û Mela Mistefa kir.

Lihevhatina
Demkî ya Barzanî û Polîtburoyê

❖ Piştî hûn vegeriyan Kurdistanê helwesta Barzanî li hember we çawa bû?

Piştî vegera ji Îranê, me serdana Mela Mistefa kir. Wê demê zêde ku rikê wî li min nedihat, got: **“Her sê mehan carekê em ê bi hev re bicivin, paşê em ê bi hev rûnên û biaxivin.”**

Mela Mistefa li nêzîkî xwe cihek li navçeya Balekayetiyê ji me re destnîşan kir, da ku em li wê derê bimînin. Piştî ku heyama diyarkirî bi dawî bû, me serdana wî kir û me gotê:

“Em heyamek e bê kar in, me li hev kiribû yan em cuda bibin an jî çareyekê ji bo pirsgirêkan peyda bikin.”

Wî jî wiha bersiv da: Biçin Dolereqeyê û baregeha xwe li wê derê deynin, piştî heyemekê ez ê serdana we bikim. Li wê derê em ê bi hev re rûnên û biaxivin û pirsgirêkan çareser bikin.

Em çûn li Dolereqeyê bi cih bûn, piştî heyamekê Mela Mistefa hat. Em heyamekê em bi wî re rûniştin, hêdî hêdî eşker bû ku mayîna me bi hev re bêfeyde ye. Bi taybet wê demê Hemîd Osman hatibû, ku berpirsekî hikûmetê bû û nerasterast hewl dida, nehêle em û Mela Mistefa li hev bikin.

Hemîd Osman li pişt me ve, li cem Mela Mistefa hinek axaftin kiribû. Ya rast Hemîd Osman kesekî mîna ruviyan bû, xwe gelek feqîr û sade nîşan dida, lê kesekî fêlbaz, pîlanger û ecîb bû. Wî hemû tişt ji Mela Mistefa re berevajî şirove kiribû û gotibû:

Eger bi cemaeta polîtburoyê re li hev bike û partiyê bike yek, wê demê cemaeta polîtburoyê dest bi ser hemû tiştekê de bigirin û piraniya xelkê dê bi wan re bin. Her wisa gotibû: Ji ber ku partiya komunîst desthilata wê kêm e, xelkê zêde pişta polîtburoyê bigirin, wê demê ew dibin navenda hêzê û bandora wan gelek mezin dibe.

❖ Gelo Barzanî tenê guh dida kesên nakokî çêdikirin, biryara we ya dawiyê çi bû?

Mela Mistefa ji tevahiya sozên dayî poşman bibû, me jî gotê:

"Ezbenî te hinek sozên din dabûn ku wan bi cih bînî, yek ji wan berdana Elî Hemdî û Mehmûd Hacî Tofîq û hinek kadroyên din bû, te soz dabû ku wan berdî, lê heta niha tiştekî wisa neqewmiye."

Mela Mistefa got: **"Ez diçim navçeya Mawetê, piştî ku vegeriyam bi hev re pirsgirêkan çareser dikin û wan jî berdidim."**

Piştre me zanî tevî ku ew bernedabûn, belkî cezayên wan girantir jî kiribûn. Mirovên me di nav alîgir, rêxistin û leşkerên Mela Mistefa de hebûn, hetta di nav buroya rêveberiyê de jî hebûn, lewma agahî digihîştin me. Ya rast Mistefa Qeredaxî dostê min bû û hajî gelek tiştan hebû; ez ji wan agahdar dikirim. Şeş-heft mehan kişand tu tiştek nekiviş bû, dengê sozên Mela Mistefa nebûn, em jî her li wê derê man.

Destpêkê jî me wiha biryar dabû, eger piştî şeş mehan Mela Mistefa erk neda hevalên me yên serokatiyê û bi me re li hev nekir, wê demê divê hevalên serokatiyê birevin bajaran û li wê derê dest bi xebata nepenî bikin û li ber destê Mela Mistefa nemînin.

Me xwe wek binçavkirî didît. Piştî şeş-heft mehan me nûçeyek gelek nexweş bihîst. Li gorî agahiyê cemaeta Mela Mistefa Elî Hemdî ji girtîgehê derxistine û kuştine.

Destpêke me kuştina wî bawer nekir, lê piştî lêkolînê, eşkere bû ku Elî Îbrahîm Derwêş rêveberê girtîgehê, bi awayekî nepenî û jîrane ew xwest bi cih aniye.

Ji Elî Îbrahîm Derwêş xwestibûn Elî Hemdî radest bike da ku bikujin. Wî jî gotibû heta nameya Mela Mistefa neyê nikare wî karî bike û divê destnivîsa wî bi xwe jî be.

Barzanî jî ew daxwaz wekî nîşana dilsoziya zêde ji bo xwe zanîbû, lewma bi xwe name jê re nivîsîbû û di nameyê de jê xwestibû, Elî Hemdî radest bike çimkî ew kesekî xayin e, divê bê kuştin.

Kuştina Elî Hemdî nîşaneya herî xirab bû, çimkî me li hev kiribû. Elî Hemdîdi nav komîteya navendî de kesê herî feqîr û têkoşer bû; ji bo têkoşînê wekî sofî û derwêşan bû. Kadroyekî pêşkeftiyê kurdatiyê bû.

Yek ji damezrênerên PDK'ê û Partiya Rizgarî bû. Roleke wî ya mezin di serhildana şoreşa Behdînan de hebû; lewma kuştina kesekî bi van taybetiyan, wek nîşaneya rewşek xirab dihat nirxandin.

❖ Gelo kuştina kadroyekî dibe sedema serhildana şerê navxweyî yan sedemên din jî hebûn?

Tenê ew nebû, piştre felaketek xiraptir ji wê qewimî, hevalekî me yê berpirsyar li cem Mela Mistefa hebû, lê Mela Mistefa nedizanî têkiliya wî bi me re heye. Navê wî "Newşîrwan Fuad Mestî" bû.

Wî nameya Mela Mistefa ya ku bi xwe nivîsîbû ji min re şand. Di wê nameyê de Mela Mistefa fermanê dide tevahiya fer-man- darên hêzan û dibêje:

"Yên ku ji cemaeta Îbrahîm Ehmed û Celal in, bikujin, ango yên ku îsbat bibe ji cemaeta Îbrahîm Ehmed û Celal in, bikujin."

Wê nameyê tevlîheviyek mezin xist nav Hêza Pêşmerge, çimkî bi sedan kesên me di nav Hêza Pêşmerge de hebûn û em ditirsiyan wan jî bikujin.

Ragihandina
Şer li Dijî Polîtburoyê

❖ Çawa Barzanî eşkere daxwaza kuştina we dikir?

Ew name (ya Barzanî) maye. Wê demê di kovara Rizgarî û Ro-jnameya Xebatê de hat weşandin. Me dixwest biçin lê Mistefa Qeredaxî xeberek şand û gotibû: "**Mam Celal hajî xwe hebe**".

Em neçar bûn bi fesal tevbigerin. Wê demê ez, Hîlmî Elî Şerîf, Nûrî Ehmed Teha, Nûrî Şaweys, Elî Ebdullah û Elî Eskerî ba hev bûn. Ji bilî min û Hîlmî, hevalên me yên din ku hevjîndar bûn, daxwaza îzinê kiribûn da ku serdana malbatên xwe bikin.

Me Ebdul Rehman Rûte şand cem Mela Mistefa, da ku razîbûna xwe ji bo îzna hevalan nîşan bide, heta bikarin serdana malbatên xwe bikin. Dema ku Rûte vegeriya berêvar bû, yekem kesê li ser riya wî, Elî Eskerî bû, jê pirsîbû: “Mela Mistefa çi got?”

Rûte jî gotibû: “Îzin neda.” Dîsa pirsî bû: “Çi tiştekî din got?” Rûte gotibû: “Qet, hinek gotinên kirêt jî ji we re kirin.”

Elî Eskerî bi dengekî bilind keniya.

Tevî ku ew kêmekê ji me dûr bûn, lê me hatina Rûte dît. Elî Ebdullah pêgermok dikir, Nûrî Şaweys li ber tavê rûniştibû, Ez, Nûrî Ehmed Teha û Hîlmî Elî Şerîf jî bi hev re diaxivîn.

Ji dûr ve Elî Ebdullah got: “Te çi kir?”
Wî jî got: “Wele Mela Mistefa îzin neda û li şûna îznê hinek gotinên kirêt ji we re kirin!”
Elî Ebdullah pirsî: “Çi got?”
Rûte got: “Ne ya gotinê ye.”
Elî Eskerî gotê: “Eger tu nebêjî, ez ê bêjim.”
Çimkî kesekî din jê re gotibû ku Mela Mistefa çi gotinên kirêt kirine.
Rûte got: “Nayê gotin, gelek kirêt e.”
Hemiyan gotin: “Nabe, divê bêjî.”
Rûte berisv da: “Mela Mistefa got ku ez îznê nadim wan.”

Min jî got: “Ezbenî çima tu îznê nadî, Mela Mistefa jî hêrs bû û komek gotinên kirêt kirin.”

Kuştina Elî Hemdî, pirsa îzin nedayîna bi hevalan û nameya gefa kuştina pêşmergeyên me, ser hev bûn sedem da ku nakokiya navbera me zêdetir kûr bibe.

Nişkeve heşt-neh kes ji Barzaniyan peyda bûn, nameya Kekê Îdrîs derbarê min û Hîlmî Elî Şerîf anî bûn.

❖ Ew name kengê şandibû û çi tê de nivîsî bû?

Meha Kanûna 1966'an bû; di nameyê de nivîsîbû:

"li ser fermana Barzanî divê hûn her du werin û ba me bimînin." yanî diviya em ji hevalan cuda bibin û baregehê veguhezin wê derê.

Berpirsê wê komê, Barzaniyek bû ku li Sovyetê xwendibû û kesekî siyasî bû. Di nav Barzaniyan de çend kes hebûn ku heza wan a siyasî û partîtiyê hebû, "Hemedemîn Mîrxan" yek ji wan kesan bû.

Min jê pirsî: "Em biçin?"

Wî jî got: "Wela hûn bi xwe dizanin." Got jî:

"Eger hez dikin, em ê yek-du rojan îznê bidin, da ku hûn xwe amade bikin."

Me jî got: "Baş e."

Wî êvarê cihê ji Elî Eskerî re gotibû:

"Kekê Elî dixwazim tiştekî ji te re bijm, lê divê sûnd bixweyî navê min nebêjî û behsa min nekî."

Elî Eskerî jî jê re sond xwaribû û gotibû ez behsa te nakim.

Wî gotibû: **"Gotine me Hîlmî û Mam Celal di rê de bikujin û bêjin reviyan, guh nedan hewara me û venegeriyan, lewma me bi neçarî gule li wan reşandin."**

Gotibû: Eger eşkere bibe ku min derbarê wê fermanê agahî daye we, tu bi xwe dizanî dê çi bînin serê min, dê min û tevahiya malbata min ji nav bibin[31].

Em li dolekê diman, heyemek bû em hinekê ji hev cihê bûn. Ez tenê li cihekê bûm û mijûlî nivîsandina vê pirtûka xwe "Kurdistan û Tevgera Neteweyî ya Kurdî" bûm. Her di wê çarçoveyê de, ez mijûlî nivîsîn û nirxandina belgeyan bûm. Şevekê şandin pey min û gotin were civîn heye.

Di civînê de, em her heft kes ango ez, Hîlmî Elî Şerîf, Nûrî Ehmed Teha, Nûrî Şaweys, Elî Ebdullah, Elî Eskerî û Omer Debabe amad bûn.

❖ Momoste Îbrahîm li ku derê bû, we derbarê çûyîna xwe çi biryarek da?

Mamoste Îbrahîm Ehmed li Tehranê bû, Seyîd Ezîz Şemzînî li Îranê bû, hinek hevalan xwe veşartibûn û nehatibûn civînê. Elî Eskerî behsa meseleyê yanî wê fermana Barzanî kir.

……

[31] Di pirtûka bîranînên xwe de, derbarê wê plana **Barzanî** ya **kuştina serkirdeyên baskê polîtburoya PDK'ê**, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Îraqê û Endamê Polîtburoya Partiya Komunîst a Kurdistana Îraqê û dostê PDK'ê û Barzanî "Ehmed Banîxêlanî" wiha dibêje:

Barzanî gazî me kiribû, ez, Ebû Selam û Adil Selîm çûn. Zivistan bû; bargeha Barzanî li Dîlmanê bû, piştî şîvê em çûne cem wî. Bayîz Ebas Mamend Axa û çend kesên din jî li wê derê bûn.

Barzanî got: "**Min şandiye pey we da ku hûn Celal Talebanê û Îbrahîm Ehmed bikujin**."

Me bersiv da û got: **Em nikarin wî karî bikin**.

Barzanî got: **Yan divê wê yekê bikin an jî divê ji Kurdistanê derkevin**, tenê 40 roj mecala we heye, eger hûn wê daxwzê bi cih neyînin; divê ji Kurdistanê derkevin û li vir nemînin.

Behsa vê yekê hat kirin ku em çi bikin? Piştî gotûbêjeke dirêj, me her heft kesan biryar da em neçin cem Barzanî.

Dema hatina cem Barzanî me biryar dabû, piştî şeş-heft mehan, eger Mela Mistefa erk neda me, wê demê divê em biçin nav bajaran û li wan deran bi nepenî xebata siyasî bikin. Roja baştir, em çûn cem Hebas Axayê Mamend Axa û me gotê:

"**Keko hal û rewş wiha ye, meseleyek wiha heye û dixwazin me bikujin."**

Ew jî di vê baweriyê de bû, em neçin lê pêşniyarek kir û got: Ez ê peyamekê ji Mela Mistefa re bişînim û bêjimê, li şûna ku Mam Celal û Hîlmî Elî Şerîf tenê bên, em hemû bi hev re bên xizmeta cenabê te û li wê derê bimînin, piştre tu çawa bixwazî em ê wisa bikin.

Me biryar da ji riya Sîtekê ve biçin û Şêx Letîf jî bi xwe re bibin.

Biryar bû em hemû ji riya "Xidrane" ve biçin û Ziyad Axayê Koye jî pê bihisînin da ku tu felaketek neqewime.

Roja baştir bersiva peyama Hebas Axa hat, Mela Mistefa gotibû:

"Nexêr, pêdivî nake hûn werin ba min, bila ew ango (Celal Talebanî û Hîlmî Elî Şerîf) fermanê bi cih binin û biçin ba Îdrîs, dema ez hatim wê derê, ez dê wan dibînim."

Diyaloga
Polîtburo û Bexdayê

❖ Helwesta we derbarê daxwaza Barzanî çi bû û we çi biryarek da?

Bêguman roj bi roj dudilî di nav me de zêdetir dibû. Di encamê de me civînek li dar xist û me biryar da, biryara çûna nav bajaran bi cih bînin. Roja sêyem Nûrî Şaweys û Elî Ebdullah poşman bûn û gotin: Wele em di nav bajaran de nikarin bijîn û Mela Mistefa dê me bikuje, lewma em li vir dimînin, karê me bi siyasetê neketiye û jiyana xwe dikin. Em pênc kes man û me biryar da, em biçin nav bajaran.

Me biryar da em çar kes birevin û biçin bajêr. Nûrî Ehmed Teha jî bi hejmarek Pêşmerge ve sibe biçe Raniyeyê, çimkî wê hingê li Raniyeyê hevalên me hebûn.

Nûrî Ehmed Teha got: Ez nikarim di bajêr de bijîm. Ez ê biçim ba Mamoste Îbrahîm Ehmed li Tehranê.

Me şev dest bi revê kir, her yek ji me 10-15 kes pê re bûn. Hejmara me hemiyan ser hev 60 kes dibû. Êvarê em çûn qûntara Çiyayê Kosret, nîvro me serdana Ziyad Axa kir; me jê xwest ku hewlekê bide da ku Mela Mistefa dev ji wê siyaseta xwe berde. Eger wiha nebe, wê demê em ê birevin û biçin.

Roja duyem em çûn Çemê Rêzanê, li wê derê li ser gaziya me hevalên Silêmaniyê hatin. Elî Eskerî û Hîlmî Elî Şerîf bi du desteyan çûn Kerkûkê, bi vî şertî ku li wê derê ji bo karê rêxistinê Hîlmî biçe Bexdayê. Elî Eskerî karûbarên rêxistina Kerkûkê bike, ez û Omer Debabe jî biçin Silêmaniyê.

Dema em gihîştin wê derê, Mela Mistefa ji reva me hisiya û gelekî hewl da bizane, em çawa ji biryara kuştina xwe hisyane. Çimkî me daxuyaniyek weşand û me got çi qewimiye, sedem ev e, em naxwazin Kurd Hevdu bikujin.

Nûçeya çawaniya kuştina Elî Hemdî ya di girtîgehê de jî me di rojnameyê de weşand. Lê me negot hatiye kuştin. Me nivîsî; Heyamek e Elî Hemdî ji girtîgeha Mawetê hatiye veguhestin û çarenivîsa wî nediyar e. Em dixwazin çarenivîsa wî bizanin. Cemaeta Mela Mistefa di wê heyamê de Mehmûd Hacî Tofîq û Osman Uzêr jî kuştibûn.

Plan danîbûn ku piraniya me bikujin. Ya rast 20-30 kes ji me kuştin, wisa hesibandibûn ku piştî kuştina wan kesan, em ê bi xwe ji nav biçin. Mirov kuştin li cem Mela Mistefa wekî av vexwarinê bû. wek Mînak:

Wî xalê xwe Hemed Axayê Mêrgesoriyê Şîrwanî bê sedem bi kurên wî ve kuşt, bêyî ku tu tawanek kiribin an dadgehekê di wê barê de biryarek dabe. Ev jî di demekê de bû ku şoreş hildiweşiya.

Me dest bi çalakî, karkirin û weşandina rojnameya Xebatê kir. Mela Mistefa jî dest bi danûstandinek nû bi hikûmeta Iraqê re kir. Wê demê Ebdul Rehman Bezaz serokwezîrê Iraqê bû. Em gelekî ditirsiyan ku carek din wek sala 1964'an li hev bikin. Vê carê jî lihevkirina wan ji bo jinavbirina me dibe. Lewma me plan kir, em çawa serederiyê bi rewşê re bikin.

Min pêşniyarek kir, hevalan jî pejirandin ku em Hîlmî Elî Şerîf bişînin cem Cemal Ebdul Nasir da ku nêrîna wî di wê barê de bizanin.

Ev nihêniyek e ku ez niha dixwazim eşkere bikim. Me bi riya balyozxaneya Misrê li Bexdayê serdana Hîlmî ya Misrê rêxist. Ew çû Qahireyê lê beriya biçe serdana Ebdul Nasir, hikûmeta Iraqê bi riya efserekî îstixbaratê peyamek ji Elî Eskerî re şandibû. Peyam bi vî awayî bû:

"Navbera me û Mela Mistefa de danûstandin heye, Ebdul Rehman Bezaz dixwaze di pêvajoyê de ser bikeve û naxwaze wek danûstandinên pêştir lê were, her wisa dixwaze bi baskê polîtburoyê re jî têkiliyê deyne."

Di bersivê de Elî Eskerî gotibû: **"Divê em hevahengiyê bi polîtburoyê re bikin."**

Me jî got: **"Bêje, baweriya me bi hikûmeta Iraqê nayê, her lihevkirinek bi hikûmeta Iraqê re, divê bi garantîkirina Cemal Ebdul Nasir be, eger xwe wek alîgirên Ebdul Nasir dizanin, divê hez bikin Ebdul Nasir pişta wê pêvajoyê bigire."**

Me got: **"Em dikarin bi wan re danûstandinê bikin û li hev jî bikin, lê eger Ebdul Nasir pişta wê pêvajoyê negire û razî nebe, piştrast bin ku bêencam dibe."** Wan jî gotibû**: "Baş e, emê wisa bikin, bila kesek biçe ba Ebdul Nasir."**

Me jî ku pêştir biryar dabû, Hîlmî Elî Şerîf biçe serdana Ebdul Nasir, me gotibûyê bi dirêjahî behsa rewşa Iraq û Kurdistanê bike, bêje daxwazên me çine da ku em bizanin Ebdul Nasir çi dibêje?

Hîlmî, Ebdul Nasir bi xwe nedîtibû, Fethî Dîbî dîtibû, ku wê demê li Serokatiya Komara Misrê wezîrê karûbarên erebî bû. Bi dirêjahî behsa Kurdistan û Iraqê jê re kiribû û gotibû:

“Rewşa tevgera Kurd gihîştiye astekꞌ metirsîdar, tirsa mudaxileya Îranê û Îsraîlê heye. Di encamê de ziyanek mezin li gelê Kurd dikeve. Ji ber wê yekê em dixwazin bi hikûmeta niha ya Iraqê re li hev bikin, dibe ku hikûmet tevahiya daxwazên me qebûl neke, lê divê em li bendê bin, da ku hikûmetek din bê ser kar û em jî tê de beşdar bibin.”

Fethî Dîbî gotibû: **“Serok Ebdul Nasir dê soz bide ku ji we re mafê xweseriyê bistîne. Behsa vê yekê jî kiribû, Ebdul Rehman Arif ne wek Ebdul Selam Arif e, kesekî baş e (wê demê Ebdul Selam Arif nema bû). Ebdul Rehman Arif ne tenê di nav refa Efserên Azad de ye, belkî dostê Misrê û kesekî nîştimanperwer e. Em hez dikin têkiliya we bi wî re hebe û pê re li hev bikin, li şûna wê yekê, ku têkiliyê bi hikûmetek kevneperest wek a Îranê re deynin.**

Behsa vê yekê jî kiribû, nêrîna xwe gihandine baskê Mela Mistefa jî û xwestine bi hikûmeta Bexdayê re pêk werin, lê negotinê ku pêvajoyek girêdayî Misrê li Iraqê di arê de ye.”

Ji aliyê xwe ve me jî pêşwazî li nêrînên wan kir.

Piştre û di 30’yê Hezîranan 1966’an de, plana alîgirên Misrê li Iraqê bi serokatiya Ebdul Rehman Arif serî girt û desthilat ket dest wan.

❖ Mesûd Barzanî dibêje: Sala 1965’an nûnerên Şah Hisên û Brîtanyayê ji bo hewla darbeyê serdana Barzanî kirine?

Ez hajî wê yekê nînim û qet tiştekî wisa jî min nebihîstiye.

❖ Têkiliya we û Barzanî bi Ebdul Rehman Arif re hebû?

Me têkilî bi hikûmeta Bexdayê re danî, bi çend hevalan ve, me serdana Ebdul Rehman Arif kir, helbet cara yekê hevdîtina me nepenî bû.

Ebdul Rehman Arif tevî ku zilamekî xweş reftar û nişтimanperwer bû lê xwedanê nêrînek kevneperest û rastgir bû, wî wiha got: Ebdul Rehman Bezaz dixwaze bi Barzanî re li hev bike, lê ez hez dikim, bi we her du baskan re, yanî bi we re wek baskê polîtburoyê û bi baskê Mela Mistefa re jî li hev bike.

Min jî got: Em wê yekê qebûl dikin, lê ji viya nîgeran in, piştî ku hûn bi Mela Mistefa re li hev bikin, mafê me bê xwarin.

Di hember de Ebdul Rehman Arif wiha bersiv da:

"**Bi Xwedê, eger ez xiyanetê li şerefa xwe bikim, xiyanetê li we nakim** (والله و بشرفی آخون عرضي ما آخونكم)," piştî ku ew gotin kir, me jî got: Baş e.

Me got: **"E te wek zilamekî nişтimanperwer dizanin û hêvî dikin ku pirsgirêk bi aştiyê bên çareserkirin."**

Ya rast me dixwest bi riya aştiyê em û Bexda bigihîjin encamekê, çimkî wê demê em hajî du tiştan hebûn. Ya yekem xurtbûna têkiliya Mela Mistefa û Îranê bû. Ya duyem jî, çêbûna têkiya Mela Mistefa bi Îsraîlê re bû.

Çavkaniya agahiyên me nûnerê Barzanî li Tehranê Şemsedîn Muftî bû ku têkiliya wî bi me re hebû.

Ya rast Şemsedîn Muftî heta dawiya 1966'an li ser biryara me gel Mela Mistefa ma. Got: Eger hûn dixwazin, ez ê Mela Mistefa bi cih bihêlim, lê me got; na carê bimîne, lewma wî

behsa hemû tiştî bi taybet li ser têkiliya Mela Mistefa bi Îranê re ji me re dikir.

Her wisa ew nûnerê Barzanî ji bo karûbarên Îsraîlê jî bû, behsa vê yekê dikir, ku çawa wî îsraîlî birine Kurdistanê.

Wê serdemê me têkiliya bi Îsraîlê re gelek metirsîdar dizanî. Em wisa difikirîn, her tiştê ku destê împeryalîzm û Îsraîlê tê de be, qirêj dibe! Her wisa em di vê baweriyê de bûn, Mela Mistefa tevgera Kurd bi Îran û Îsraîlê ve girê dide.

Me dixwest tevgera Kurd çareyek bi aşitî peyda bike, hetta eger di vê qonaxê de mafê xweseriyê jî neyê dayîn, eger hikûmet û Mela Mistefa li hev bikin, em wek cara buhurî dijatiya wê yekê nakin, bi vî şertî ku ew jî li dijî me nebin. Li ser bingeha wan rastiyan û sozên Ebdul Nasir, em li benda guhertina siyasî li Iraqê bûn, da ku desthilat bikeve dest alîgirên Ebdul Nasir, ji ber ku alîgirên wî di nav artêşê de gelek zêde bûn.

Li Bexdayê min bi serkirdeyên Tevgera Sosyalîstiya Erebî re hevdîtin dikir, wekî Fuad Rikabî, Ebdulîla Nesrawî, Dr. Xeyredîn Hesîb û Edîb El-Cadir. Wan jî piştrastî dan û gotin: Gelek baş e, ku hûn li vê derê bin, her guhertinek çê bibe, em hemû bi hev re dibin. Wê serdemê ez û Fuad Rikabî û Ebdulîla dost bûn. Fuad Rikabî ku dest ji wezîrtiyê kişandibû, got:

“Em dixwazin darbeyekê bikin, di vê darbeyê de du bask hene, baskê Erebî em in û baskê Kurdî jî hûn in, Ebdul Nasir jî paşta me digre.”

Bi rastî em dilxweş bûn. Me digot, him aliyê pêşverû û niştimanî ya erebî bi me re ye him jî me dizanî eger destketekî me hebe piraniya gelê Kurd bi me re dibe.

Peymana
29’ê Hezîrana 1966’an

❖ Çi helwestek we li hember Peymana 29’ê Hezîranê hebû?

Wekî Baskê Polîtburoya PDK’ê, me pêşwazî ji Peymana 29’ê Hezîrana 1966’an kir, ku di navbera Mela Mistefa û Ebdul Rehman Arif, Ebdul Rehman Bezaz de hat îmzekirin. Ji ber wê helwestê, Ebdul Rehman Arif bangî me kir û wêneya me ya hevdîtinê di rojnameyê de hat weşandin û hat gotin; Arif pêşwazî li Talebanî û Şerîf kir

(عارف يستقبل طالبانى و الشريف).

Wê demê li Kurdistanê bûyerek qewimî bû, ew jî bi cih anîna biryara kuştina dostên me di nav Hêza Pêşmerge de bû. Bi wî awayî dest bi jinavbirina hinek ji kadro, berpirsên leşkerî yên me kirin. Di encamê de gelek ji berpirsên navçeya Çemê Rêzanê serhildan û gotin em naçin ba Mela Mistefa.

Bi sedan pêşmerge li hev kom bûn, bicihneanîna fermana Mela Mistefa ragihandin. Ya rast em hajî wê biryarê nebûn, lê piştî eşkerebûna biryara wan, ji ber ku tevahiya wan hevalên me bûn, lewma ez, Hîlmî Elî Şerîf û Elî Eskerî çûn nav wan û me dest bi rêxistin û serperestiya wan kir.

Dema Mela Mistefa fermana lêdana wan pêşmergeyan da, me bangewaziyek da û ji pêşmergeyên aliyê Mela Mistefa xwest bi gotina wî nekin û birayên xwe nekujin. Yên daxwaza me bi cih anîn, ji Mela Mistefa cihê bûn wek mînak li navçeya Qeredaxê tevahiya hêzên wê derê bi fermandariya Kemal Muftî hatin ba me.

Li navçeya Merge Hemedemîn Ferec, Babekir Mehmûd Axayê Pişderî, Elî Axayê kurê Hebas Axayê Mezin hatin aliyê me.

Tevahiya wan hêzan hatin aliyê me. Bi wî awayî hêzeke mezin li wê derê kom bû. Di encamê de em jî bûn hêzeke mezin û li navçeya Çemê Rêzanê û Qeredaxê me baregeh danî.

❖ Çend pêşmergeyên we hebûn?

Hejmara pêşmergeyên aliyê me ango baskê polîtburoyê bi qasî du hezar kesan dibû.

❖ Çiqas pêşmerge gel Barzanî bûn?

Sê hezar pêşmerge ba wan bû. Li Soranê hejmara me bi qasî hevdu bû, em du hezar bûn, ew jî du hezar bûn. Barzaniyan, Behdîniyan û hinek eşîrên din jî ba Mela Mistefa bûn.

Serokê Eşîra Ako Hebas Mamend Axa ba me bû, li Pişderê û Balekayetiyê alîgirên me hebûn, lê hinek ji wan nediwêran li hember Mela Mistefa bisekinin. Bi vî awayî, em bûn du hêz û du partiyên eşkere.

Wê demê, me bi daxuyaniyekê pêşwaziya lihevkirina Mela Mistefa û hikûmetê kir. Piştre me xelk şand cem Mela Mistefa û me daxwaz kir, Bila şer raweste, bila neyêne ser me, em dijî şer in û em aşitiyê dixwazin. Lê aştîxwaziya me bêfeyde bû, wî careke din êrişî me kir.

Dema agirbesta bi hikûmetê re, Mela Mistefa êrişî me kir û hinek navçe ji dest me derxist wek Deşta Koyeyê. Lê navçeyên me yên din her di dest me de man.

❖ Çima mêla Ebdul Rehman Bezaz zêdetir li ser Barzanî bû, tu pirsgirêkek wî gel we hebû?

Li gorî Peymana 29'ê Hezîranê, Ebdul Rehman Arif wek serokkomar soz dabû me, lê piştî ku me lê nihêrî dixwaze mafê me bin pê bike, em çûn ser û me gotê: Keko te got bi Xwedê, eger ez xiyanetê li şerefa xwe bikim, xiyanetê li we nakim, ka ew soza te?

Wî got: Ez li ser soza xwe me û ez ê sed peymanan betal bikim.

Di hizûra me de bi telefonê bi tundî bi Ebdul Rehman Bezaz re axivî. Bezaz gelekî dijî me bû, çimkî dema ku ez û Hîlmî Elî Şerîf li Bexdayê bûn; têkiliya me bi Ebdul Rehman Arif re baş bû, ji ber wan gotinan, Bezaz dijatiya wê têkiliya me kir.

Di vir de ez dixwazim behsa du mijaran bikim.

Carekê me karî Ebdul Rehman Arif razî bikin, ku lêbuhurîneke giştî ji bo girtiyên siyasî derbixe ku piraniya wan komunîst bûn. Me gotê: Ev karê te dibe sedem da ku di nav civaka sosyalîstî de, tu zêdetir nav û deng derbixî û peyamên piştgirtinê ji te re bên.

Her wisa rûpelek nû di Şoreşa 14'ê Tîrmehê de vedikî û nav û dengê Iraqê gelek baş dibe, ew pêşniyara me ket mejiyê wî û got: Wela hûn rast dibêjin.

Piştî du-sê rojan Ebdul Rehman Bezaz serdana wî kiribû û gotibû: Çawa dibe em girtiyên komunîst berdin, tevahiya welatên rojava li hember me disekinin, Amerîka û Brîtanyayê dijatiya me bikin, bi wan gotina ew poşman kiribû.

Carekê jî me gotê: Cewahîrî helbestvanekî mezin yê Ereb e, nabe di serdema Ebdul Rehman Arif de, ew di mişextî û xerîbiyê de bijî, wî jî got: Em çi bikin? Me gotê: Tu jê re lêbuhurînekê derxîne. Got: Ez ê lêbuhurînê jê re derbixînim û bilîtê jî jê re bişînim.

Dema fermana lêbuhurînê diçe cem Ebdul Rehman Bezaz, dibêjê; Tiştên wiha çawa dibe? Cewahîrî gotinên kirêt ji bav û birayê te Ebdul Selam re kirine. Piştî heyamekê ku me serdana wî kir, got: Cewahîrî gotinên kirêt derbarê bavê min kiriye, fermana lêbuhurînê jê re dernaxim.

Di hember de me jî, dijatiya Ebdul Selam Bezaz kir. Paşê hatibû ser vê baweriyê ku em wan karan di bin bandora Ebdul Nasir de dikin, em wek dostê Ebdul Nasir didîtin. Di dawiyê de, Ebdul Rehman Bezaz ji serokwezîrtiyê hat avêtin. Piştre hikûmetek bi serokatiya Nacî Talib hat avakirin, lê kesê duyem û yê girîng di wê hikûmetê de, “Receb Ebdul Mecîd” bû, ku gelekî em hez dikirin.

Ji destpêka pêkanînan koma Efserên Azad û di serdema çalakiyên wan ên nepenî de, Receb Ebdul Mecîd sekreterê wan bû, kesekî pir aram û nîştimanperwer û rewşenbîr bû, heta wexera dawiyê jî, her dostaniya me dikir.

Beşdariya Du Baskên
PDK'ê di Hikûmetekê de

❖ Rast e hûn û Barzanî her yek bi nûnerekî beşdarî hikûmetê bibûn?

Li gorî biryara hikûmetê, diviya wezîrê Kurd hebe, yek ji me (baskê polîtburoyê) yek jî ji baskê Mela Mistefa. Me Fewzî Cemîl Sayîb pêşniyar kir, wan jî Ehmed Kemal Kerkûkî destnîşan kir. Lê baskê Barzanî gotibû; eger nûnerê polîtburoyê beşdar bibe, em beşdar nabin û wergirtina wezaretê red dikin.

Rojekê Kekê Fewzî telefon kir û got: Rêûrisma sondxwarina wezîran heye, hatine pey min, me jî got: Biçe. Li ber Koşka Komariyê gotibûn Fewzî, navê te di nav lîsteya wezîran de nîne.

Di wê heyamê de Ehmed Kemal dibêje wan: Eger nûnerê baskê polîtburoyê di hikûmetê de beşdar be, wê demê ez beşdar nabim, çimkî Mela Mistefa dê şerê min bike. Xwe dike kevoka aştiyê, Ebdul Rehman Arif razî dibe û dibêjê, cemaeta din kesên nîştimanperwer in, em ê bi wan re biaxivin û wan razî bikin.

Ji ber wê yekê bû, ku nûnerê me di hikûmeta Nacî Talib de nebû, tenê nûnerê baskê Mela Mistefa beşdar bû. Tevî ku me hez dikir di hikûmeta Nacî Talib de, kesekî me jî beşdar ba. Kekê Fewzî endamê partiyê nebû, lê dostê me bû, ji ber wê yekê helahelayeka mezin çêbû.

Nacî Talib yek ji Efserên Azad û şîe bû, ku gelekî Ebdul Nasir hez dikir, zilamekî aram, serxwe û xwedan exlaq bû, yê wê yekê nebû ku bikûjin û serê wî bibirin.

Her wisa di hikûmeta Nacî Talib de, hejmarek zilamên nîştimanperwer hebûn wek Edîb El-Cadir ku wezîrê pîşesaziyê bû, alîgirê Ebdul Nasir û mirovekî xweşdevî bû.

Cemaeta
Melayî û Celalî
Yan Cemaeta 66'an

❖ Ew dem destpêka nav lêkirina we ya caşê 66'an bû?

Sala 1966'an cemaeta Mela Mistefa dest bi propagandayeke berfireh li dijî me kirin, navê caşên 66'an li me kirin û gotin, ew xizmetkarên biyaniyan in. Di hember de me jî dest bi propagandayê li dijî wan kir, me jî got: Ew caşên peymana SENTO'yê ne û dixwazin tevgera Kurd bi împeryalîzmê ve girê bidin.

❖ Çima ji we re digot caşê 66'an, xwe wê demê Mela Mistefa jî gel hikûmetê bû?

Wan ji bo xwe helal dizanîn, lê ji bo me heram dizanîn. Ji bo wan helal bû ku têkiliya wan bi hikûmetê re hebe, mehê mûçe û alîkariyê werbigirin, wezîr û rojnameya wan hebe, lê nabe têkiliya me bi hikûmetê re hebe. Wan bi alîkariya hikûmetê şerê me dikirin, hêzên wan ji nav bajarê Silêmaniyê re derbas dibû, bi çek û fîşek û alîkariya hikûmetê şerê me dikirin.

Em jî bi heman awayî diaxivîn û me dipirsî; eger têkilî bi hikûmetê re xirab e? Eger wezaret xirab e? Çima wezîrê we heye? Me digot Mela Mistefa dixwaze tevahiya qada kurdî kontrol bike, ji bo wê armancê jî dixwaze agirê şerê birakujiyê hilbike. Pêwîstiya Mela Mistefa bi vê hincetê hebû, ku me wek caş nîşan bide da ku dest bi şerê birakujiyê bike.

Şerê çekdarî dest pê kir, gelek caran em rastî şikistê hatin. Tevî wê yekê, em li deverên xwe man, lê êrişan bi berfirehî dewam dikirin, bi vê hincetê ku em girêdayî Îranê ne. Piştî derketina Mamoste Îbrahîm Ehmed ji Îranê me têkiliya xwe bi Îranê re qut kir.

Em li dijî hev diaxivîn. Me baskê Barzanî wek dêla împeryalîzmê, SENTO, Îran û Îsraîlê dizanî û me digot: Rojekê were belgeyên ser wan dê eşkere bibin. Helbet me li ser bingeha agahiyên Şemsedîn Muftî, ew gotin dikirin.

❖ Wê demê têkiliya we bi partiyên iraqî re çawa bû?

Têkiliya me bi partiyên iraqî yên neteweyî û partiya komunîst re baş bû. Ez vê gotinê ji bo dîrokê dikim: Li ser bingeha helwesta li hember me, Partiya Komunîst a Iraqê bi ser du beşan de par ve bibû. Cemaeta Ezîz Hac, ango cemaeta serokatiya navendî û cemaeta komîteya navendî. Cemaeta komîteya navendî nedixwestin beşdarî şerê Barzanî yê li dijî me bibin.

Têkiliya me jî gel cemaeta komîteya navendî ne xirab bû, lê amade nebûn, em bi hev re eniyekê pêk bînin, ji aliyekî ve jî wan rewatî didan kar û kiryarên Mela Mistefa. Têkiliya me bi Tevgera Sosyalîst a Erebî, Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Nasirî, Partiya Beis a çep û Partiya Karkeran a Şoreşger re baştir bû.

Ji bo wan tiştan yên ku niha ez dixwazim behsa wan bikim, me du caran hewl da, em her du alî bi hev re hukimdariyê bikin. Carekê sala 1966'an bû û cara din jî sala 1967'an bû. Têkiliya me bi hêzên erebî û misrî jî pêşketibû, li Bexdayê me û Balyozxaneya Misrê zû zû hevdu didît. Ez çûm Beyrûtê û li wê derê min cemaeta Ebdul Nasir dît, wan gelek sozên baş dan, da ku alîkariya me bikin.

Kongreya Cezayîrê ya 1967'an û Pirsa Kurd

❖ Çi bûyereke girîng a din a girêdayî Kurdistan û Iraqê di sala 1967'an de qewimî?

Bûyera herî girîng a sala 1967'an, lidarketina Kongreya Sosyalîstiya Erebî li Cezayîrê bû**.** Tevahiya partiyên komunîst, sosyalîst, Beisî ji bilî Partiya Beis a Rastgir, tevahiya partiyên eniya Rizgarî, Yekîtiya Sosyalîstiya Erebî hatibûn vexwendin.

Ji nav Kurd û ji nav Partiya Demokrat a Kurdistanê, tenê ez hatibûm vexwendin, Beisiyên rastgir ango Beisiyên Efleqî nehatibûn vexwendin.

Wê demê Beisî rastî vê guhertinê hatibûn.

Di sala 1963'yan de, komek ji wan cuda bibû û navê partiya Beis a Sosyalîstiya Şoreşger li xwe kiribûn. Alîgirên vê partiyê li Sûriyeyê, Lubnanê û Iraqê zêde bûn. Kongreya xwe li dar xistin, Mîşêl Efleq derkirin û gotin: Mirovekî narsîsîst û

muhafezekar e. Hevdem hejmarek biryarên baş di kongreya wan de hatin dayîn.

Kongreyê mafê çarenivîsê ji bo Kurd pejirand, mafê xweseriyê wek pêngava yekem a pêş wê qonaxê da zanîn. Her wisa siyaseta berê ya Beisiyan li hember gelê Kurd protesto kir.

Piştre Beisiyên Sûriyeyê jî bi darbeya leşkerî Mîşêl Efleq derkirin û "Rêveberiya Qutrî[32] bi serokatiya Dr. Yûsif Zueyîn û Dr. Nûredîn Etasî ava kirin. Vê carê Mîşêl Efleq dijatiya wê serokatiyê kir, lê nekarî tiştekî bike. Rêveberiya Qutrî bi alîkariya artêşê karî Mîşêl Efleq û cemaeta wî derbikin. Serokkomar Emîn Hafiz rakirin û tevahiya desthilatê xistin destê xwe.

Bi wî awayî cara yekem Beisiyên çepgir hatin derkirin. Piştre aliyê rastgir jî bû du beşan, beşek ji wan gel Mîşêl Efleq man, ku xwedanê nêrîneka tam a rastgir bûn. Li Iraqê Ehmed Hesen Bekir, Sedam Hisên û çend kesên din pişta wan digirtin. Ev jî di demekê de bû, ku li Iraqê piraniya zêde ya Beisiyan çepgir bûn.

Wek baskê polîtburoyê têkiliya me bi Beisiyên çepgir û Tevgera Neteweçiyên Erebî re hebû, ku hîn nebibûn çend parçeyan. Her wisa têkiliya me bi Yemena Başûrê û hejmarek hêzên din yên erebî re hebû. Di wê qonaxê de ya ku jê re biratiya Kurd û Ereb, hevkarî û têkoşîn dihat gotin, bi başî xwe nîşan da.

……

[32] Di serdema desthilata **Partiya Beis** de li Sûriyeyê û Iraqê, karûbarên welat ji aliyê desteyek bilind a Partiya Beis ve dihat rêvebirin ku jê re **"Qiyadeya Qutrî" an serokatiya Qutrî** dihat gotin. Ew deste desthilata herî bilind di welat de dihat hesebê. **Desthilatên cibîcîkar wekî wezaretan û emcumena wezîran rasterast di bin ferman û çavdêriya wê desteya bilind a hizbî de bûn**. Hevdem tevahiya postên bilind ên hikûmetê di dest endamên desteya serokatiya qutrî de bûn.

Ez gel şandeyê çûm Cezayîrê. Di wê gerê de ev kes bi me re bûn: Fuad Rikabî, Serokê Yekîtiya Sendîkaya Karkeran a Erebî Haşim Elî Muhsîn, piştre bû sekreterê giştî yê Partiya Karkerên Sosyalîst a Erebî. Zilamekî gelek baş û heval û dostê min û Newşîrwan Mistefa bû. Wê serdemê ku Newşîrwan li Şamê bû, têkilî bi wan re danîbû.
Her wisa Dr. Xîredîn Hesîb û Dr. Mehmûd El-Himsî hatibûn ku ji Beisiyên çepgir bûn. Piştî ku hikûmeta Nacî Talib herifî, hikûmeteke nû bi serokatiya wezîrê navxwe Ebdul Setar Elî hat pêk anîn.

Em wek şandeyeke nîv fermî hatin birêkirin, em çûn Beyrûtê û Qahireyê û ji wê derê ve çûn Cezayîrê. Ji kesatiyên wê serdemê yên wek Kemal Cunbilat, Fuad Nisar, Kemaledîn Refet Misrî, Ehmed Hemruş, Ebdul Xaliq Mehcub, Muhsîn Îbrahîm û Nayif Hewatme hatibûn. Ji Sûriyeyê jî şandeya Partiya Beis a nû ya çepgir hatibû.

Di kongreya Cezayîrê de min ev sê mijar pêşkêş kirin ku niha jî mijarên girîng û bifeyde tên hesabkirin.

1. **Sosyalîzm û Pirsa Kurd li Iraqê**

   (الايشتراكية والمسالة القومية و المشكلة الكردية فى العراق)

2. **Girîngiya Dîrokî ya Yekîtiya Ereban li Ser Bingehên Pêşverû û Demokratîk**

   (ألاهمية التاريخية للوحدة العربية على آسس تقدمية الديموقراطية)

3. **Rola Burjuwaziya Biçûk di Avakirina Sosyalîzmê de**

   (دور البورجوازية الصغيرة في بنا الاشتراكية)

Destpêkê min babeteke aborî, siyasî û stratejîk pêşkêş kir ku tê de behsa vê yekê dihat kirin;

Eger Yekîtiya Ereban li ser bingeha pêşverûyî û demokrasiyê bê damezrandin di berjewendiya gelan de çi bandorekê li hevsengiya hêzan li deverê û cîhanê dike.

Gelek kêfa beşdarên kongreyê ji wê mijara min re hat. Mijara duyem a axaftina min, behsa pirsa Kurd bû wê jî bandoreke baş li beşdaran kir.

Serokkomarê Cezayîrê Ebdul Eziz Bûteflîqe, her wisa dîplomatê navdar yê Neteweyên Yekbûyî Exzer Îbrahîmî amade bûn. Exzer Îbrahîmî dostê min yê nêzîk bû û hatin û çûyîna me ya malbatê hebû.

Mijara min a sêyem; "Rola Burjuwaziya Biçûk di Avakirina Sosyalîzmê de" bû ku kêfa piraniya beşdaran jê re nehat, çimkî wê demê nêrîna çepgiriyê zêdetir bi nivîsên min ve diyar bû. Min got:

"Ew nêrîn rast in yên ku dibêjin bêyî serokatiya hêza karkeran, sosyalîzm nayê avakirin û burjuwaziya biçûk nikare sosyalîzmê ava bike. Geşbûna nekapîtalîst ji bo wan welatan baş e ku sosyalîst nînin. Min bal kişand ser gotineka Lenîn ku dibêje; nabe tevgera rizgarî û tevgera demokratîk a şoreşger tevlî nêrînên komunîstiyê bên kirin."

Kêfa Sovyetiyan bi nêrînên min re nedihat. Sovyetî ji ber du tiştan nerazî bûn. Balyozê Sovyetê li Cezayîrê gotibû: **"Çima we bangî Barzanî nekiriye û bangî Talebanî kiriye?"** Wek endamê komîteya rêxistina kongreyê Muhsîn Îbrahîm bersiv dabû û gotibû:

"Heval, eger me kongreya eşîran li dar xist û me bangî Barzanî nekir, wê demê mafê te ye ku gazinde li me bikî. Eger me Kongreya Eşîran a Welatên Ereb li dar xistiba û navê Barzanî li

destpêka bangkiriyan de neba, wê hingê pêwîst bû, te gazinde kiriba. Lê ev Kongreya Sosyaliytiya Erebî ye.”

❖ Kongreya Cezayîrê ji bo Kurd firsendek bû, gelo wek pêdivî sûdek jê hat girtin?

Belê. Li gorî şiyanên xwe me hewl da. Di kongreyê de me behsa pirsekê kir, Cezayîrî pê dilgiran bûn. Ew jî pirsa Ehmed Bên Bêlla bû. Hejmareka kesan behsa berdana Bên Bêlla kirin. Ez bi Bûteflîqe re axivîm, min jê xwest di wê barê de em bi serokkomar re biaxivin, lê wî got: Pêwîst nake, dibe ku serokkomar aciz bibe.

Qenciya Bên Bêlla li ser Kurd hebû, di dîroka Cezayîrê de kesatiyekî mezin û nîştimanperwer bû. Min hez kir, ez jî tevlî wan kesan bibim ên behsa berdana wî dikin.

Di kongreyê de nêrînên min û Sekreterê Partiya Komunîst a Sûdanê Ebdul Xaliq Mehcûb gelekî li hev nêzîk bûn, lewma hevaltî di navbera me de çêbû.

Her wisa di komîteyeke kongreyê de ku Ebdul Ezîz Bûteflîqe, Exzer Îbrahîmî, Ebdul Xaliq Mehcûb û çend kesên din tê de beşdar bûn, ez jî endam bûm. Wê derê min Fuad Nesar nas kir, min nameyek û çend kom bi riya wî ji Cewahîrî re şand, ku diçû serdana Cewahîrî li Pragê.

Nîqaşa min li ser pirsa Kurd û sosyalîzmê bû. Bandoreke wê ya baş li ser nêrîna erebî ya derbarê pirsa Kurd hebû. Ev cara yekê bû, ku li welatekî erebî bi taybet Cezayîrê di nav komeke hêz û partiyên sosyalîst ên Ereb de, ku hinek ji wan di desthilatê de bûn, me bi wî awayî behsa pirsa Kurd, mafê çarenivîsê û xweseriyê kir.

Min bal kişand ser vê yekê: **“Mafê çarenivîsê û xweseriyê, rêçareya herî baş e, ji bo çareseriya pirsgirêka navbera Kurd û Ereban, bi wî awayî nebe pirsa neteweyî ya Kurd nayê çareserkirin.”**

Dema em vegeriyan Qahireyê, Şerê Hezîranê qewimî û Misr şikiya; em bi riya bendera Eskenderiyê ve bi keştiyê ber bi Beyrûtê rêketin. Roja ku em gihîştin Beyrûtê, şev Ebdul Nasir destkişandina xwe ji erka serokkomariyê ragihand, lê xwenîşandanan li dijî dest ji kar kişandina wî dest pê kir û xwenîşandêran xwestin di erka xwe ya serokkoamriyê de bimîne.

❖ Wê demê şerê Hezîranê di navbera Ereb û Îsraîlê de qewimî, çi helwesteke we li hember wî şerî hebû?

Wê demê ez li Beyrûtê bûm, min gotarek li ser pirsa Kurd û helwesta neteweya Ereb li hember wê pirsê nivîsî û di kovara El- Horiye de hat weşandin ku ji aliyê Muhsîn Îbrahîm ve dihat weşandin. Di wî gotarê de, min got:

“**Di wî şerî de gelê Kurd pişta gelê Ereb digire û planên kolonyalîzm û siyonîzmê di dawiyê de rastî şikistê tên.”**

Cemaeta Mela Mistefa bi taybet Dr. Mehmûd Osman, ew nêrîna min wek dûketina Ereban û Ebdul Nasir dan zanîn û kopiyeka wê li Ewropayê belav kirin .

Em ji Lubnanê hatin ser sînorê Sûriyeyê, wê derê ji bilî min û Fuad Rikabî, rê dan tevahiya endamên şandeyê biçin nav Sûriyeyê, lê gotin: Çûyîna we ya nav Sûriyeyê qedexe ye.

Endamên din ên şandeyê gotin: “Em ê bêjin hevalan bila vê arîşeya we çareser bikin, hûn li ser sînor li bendê bin.”

Wê demê pêl pêl leşkerên sûrî dihatin yan reviyabûn yan jî di şer de şikiyabûn, gelek perîşan duxuyan. Hejmareke efserên sûrî yên alîgirên Ebdul Nasir jî hatibûn ser sînor û digotin: Em ê biçin welat û di nav artêşa xwe de xizmetê bikin.

Wan jî qebûl nekirin em bi wan re derbasî nav Sûriyeyê bibin. Piştî heyamekê, otomobîlek hat pey me û em birin Şamê.

Şev li Şamê, em çûn baregeha sendîkaya karkeran. Wezîrê Berevaniya Sûriyeyê Mistefa Telas jî li wê derê bû. Di axaftinan de behsa bikarhatina bombeyên Napalmê li dijî leşkerên Sûriyeyê hat kirin, bi awayekî ku Napalm nedîtibin.

Efserekî balafirvaniya Iraqê yê Beisî yê çepgir li wê derê penaber bû. Wî behsa bandor û metirsîdariya Napalmê dikir û digot; dibe sedema komkujiyan, wek pisporekî li ser Napalmê diaxvî.

Mistefa Telas ku ji gotinên wî matmayî bibû, pirsî: “Heval, tu wan agahiyan derbarê Napalmê li ku derê hîn bûyî?” Wî destê xwe dirêjî min kir û wiha bersiv da û got:

“**Nizanim çawa me li dijî birayên xwe yên Kurd (Napalm) bikar anî” (كِيف ما آعرف مو آحنا استعملنا ضد اخواننا الاكراد)**.

Êdî hemû keniyan. Ji wê şûn de gelek caran behsa wê gotinê dihat kirin û digotin: **Em nebûn ku me li dijî birayên xwe Kurd (Napalm) bikar anî!** Ji ber nebûna balafirê em li Şamê egile bûn. Di wê heyamê de me gelek kes dîtin. Min hewl da têkiliyê bi Sûriyan re deynim bi taybet ên çepgir wek Dr. Yûsif

Zueyîn, lê derket di pirsa neteweçîtiyê de ne çepgir in, di bingehê de hemû Beisî ne, lewma ez poşman bûm.

Em hatin îstasyona trênê da ku vegerin Bexdayê. Li wê derê min Tariq Ezîz dît; wê demê ew li Şamê mamoste bû.

Ji cemaeta Mîşêl Efleq bû ku sala 1966'an ji aliyê cemaeta çepgiran ve hatibû girtin lê Hezîrana 1967'an ji ber şerê Îsraîlê, hatibû berdan, dixwest vegere Bexdayê.

Ji şandeya Iraqê, kes pê re nediaxivî û hemiyan avirê xwe dabûnê, ez çûm cem û min silav lê kir, piştre min fem kir, bê pare ye jî, lewma di rê de min xercê tevahiya xwarin û vexwarina me her duyan kişand. Dema danûstandinên 1983'yan behsa wê meseleyê kir û got: "Di bîra min de ye, wê demê Kekê Celal li Şamê tekane kes bû, bi min re axivî."

❖ Rast e wê demê Barzanî serdana Îsraîlê kiribû, çi berteka we û Iraqê li hember serdana wî hebû?

Heyamekê piştî Kongreya Cezayîrê, me nûçeyeke xirab ji Tehranê bihîst. Li gorî nûçeyê Mela Mistefa çûbû Îsraîlê û Şemsedîn Muftî û Dr. Mehmûd jî gel xwe biribû[33].

……

[33] Şlomo Nekdîmon rojnamevan, nivîskar û analîstê siyasî yê navdar ê îsraîlî, ku bi lêkolînên xwe yên kûr li ser dîroka leşkerî û ewlekariya Îsraîlê bi taybetî rola Mossadê li Rojhilata Navîn tê naskirin; di pirtûka xwe ya bi navê "Mossad Li Iraq û Welatên Cîran" de dibêje:
Mela Mistefa Barzanî 15.04.1968'an ango roja cejna Qiyamet a Îsraîliyan serdana Îsraîlê kir. Di wê serdanê de Barzanî **bi serokkomarê wê demê yê Îsraîlê, Zelman Şazar û berpirsên payebilind ên hikûmet û opozisyonê re hevdîtin kir**. Di wê serdanê de, **Dr. Mehmûd, Şemsedîn Muftî û 5 zêrevanên taybet** gel Barzanî bûn.

Wisa dihat gotin; piştî şikista Ereban, Îsraîliyan Mela Mistefa birene Biyabana Sînayê, cihê şer lê nîşan dane. Nûçeyek belav bû, tê de dihat gotin, Barzanî peyameke pîrozbahiyê ji Îsraîlê re şandiye.

Ya rast naveroka wê peyamê heta sala 1969'an nediyar bû. Lê di wê salê de pirtûkek bi navê "Eswar Îsraîl" hat weşandin. Di pêşgotina wê pirtûkê de fermandarê giştê yê wê demê yê artêşa Îsraîlê "Mûşê Deyan" dibêje, piştî ku sala 1967'an, em li hember Ereban serketin, Mela Mistefa bi riya peyamekê, ew serketin li me pîroz kir.

Li aliyekê din, di nevbera Sovyet û Çînê de nakokî çê bibû. Cemaetek di nav me de peyda bibûn û pişta Çênê digirtin û Mao Zedong wek serkirdeyê mezin yê komunîstan dizanîn.

Di nav PDK'ê de, hejmarek xort hebûn ku li Ewropayê xwendina xwe temam kiribûn û gelek baş ew pirs fem dikirin, wek Ruşdî Şerîf, her wisa komeka xortên hişyar li Silêmaniyê hebû, zêde ketibûn bin bandora çepgiriya nû, wek Newşîrwan Mistefa, Bekir Hisên Fuad, Fazîl Mela Mehmûd, Fereydûn Abdul Qadir û Şazad Sayîb.
Nêrîna wan nêzîkî çepa nû bû, lê min ji mecalê sûd wergirt û têkilî bi wan re danî.
Ew têkiliya tund a bi Îsraîl û Îranê re, bû sedem ku Mela Mistefa li ber çavan bikeve. Ne tenê tevgera me wek şoreşekê nedihat dîtin, belkî em wisa difikirîn ku tevgereke kevneperest a girêdayî Îsraîlê ye. Wê demê çepgir û marksîstan pişta me digirtin.

Avakirina
Baskê Çep di Nav PDK'ê de

❖ Kengê û çawa çepên nav PDK'ê li hev nêzîk bûn?

Di bin bandora xeta Çînê de, wek ciwanên nav PDK'ê, em li hev nêzîk bûn. Me gelekî hejî Mao Zedong dikir, bi awayekî li Bekreco û Qeredaxê me wêneyên Mao daliqan dibûn. Medal-yayek Mao li stûyê me de bû. Gel Newşîrwan û hevalên din ên ku min navê wan anîn, me xeleka rewşenbîriyê çê kir.

Tevî ku em PDK bûn, lê di nav partiyê de em baskek bûn. Min him pişta wan hevalan digirt, him jî li hember biryarên polît-buroyê û hevalên serokatiyê, min parêzvaniya wan dikir.

Me hewl da, di hilbijartinê de li Silêmaniyê hevalên xeta Çînê serkevin da ku desthilata hevalên wek Heme Hacî Tayer û hinekên din kêm bibe. Her çend hevalên me yên din jî kesên baş û dost bûn, lê yên nû zêdetir xwedan bandor bûn. Wek mînak; Mamoste Îbrahîm Ehmed, Omer Debabe, Ebdul Rehman Zebîhî, Elî Eskerî û Hîlmî Elî Şerîf, zêde girîngî nedidan nêrînên hizrî yên nû.

❖ Yanî hûn rêxistinek di nav rêxistinekê de yan partiyek çep di nav partiyek neteweyî de bûn?

Nexêr, em rêxistin nebûn tenê baskek bûn. Me belavok di-weşand, gotar û babet dinvîsîn, me hinek babet dida Newşîr-wan Mistefa werdigerandin ser zimanê kurdî. Bi taybet nivîsa Mao Zedong ya bi navê "Bijî Şerê Gel". Piştre Mamoste Îbrahîm bi alîkariya Newşîrwan Mistefa hilbijartiyên Mao Zedong wergerand ser zimanê kurdî.

❖ Pirtûkxaneya Hizra Nû li Bexdayê cihê kombûna we bû, kî dihatin wê derê?

Ez ê paşê behsa avakirina Xwendingeha Hizra Nû jî bikim. Me Pirtûkxaneya Hizra Nû ava kir, ew jî di wê barê de bû. Wê demê hevalên me yên din jî li wê derê diciviyan wek Şehab Şêx Nûrî û brayê wî Daro, Mihemed Sabîr, Memûd Mela Îzet û Cemal Tahîr, di çarçoveya wê hiza nû ya çep de li dor hev kom dibûn.

❖ Çi salekê şer di navbera we û Barzanî de li Kurdistanê qewimî?

Şerên mezin yên navbera me û Mela Mistefa di sala 1968'an û pê de qewimîn.

Bûyereka din a girîng ew bû, ku li destpêka sala 1968'an, em û Beisiyên Çep û Tevgera Sosyalîst bi serokatiya Fuad Rikabî, me dixwest darbeyê bikin. Mirovên wan di nav artêşê de hebûn, me jî dixwest hejmarek Pêşmerge amade bikin.

Ebdul Setar Ebdul Letîf ku farmandarê giştî yê malnişîn û dostê me bû, xwestibû min û Fuad Rikabî bibîne. Ez û Fuad Rikabî him dost bûn û him jî hatin û çûyîna ma ya malbatê hebû. Her wisa têkiliya me bi Misrê re jî gelek baş bû. Balyozî Misrê ji bo karên girîng serdana min dikir an ez diçûm ba wan an dema pirsên girîng bi min re dişêwirî.

Navbera min û hikûmetê jî ew qasî baş bû, ku rojekê Ebdul Rehman Arif ji bo çareserkirina pirsgirêkekê di navbera xwe û Ebdul Nasir de xwest ez nameya wî bigihînim Ebdul Nasir, tevî ku paşê bi awayekî din hat çareserkirin.

Dema em çûn ba Ebdul Setar Ebdul Letîf , wî got: Rewşa hikûmetê gelek xirab bûye, bi awayekî cemaeta Ebdul Rehman Arif bi xwe jî dixwazin biguherin û ji wî xwestine bibe serokkomar, lê gotiye: “Du hevalên wî hene dixwaze di wê barê de bi wan re bişêwire, ew jî Fuad Rikabî û Celal Talebanî ye.”

Beşa Dazdehem
12
Hatina Beis û Peymana
11’ê Adara 1970’yan

- Darbeya Beisiyan
- Sedam Hisên û Kurd
- Beşdariya Polîtburoya PDK’ê di hikûmeta Beis de
- Şerê navxweyî yê PDK’ê
- Peymana 11’ê Adara 1970’yan

Darbeya Beisiyan

❖ Ebdul Setar Ebdul Letîf negot kî dixwazin darbeyê bikin, çi helwesteke we hebû?

Me hejmarek pirs derbarê xelkê û çawaniya darbeyê kirin. Bi gotina wî, Ebdul Letîf Deracî, Îbrahîm Dawud, Edbul Rezaq Nayif, û cemaeta Seidûn Xeydan di nav wan kesan de de bûn.

Wan gotibûn: Tu kesekî hizbî nînî û em hez dikin bibî serokkomar. Wî jî di bersivê de gotibû: Bi şertekî wê daxwazê qebûl dike, ku ji Fuad Rikabî bê xwestin da ku kabîneyeke nîştimanî pêk bîne û em jî tê de beşdar bin.

Wan bi şertekî qebûl kiribûn ku wezaretekê bidin wan, ew jî wezareta ewlekariya neteweyî bû, qaşo ew jî razî bûye û dixwaze nêrîna me bizane.

Me jî got: Ev tiştekî nû û girîng e, divê em hevahengiyê bi partiyên xwe re bikin. Em hatin derve, Rikabî got:

“Ez hez dikim em alîkariya wan bikin da ku Ebdul Setar Ebdul Letîf bibe serokkomar, ez bibim serokê encumena wezîran, tu jî bibî cîgirê serokê encumena wezîran û wezîrê navxwe. Wê demê, em ê hêdî hêdî rewşa xwe di nav artêşê de xurt bikin û hejmarek reform di nav artêşê de pêk bînin da ku ew efser xeterê li ser me çênekin.”

Ya rast nêrîna min jî wek a Rikabî bû lê dema ku em vegeriyan nav hevalên xwe, rewş hatibû guhertin. Ereban di şerê şeş rojan de yê bi Îsraîlê re şikist xwaribû. Beşek mezin bi qasî 50-60 hezar kesî ji artêşa Iraqê çûbû Urdinê, diviya Iraq amade bibe da ku di şerê dijî Îsraîlê de alîkariya Misrê bike.

❖ Rewşa hikûmeta Ebdul Rehman Arif, partîtiyê û azadiya ramanê çawa bû?

Wê serdemê hikûmeta Ebdul Rehman Arif gelek lawaz bû. Partiya komunîst parçe bibû, gelek kesan dixwestin hikûmet bê guhertin, her wisa welatên Ewropaya Rojawayê jî hewl didan hikûmetê biguherin. Erebistana Siûdî û Îranê bi planeke hevpar dixwestin Ebdul Rehman Arif rakin, ji ber ku di vê baweriyê de bûn, ew kesekî nîştimanperwer e, bi gotina Ebdul Nasir dike.

Ew nêrîn rast bûn, çimkî xebata siyasî geş bibû, rê hatibû dayîn partiyên siyasî dest bi xebat û çalakiyan bikin, rewşa azadiya ramanê baş bibû, her kesî dikarî nêrîna xwe eşkere bêje, kêm kes dihat cezakirin û girtin.

Rewşek wisa di berjewendiya welatên rojava de nebû, wan dixwestin hikûmetekê bînin ser desthilatê ku Eniya Rojhilat hilweşêne û dijatiya Ebdul Nasir û Sûriyeyê bike.

Beisiyên rastgir cemaeta herî baş ji bo wê armancê bûn. Beisî dijî Sûriyeyê bûn, eger desthilat biketa dest wan nedihîştin Iraq û Sûriye bibin hevpeyman, li dijî Ebdul Nasir bûn û di encamê de, Eniya Rojhilat têk diçû. Her wisa Beisiyên Iraqê dijî komunîstiyê bûn, bi hatina ser desthilatê diketin hewla jinavbirina partiyên komunîst.

Ji ber van sedeman, welatên rojava ji sedî 100 pişta Beisiyên rastgir digirtin û hatina wan a ser desthilatê bi plana wan re digunca.

Ebdul Setar Ebdul Letîf got: Eger hûn alîkariyê nekin, wê demê ew efser neçar dibin da ku bi cemaeta Ehmed Hesen

Bekir re li hev bikin. Di hember de, Fuad Rikabî got: Bila werin piştî heyemekê, em ê wan biherifînin. Min jî gotê:

“Vê carê tecrubeya wan a sala 1963’yan heye, bi hêsanî nayên herifandin.”

❖ Têkiliya we ya bi hêzên Iraqê yên din re çawa bû?

Têkiliya me bi Partiya Komunîst a Iraqê re ne xirab bû. Me û Dr. Sefa Hafîz hevdu didît, hinek caran Mamoste Îbrahîm Ehmed bi wan re diciviya, hinek caran jî ez û Hîlmî Elî Şerîf bi Ezîz Mihemed re diciviyan.

Ezîz Mihemed nîv eşkere hatin û çûn dikir. Hinek caran jî me li mala Hemze Ebdullah, Ezîz Mihemed didît. Wê serdemê siyaseta partiya komunîst bi vî awayî bû, him gel me têkiliya wan hebû, him jî gel baskê Mela Mistefa, dixwestin me bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê – Polîtburo binav bikin.

Lê baskê Rêberiya Navendî ya Partiya Komunîst a Iraqê, li dijî me bû û pişta baskê Mela Mistefa digirt.

Ez wisa difikirîm, Mela Mistefa bi riya Hebîb Kerîm, baskê rêberiya navendî bi serokatiya Ezîz Hac li dijî me teşwîq dikir, da ku ji partiya komunîst cihê bibin, armanca wî jî lawazkirina partiya komunîst bû heta di bin kontrola wan de be.

Navbera me û partiyên din ên erebî jî xweş bû, hetta efserên alîgirên Ebdul Nasir û yên neteweçî him li Kurdistanê û him jî li deverên din ên Iraqê di dayîna agahî û şêwran de alîkariya me dikirin.

Komeleya Fuad Rikabî daxwaza beşdariya hikûmetê red kir, bi taybet Ebû Şewqî (Cewad El- Dûş), gelek dijî wê yekê bû, ku

wê demê endamê serokatiya wan bû. Dijî vê yekê bû, em her du alî alîkariya wê cemaetê bikin, ji ber ku baweriya wî bi wan nedihat.

Wê serdemê nêrînek nû ya çepgriya Ebû Şewqî û cemaeta wî hebû, xwe wek pisporê payebilind ê Marks û Lenînnasiyê didît.

❖ Gelo Beisî bi alîkariya Amerîkayê hatin ser desthilatê?

Efserên Beisî bi riya Nasir Aniye ku balyozê Iraqê li Şam û Beyrûtê bû û bi salan têkiliya wî bi Amerîkiyan re hebû, karîn hejmarek ji efseran wek Herdan Tikrîtî, Îbrahîm Dawud, Ebdul Rezaq Nayîf, Seidûn Xeydan, Ehmed Hesen Bekir û hejmarek kesên din ên girêdayî Beis bi rêxistin bikin û bi hev re darbeya 17'ê Tîrmeha 1968'an ser bixin.

❖ Ehmed Hesen Bekir kesekî çawa bû?

Di nêrîna me de Ehmed Hesen Bekir kesekî eşîr ê sade yê aşitîxwaz bû. Nêrîna wî derbarê pirsa Kurd baş bû, xwe wek dostê me nîşan dida û digot: **"Eger carek din şiyana me hebe yan em bibin desthilat, em ê mafê xweseriyê bidin Kurd, her wisa alîkariya we jî bikin."**

Ehmed Hesen Bekir bi wî awayî gel baskê Barzanî jî diaxivî. Her wisa têkiliyên wî bi şîeyan re jî baş bûn. Wê serdemê tevgerek şîe peyda bibû, wan jî bo xweşirînkirinê wisa serederî dikirin.

Sedam Hisên û Kurd

❖ Cara yekem te kengê Sedam Hisên dît?

Yekemîn car min Sedam Hisên li dîwanxaneya Ehmed Hesen Bekir dît. Di nav koma Hesen Bekir de, hejmarek xortên wek Ebdul Xaliq Samerayî û Ebdullah Selûm Samerayî hebûn ku min bi riya Teyib Berwarî, ew nas kirin û têkiliya navbera me dewam kir.

Têkiliya me bi cemaeta Ehmed Hesen Bekir re bi riya Ebdullah Selûm Samerayî û Dr. Mihemed Mişate çêbû ku paşê Mişate bû balyozê Iraqê li Brîtanyayê. Gelek caran dihatin û em li mala Mamoste Îbrahîm Ehmed diciviyan.

Em tekane partî bûn ku têkiliya me bi cemaeta Ehmed Hesen Bekir re hebû. Bi awayekî carekê wî ji min xwest, hewlekê ji bo hevdîtina wî û Ezîz Mihemed bidim. Piştre ku ez bi Ezîz Mihemed re axivîm, ew amade nebû Ehmed Hesen Bekir bibîne û got: **“Kuştinek zaf di navbera me de çêbûye, ji ber wê yekê nikare wî bibîne.”**

Helwesta cemaeta Ebdul Xaliq Samerayî li hember pirsa Kurd li gorî hinekên din baştir bû. Di hilbijartina xwendekaran de, em û Beisî bi lîsteyekê beşdar bûn, li hinek cihan jî lîsteya me û Tevgera Sosyalîstiya Erebî û cemaeta Ebdul Nasir a hevpar hebû.

❖ Dema Darbeya 17’ê Tîrmehê tu li ku derê bûyî?

Dema Darbeya 17’ê Tîrmeha 1968’an, ez li Silêmaniyê bûm. Ebdul Kerîm Hemdanî efserekî îstixbaratê bû, paşê bû fermandarê giştî yê parêzvanên komarê. Ew hat cem min, ez ji

qewmîna darbeyê hisandim, hîn nav nehatibûn belav kirin. Wî got:

“Ehmed Hesen Bekir û cemaeta wî ev kiryar kirine. Bi gotina wî, diviya navên wan êvarê bi riya radyoyê bihata weşandin.”

❖ Di kabîneya yekem de du wezîrên baskê Barzanî hebûn, çima yê we nebû?

Di yekem kabîneya bi serokatiya Ebdul Rezaq Nayîf de du wezîrên girêdayî baskê Mela Mistefa bi navên Muhsîn Dizeyî û Îhsan Şêrzad hebûn, ji ber ku pêştir wan têkilî bi baskê Mela Mistefa re danîbûn.

Ehmed Hesen Bekir bû serokkomar, Ebdul Rezaq Nayîf bû serokê encumena wezîran û Îbrahîm Dawud jî bû wezîrê berevaniyê.

Yekser darbe rastî bertekan hat, xelkê wek plana kolonyalîzmê dan zanîn. Misrê ragihand; plana hevpar a Brîtanya û Amerîkayê ye, ji bo hilweşandina Eniya Rojhilat û dijminatîkirina Misrê û Sûriyeyê. Helwesta Sûriyan jî her bi wî awayî bû, digotin: Destê welatên erebî yên kevneperest û Îranê tê de hebûye.

Ebdul Rezaq Nayîf di konferansek rojnamevanî de ragihand: **“Nûnerê Kurd bi wan re ye û pirsa Kurd li ser bingeha Peymana 29’ê Hezîrana 1966’an çareser dikin.”**

❖ Têkiliya we bi Beisiyan re hebû, çima li şûna we baskê Barzanî di kabîneyê de beşdar bû?

Wê demê têkiliya me ya nêzîk bi Beisiyan re nebû û me nedizanî darbe hatiye kirin. Tenê Teyib Berwarî, Ebdul Xaliq Samerayî dîtibû, wî jî bêzariya xwe ji Beisiyan nîşan dabû û

gotibû: **“Beisî berguman diyar in, em nizanin çawa hatine ser desthilatê û kê ew anîne? Civîna me ya serokatiyê heye, ez ê li wê derê li ser biaxivim.”**

❖ Çi helwesteke we li hember siyaseta pişgtuhxistinê ya Beisiyan hebû?

20 yan 21’ê Tîrmeha 1968’an bû. Ez û Mamoste Îbrahîm Ehmed û Omer Debabe bi otomobîlê li cadeya Komarê ya Bexdayê digeriyan. Otomobîlek ku li pey me dihat bi lêdana kornê îşaret dida. Dema min bala xwe dayê, Sedam Hisên bû, bi îşaretê xwest em bisekinin. Me otomobîla xwe sekinand, ew peya bû ber bi me hat û li ser cadeyê me halê hev pirsî.

Ji min pirs: “Ew du kesên din kî ne?” Min jî got: “Mamoste Îbrahîm Ehmed û Omer Debabe ye,” Sedam got: “Hez dikim wan nas bikim,” min jî bangî wan kir û bi hev dan naskirin.

Min jê pirsî: “Tu diçî ku derê,” wî got: “Nexweş im û diçim ba bijîşik. Piştî wan çar rojên ku em bi wan kesên xirab re bûn ku hatin ser desthilatê, ez wisa difikirim tevahiya cîhanê ji me re didin xeberan. Eger a ku di mejiyê me de ye û ya ku di destê me de ye serî negire, wê hingê xelk dibêjin: Ew kurê keran, hemû sîxur û xizmetkarên kolonyalîzmê ne û bi xizmetkarên kolonyalîzmê re hatine ser desthilatê. Ewqas nîgeran im, ji ber nîgeraniyê nexweş ketime.”

Me soz da ku em hevdu bibînin û bi dirêjahî li ser pirsan bi-axivin.

Ji wê hevdîtina kurt me fem kir mesele çi ye? Min behsa wan gotinên Sedam Hisên ji Hazim Cewad re kir, ku hevalê min bû,

tevî ku Beisiyekî kevin ê mezin bû, lê wê demê dev ji Beis berdabû. Wî jî wiha bersiv da:

“Kekê Celal Sedam di nav wê partiyê de kesatiyekî girîng e, bi gotina min bikin û têkiliya xwe bi wî re xurt bikin.”

Roja paştir ez û Mamoste Îbrahîm Ehmed çûn cem Ehmed Hesen Bekir. Her tim wisa nîşan dida ku hejî mamoste dike, ji pişt maseyê rabû û hat li teniştê û li beramberî me rûnişt, behsa guhertinê hat kirin.

Min got: “Ez bêjim, siyadet el-reîs (Birêz Serok)! an bêjim Ebû (Bavê) Heysem? Çimkî me berê jê re digot Ebû Heysem”.

Got: **[**“**Wek berê, te xûyên xwe neterikandiye**

her çawa ku tu dixwazî, bêje.”**]** **(مثل السابق انت ما تجوز من عادتك)**

Min got:

[“Na heval Ebû Heysem, ev çi ye? Tu li ku û Ebdul Rezaq Nayîf li ku? Te ji ku derê anîn û çawa li hev kom kirin? Tevahiya xelkê dibêjin; ev (kesên) berguman û girêdayî (biyaniyan) ne.

(ولا رفيق ابو هيثم هاي شنو. انت وين و عبدالرزاق نايف وين؟ هل شكولات منين جبتهم شلون جمعتهم ؟ كل الناس يگولون هذولة مشبوهين ومرتبطين).“]

Piştî wê gotina min, bala xwe da Mamoste Îbrahîm û got: “Qet baweriya vî xortî bi me nayê **(هذا الشاب ابد ما يثق بينا)**.”

Ew li tenişta min bû, ji bo ku bandora axaftina xwe kêm bike, rabû û ez maç kirim û got: **[**“Sebir bike, lezê neke… gel me bêhnfireh be, hemû tiştek wek tu dixwazî, pêşde diçe

(اصبر علي، اصبر ... اصبر لا تكون مستعجل... اصبر علينا كل شي يسير بكيفك) .“]

Me fem kir navbera wan xweş nîne. Biryar bû em serdana Ebdul Rezaq Nayîf bikin ku dostî Kemal Muftî û efserê artêşê bû. Her gavekê ez didîtim, rêz û hurmetek mezin nîşan dida, li cem min gelek hişk derbarê Mela Mistefa diaxivî.

Em çûn cem wî û me pîrozbahî lê kir, min gotê: "Ev çi ye? Te çi digot û te çi kir?"

Wî jî got: **"Ev serdemek taybet e, ez dixwazim pirsgirêkan çareser bikim, ji bilî ku hûn kesên nîştimanperwer in, lê cihê we yê taybet di nav dilê me de heye".**

Min jê pirsî: **"Hûn ji Beisiyan natirsin û wiha bi hev re desthilatdariyê dikin?"**

Wiha got:

"Piraniya endamên Meclisa Serokatiya Şoreşê gel me ne, li encumena wezîran jî, 17 wezîrên me hene, yanî piranî em in, tu bi xwe jî dizanî ku Beis lawaz e."

❖ Beisiyan hûn ji Darbeya 30'yê Tîrmehê hisandibûn, her wisa ji we xwestin beşdarî hikûmetê bibin?

Belê. Berî Darbeya 30'yê Tîrmehê, Ebdul Rezaq Nayîf hat der kirin. Roja ew derkirin, hîn tiştek ranegihandibûn. Ez li mala Mamoste Îbrahîm Ehmed bûm. Ehmed Hesen Bekir telefon kir û min bersiv da, dixwest bi mamoste re biaxive, min telefon dayê û got:

"Mamoste Îbrahîm navê du wezîran bide, em hikûmeta nû ava dikin, her wisa got; niha guhdariya radyoyê bikin."

Ez li tenişta Mamoste Îbrahîm sekinîbûm, Ehmed Hesen Bekir got:

“Bêje wî xortî cem xwe, me nakokiyên navxwe yek alî kirin û me bersiva wan da, ez hikûmeta nû ava dikim, navê çend kesan ji bo beşdariya di hikûmetê de bidin.”

Pêşniyara wî bi vî awayî bû, ku ez û mamoste Îbrahîm beşdar bibin, lê Mamoste Îbrahîm got:

“Li gorî biryara kongreya çarem a Kelarê, em bi xwe nikarin di hikûmeta hevpeyman de beşdar bibin, lê ez ê navê du dostên me bidim, ew jî Fewzî Cemîl Sayîb û Teha Mihêdîn Meirûf e, her du zilamên gelek baş in.”

Wan Teha Mihêdin pejirandin, lê Fewzî Cemîl Sayîb red kirin. Piştre eşker bû, dema Ehmed Hesen Bekir fermandar bûye, kêfa wî bi Kekê Fewzî re nehatiye.

Her wisa di serdema Ebdul Kerîm Qasim de Fewzî parêzgarê Nasiriyê bûye, ji ber hinek gumanan ku li ser hebûne, kêfa neteweçiyan jê re nedihat, lewma razî nebûn bibe wezîr.

Tevî ku Teha Mihêdîn li balyozxaneya Iraqê li Londonê kar dikir, lê wezîrbûyîna wî hat qebûlkirin. Wê demê Teha bi navê Teha Hacî Mihêdîn dihat naskirin, lê jê re digotin; Teha Meirûf.

Beşdariya
Polîtburoyê di Hikûmeta Beis de

❖ Teha Mihêdîn kadroyê PDK'ê bû, we ji bo erka wezîr berbijêr kir?

Nexêr. Teha Mihêdîn dostê PDK'ê bû. Ehmed Hesen Bekir dixwest du endamên partiyê bibin wezêr, lê Mamoste Îbrahîm got: Em endamên partiyê ne û nikarin di hikûmetê de beşdar bibin, lewma pêşniyara du dostên partiyê dikin. Wezîrek dabûn me û yek jî dabûn baskê Mela Mistefa, lê cemaeta Mela Mistefa gotin: Ji ber ku Teha Mihêdîn beşdar e û girêdayî cemaeta Celaliyan e, em beşdar nabin, ji ber wê yekê wan beşdarî di hikûmetê de nekirin.

❖ Hûn li ser çi bingehekê di hikûmeta Beisiyan de beşdar bûn?

Çend caran em her du alî bi hev re civiyan û me li ser çend xalên girîng li hev kirin ku yên herî girîng ev bûn:

1. **Her du alî hevkariya hev bikin.**
2. **Xweseriyê bidin Kurd**
3. **Ew li Kurdistanê hevkariya me bikin da ku em xurt bibin û di paşerojê de em li Kurdistanê bibin desthilat. Sozdan ji bo vê yekê her çi pêwîst be ew ê bikin.**

Di hember de daxwazên me jî bi vî vawayî bûn:

1. **Pêngava pêwîst piştgiriya siyasî ye, divê karên baş ji bo gelê Kurd bikin.**

2. **Divê rêxistinên demokratîk wek xwendekaran, ciwanan, jinan, cotkaran bi azadî çalakiyên xwe bikin, em bikarin bi azadî rojnameyan biweşînin.**
3. **Alîkariya leşkerî û darayiya me bikin da ku yên ji Mela Mistefa bê hêvî dibin, bikişînin nav baskê polîtburoyê.**

Di hember de wan gotin:

“Ji bilî xweseriyê ku em nikarin niha rabigihînin, tevahiya daxwazên din ên we bi cih dînin, tevî ku em xweseriyê jî wek prensîb dipejirînin.”

❖ Rengvedana destkeftan, encama Peymana 29’ê Hezîrana 1966’an bû?

Belê. Di wê yekê de bû, rê hat dayîn rêxistinên girseyî eşkere çalakiyan bikin, Newroz wek cejneka fermî hat naskirin, zanîngeha Silêmaniyê hat vekirin. Duhok bû parêzgeh, Navenda Agahiyan a Kurdî (کۆری زانیاری کورد) hat damezrandin. Îzna çalakî û xebata “Yekîtiya Nivîskarên Kurd” hat dayîn, her wisa kovarên Rizgarî û Beyan hatin weşandin, gel rêdayîna bi çendîn karên din.

Me li ser xweseriyê li hev kiribû, hetta dema me Mîşêl Efleq dît, wî got: “Em dayîna xweseriyê dipejirînin, lê divê hinekê li ser me bisekinin”.

Salih Mehdî Emaş Kurdî jî got: **“Wek cara din nekin, bêjî Mela Mistefa qebûl nake, wek sozeka bi rûmet û camêrane, em ê xweseriyê bidin, lê pêwîstiya me bi heyamekê heye, kêmekê mecalê bidin da ku em hinekê xwe bigirin”.**

❖ Tê gotin li ser pirsa Kurd nêrînên ne wek hev di nav Beisiyan hebû, ev çiqasî rast e?

Belê. Di nav Beisiyan de du bask hebûn. Baskek ji van kesan pêk dihat:

Ebdul Xaliq Samerayî, Ebdullah Selûm Samerayî, Salih Mehdî Emaş û hinek Beisiyên kevin wek Şazil Taqe, Murteza Hedîsî, Ebdul Kerîm Şêxlî, ku paşê Şêxlî bû wezîrê derve û piştre Sedam ew kuşt. Wê cemaetê dixwestin bi me re li hev bikin.

Bi taybet nêrîneka gelek zelal a Ebdul Xaliq Samerayî derbarê pirsa Kurd hebû û digot: **"Li Iraqê du netewe hene, neteweya Kurd û neteweya Ereb û di wê bare de çendîn gotar nivîsîbû û bal kişandibû ser vê yekê ku her du netewe jî hatine parçe kirin, ew wek Ereb ew beşek ji neteweya Ereb in û em jî beşek ji neteweya Kurd in."**

Di nivîsa xwe de gotibû: Li ser bingehê wê rastiyê, divê em xweseriyê bidin Kurd û di encamê de her du alî xurt dibin û Iraq dibe navenda serhildana Kurd û Ereb. Bi wê armancê jî divê em pirsgirêkên navbera xwe çareser bikin. Helwesta wî li hember Mela Mistefa baş nebû û wek zilamekî kevneperest dizanî ku têkiliya wî bi Îsraîlê re heye.

Baskê din yê Beis, baskê Sedam Hisên, Seidûn Şakîr, Teha Cezrawî û koma Sedam bû, wan wek xeterekê bala xwe didan me û digotin:

"Partî ango baskê polîtburoya PDK'ê ji Barzanî metirsîdartir in, ji ber ku Barzanî tekane kes e, eger em bikujin dawî pê tê lê ev cemaet partiî ne zêde dibin û xelk bi wan re ye, xwestekên wan ji Barzanî jî zêdetir in."

Gotinek min a girîng heye ku ji bo dîrokê dikim. Fuad Arif ji zarê Sedam Hisên vegot: Sedam bangî min kiribû, ez çûm cem

wî, got: “Biçe ba Mela Mistefa”, min jî gotê: **“Têkiliya me bi koma partiyê (baskê polîtburoyê) heye.”**

Lê wî got: **“Keko ne kom in, belkî gelek metirsîdartir in ji Mela Mistefa, Mela Mistefa behsa xweseriyê nake, koma partiyê bi xweseriyê jî razî nabin û dewa federaliyê ji me dikin.”**

Bandora wan nêrînên me hebûn, xaleka din ku dibû sedema dilgiraniya wan, têkiliya me bi Cemal Ebdul Nasir re bû, wek mînak, di cejnan de me peyam dişand, rojnameya me ya El-Nûr di rûpela xwe ya yekem de, nûçeyên şerê wê demê di-weşand. Di demekê de, rojnameyên din ên Iraqê behsa şer nedikirin.

Carekê Ebdul Nasir di nameyeka xwe de rexne li Ehmed Hesen Bekir girtibû û gotibû:

“Ne tenê hûn şer nakin, hetta nûçeyên şer jî naweşînin. Ro-jnameya El-Nûr diweşîne ku rojnameyeke koma Kurdî ya nîştimanî ye.”

Wê demê rojnameya El-Nûr tekane rojname bû, nûçeyên şer diweşand.

❖ Çi bandoreke rojnameya El-Nûr li ser pêvajoyan hebû?

Ya rast rojnameyeka bi nav û deng bû. Rojnameya herî baş a wê serdemê dihat hesabê û rojane 30-40 hezar jimareyên wê dihatin firotin, ku ji bo wê hingê asta herî bilind bû.

Kêfa xelkê ji rojnameyên hikûmetê re nedihat. Munzir Mûsilî di pirtûka xwe ya bi navê “El-Ereb û El- Ekrad” de behsa ro-jnameya El-Nûr dike û dibêje: Wek penaberên sûrî li Iraqê

sibehan berî rojnameyên din, me El-Nûr dixwend, ji ber ku rojnameya herî baş a wê serdemê bû.

❖ Nivîskarên sereke yên rojnameya El-Nûr kî bûn?

Beşek mezin ji bebetên rojnameyê Mamoste Îbrahîm Ehmed dinvîsîn, Hîlmî Elî Şerîf, Ebdul Rehman Zebîhî, Seyîda Teyib Berwarî û hejmarek nivîskarên ciwan, di rojnameyê de kar dikirin û babet dinvîsîn. Mecîd Kerîm birayê Mamoste Ceifer, yek ji wan bû. Hinek rojnamevan jî me anîbûn, karê wergêranê dikirin. Wek mînak ji bo 100 saliya jidayikbûna Lenîn, me pirtûkek derbarê jiyana wî wergerand ku bi awayê xelek di rojnameyê de dihat belav kirin.

Bi kurtî gelek rojnamevanên pêşverû yên Iraqê gel me kar dikirin, wek mînak dikarim balê bikişînim ser Ezîz Sibahî ku wergêrê herî baş bû[34].

.....

[34] Dr. Fayiq Betî di Ansîklopediya Rojnameyên Kurdî de li Iraqê (**الموسوعة الصحفية الكردية في العراق**) bi vî awayî behsa **rojnameya El-Nûr** dike:

El-Nûr, rojnameyeka rojane ya bi zimanê erebî bû ku **26.09.1968'an** destûra weşana wê ser navê parêzer Kemal Mihêdîn, parêzer Omer Debabe, Hîlmî Elî Şerîf, Xalîd Dilêr û Mihemed Hesen Birzo hat dayîn.

El-Nûr **ji aliyê Polîtburoya PDK'ê yan Komeleya Mamoste Îbrahîm Ehmed û Celal Talebanî ve dihat piştgirîkirin**. Di heyamek kurt de El-Nûr bû yek ji rojnameyên herî girîng ên wê serdemê, ku **rojane 30 hezar jimareyên wê dihatin weşandin û firotin**. Hejmarek ji nivîskar û rewşenbîrên Ereb babet tê de dinvîsîn wek; Kazim Semawî, Fayiq Betî, Ezîz Sibahî, Mihemed Hamid û Sadiq Nezdî. Weşandina wê heta 11'ê Adara 1970'yan dewam kir.

Şerê Navxweyî yê PDK'ê

❖ Xurtbûna we bandor li têkiliya we û baskê Barzanî ne-kir?

Piştî ku em xurt bûn, cemaeta Barzanî dest bi amadekirina hêzê ji bo jinavbirina me kir. Behsa vê yekê dikin ku li Bekre-coyê êrişî me dikin. Her di wê çarçoveyê de bû Tahîr Elî Walî Beg ji milê Taslûceyê ve êrişî me kir, lê hat şikandin û paşde reviya.

Hikûmetê alîkariya çek ya me kir. Destpêkê hejmara Hêza Pêşmerge nêzîkî 700-800 kesan bû, piştre me gihand 2000-3000 kesan. Piraniya navçeyên Şarbajêr di dest me bûn. Her wisa hêzên me li tevahiya navçeyên Çemê Rêzanê, Sûrdaş, Deşta Şuwan, Şêx Bizên û deşta Koyeyê digeriyan.

❖ Geko plana we ya şerê li dijî Barzanî hebû, cara yekê kê dest bi êrişan kir?

Şer di navbera me û cemaeta Mela Mistefa de dest pê kir. Cara yekem wan dest bi şer kirin, di hember de me dixwest wan lawaz bikin.
Me karî li du-sê aliyan de wan bişkênînin, li çend aliyên din de jî me dest bi êrişan kirin. Hinek caran wan û hinek caran me dest bi êrişan dikir, lê serdestî û însiyatîva meydana şer di dest me de bû, çimkî me ji bo Kurd destkeft bi dest anî bûn.

Berî me, Mela Mistefa bi çend hikûmetên Iraqê re têkilî danîbû, wek mînak, gel Ebdul Selam Arif, Tahîr Yehya û Ebdul Rehman Arif, wan hemiyan tu tiştek ji Kurd re nekirin. Lê tenê pênc- şeş meh bûn, em bi Beis re rêkeftibûn, me karîbû hejmarek destkeftên berçav bi dest bînin.

Li her derekê hêza me ya çekdar hebû, gelek bajar û bajarokên Kurdistanê hêdî hêdî diketin desthilata me û li piraniya bajarên Kurdistanê baregah û pêşmergeyên me hebûn. Me çalakiyên cur bi cur dikirin, hetta bajarên Behdînan wek Amêdî û Duhokê di dest me de bûn.

Di dawiya sala 1969'an de, min têkiliyek bi Mela Mistefa re danî, çimkî xelkekî zaf daxwaza lihevkirinê li me dikirin. Di hember de min ji yek ji wan kesan re got**: "Tu bi xwe bibe wekîlê me, lê Mela Mistefa lihevkirinê naxwaze, tevî ku niha rewşa me gelek baş e, lê em amade ne pê re li hev werin."**

Wan gotinên me bawer nedikirin, rojê bi dehan çekdaran Mela Mistefa bi cih dihîştin û dihatin ba me. Wê demê hejmara pêşmergeyên me gihîştibû sê heta çar hezar kesan.

❖ Kê pêşniyar kir, hûn bi Barzanî re li hev werin?

Yê ku rasterast bi min re têkilî danî, Hemze Ebdullah bû, lê wî Fuad Arif erkdar kiribû û min li mala Burhan Begê Caf, Fuad Arif dît û min gotê: **"Kekê Fuad biçe hewl bide, em amade ne bi Mela Mistefa re li hev bikin."** Wê demê rewşa baskê Mela Mistefa baş nebû, di encamê de razî bibû.

Em wiha difikirîn, niha hikûmet razî ye, tiştekê ji me re bike lewma baştir e em li hev werin. Dema yekbûnê dibe ku hikûmet mafê xweseriya me jî bipejirîne.

Hikûmet pê hisya bû û li dijî wê hewla me bû. Her wisa vekişiyana me li ser pirsa Kerkûkê ji kongreya xwendekarên Iraqê, têkiliya me ya bi Misrê û Cemal Ebdul Nasir re ser hev bûn sedem da ku Partiya Beis di bin bandora helwesta Sedam Hisên de dijatiya me bike.

Peymana
11’ê Adara 1970’yan

❖ Çima hikûmeta Beis Peymana 11’ê Adarê gel we îmze nekir lê gel Barzanî îmze kir?

Hikûmetê behsa peymana xwe ji me re kir, lê wan di nav xwe de ev yek dinirxandin, ku gel kîjan beskê PDK’ê peymanê îmze bikin?

Piştre gel Barzanî îmze kirin. Eger hikûmetê ew peyman gel me îmze kiriba, wê demê me dikarbû bigota; êdî dawî bi Mela Mistefa hatiye, lê dema ku gel wî îmze kir, bi vê wateyê bû ku ji rûyê siyasî em nehatin hesabê.

Piştî 11’ê Adarê helwesta Beisiyan li hember me bi temamî hat guhertin û dest bi dijminatiya me kirin. Li Silêmaniyê cezayê bidarvekirinê ji Newşîrwan Mistefa re birîn, ji ber wê yekê me Newşîrwan veşart.

Lê hikûmeta Beis xortek bi navê “Cemal Ehmed Koçer” bi vê hincetê ku qaşo bombe avêtiye xwendingeha keçan a navincî li Silêmaniyê bi darve kir, ku tu rastiyek wê kiryarê nebû û tenê komployek li dijî me bû. Wê serdemê Mamoste Îbrahîm Ehmed nexweş bû, roj bi roj lawaz û jar dibû.

Me li tevahiya klînîkên bijîşkî yên Bexdayê gerand lê bêfeyde bû. Li malê di nav cihê bû, rojekê Sedam Hisên hat serdanê, ez jî li wê derê bûm, got: Çima hûn Mamoste naşînin Londonê? Di bersivê de min got:

“Ya rast nehatiye fikra me. Got: Sibe em ê pasport û pêdiviyên şandina wî amade bikin û tu bi xwe jî were ba min.”

Roja paştir ez çûm cem Sedam, pasporta Mamoste Îbrahîm Ehmed amade bû, her wisa hinek pere jê re xistibû nav pakêtekê, ya rast min nezanî çiqas e, li ser pakêtê nivîsîbû: “Digel Silava Cîgirê Serokê Meclisa Bilind a Şoreşê”. Piştî wê yekê, me Mamoste Îbrahîm Ehmed şand Londonê.

❖ Peymana 11’ê Adarê wek serketineke mezin a siyasî dihat zanîn, helwesta we çawa bû?

Me biryar da pişta Peymana 11’ê Adarê bigirin, tevî ku me wek partî ji wê peymanê ziyan dîtibû, lê di berjewendiya gelê Kurd bû, lewma me dijatiya wê nekir û di çend jimareyên ro-jnameya El-Nûr de, me bi weşandina gotaran piştgiriya xwe ji peymanê re nîşan da.

Beşa Sêzdehem
13
Lihevhatin û Yekbûn

- Helwesta Barzanî piştî 11’ê Adarê
- Lihevhatina Barzanî û polîtburoyê
- Hilweşandina PDK’ê (baskê polîtburoyê)
- Rêxistina Komeleya Rencderên Kurdistanê
- Şerê navxweyî û hikûmeta Bexdayê
- Barzanî piştî 11’ê Adarê

Helwesta
Barzanî piştî 11’ê Adarê

❖ Piştî 11’ê Adarê helwesta Barzanî li hember we çawa bû?

Mela Mistefa piştî heyamekê Faxir Mêrgesorî şand pey min. Wî têkilî bi min re danî û got: **“Peyama cenabê Barzanî bi min re ye û dixwazim serdana te bikim.”**

Û got: “Ez ê sibe serdana te bikim.” Min jî got: “Sibe em ê li mala Mamoste Îbrahîm hevdu bibînin û nanê nîvro jî bi hev re bi bixwin.” Got: “Gelek baş e.”

Faxir Mêrgesorî bi 10-12 kesan ve hat. Me gelek bi rêz û hurmet pêşwazî li wan kir. Piştî nanxwarinê, ji min re got: Ya rast dixwazim tiştekî tenê ji te re bêjim. Em cihê axivîn, Faxir wiha got:

Mela Mistefa ez şandime pey te û got:

“Bêje Celal bila were ba min, dixwazim tiştekî bêjmê û zoza zilaman didim, eger me li hev nekir, bi selametî vegere.”

Min wiha bersiv da:

“Faxir, ez bi gotina te dikim, li ser berpirsyariya te wê yekê jî dikim, tu bi rûmeta xwe gelo Mela Mistefa naxwaze min bigire?”

Got: **“Bi rûmeta xwe sond dixwim, rast dibêje û te nagire.”**

❖ Çi salekê Faxir Mêrgesorî serdana we kir?

Serdana Faxir Mêrgesorî di heftê Tebaxa 1970’yan de bû. Piştî razîbûna hevalan, ez bi pênc-şeş çekdaran ve gel Faxir

çûm serdana Mela Mistefa. Dema em ji Rewandizê derbas bûn, xelk li ser cadeyê sekinîbûn. Seidûn Xeydan û Murteza Hedîsî ji cem Mela Mistefa vedigeriyan, Mesûd û Îdrîs heta wê derê hatibûn û şande bi rê dikirin.

Faxir bilez Mesûd pê hisand ku Mam Celal gel wî ye, her du hatin, bi rastî Mesûd û Îdrîs gelek bi germî xêrhatina min kirin, lê Dr. Mehmûd gelek sar destê xwe da min, di hember de min jî her bi sarî destê xwe dayê.

Endamên Şandeya hikûmetê dema ez dîtim gelek şok bûn û gotin: **“Tu li vir çi dikî?”**

Min jî pirsî: “Hûn li vir çi dikin?” Gotin em hatibûn serî li Barzanî bidin, her ji rûyê wan ve xuya bû, ji dîtina min aciz in, bi awayekî ku ji bo wan helal be û ji bo min heram.

Lihevhatina Barzanî û Polîtburoyê

❖ Yanî çûyîna te destpêka lihevhatina we bi Barzanî re bû?

Belê wiha bû. Em êvarê gihîştin baregeha Barzanî, her zû Barzanî hat û bi germî halê min pirsî, Samî Ebdul Rehman û hemû kurên Barzanî rûniştibûn, hemiyan gelek bi germî xêrhatina min kirin. Mela Mistefa bala xwe da min û got:

“Celalê dîn, diviya tu gelekî zûtir li vir bayî, kerem ke bala xwe bidê te çi anî serê min û serê xwe?”

Piştre got cemaetê:

“Ez û Celal hevalên kevin in, em ê biçin wê odeyê û axaftina me ya taybet heye.”

Mela Mistefa axivî û got: **“Celal rast e dema ku wezîrê navxwe û cemaeta pê re tu dîtin, gelek şok bûn?”**

Wê demê Seidûn Xeydan wezîrê navxwe yê Iraqê bû. Min got: **“Kîjan wezîrê navxwe? Wezîrê navxwe yê cenabê te yan wezîrê navxwe yê Iraqê?”**

Mela Mistefa got: **“Na na, Seidûn Xeydan, ma yê min kî ye?”**

Min got: “Tişt nabe, em ê paşê li ser wê yekê biaxivin.”

Diyar bû Mesûd û Îdrîs jê re gotibûn: Dema dîtina Celal, Dr. Mehmûd jî şok û matmayî bûye.

Gelek caran (Barzanî) digot leinet li Celalê dîn û hevalên wî ku bûn sedem ez bibim hevalê van kesan! Wê demê ji Dr. Mehmûd razî nebû.

Em derbasî odeya din bûn, Mela Mistefa dest bi axaftinê kir, ya rast edetek wî hebû, çend caran meseleyek dubare dikir, diviya beramberê wî bêdeng ba heta axaftina wî bi dawî dibû. Behsa çend mesele û pirsan wek me çi kiriye û çi gotiye kir. Axaftina wî bi dawî bû.

Di hember de min got: **“Ez axaftina li ser wan pirsan gelek girîng nabînim, lê hemû kêmasî ya mirovekî bi navê Mela Mistefa Barzanî bû.”**

Min hinek mesele û pirsgirêk anîn bîra wî wek meseleya Sengeserê ya ku min serdana wî kir û min gotê: **“Tu bûyî sedem, berevajî ew mesele nediqewimîn, cara dawiyê jî min**

Fuad Arif şand cem te, min behsa tevahiya wan pirsgirêkan kir yên di navbera me de qewimîbûn."

Mela Mistefa got:"Tu rast dibêjî, lê niha tu çi dibêjî?"

Min jî got: "Ez hetime ba cenabê te dixwazim bizanim tu çi dibêjî?"

Lê wî got: "Ez dixwazim nêrîna te bizanim?"

Min got: **"Em niha partiyek biçûk in, partiya te mezintir e, em tên Kurdistanê û di bin rêberiya te de wek partiyekê xebata xwe dewam dikin."**
Min jê pirsî: **"Tu derbarê Peymana 11'ê Adarê çawa difikirî? Gelo ev peyman serî digire, pirsa me çi lê tê?"**

Mela Mistefa bersiv da û got: Hinek pirsên girîng hene, divê tu bizanî û wiha bal kişand ser wan pirsan:

"Yekem: Beisî rast nabêjin, ew fêl û hîleyan li me dikin, ez rewşê gelek metirsîdar dibînim, tu çaxan qet wek vê qonaxê min xwe di xeterê de nedîtiye, xelk wisa difikirin em serketî ne lê ne wisa ye.

Duyem: Îbrahîm Ehmed û Omer Debabe xwe wek kesên siyasî dizanin, lê tiştekî ji dinyayê fem nakin. Bêje wan: **Wele wê rojê ku Mela Mistefa li Bexdayê were bidarvedikin, aliyê rastê wî Îbrahîm Ehmed dê were bidarvekirin, aliyê çepê jî Mam Celal dê were bidarvekirin, Omer Debabe jî li tenişta wan dê were bidarvekirin. We mesele şaş fem kiriye, çarenivîsa me hemiyan bi hev re girêdayî ye, ev hikûmet dijî me hemû Kurdan e."**

Wan gotinên Mela Mistefa bandorek mezin li min kir, şiroveya wî li gorî min gelek rast bû û bi rastî çû nav kûrayiya dilê min, ji ber wê şiroveyê, min gotê: **"Tu dibêjî em çi bikin?"**

Got: **“Ez dixwazim em her du alî bibin partiyekê.”**

Min gotê: **“Ez qebûl dikim, lê nizanim hevalên me dê çi bêjin?”**

Mela Mistefa wiha axivî:

“Celal ez soz didim, tenê tu hewl bide hevalên xwe razî bike, da ku em bibin yek. Çawa dema Hemze Ebdullah min alîkariya we kir û li hember wan sekinîm, vê carê jî ez ê li hember dijberên hevgirtinê wisa alîkariya we bikim û piştî heyamekê partiyê bispêrim destê we.”

Min jî got: **“Em naxwazin partiyê ji te bistînin, bila li gorî şiyana her kesî erk bi wî were sipartin.”**

Min gotê: **“Ez razî me, lê divê biçim û bizanim hevalên me çi dibêjin.”**

Mela Mistefa got: **“Tu ji bo min kesekî girîng î, çawa ku dizanî pêştir jî min di nameyekê de ji te re behsa wê girîngiyê kiribû.”**

Dema ku Mela Mistefa di nav Hêza Pêşmerge de darbeya leşkerî kir û cemaeta polîtburoyê jê cuda bûn, ez li Zêweyê bûm, nameyek ji min re şandibû û tê de nivîsîbû:

“Were ba min, gel cemaeta polîtburoyê neçe, bi rastî ez hejî te dikim, ba min tu kesekî rêzdarî, were ba min, sê caran ew xwesteka xwe dubare kiribû. Piştre ayetek nivîsîbû ku Nûh wê ayetê ji kurê xwe re dibêje û bi vî awayî ye: ‘Ey kurê min bi me re siwarî keştiyê bibe û bi gelê kafir re nebe (يا بنى اركب معنا ولا تكن مع القوم الكافرين).’ ”

Wê nemeyê deng vedabû, her wisa di rojnameyê de jî hatibû weşandin.

Mela Mistefa got: **“Bîra te tê dema cudabûna polîtburoyê min ji te re nameyek şand, lê te bi gotina min nekir û nehatî ba me, niha jî hez dikim hûn werin.”**

Min gotê: **“Baş e, lê tecrubeyek min a tal gel te heye, dema em ji Îranê vegeriyan te soza şeş mehan da, lê te paşê hinek kes şand da ku me bikujin, Elî Hemdî jî wisa lê hat, te hinek kiryar li dijî me kirin.”**

Mela Mistefa dayîna biryarek wisa înkar kir û got:“Çawa destê min diçe te bikujim?”

Ya rast min newêra bêjmê ku filan kesî bi xwe ji min re gotiye.

Min gotê: **“Ez ê biçim û bi hevalan re biaxivim, me her biryarek da, ez ê te agahdar bikim.”**

Kurên wî jî rûniştibûn, dest bi gotnên xweş kirin û got: “Celal dibêjin tu zewiciyî.” Wê demê Hêro destgiriya min bû.

Di bersivê de min got: “Rast e ezbenî.”

Got: “Pîroz be, lê tu li malê wêrek î yan tirsek?”

Min gotê: **“Xelk li ser ola padişahên xwe dibin (الناس علي دين ملوكهم) û min îşaretî wî kir, cenabê Barzanî çawa be, em hemû li ser riya wî ne.”**

Bi wê gotinê, hemû bi hev re keniyan, Mela Mistefa jî keniya û derket, Ubeydê kurê wî got: **“Celal hîn rojek derbas nebûye te dest bi henekan kir.”**

Min gotê: **“Ji berê ve ez cenabê Barzanî nas dikim, çawa ku bi xwe jî got, em hevalên kevin in, niha lutfa wî ji bo min heye, ji her derê ve qetiyabe, ez ê ji wê derê ve girêbidim, xwe ji destpêkê ve dest pê nakim.”** Carek din hemû keniyan.

Piştre Mela Mistefa got:“Tu dê çend rojan ba me bî?”

Min wiha bersiv da: “Tu çend rojan bixwazî ez ê bimînim, lê her çend zûtir biçim ba hevalan baştir e, dîsa jî tu dizanî.”

Got: “Çend rojên din jî bimîne.”

Em wê şevê li wir man, roja paştir me bi hev re nanê nîvro xwar, her yek ji Ubeyd, Mesûd, Îdrîs û Loqman amade bûn.

Faxir Mêrgesorî got: **“Em dixwazin komîteya navendî biguherin, bi taybet Hebîb û Dr. Mehmûd, çimkî Mela Mistefa gelekî ji destê wan aciz e, serdema niha ya zilamên nişтimanperwer e gel ereban.”**

Mela Mistefa her kesek ji bo aliyekî û serdemekê dixwest, wek mînank; xurtkirina têkiliyan bi Sovyetiyan re dispart Dara Tofîq, ya Brîtanyayê dispart Şefîq Layînî, niha ku me bi Ereban re li hev kiribû û têkiliya me bi wan re baş bibû û di nav Ereban de, em hatibûn naskirin, pêwîstiya wî bi kesên wek me hebû. Ya rast di wan waran de gelekî jîr bû.

Ez du-sê rojan ba wan mam, gelekî hurmeta min girtin û min gelek kes jî dîtin, piştre vegeriyam Bexdayê.

❖ Mesûd Barzanî dibêje:“Piştî 11’ê Adarê ji bo lihevhatnê we kesek bi navê Reşîd şandiye cem Barzanî,” ew kî bû?

Ew yek ne rast e, çawa ku min ji te re go: Ji aliyê Barzanî bi xwe ve pêşniyar hat kirin û me kes neşandibû.

Ji destpêkê ve jî me lihevhatin nedixwest û tu biryarek me jî nebû em bi Barzanî re li hev werin, Belkî me biryar dabû em xebata xwe li ser hundir û derve de parve bikin.

Ez kesekî bi wî navî nas nakim ku tu behsa wî dikî û dibêjî xwedêgiravî me şandiye cem Barzanî.

Hilweşandina PDK'ê (Baskê Polîtburoyê)

❖ Piştî vegera te ya ji cem Barzanî, helwesta hevalên we çawa bû?

Piştî ku ez ji cem Barzanî vegeriyam, destpêkê em li hev civiyan, piştre me konferansek li dar xist û biryara hilweşandina partiya xwe da û me navê partiyê guhert û kir "Partiya Şoreşger a Kurdistanê".

15'ê Cotmeha 1970'an şandeya me ya pêkhatî ji Mamoste Îbrahîm Ehmed, Omer Debabe û Elî Eskerî çû serdana Mela Mistefa, beriya ku lihevhatin bê eşkerekirin; wan li ser bingeha beşdariya yek ji sêyê tevahiya saziyên partiyê û rêxistinên pîşeyî û girseyî li hev kiribûn, ji bilî komîteya navendî.

Hevalan gotin: Komîteya navendî dicive û kongreyekê jî li dar dixin. Mela Mistefa soz daye di heyama salekê de kongre bê lidarxistin û li gorî şiyan û lêhatibûnê erk bi hevalên me bê sipartin. Di wê çarçoveyê de me konferansa xwe li dar xist û tê de biryara hilweşandinê hat dayîn û lihevkirina bi Barzanî re jî hat pejirandin[35].

……

[35] Derbarê xwehilweşandina Partiya Demokrat a Kurdistanê (baskê polîtburoyê) Dr. Mihemed Sabîr, Mamoste Cemal Ebdul (kadroyên payebilind ên partiyê) û Kemal Mihêdîn (endamê polîtburoya wê partiyê) dibêjin:

Dewam dike →

Roleke gelek baş a Mela Mistefa di bicihhanîna lihevkirinê de hebû, lê Dr. Mehmûd û Samî Ebdul Rehman gelek astengî li hember lihevkirinê çê kirin. Helwesteke baş a kurên Mela Mistefa li hember daxuyaniya hevpar hebû, ku rê li ber pêvajoya lihevhatinê hêsan dikir. Daxuyanî bi razîbûna her du aliyan hat nivîsandin, me navê "Înzimam" (Tevlîbûn) li daxuyaniya xwe kir. Hikûmeta Iraqê li hember wê lihevkirina me gelek aciz diyar bû.

Li vir ez dixwazim behsa tiştekê bikim: Zilamekî sûrî wê demê li Bexdayê bû, di hevdîtinekê de gotibû Mamoste Îbrahîm:

"Çawa hûn şerê Mela Mistefa dikin, ew mezinê Kurda ye?" Her ew zilamê sûrî piştî Peymana Adarê hatibû cem Mamoste Îbrahîm û gotibû: "Hûn çawa dikarin bi Mela Mistefa re li hev bikin? Çimkî ew kesekî eşîr û kevneperest e."

Piştî ku ew zilamê sûrî çû, me jê pirsî: "Wî çi digot?" Mamoste Îbrahîm got:
"Wele mirov nizane gel van kurê san çawa reftar bike? Li hev dikî dibêjin: 'Çima li hev dikin?' Li hev nakî dibêjin: 'Çima li hev nakin?'"

……

→ Dewama [35]

Kongreya xwehilweşandina baskê polîtburoyê di 17.11.1970'yan de li baregeha polîtburoya PDK'ê ya li Bexdayê hat lidarxistin û tê de 150 endam beşdar bûn, ku **nûnertiya tevahiya rêxistinên partiyê li navxwe û derveyî** welat dikirin.

Roja çarem a kongreyê **bi piraniya dengan biryara yekbûnê bi baskê Barzanî re hat dayîn**. Piştî pêkanîna komîteya diyarkirina mekanîzma yekbûnê, biryar hat dayîn ew komîte serdana Barzanî bike, piştî vegerê beşa duyem a kongreyê bê lidarxistin û biryara dawiyê bê dayîn.

Piştî vegera şandeyê **beşa duyem a kongreyê di 10.12.1970'yan de** li mala Mamoste Îbrahîm li Bexdayê hat lidarxistin û ji bo tevlîbûnê biryara dawî hat dayîn. **Piraniya 93 endamên beşdar deng dan yekbûnê, tenê 12 endaman deng nedan ku yek ji wan Mam Celal bû.**

Piştî Peymana 11'ê Adarê, rojekê ez û Elî Eskerî çûn ba Seidûn Xeydan, wî pirsî:

"Kekê Celal, cemaetek nîştimanperwer û pêşverû wekî we çawa dikarin gel Mela Mistefa pêk werin û bi hev re bijîn?"

Di bersivê de min got: "Ez gotinekê ji te re vebêjim?" Got: Kerem ke. Min behsa meseleya wî zilamê sûrî ji Seidûn re kir û min got:

"Nizanim gel van kurê san çi bikim? Em şer dikin, dibêjin: 'Çima şer dikin?' Li hev dikin, dibêjin: 'Çima li hev dikin?'"

Seidûn Xeydan ji mebesta min tênegihîşt û bilind keniya û got: **"Bi Xwedê kekê Celal rast e** (والله صدق كاك جلال)."

❖ Rast e Mamoste Îbrahîm di hizûra Elî Eskerî û Omer Debabe de gotiye Barzanî: "Em şaş bûn kurdayetî û nîştimanperwerî li cem te ye?"

Min tiştekî bi vî awayî nebihîstiye.

❖ Piştî hilweşandina partiya xwe, we bi Barzanî re xebat kir an nêrîna we ne wek hev bû?

Li gorî şertê Mela Mistefa piştî lihevkirinê diviya çend kes ji me biçûna ba wan. Ebdul Rehman Zebîhî û Hîlmî Elî Şerîf qebûl nekirin biçin, Ez, Mamoste Îbrahîm,Omer Debabe, Elî Eskerî çûn. Me Newşîrwan Mistefa jî gel xwe bir, çimkî li ser bûyera bombeavêtina nav xwendingehê cezayê bidarvekirinê lê hatibû birîn, da ku riyekê ji bo şandina wî ya derve peyda bikin. Em pênc kes çûn xizmeta Barzanî.

❖ We li wê derê çi dikir, hûn serbest bûn bixebitin?

Em heyamekê li wê derê man. Ya rast Mela Mistefa tu şertekî me bi cih neanî. Zêdetir em di bin çavdêriyê de bûn, nedihîştin xelk serdana me bike. Ji bilî cemaeta wan û yên wan bi xwe dixwestin, rê nedidan kesên din serî li me bidin.

Zêdetirî salekê derbas bû, wan tu sozek xwe bi cih neanîn. Biryar bû kongre were lidarxistin û erk bi me bê sipartin, ew jî nehat kirin.

Di 29'ê Îlona 1971'an de hewla ji navbirina Mela Mistefa hat dayîn, ew jî bi riya xweteqandina çend kesan bû ku ji aliyê hikûmetê ve hatibû plankirin da ku Mela Mistefa bikujin. Piştre eşkere bû destê Sedam Hisên di wê bûyerê de hebûye, tevî ku destpêkê înkar kirin.

Zêde bandora rewşa Kurdistanê û nav PDK'ê li ser Barzanî nebû, da ku bibe sedem, kongre bê lidarxistin û li gorî şiyan û lêhatîbûnê erk bi endaman bê spartin û roleke me jî hebe, lewma em li wir wek biçavkiriyan bûn.

❖ Mesûd Barzanî dibêje: "Dema yekbûna polîtburoyê û Barzanî, Omer Debabe û Elî Eskerî gotine: 'Milyonek û 400 hezar dînar winda bûye ku cem te û Mamoste Îbrahîm bûye?'"

Yekem: Yek fils jî ba min nebû, pereyê partiyê li cem Ebdul Rehman Zebîhî û Omer Debabe bû, ba Mamoste Îbrahîm Ehmed jî nebû.

Duyem: Bi dirêjahiya temenê xwe yek milyon û 400 hezar dînarên partiyê nebû, çimkî hikûmeta Iraqê mehê 58 hezar dînar wek alîkarî dida partiyê, lewma tiştekî wisa bi tu awayî nebû.

Derbarê darayiya partiyê, dixwazim bêjim: Dema ku me Partiya Demokrat a Kurdistanê (baskê polîtburoyê) hil-weşand, hinek pereyên me hebûn, beşek ji wî pereyî bi qasî 50 hezar dînarî ba min bû, ku Mamoste Îbrahîm, Omer Debabe û Zebîhî haj pê bûn. Min piraniya wî pereyî di hejma-rek çalakiyan de xerc kir.

Rêxistina
Komeleya Rencderên Kurdistanê

❖ Piştî ku di nav partiyê de xebata we hat astengkirin, we çi kir?

Nepenî dest bi avakirina Komeleyê kir. Piştre ez ê bi awayekî taybet behsa avakirina komeleyê bikim. Ez û Newşîrwan Mistefa komele bûn, lê wê demê hîn komele aktîv nebû.

Mamoste Îbrahîm, Omer Debabe û Elî Eskerî nedizanîn ku ez komele me û min nedixwest eşkere bibe, eger eşkere biba ez ê ji aliyê PDK'ê û Mela Mistefa ve bihatima kuştin.

Her wisa em pê hisiyan Mela Mistefa dest bi danîna têkiliyan bi Îran, Îsraîl û Amerîkayê re kiriye.
Serdana Dr. Mehmûd û Îdrîs a Amerîkayê di 30'yê Hezîrana 1972'yan de û dîtina Serokê wê demê yê Ajansa Îstixbarata Navendî (CIA) Richard Helms, bû sedema sarbûna têkiliya me û Mela Mistefa, çimkî wê serdemê her kesî têkilî bi Amerîka û Îranê re dayna, ew yek wek kifir dihat hesabê[36].

❖ Eger siyaseta Barzanî ne bi dilê we bû, çima hûn ji nav partiyê derneketin?

Min bi xwe nedixwest li wê derê bimînin.

……

[36] Goran Îbrahîm Salih di pirtûka xwe de bi navê "**Tevgera Kurd di Xeleka Têkiliyên Amerîka û Iraqê de**" wiha dibêje: Di serdana **30'yê Hezîrana 1972'yan** a Amerîkayê de, **Dr. Mehmûd û Îdrîs Barzanî** bi Serokê Ajansa Îstixbarata Navendî (CIA) **Richard Helms û Richard Kanady** alîkarê Henry Kissinger re li Konseya Ewlekariya Neteweyî ya Amerîkayê hevdîtin kirin û **Amerîkayê biryar da bi nepenî alîkariya tevgera Kurd bike**.

Lewma piştî nêzîkî du salan min îzin ji Mela Mistefa stand da ku ji bo çareserkirina nexweşiya Hêroyê biçime derveyî welat. Lê ez venegeriyam û min nameyek ji Mela Mistefa re şand û min tê de wiha nivîsî:

“Ez li derve dijîm û dijatiya we nakim û mijûlî xwendin û jiyana xwe dibim û hêvî dikim; Eger zilamekî xirab nûçeyekê ji te re bîne, bi baldarî lêkolînê lê bike, da ku ji nezaniyê heqaretê li miletekî nekî û piştre ji kirina xwe poşman nebî

(اذا جاءكم فاسق بنبا فتبينوا ان تسيبوا قوما بجهالة فتسبحوا على ما فعلتم نادمين).

Hez dikim vê rastiyê bizanî, berê jî min hez nedikir, navbera me li hev keve û şerê te bikim belkî em hatin neçar kirin, niha jî hez nakim navbera min û te têk biçe, lê soz hatibû dayîn ji şeş mehan heta salekê hinek reform bên kirin, lê du sal in te tiştek nekir, ji ber wê yekê ez ê li derve bimînin, her gavê pêdiviya te yan şoreşê bi min hebû, ez nahêlim gîro bibe û wê erka xwe bi cih dînim.”

Îdrîs û Mesûd bi riya nameyekê bersiva min dabûn û tê de gotibûn: **“Mela Mistefa mayîna te ya derve hez nake.”**

Min jî bersiv da û wiha got: **“Her karekî we li derve hebe, ez ê ji we re bikim.”** Newşîrwan Mistefa pêştir çûbû Awistiryayê, Omer Debabe, Mamoste Îbrahîm û Elî Eskerî ba Mela Mistefa mabûn. Ez jî ji Beyrûtê çûm Fransayê, piştre çûm Misrê û Sûriyeyê. Paşê ez ê di mecalekê de behsa wê yekê bikim.

Şerê Navxweyî
û Hikûmeta Bexdayê

❖ Hûn helwesta xwe ji 1966’an-1970’yan çawa dinirxînin ku we ji bo şerê dijî Barzanî alîkarî ji hikûmetê wergirt?

Ez helwesta me ya wê hingê baş nabînim, ew karek bû me bi neçarî kir. Wek mînak; me sala 1983’yan gel hikûmeta Iraqê danûstandin kir, me bi dilê xwe danûstandin nekir, belkî rewşê bi me da kirin. Eger me kariba hikûmet biherifanda bêşik me dê kiriba, lê ku me nekarî biherifînin, rewşek wisa çûbû em neçar bûn danûstandinê bikin.

Mela Mistefa şerê salên 1966’an-1969’an bi ser me de ferz kir. Tenê du rê li hember me mabûn an diviya em teslîm bibin an jî diviya berevanî ji xwe bikin.

Bijartiya herî baş ev bû, ji destpêkê ve şer derneketiba û me û Mela Mistefa bi cuda çalakiyên xwe yên siyasî û partîtiyê bikira.

Lê dema ku Mela Mistefa şer bi ser me de ferz kir û êriş kir, wê demê du rê li ber me man, an diviya me hevkariya Îranê kiriba, bêguman ev bijartî nebaş bû, lewma diviya em li ber xwe bidin û li hember êrişên baskê Mela Mistefa bisekinin. Belê şer bi ser me de hat ferzkirin, me jî berevanî ji xwe û partiya xwe kir.

Tu caran em destpêkerê şer nebûn. Sala 1967’an Mela Mistefa dest bi şer kir û êrişî me kir, lê sala 1969’an hevsengiya hêzê hat guhertin, li hinek cihan ku wan êrişî me

kirin, me jî êrişî wan kirin. Mîna şerê Iraq û Îranê bû, destpêkê Iraq pêşde çû û ket nav axa Îranê, lê piştre Îran ket nav axa Iraqê. Qet me şer nedixwest, hemû caran me ji Mela Mistefa dixwest şer rawestîne.

Sala 1969'an tevî ku rewşa me ya leşkerî baş bû, lê me amadebûna xwe ji bo danûstandinê nîşan da, yanî me şer baş nedidît, lê ji aliyekî ve em neçar bûn bikin. **Bi kurtî û bi nêrîna me, wê demê diviya ew şer hatiba kirin!**

❖ Ji we re caşên 66'an dihat gotin, çiqasî ew navlêkirin di cihê xwe de bû?

Me jî ji wan re caşê SENTO'yê digot. Raya giştî gel me bû, piraniya bajar û bajarokan gel me bûn, em biçûna her cihekê me rizgar dikir. Bêyî mubalexe heta Peymana Adarê piraniya xelkê gel me bûn. Em biçûna her derê bi hezaran kesan çek hildigirtin û alîkariya me dikirin. Heta Peymana Adarê kampanyayek mezin li dijî me dewam dikir, Partiya Komunîst a Iraqê, Îran, Sovyet, Îsraîl û kevneperestên Kurd li dijî me bûn, lê piraniya xelkê pişta me digirt.

❖ Eger sibe rewşa 1966'an dubar bibe, helwesta te dê wek wê demê be?

Belê, bêşik. Eger êriş bikin û bixwazin min bikujin, divê ez çi bikim? Ez wê pirsê ji te dikim, birevim, ku de birevim?

❖ Yanî tu niha rexneyê ji helwesta wê serdemê digrî?

Ez helwesta me ya wê serdemê hêjayî tu rexneyek cidî nabînim. Tenê em neçar bûne bersiva tiştekê bidin ku bi ser me de hatibû ferzkirin. Rexneya min ji serdema pêş sala 1968'an heye, ne ji serdema piştî wê dîrokê.

❖ Çima we hêza çekdar û çiya ji bo Barzanî nehîşt û neçûn bajaran xebata siyasî bikin?

Me nedikarî li bajaran tenê xebata siyasî bikin, çimkî şev dihatin ser me û em dikuştin an direvandin. Li Kurdistanê bê xebata çekdarî xebata siyasî nedihat kirin. Hetta me pêşniyara wê yekê da Mela Mistefa û me got: **"Em amade ne tevahiya Hêza Pêşmerge bidin wî û em tenê xebata siyasî bikin, lê Mela Mistefa qebûl nekir."**

❖ Nedibû hûn partiya xwe hilweşînin da ku şerê bi-rakujiyê neqewime?

Min nedixwest partiyê hilweşînim, eger niha jî careka din sala 1968'an dubare bibe, di xet û hêlên bingehîn de heman helwesta min hedibe. Eger ez pê bihisim tu dixwazî min bikujî, eger bikarim ez ê pîşde te bikujim, eger min nekarî, ez ê bi-revim, rûnanêm tu bi rehetî min bikujî!

Ez li ba Mela Mistefa nedimam da ku min bikuje, min xwe jî layîqê kuştinê nedidît. Lewma min biryara revê da û min bi-ryar jî da eger were ser min, ez ê berevaniyê ji xwe bikim.

Lê eger em pirsek din bikin û bêjin: Gelo ew çareseriya herî baş bû? Ez dibêjim: Nexêr, çarseriya baş, ev bû Mela Mistefa êrişî me nekira û em jî neçar nemaban hêza çekdar çêbikin, da ku şerê birakujiyê neqewimiya. gelek caran tevgera nîştimanî rastî hinek pirsgirêkan tê ku neçar dibe bê dilê xwe helwestekê nîşan bide. Helwestek wiha bi vî awayî nîne ku hatibe plankirin an hizirkirin, belkî helwestek e ku rewşa demê bi ser de ferz dike. Ez bi xwe dîroka wê serdemê baş nabînim û di dîroka Kurd de wek kiryarek baş napejirînim.

Barzanî
Piştî 11'ê Adarê

❖ Piştî 11'ê Adarê lihevkirina Barzanî bi we re ji bilî niştimanperweriyê armanceke wî ya din hebû?

Li gorî nêrîna min, Mela Mistefa gelek baş dizanî Beis di rastiyê de gel wî nîne. Ew di vê baweriyê de bû, firsetek çêbûye dikare di berjewendiya xwe de bi me re li hev were. Ew serketiye, xwedan hêz e, em jî di warê siyasî de şikiyane, di encamê de dikare bi şertên xwe bi me re pêk were.

Bi nêrîna min ji bilî şiroveya rast ji bo rewşê û hiskirina bi niştimanperweriyê tu armancek wê helwesta Barzanî ya li-hevhatinê nebû.

Wê hingê her aliyekî rojhilatî û rojavayî yê ku hejî Mela Mistefa dikir, jê dixwest bi me re li hev were. Piştî Peymana 11'ê Adarê, kesekî sovyetî bi navê Arazov li mala Nûrî Ebdul Rezq ez dîtim. Wî pirsî: "Çi helwestek te derbarê Peymana Adarê heye?"

Min jî got: **"Tiştekî baş e, tevî ku wek partî me jê zerer kiriye."**

Bi nêrîna wî helwesta me gelek baş bû û got: **"Em wek Sovyet hez dikin hûn û Mela Mistefa li hev werin."**

Min di bersivê de got: **"Em jî hez dikin."**

Û got: **"Hûn hez dikin, em di wê barê de hewl bidin?"**

Min got: "Belê."

Ez wisa difikirim rola hewl û şîretên Sovyetê jî hebû.

Mela Mistefa dixwest tevahiya deriyan bi ser hevrikên xwe de bigre.

Mela Mistefa di vê baweriyê de bû, dibe ku Îran an her aliyekî din bixwaze gel me rêbikeve, çima bi xwe gel me rê nekeve?

Wî dixwest hemû Kurdan li dora xwe kom bike, ev rastî jî dizanî him hêza me heye, him jî xelk pişta me digre, lewma dixwest me bi awayekî bikşîne ba xwe.

❖ Gelo xurtbûna Kurd di stratejiya Beis de hebû?

Heta hatina Sedam ya ser desthilatê Partiya Beis partiyek nebû, belkî çend bask bûn. Heta sala 1980'yan rewş bi vî awayî bû. Hinek baskên Beis dixwestin lihevkirin bi Kurdan re bê kirin û mafê wan bê dayîn, yên ku bi vî awayî difikirîn, Sedam Hisên ew bi darve kirin.

Bi riya Beisiyên çepgir, em hajî nav Partiya Beis hebûn. Li Tehranê Hazim Cewad hat ba min û got: **"Celal bilez vegere Kurdistanê, van rojan nûçeyek belav dibe û ez jî têm ba we,"** ez di rê de bûm, ew hatin bidarvekirin.

Sitratejiya baskê Sedam û Mîşêl Efleq, jinavbirina tevgera Kurd bi riya hêzê bû. Di wê qonaxê de, du bask di nav Partiya Beis de hebûn:

Baskê yekem yê Ebdul Xaliq Samerayî û Ebdullah Selûm Samerayî bû. Cemaeta wî baskî pişta me digirtin û hez dikirin bi Kurdan re li hev bikin û mafê Kurdan bê dayîn.

Baskê duyem yê Sedam bû. Cemaeta baskê Sedam hewl didan tevgera Kurd ji nav bibin.

Di vê baweriyê de bûn, em cemaetek siyasiya xwedan partî ne, pêwîst e destpêkê me ji nav bibin, piştre Mela Mistefa bikujin ku tekane kes e, her di wê çarçoveyê de bû ku hewla kuştina Mela Mistefa dan lê Xwedê nekuşt.

❖ Eger hikûmetê Peymana 11'ê Adarê bi we re îmze kiriba, çi helwestek we li hember Barzanî hedibû?

Bêşik karê ku Barzanî kir, me dê bi awayekî rêk û pêktir kiriba, em her tim di vê baweriyê de bûn, eger rojekê Mela Mistefa di rewşa herî lawaz de be, wê demê girîng e em pê re li hev werin.

Piraniya me wiha difikirîn, ne Mela Mistefa dikare me ji nav bibe, ne jî em dikarin wî ji nav bibin, wek partî em ji bo gelê Kurd pêwîst in, Mela Mistefa jî (ji bo gelê Kurd) pêwîst e, ji ber vê yekê girîng e, ku em bi awayekî li hev bikin.

Ez piştrast im, eger hikûmetê Peymana 11'ê Adarê gel me îmze kiriba, wê demê ji bo lihevhatinê min kesek dişand cem Barzanî yan jî ez bi xwe diçûm, bi şertekî ku ez nekuştibam, çimkî dawî bi şerê navbera me nedihat.

❖ Yanî helwesta lihevhatinê pêş 11'ê Adarê di nav we de hebû?

Ji bo dîrokê dibêjim, her tim nêrîna şernekirinê di nav me de hebû û me dixwest nakokiyên xwe bi aşitî û riya siyasî çareser bikin. Em di vê baweriyê de bûn, aşitî di berjewendiya me de ye, şer jî di berjewendiya Mela Mistefa de ye.

Em di vê baweriyê de bûn, eger nakokiyên me bi riya siyasî û aşitî û xebata girseyî bê çareserkirin, wê demê em ser dikevin.

Eger bi şer û pevçûnan bê çareserkirin, wê demê baskê Mela Mistefa ser dikeve.

Ji ber wê yekê, me her tim xebata siyasî hildibijart Mela Mistefa jî her tim çareseriya siyasî û aşitî red dikir û çareseriya çekdarî bikar dianî.

Wî li şûna nakokiya siyasî nakokiya çekdarî ferz dikir çimkî dizanî di qada rêxistin, hizrî û girseyî de em serketî dibin, eger em ser neketiban jî, dibûn hêzeka mezin, lê wî nakokî bi lêdan, gule, top û cebilxaneyê çareser dikir.

Me ji Îranê xwest ku dostê Mela Mistefa bû navcîtiyê bike, her wisa me bi armanca lihevhatinê gelek kesatî ji wan şêx û mele şandin cem Mela Mistefa, lê hewlên me bêencam bûn.

❖ Tevî hemû pirsgirêkan, dibû ku we şer nekiriba?

Bi nêrîna min eger sala 1964'an polîtburoyê binermî û aqilane reftar kiriba û Nûrî Şaweys, Elî Ebdullah û hinek hevalên din bi wê tundiyê dijatî nekirban û Mamoste Îbrahîm Ehmed nexalifandana, eger wî jî kêmekê dûrbîntir û berfirehtir bala xwe bida nakokiyan, ew şerê navxweyî nediqewimî, tevî ku Mela Mistefa hez jî kiriba, ew şerê navxweyî nediqewimî û me dikarî pêşiya şer bigirin, çawa ku min pêştir behsa wê yekê kir, dibû me konferans an kongreyeke hevpar li dar xista.

Beşa Çardehem
14
Bandora Kurd û Çepên Îranê li Ser Kurdistana Iraqê

- Têkiliya Kurdên Iraqê û Îranê gel çepên Îranê
- Têkiliya bi Kurdistana Îranê re

Têkiliya Kurdên
Iraqê û Îranê gel Çepên Îranê

❖ Têkiliya PDK'ê bi çepên Îranê re bi taybet Komîteya Şoreşger û cemaeta Mela Aware çawa dest pê kir?

Ev du mesele ji hev cuda ne. Mela Aware, Qadir Şerîf (Haşimî Heqteleb), Seîd Kuwêstanî û Hisên Medenî ji Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDK-Îran) cuda bûn.

Wê demê Ehmed Tofîq (Ebdullah Îshaqî) sekreterê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bû. Wan çend kesan sala 1964'an komîteyek bi navê "**Komîteya Vejandina Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**" avakiribû, ku tenê salekê kişand[37].

Sala 1967'an Komîteya Şoreşger a Hizba Demokrat a Kurdistanê, ji aliyê Silêman Mu'înî, Îsmaîl Şerîfzade, Mela Aware, Seîd Kuwêstanî, Senar Mamedî û Salar Heyderî ve hat avakirin[38].

……

[37] Ehmed Tofîq ku navê wî yê rast "**Seîd Ebdullah Îshaqî**" ye, Sala 1931'an li Mihabadê ji dayik bûye. Ji destpêka xortiyê ve çûye nav xebata siyasî û bûye **endamê PDK-Îranê.**
Sala 1959'an revî Kurdistana Iraqê. Wê serdemê du baskên PDK-Îranê hebûn, ku Ehmed Tofîq **serokatiya baskê rastgir dikir**. Barzanî û hejmarek serokeşîran pişta wî digirtin û bi wê yekê wek sekreterê hizbê hat naskirin.

Piştî hinek bûyeran, **Ehmed Tofîq Kurdistan bi cih hîşt û çû Bexdayê**. Bi gumana têkiliya bi hikûmeta Îranê re Ehmed Tofîq **ji aliyê rejîma Beis ve hat girtin û di encama êşkenceyeke giran de li "Girtîgeha Ebû Xirêbê" a Bexdayê hat bêserûberatekirin**.

[38] Di "**Pirtûka Karwanek ji Şehîdên Kurdistana Îranê**" ya Kerîm Hîsamî de, wiha behsa endamên "Komîteya Vejandina Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê" hatiye kirin:

Dewam Dike →

Endamên wê komîteyê dixwestin ji bindestiya malbata Mela Mistefa derkevin û biçin Kurdistana Îranê û li wir xebata xwe bikin. Berî ku dest bi şoreşê bikin bi çêkirina grupên çekdar ên biçûk vegerin û li navçeyên Kurdistana Îranê dest bi hişyarkirina xelkê bikin.

Mela Aware, Îsmaîl Şerîfzade û Silêman Mu'înî di nav endamên komîteyê de yên herî çalak bûn û her yek ji wan ji bo navçeyekê hatibû danîn.

.....

Dewama [38] →

1. **Silêman Mu'înî;** sala **1935'an** li Mihabadê ji dayik bûye. Bavê wî wezîrê navxwe yê Komara Kurdistanê bûye. Sala 1952'yan ji bo xwendinê çûye **Tehranê,** piştî sê salan ji ber xebata xwendekariyê hatiye girtin. **Sala 1959'an derbasî Kurdistana Iraqê bûye** û piştî heyamekê vegeriyaye Mihabadê.

Sala 1968'an dema ku vedigere Kurdistana Iraqê ji aliyê **"Qale Tegeranî"** ve tê girtin û **teslîmî Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê tê kirin**. **PDK jî piştî kuştina Silêman Mu'înî cenazeyê wî teslîmî Îranê dike** û piştre hikûmeta Îranê ji bo tirsandina xelkê cenazeyê wî di nav bajarên Kurdistanê de digerîne.

2. Îsmaîl Şerîfzade; sala **1942'yan li Mihabadê** ji dayik bûye, xwendina xwe li **Mihabad û Tehranê temam kiriye**, her ji wê serdemê ve di nav xwendekarên çepgir de dest bi karê siyasî kiriye. Sala **1964'an** bi çend hevalên xwe ve **derbasî Kurdistana Iraqê dibe** û piştî sê salan bi armanca xebata siyasî vedigerin Kurdistana Îranê heta 12'ê Gulana 1968'an li wir dimînin.

Hikûmet bi riya **caşekî** li şûna mayîna Îsmaîl Şerîfzade bi çar hevalan ve dihise û **şer navbera wan û hêzeka hikûmetê ya zêdetir ji 500 candirmeyan derdikeve, di encamê de, her pênc kes şehîd dibin.**

3. Mela Aware; navê wî yê rast "**Mela Ehmed Şelmaşî**" bûye. Sala **1934'an** li gundê Şelmaşê girêdayî bajarê Serdeştê ji dayik bûye. **Xwendina wî ya olî hebûye** û li gundên navçeyê geriyaye û **hewl daye xelkê hişyar bike** da ku bêne nav qada xebat û têkoşînê.

Mela Aware sala 1966'an bi hevalên xwe yên Hizba Demokrat a Kurdistanê ve, vedigere Kurdistana Îranê û dest bi xebatê dike. Di fêlkirinekê de piştî dermanxwarkirinê, **axayê gundê Dîwalan Hesen Sekir**, hêzên hikûmetê tîne ser wan, di encamê de, **Mela Aware bi du Pêşmergeyan ve tên girtin** û roja **10.05.1968'an** li bajarê Serdeştê **tên bidarvekirin**.

Silêman Mu'înî ji bo Mihabadê, Mela Aware ji bo Serdeştê û Îsmaîl Şerîfzade ji bo bajarê Baneyê.

Helbet demek bû ku têkiliya wan bi me re hebû. Ji berê ve têkiliya Mela Aware û Qadir Şerîf gel me hebû. Dema nakokiya navbera polîtburoyê û Mela Mistefa, wan pişta aliyê polîtburoyê digirt û têkiliya wan bi Mela Mistefa re nema, bi taybet piştî ku Mela Mistefa têkiliya xwe bi Îranê re xurt kir û em ji Îranê dûr ketin û me têkiliya xwe bi Bexda û Qahireyê re danî û xurt kir.

Wê demê wan dest bi xebata çekdarî kiribû û pêdiviya wan bi alîkariyê hebû. Mela Aware, Silêman Mu'înî şandibû Silêmaniyê da ku ji me daxwaza alîkariyê bike.

Silêman Mu'înî li Silêmaniyê rastî komunîstan hatibû, wan gotibûnê neçe cem cemaeta polîtburoyê û ew alîkariya we nakin û werin em ê we bibin Bexdayê da ku balyozê Misrê bibînin.

Wan bi gotina komunîstan kiribûn û çûbûn balyozxaneya Misrê li Bexdayê. Piştre ji balyozxaneya Misrê ji me pirsîn: "Cemaetekê serdana wan kiriye û daxwaza alîkariyê kiriye, hûn di wê barê de çi dibêjin?" Me got: "Nêrîna me derbarê Silêman Mu'înî baş nîne, lê Mela Aware û Îsmaîl Şerîfzade zilamên baş in û em pişta wan digrin."

Destpêkê ji ber têkiliya zêde ya Silêman Mu'înî bi Ehmed Tofîq re, gazindeya me jê hebû, lê piştî ku me zanî Mu'înî hatiye ba Komîteya Şoreşger, nêrîna me derbarê wî hat guhertin û me ji balyozxaneya Misrê xwest alîkariya wan bikin, lê hikûmeta Misrê gotibû: **"Ew ê daxwaza wan binirxînin."**

Silêman Mu'înî li Silêmaniyê Qale Tegeranî dîtibû, wî jî biribû ser Çiyayê Ezmerê, wê derê Sidîq Efendî ku fermandarekî hêzeka Mela Mistefa bû, pêşiya wan girtibû û Silêman Mu'înî ji otomobîlê peya kiribû û gel xwe biribû.

Bêşik, gotibûn Sidîq Efendî ku Mu'înî di nav otomobîlê de ye, lê ne zelal e kê Sidîq Efendî pê hisandibû? Nediyar e çi roleke Partiya Komunîst a Iraqê di wê bûyerê de hebûye?

Piştî ku Sidîq Efendî, Mu'înî radestî Mela Mistefa dike, bi fermana Mela Mistefa Mu'înî tê kuştin û cenazeyê wî teslîmî hikûmeta Îranê tê kirin.

Hikûmeta Îranê cenazeyê Silêman Mu'înî li ber avahiya polîsê Mihabadê darda kir û ragihand: **"Ev cenazeyê Silêman Mu'înî ye ku Mela Mistefa ser daxwaza me teslîm kiriye."**

Dengvedanek gelek xirab a kuştin û teslîmkirina cenazeyê Silêman Mu'înî bi Îranê ji bo Mela Mistefa hebû. Partiya Komunîst a Iraqê di wê barê de gotarek bi navê " Şerê li dijî xelkê rizgarîxwazê Kurdistana Îranê di berjewendiye kê de ye" weşand (لمصلحة من محاربة آحرار كردستان ايران؟), tê de behsa vê yekê nehatibû kirin ku berpirsê wê kuştin û teslîmkirinê Mela Mistefa ye! tenê gotibûn ew kiryareka xirab e. Lewma me jî li ser wê gotara partiya komunîst helahelayek çêkir.

❖ Çi roleke Ehmed Tofîq di PDK'ê de hebû, nêzîkatiya wî ya bi Barzanî re ji ber çi bû?

Du-sê taybetiyên xirab ên Ehmed Tofîq di nav Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê de hebûn.

Yekem: Kesekî gelek rastgir bû, gelekî hewl dida Kurd bi Amerîka, welatên Ewropayê û rojavayê ve bê girêdan. Di wê

çarçoveyê de û bi armanca danîna têkiliyê bi Amerîkayê re ser navê Mela Mistefa hat Beyrûtê. Dana Adams Schmidt di pirtûka xwe de spasiya Ehmed Tofîq dike, ku çawa ew gihandiye cem Mela Mistefa.

Duyem: Ehmed Tofîq kesekî gelek zêdexwaz bû, bi awayekî dixwest bi keçeka Mela Mistefa re bizewice û bibe axayê Kurdistana Îranê.

Sêyem: Ehmed Tofîq gelek li dijî baskê polîtburoyê bû û roleke nebaş navbera Mela Mistefa û cemaeta polîtburoyê de didît. Gelek bi xirabî Mela Mistefa teşwîq dikir, bi awayekî dema ku Elî Ebdullah û hevalên me yên din li Sengeserê hatin girtin, ew berpirsê girtîgehê bû.

❖ We çawa têkilî bi çepên Îranê re danî?

Wê grupê vê carê bi riyek din têkilî bi me re danî. Her wisa wan dengê xwe gihandibûn Ewropayê, di wê çarçoveyê de cemaetek li Ewropayê bi navê "Rêxistina Şoreşger a Partiya Tûde ya Îranê" peyda bû û biryar dabûn kesekî wek nûner bişînin cem wan li Kurdistanê ango Komîteya Vejandina Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê. Navê wî kesî Dr. Kurûş Laşayî bû, piştre li cem me navê xwe kir "Dr. Celal".

Dema ku Dr. Celal hat, ez li Bexdayê bûm û li wê derê me hevdu dît. Nêrîna me li hev nêzîk bû.

Dr. Celal got: **"Ez hatime da ku bi riya we biçim ba Mela Aware û hevalên wî li Kurdistana Îranê."**

Min jî got: "Baş e, biçe bi wan re biaxife û li hev bikin."

Piştre çû ba Mela Aware û hevalên wî, paş hingê Mela Aware bi şandina kesekî daxwaza hevkariyê ji me kir. Me gelek çek û cebilxane û pere ji wan re şand û me got: **“Em amade ne her hevkariyeka we bikin.”**

Wê serdemê hejmarek ji ciwanên me bi serokatiya Newşîrwan Mistefa û Şazad Sayîb dixwestin têkiliyê bi wan re deynin û bi wan re kar bikin.

Dr. Celal di serdana xwe de, Îsmaîl Şerîfzade û Mela Aware dîtibû, piştî ku vegeriya nêrîna wî derbarê wan gelek erênî bû û digot:

“Ew hejmarek xortên gelek baş in, hetta bi riya wî Îsmaîl Şerîfzade nameyek ji min re şandibû, ez fikir dikim ew name hîn maye.”

Îsmaîl Şerîfzade di nameyê de gelek dostane gotibû: **“Pêwîstiya me bi şîretên we yên siyasî û hevkariya we heye.”**

Her wisa çend pirs derbarê rewşa siyasiya wê demê ya cîhanê, navxwe û şerê pêşmergetiyê kiribûn, ku wê hingê girîngiya xwe hebûn. Min bi 30 rûpelan bersiv da, lê dema şehîdkirinê ew bersivname gel cenazeyê wî ket dest hikûmeta Îranê û Îranê wek belgeyekê ji bo dijatiya min bi kar anî.

Hîn têkiliya me bi Îranê re bi temamî qut nebibû û Mamoste Îbrahîm Ehmed ji Tehranê hatibû Bexdayê. Îraniyan gef li Omer Debabe kiribûn û gotibûn:

“Nameya Celal Talebanî ketiye dest me, ew dest dixe nav karûbarên navxwe ya Îranê, em bêdeng nabin, eger di himbêza Ebdul Nasir de jî be, em ê wî bikujin.”

Omer Debabe jî di bersivê de gotibû: **“Eger şah biçe nav zikê dayika xwe, em ê jî wî bikujin.”**

Têkiliya bi Kurdistana Îranê re

❖ Hevkariya PDK’ê ya siyasî û pêşmergetî gel çepên Kurdistana Îranê di çi astekê de bû û çiqasî kişand?

Têkiliya me ya siyasî hebû lê ya pêşmergetiyê kêmtir bû, me hinekê alîkariya wan kir, di encamê de kêmekê vejiyan, lê mixabin, du bûyerên xirab qewimîn:

1. **Şehîdbûna Îsmaîl Şerîfzade û Mela Aware**
2. **Kuştin û teslîmkirina cenazeyê Silêman Mu’înî**

Ji ber wan bûyeran tevgera wan vemirî û têkiliya me û wan jî bi dawî bû.

Mela Mistefa Silêman Mu’înî kuşt, hikûmeta Îranê jî Îsmaîl Şerîfzade û Mela Aware kuşt, hevalên wan ên ku rizgar bibûn, hatin ba me û li Bekrecoya Silêmaniyê bûn pêşmerge ku nêzîkî 100 kesî bûn.

Hatina Dr. Celal bû sedema çêbûna têkiliyê di navbera me û çepên Îranê de. Wan wek “Rêxistina Şoreşger a Partiya Tûde ya Îranê” rojnameyek bi navê “Tûde” diweşandin.

Wî gel xwe çend jimareyên wê anî bû, êdî ji wê demê ve dostaniya me dest pê kir.

Dr. Celal got: **“Cemaetek wan çûne Kûbayê û li wê derê perwerde dîtine û hez dikin wan vegerînin û tevlî wê tevgera Îranê bibin.”** Me jî pêşniyara wan qebûl kir. Lê dema ku ew cemaet gihîştin Kurdistana Iraqê, Îsmaîl Şerîfzade û Mela Aware şehîd bibûn, lewma nekarîn wek pêdivî tevlî tevgerê bibin, neçar man ba me bimînin ku zêdetirî 30 kesan bûn. Bi mayîna wan têkiliya me zêdetir xurt bû.

Piştre gotin: Hez dikin meşqa leşkerî bibînin, min jî mamosteyê me yê herî baş Erîf Hemîd ji bo perwedeya wan destnîşan kir, ku bi Hemîd Reşaş dihat naskirin.

Êvarê Dr. Celal (Kurûş Laşayî) got:

“Mam Celal, ew cemaet hemû tiştekê dizanin, çima perwerdeyê dibînin? Ew yek ji bo xwe veşartinê ye.”

Min ji wan pirsî: “We perwede dîtiye,” gotin: “Belê.”

Bi wî awayî ew cemaet ba me man, li Bekrecoyê me baregeh ji wan re danî û weşanxane danê û dest bi çalakî û têkiliya bi Îranê re kirin, tevî ku hinek ji wan hatin girtin û bidarvekirin.

Bandoreke hizrî ya wan li ser me hebû, mirovên gelek baş û rewşenbîr bûn, piraniya wan xwendina bilind a zanîngehê temam kiribûn.

Dostanî di navbera wê cemaetê û hejmarek rewşenbîrên Silêmaniyê yên wek Newşîrwan Mistefa, Şazad Sayîb, Bekir Hisên, Mehmûd Mela Îzet û hinekên din çêbû.

Ji ber wê yekê dostanî û têkiliya bi milê Îranê re geş bû. carekê caşên hikûmeta şah û cemaeta Barzanî hatin ser me, li Helebceyê me çend caşên Îranê bi dîl girtin. Cemaeta Partiya

Tûdeyê hinek ji wan nas kirin û dizanîn xelkê ku derê ne, piştre wêneyên wan belav kirin.

❖ Çima we têkilî bi grupên din ên opozisyona Îranê re nedanî?

Bi riya wan ve me têkilî bi "Federasyona Xwendekarên Îranê li Derveyî Welat" re danî, tevî ku wê demê endamên rêxistina şoreşger piraniya federsyonê pêk dianî, lê hinek kesên din jî endamên federasyonê bûn, wek cemaeta Eniya Gel û hejmarek kesan wek Hesen Masalî ku niha li Almanyayê dijî û hîn dostaniya me dewam dike. Piştre wî grupek li Îranê avakir û di hilbijartina Parlamentoya Îranê de serket, lê hikûmetê qebûl nekir, biçe parlamentoyê.

Wê serdemê Hesen Masalî serokê Eniya gel li Rojhilat navîn bû. Bi riya me hat Iraqê, piştre çû Lubnanê û serdana filistîniyan kir.

Paş hingê komek bi navê Grupa Filistînê ku ji Îranê dixwestin bên û bi riya me ve biçin Filistînê, di rê de hatin girtin hinek rizgar bûn, lê hinek jî bê ser û berate bûn.

Ya rast wê serdemê navê me wek hêzeka çepgir a dijî Şahê Îranê dengveda bû, ji ber wê yekê piraniya hêzên dijî şah berê xwe didan me û dihatin Kurdistana Iraqê.

❖ Wê demê Ayetulla Xumêynî sewqî Necefa Iraqê hatibû kirin, têkiliya we pê re hebû?

Ne tenê têkiliya me bi Ayetulla Xumêynî re nebû, belkî agahiyên me jî derbarê wî gelek kêm bûn. Piştî ku Rêxistna Şoreşger a Partiya Tûde û Hesen Masalî hatin ba me, wan

behsa wî dikirin û di gotin Ayetulla Xumêynî Seyîdekî mezin, rêzdar û şoreşger e.

Cemaeta Rêxistna Şoreşger nûçeyê derbarê Ayetulla Xumêynî di rojnameya xwe de diweşandin. Me bi riya Hesen Masalî têkilî bi Seyîd Mistefayê kurê Ayetulla Xumêynî re danî ku li wê derê (Necefê) ji aliyê Rêxistina Îstixbarat û Ewlekariya Îranê (SAVAK) ve hat jehirdayîkirin.

Carekê min Seyîd Mistefa li Bexdayê dît û min soza alîkariyê dayê û min got:

"**Eger bixwazin em amadene meşqê bidin morvên wan an ji wan re bişînin aliyê Îranê**."

Ew hevdîtin, destpêka têkiliya me bi Ayetulla Xumêynî re bû. Wê demê tevgerek bi navê "Partiya Karkeran a Yemenê" (حزب العمال اليمنى) li Omanê peyda bibû, wan jî 20-30 kes şandin ba me, da ku perwerdeya leşkerî bibînin, piştre me çek da wan û çûn Cebel Exzer da ku li wê derê hevkariya cemaeta "Zefarê" bikin.

Piştî wê yekê, Dr. Celal (Kurûş Laşayî) çû Îranê, lê piştre hat girtin û di girtîgehê de xiyanet kir û di televîzyona hikûmeta Îranê de axivî.

Bandoreke hizriya mezin a wê grupê li ser me hebû. Çend gotarên wan derbarê bîr û nêrînên Mao Zedong di kovara Rizgarî de hatin weşandin. Piraniya gotaran Dr. Îbrahîm dinvîsîn, ku navê wî yê rastî "Dr. Elî Sadiqî" bû û malbata wan ji Kurdên Xorasana Îranê bûn. Çend bira bûn ku hemiyan li derveyî welat, xwendina xwe temam kiribûn. Birayeykî wî bi-jîşkê dil bû, wî bi xwe jî doktoraya fîzîka nûklerî hebû.

Gotarên farsî yên Dr. Îbrahîm ji aliyê Newşîrwan Mistefa ve dihatin wergerandin ser zimanê kurdî û di kovara Rizgarî de dihatin weşandin. Wê serdemê kovara Rizgarî tekane kovar li Iraqê bû ku tê de nêrînên çepgiriyê dihatin weşandin.Pêştir min û Newşîrwan Mistefa serdana Ebdullah Selûm Samerayî kir, da ku destûra weşandina kovarekê bistînin, lê çavdêrî li ser hebû, Newşîrwan jî got: **“Wele eger çavdêrî li ser kovarê hebe ez nakim.”**

Selûm Samerayî jî got:

“Biçe dest pê bike, tu bi xwe bibe wekîl pêwîst bi çavdêriyê nake.”

Şazad Sayîb jî bû sernivîskarê Kovarê ku bi navê “Kovara Rizgarî” hat weşandin.

Li aliyekî din, rola wê koma îranî di çêkirina têkiliya navbera me û Çînê de hebû û hewî jî dan da ku ew têkilî xurtir bibe. Têkiliya me û wê koma îranî giştibû astekê ku gelek caran Azad Hewramî wek henek digot:

“Eger Mam Celal biçe Cemsera Bakûr hevalên rêxistina şoreşger diçin li hember baregeha wî du konan vedigirin û ba wî dimînin.”

Di salên deheka 1970’yan de, ez li Beyrûtê bûm û min hewl da ku wan bi filistîniyan, Dr. George Habash, Nayif Hewatme, tevahiya hêzên lubnanî û dûre jî bi lîbyayîyan bidim naskirin.

Piraniya hêzên opozisyona Îranê min bi Lîbyayiyan da naskirin, Hesen Masalî jî min bir Lîbyayê ku ser navê Eniya gel kar dikir.

Her yek ji Rêxistina Mucahêdnê Xelq a Îranê û Ayetulla Îşraqî zavayê Îmam Xumêynî min bi Lîbyaiyan dan naskirin.

Hetta carekê li Lîbyayê dan nav çavê Mihemed Montezêrî û gotinê: Hûn li hember keda Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê cemaetek bêwefa ne, tevahiya wan alîkariyan ku we ji me wergirtine, hemû bi hewlên Celal Talebanî bûye. Îşaretî min kirin û gotin:

"Ew Mam Celal e, hat ba me û behsa we kir û got; Ayetulla Xumêynî mirovekî mezin e û hûn bi me dan naskirin, berevajî hûn niha bi vî awayî bi wî re reftar dikin."

Têkiliya nevbera me û hêzên opozisyona Îranê heta Şoreşa Îranê, her bi wî awayê baş ma. Piştî şoreşê "Rêxistina Şoreşger a Partiya Tûde ya Îranê" bû "Partiya Rencberan", navbera me her baş bû.

Her wisa têkiliya me û "Rêxistina Çirîkên Fêdayî yên Xelq" ku ji aliyê Eşref Dêhqanî ve dikat serokatîkirin, heta wê demê ku parçebûn baş bû.

Hemad Şîbanî ku navê wî yê rast "**Mehmûd Exevan**" e, nûnerê Çirîkên Fêdayî li derveyî Îranê bû. Şîbanî li mala me wek kurê malê lê hatibû, heta çend salan berî niha jî xebata wî di nav Rêxistina Çirîkên Fêdayî yên Xelq, baskê Eqeliyet de berdewam bû. Niha jî dostaniya me dewam dike, heta pêş "Serhildana Mezin a Gelê Kurd" li Kurdistana Iraqê, li Yaxsemerê em û Çirîkên Fêdayî yên Xelq bi hev bûn.

❖ Têkiliya we bi Mucahêdînê Xelq a Îranê re çawa bû?

Piştî ku Mucahêdîn bûn du beşan, me pişta aliyê marksîst-lenînîst girt, ku paşê navê xwe kirin, "Rêxistina Pêykar".

Navbera me û wan gelek baş bû, heta wê demê ku ji ber şer û lêdanê ji nav çûn.

Piştî Mucahidînê Xelq û Çirîkên Fêdayî yên Xelq, ew rêxistina herî xurt bûn.

Wek mînak karkerekî nenas ê girêdayî wan xwe berbijêr kirbû, bi wê rewşa xwe karî 88 hezar dengan bi dest bîne, di-yar bû wan hemiyan deng dabûnê, wê yekê jî xurtiya wan nîşan dida lê paşê di encama êrişan de hatin şikandin, hinek hatin girtin hinek hatin kuştin û hinekan jî îtiraf kirin.

Lê têkiliya me bi aliyê din ango Rêxistina Mucahêdînê Xelq re nebû. Wan dizanîn têkiliya me bi Rêxistina Pêykarê re heye, lewma hez nedikirin têkiliya wan bi me re hebe. Piştî Şoreşa Îranê jî têkiliya me bi Mucahêdîn re lawaz bû.

Beşa Pazdehem
15
Karkirina di Nav Filistînîyan de

- Jiyana di nav Filistînîyan de
- Karekî gelek bi xeter

Jiyana
di Nav Filistîniyan de

❖ Dema karkirinê digel filistîniyan, bi taybetî Eniya Gel te çi kir û hînî çi bûyî?

Piştî avakirinê di sala 1967'an de, têkiliya min bi Eniya Gel a Filistînê re çêbû. Wê demê hîn bi ser Eniya Gel, Eniya Demokratîk û Eniya Gel Serkirdatiya Giştî de par venebibû. Piştî parçebûnê jî têkiliya min bi hemiyan re baş bû û her wisa jî dewam kir. Yanî têkiliya min bi serokên her sê aliyan; Dr. George Habash, Nayif Hewatme û Ehmed Cebreîl re hebû.

Beriya ku ez biçim Lubnanê, hejmarek gotarên min di kovara El-Hedef a Eniya Gel a Filistînê de hatibûn weşandin.

Di salên deheka 1970'yan de, me ji bo kadroyan li Bexdayê kursek danî ku nêzîkî 30-40 kesan tê de beşdar bûn. Di dawiyê de min tevahiya mijarên kursê bi navê "Eniya Niştimanî Di Qonaxa Xebata Rizgarîxwaziya Niştimanî de" kom kirin, ku tê de behsa wê qonaxê û pêwîstiyên wê û rola çînên civakê di wê qonaxê de dihat kirin.

Ew gotar me di pirtûkeke biçûk de da weşandin. Ji ber ku naveroka wan gotaran bala Xesan Kenefanî sernivîskarê kovara El- Hedef a Eniya Gel a Filistînê kişandibû, lewma di qaliba 14 gotaran de û di wê kovarê de hatin weşandin.

Ew kursa kadroyan, bi hevkariya balyozxaneya Çînê li Bexdayê hat sazkirin. Di rêûrisma vekirinê de jî balyozê Çînê axivî û balkişand ser dostaniya min û welatê xwe.

Piştî wê yekê, Gulana 1972'yan ez hatim Bexdayê û min îzin ji Barzanî wergirt û gel Hêroyê ji Iraqê derketim.

Ya rast min biryar dabû venegerim, çimkî du sal bi ser lihevkirina me û Barzanî re derbas bibûn û em li cem wî bûn, lê tu karek nedabû me. Her wisa ji vê yekê ditirsiyam ji komelebûna min bihisin û serê min bifirînin.

Li aliyê din, min tu sûdek ji wê mayîna xwe nedidît, ji ber wê yekê ez çûm Fransayê û li bajarê Lyonê çûm xwendingeha zimanê fransî du meh derbas nebûn, hevalên Rêxistina Şoreşger a Partiya Tûde ya Îranê nameyek ji min re şandin û tê de gotibûn:

"Kurûş Laşayî li Tehranê hatiye girtin, em ditirsin were bidarvekirin, ji ber wê yekê ricayê ji te dikin vegere Rojhilata Navîn da ku dest bi kampanyayekê dijî girtina wî bikin."

Ev jî di demekê de bû, pêştir ji bo rizgariya girtiyên siyasî li Îranê min kampanyayek rêxistibû û hejmarek kesatî wekî Kemal Cumblat anîbûn ser xetê. Min bi gotina wan kir û dawiya sala 1972'yan xwendina zimanê fransî bi cih hîşt û çûm Şamê lê ez li Şamê ji rêxistina SAVAKê ya Îranê û îstixbarata Iraqê ditirsiyam.

Lewma ji ber dostaniya me ya kevin, min têkilî bi Eniya Gel a Filistînê re danî. Wê demê ji bilî hinek efser û berpirsên wan, mafê filistîniyan ê hilgirtina çekan li derveyî kampan nebû. Ji bo ku di nav otomobîlê de demançe û Kalaşînkov bi min re be, wan ez kirim efserê Eniya Gel.

Wê heyamê ku ez ba Eniya Gel re bûm, min du-sê kar dikirin. Him Dr. Wedî Hedad hevalê min yê nêzîk bû û him jî Hanî

Hindî ku zilamekî gelek baş bû, me di beşa leşkerî û rojnameyê de bi hev re kar dikir.

Du bûyerên balkêş derbarê kovara El-Hedefê hene, ku pêdivî ye ez li vir behsa wan bikim. Şahidên yekê zaf in, lê şahidên yekê kêm in.

Yek ji wan ku gelek kes haj pê bûn, bi taybet jî Dr. George Habash ev bû, min got Xesan Kenefanî:

“Tu dê werî kuştin, çimkî hûn hêj hînî xebata nepenî, çekdarî û xebata dijî Îsraîlê nebûne.”

Wek mînak yek ji wan meseleyan ku min jê rexne digirtin vekirina wan nameyan bû yên ji wan re dihatin, min digot nabe hûn bi xwe nameyan vebikin.

Avahiyek Eniya Gel hebû, min pêşniyar kir li qata xwarê kesek bi amûrê nameyan bipişkine û piştî vekirinê bide wan. Dema ku dijmin bizane name bi amûrê têne sehkirin, wê demê hewl nade bi riya nameyan teqînan pêk bîne. Lê dema ku bizane Xesan Kenefanî yan Besam Ebû Şerîf cîgirê wî bi xwe nameyan vedikin, wê demê bêşik hewla kuştina wan dide.

Paş hingê min got: “Xesan cihê mala te baş nîne, tu bi xwe jî ajokariyê dikî, bi rijdî min gotê dê otomobîla te bombe bikin, divê bizanî Îsraîl dikare gelek karan li Lubnanê bike.”

Min gotê: “Pêşniyar dikim bila ajokarekî ji te re bigirin, dibe ku dijmin şev bê û li hewşê bombeyan bi otomobîlê ve bike, lewma bila otomobîl ba ajokarê Eniyê be, sibehan te bîne, bi roj ba te be, êvaran jî te vegerîne malê.”

Hinek ji wan, ew kar wek şêwazeka burjuwaziyê dizanîn, piştî ku Xesan Kenefanî şehîd bû, di civînê de carek din min behsa wê pirsê kir.

Piştre min got Besam Ebû Şerîf, Xesan kuştin, niha jî nobeta te ye, lewma ricayê dikim, tu bi xwe nameyan veneke, got baş e, lê bi gotina min nekir, heta ku name pêve teqîya. Piştî başbûnê ji George Habash re gotibû: Eger min bi gotina Mam Celal kiriba wiha nedihat serê min.

Karekî Gelek bi Xeter

❖ Gelo hevkariya te ya bi filistîniyan re jiyana te xist xeterê?

Min du-sê kar ji wan re dikirin; yek pirkirina pasportên wan ên îranî bû, ji ber ku wan zimanê farsî nedizanîn. Her wisa yek-du caran ez di çalakiyên wan ên derve de beşdar bûm.

Li bajarê Amrdar ez li mala Wedî Hedad dimam. Min serdaneka Viyenayê kir, dema vegeriyanê Dr. Wirya Rewandizî got: Min tu vexwandiye lê tu hemû caran lez vedigerî, vê carê nabe biçî, Newşîrwan Mistefa jî li wir bû, wî jî got: Neçe. Bi wî awayî ez du-sê rojan egile bûm.

Şeva ku biryar bû, ez vegeriyama her wê şevê Îsraîliyan êrişî mala Wedî Hedad, baregeha me û cihê ku ez lê radizam kiribûn, hemû tiştên min ên kesane gel xwe biribûn.

Bêşik eger ez li wê derê bama dihatim kuştin, çimkî hemû kesên ku li wir bûn hatibûn kuştin. Rijdbûna Dr. Wirya û Newşîrwan bû sedema rizgarbûna min.

❖ Çima te tenê bi Eniya Gel a Filistînê re kar kir, têkiliya te bi rêxistinên din re hebû?

Karkirina min bi Eniya Gel re, ji ber vê yekê bû ku em di warê hizrî de ji yên din zêdetir li hev nêzîk bûn, ew şoreşgertir jî bûn, her wisa têkiliya wan bi hêzên şoreşger ên Rojhilata Navîn re xurtir bû.

Wê hingê wan du karên girîng sipartin min. Yek ji wan tê de Dr. Basîl Kubeysî hat kuştin. Terorkirina Dr. Basîl Kubeysî ji ber vê yekê bû ku filistîniyan dixwestin ji balafirxaneya Romayê balafireka îsraîlî birevînin.

Ji bo pêkanîna wê karyarê, li bajarê Genevê çar kes hatibûn amadekirin, min hevkariya wan kir da ku biçin Spanya û Portûgalê, ji wê derê ve jî bi riya trênê biçin Îtalyayê.

Pasporta wan a sexte ya Îranê hebû. Li Romayê wan têkilî bi hevalekî min re bi navê “Ebû Fîda” danîn ku berpirsê wê operasyonê bû.

Biryar bû di birina çekan de ji bo nav balafirê, ez hevkariya wan bikim, ew jî bi riya Teha Mihêdîn Meirûf, ku balyozê Iraqê li Romayê bû û parêzbendiya wî ya dîplomatîk hebû. Biryar hatibû dayîn, ez biçim Parîsê Basîl Kubeysî bibînim, pasporta ku bi min re bû, bidirînim û bêjme polîs min pasporta xwe winda kiriye, çawa me plan danîbû, me wisa kir.

Li Parîsê min pasporta xwe dirand û digel kesekî naskirî bi navê Dr. Yûsif Sincarî çûm ba polîs û min got: Min pasporta xwe winda kiriye, piştre çûm balyozxaneya Iraqê, bi dilxweşî balyoz dostekî min ê berê bi navê Nêimet Nêime bû. Balyoz pasportek nû da min, her wisa rijd bû ku bi hev re em nan

bixwin. Wî got: Şandeyek parêzerên Iraqê hetine, divê tu jî werî.

Wê demê têkiliyê navbera rojnameya El- Sewre û Eteexî (At-taakhi) dest pê bibû, wan xwestin nêrîna min di wê barê de bizanin. Min jî got: Wele her du tiştên rast diweşînin. Piştre min Basîl li Parîsê peyda kir.

❖ Basîl Kubeysî kî bû?

Dr. Basîl Kubeysî yek ji serkirdeyên kevin ên Tevgera Neteweçiyên Ereb li Iraqê bû. Pêştir di nav refên Eniya Gel a Filistînê de dixebitî, doktoraya xwe derbarê Tevgera Neteweçiyên Ereb li Amerîkayê wergirtibû.

Kubeysî berpirsê têkiliyên derve yên Eniya Gel li Parîsê bû. Em bi hev re bûn, şeva yekem em her du li hotêlekê bûn. Biryar bû em her şevekê li hotêlekê bin û cihên xwe biguherin. Eger li dû me bin, em neyên peydakirin. Şeva duyem me cihê xwe guhert, ew çû Hotêlekê nêzîk Opêrayê, ez jî çûm hotêlekê beramberê Opêrayê.

Roja sêşemê em bi hev re bûn, me biryar da roja paştir ango çarşemê ez biçim Viyenayê, ew jî biçe Mexrîbê (Marokoyê), zavayekî wî bi navê Ebdul Xenî Delî li wir bû ku serdemekê wezîrê çandiniya Iraqê bû.

Sibeha roja paştir me xatirê xwe ji hev xwest, min gotê tu dê îro biçî? Got belê. Min dubare kir: “Eger neçûyî hotêla xwe biguhere, bi wî awayî ku me li hev kiriye.”

Got: “Ez ê piştî nîvro biçim.”

Ez çûm Viyenayê, roja Înê li mala Dr. Wirya Rewandizî bûm, radyona Îranê nûçeya terorkirina doktorekî iraqî li Parîsê belav kir. Min guman kir û got: Bi xwedê ew Basîl e. Dema dirêjiya nûçeyan hat xwendin, diyar bû kesê hatiye terorkirin, Dr. Basîl Kubeysî ye. Roja çarşemê ew neçûbû Mexrîbê, êvara pêncşemê li heman hotêlê mabû û cihê xwe neguhertibû.

Heta niha diyar nebûye çima Dr. Basîl roja çarşemê neçûye Mexrîbê û egile bûye. Di wê barê de du nêrîn hene:

Yekem: Partiya Beis a Iraqê pê re têkilî daniye, ji ber wê yekê egile bûye.

Duyem: Behsa keçeka mexrîbî dihat kirin ku jê re kar dikir, qaşo ew keç sîxura Îsraîlê bûye û serdana wî ya Mexrîbê paş de xistiye.

Navê kesekî din jî girêdayê wê bûyerê hebû, lê hîn dema wê nehatiye ku bê eşkerekirin.

❖ Di encamê de derneket, kê kuştiye?

Îsraîliyan kuşt, çimkî dizanîn plana wî ya li dijî Îsraîlê heye û nehîştin serî bigre.

❖ Yanî îsraîlî hajî plana Romayê hebûn, gelo tu hewlek ji bo terorkirina te jî hat dayîn?

Îsraîlî li plana wî hisyabûn, tê texmînkirin wê keça mexrîbî îsraîlî agahdar kiribin.

Navê min di wî planê de hebû. Lewma Îsraîliyan dixwestin min bixine bin çavdêriyê, bi wê meremê bi Ajansa Parastina PDK'ê re axivîbûn û xwestibûn partî kesekî bişînin ba min,

tenê hajî hatin û çûyîna min be û di wê çarçoveyê de Ajansa Parastinê otomobîlekê ji min re bikre.

Kurek bi navê Mihêdîn hebû, pêştir ajokarê min bû. Ajansa Parastinê gazî kiribûnê, piştî ku kiribûn endamê ajansê gotibûnê: Em ê te bişînin ba Mam Celal da ku jê re ajokariyê bikî. Lê wî guman kiribû ku tiştek di arê de heye, lewma qebûl nekiribû û gotibû bi xwedê ez naxwazim biçim.

Ji ber wê yekê li Lubnanê zêdetir ji berê haya min ji xwe hebû. Li vir ez dixwazim behsa bûyerekê bikim:

Şevekê ez digel Dr. Wedî Hedad çûm mala Georg Salih li navçeya xirîstiyaniyan ku diket ser bilindahiyên Beyrûta Rojhilat, em şev li wir man.

Wan li cadeya Seidad apartmanek dabûne min. Sibeheka zû bû ajokarê Wedî Hedad ez gihandime mala wan, demjimêr 9'ê danê sibehê bû, tenê çend deqe bûn ku ez gihîştibûm, li derî dan, min vekir Hanî Hindî bû, got: Tu li vir î (های انته موجود؟)?

Min gotê: Belê.

Gelek xembar bû, got:**"Diviya şeva buhurî tu hatibayî kuştin."**

Min jî got: "Çima?"

Got: **"Iraqiyan li ber mala te kemîn danîbûn, dixwestin dema vegerê te bikujin, ez ji duh êvarê heta derengiya şevê li te digeriyam."**

Min jê pirsî: **"Te çawa zanî?"**

Got: **"Cîgirê ataşeya leşkerî zabtek e ku ji rûyê hizrî ve girêdayî Tevgera Neteweçiyên Ereb e, hajî wê planê hebûye, hatibû me pê bihisîne lê ez nedîtibûm lewma gotibû kesekî din."**

Ew efser, zilamekî xirîstiyanî yê gelek baş û yek ji wezîrên Tevgera Neteweçiyên Ereb di darbeya 1963'yan de bû.

Hanî Hindî got: **"Şeva buhurî ez çend caran hatim vir û min tu nedîtî, ya rast ez difikirîm tu hatî kuştin, careka din serê vê sibehê min li dergeyê apartmana te da lê kesî derî venekir. Êdî ez bêhêvî bûm min dixwest polîs agahdar bikim, gelo di nav apartmanê de tu hatî kuştin an tiştek li serê te hatiye?"**

Ez, Dr. George Salih û Dr. Wedî Hedad me behsa meseleyê kir, wan gotin: **"Ya rast tu niha di xeterê de yî, li aliyekî îsraîlî û li aliyê din iraqî bi dû te ne, bi vî awayî be dê te bikujin, divê tu ji vir biçî."**

Min got: "Hûn rast dibêjin, lê ez ku de herim?"

Ez çûm Misrê, çimkî Misr hinekê ewle bû, planeka Iraqiyan li wî welatî eşkere bibû û hatibûn girtin, piştî wê yekê soz dabûn Enwer Sadat carek din kiryarek wisa li Misrê nekin.

Dema ez çûm Misrê Bihara 1973'yan bû. Pêştir ango Sibata wê salê ez li Lubnanê bûm, Şehab Şêx Nûrî jî hatibû Misrê, em du mehan ba hev bûn. Piştre Me Şehab bi pasportek sexte bi riya Sûriyeyê ve şand Kurdistanê da ku bi nepenî li Kurdistanê xebatê bike.

Min Şehab bir Şamê û karên wî rêxist û vegeriyam Qahireyê. Ez Li Beyrûtê bûm ku Bafilê kurê min jê bû. Dema ku ez çûm Qahireyê, hinek ji dostên Ebdul Nasir li Wezareta Karûbarên Erebî dixebitîn.

Du kesan li ofîsa serokkomar kar dikirin, yek ji wan Ebdul Hemîd Mazinî kurê Ebdul Qadir Mazinî nivîskarê navdar bû, yê din jî Hesen Refet bû, ku pêştir wezîr bû.

Wan bi kêfxweşî xêrhatina min kirin û gotin:

“Divê em Serokkomar Enwer Sadat pê bihisînin ku tu hatî vê derê.”

Sadat jî gotibû: **“Bi xêr hatiye, vir mala wî ye, her tiştekê bixwaze jê re bikin.”**

Hez dikim behsa tiştekî din jî derbarê helwesta Enwer Sadat bikim. Piştî şikista Şoreşa Kurd di sala 1975’an de, Sadat ferman dabû saziyan, Celal Talebanî dikare li Misrê bimîne, her wisa tevahiya wan kesan ên ew destnîşan bike, dikarin wek penaber li Misrê bimînin.

Dema ku Hebîb Kerîm tê Qahireyê, cemaeta Wezareta Karûbarên Erebî dibêjinê: Ji ber Celal Talebanî em ê te wekî penaber qebûl bikin, lê ew qebûl nake û vedigere Iraqê û teslîm dibe.

Li Qahireyê min got: Ez naxwazim bibim penaberê siyasî, ji ber ku pêdiviya min bi alîkariyê nîne û ji Şoreşa Kurd alîkarî ji min re tê. Tenê hez dikim mafên min ên penaberê siyasî hebe. Wan jî qebûl kirin û biryar dan di hinek mijaran de alîkariya min bikin.

Wek mînak; eger otomobîl an kelûpelan ji derve bînim, gumrkê nedim, her wisa hinek hêsankarî jî kirin da ku endamên malbata me bikarin biçin xwendingehê û bi fermana serokatiya komarê li zanîngehê bixwînin. Bi wan hêsankariyan me karî jiyana xwe bê pirsgirêk derbas bikin.

❖ Di wan salan de têkiliya te bi şoreşê re hebû?

Heta Havîna 1974’an li Qahireyê mam, lê nav bi nav min serdana Beyrût û Şamê dikir. Li Şamê min Ebdul Îlla Nesrawî, Ebû Şewqî û Ebû Omer dît ku wek kesatiyên opozisyona Iraqê li Şamê Encumena Nişstimanî ya Iraqê ava kiribûn.

Ez li Misrê bûm, heta wê demê ku rojekê Ezîz Şêx Reza hat, nameyek Mesûd û Îdrîs Barzanî pê re bû û tê de daxwaza karkirinê ji min kiribûn. Min jî qebûl kir lê min got divê ez çi bikim? Wan jî gotin: Me ofîsek ji bo karûbarên erebî li derve daniye, ku ji te û Dr. Fuad pêk tê, Ezîz Şêx Reza jî berpirsê we ye. Min got baş e û me dest bi kar kir.

Paşê Dr. Fuad got: Ji bo ku di bin çavdêriyê de bî, tu wek endamê ofîsê danîbûn, lê berevajî di wê heyamê de me karî karên baş bikin. Yek ji wan karan me bi navê Şoreşa Kurd bi misriyan re têkilî danî.

Heta şikista şoreşê di sala 1975’an de, min li ofîsa karûbarên erebî li Lubnanê kar dikir. Her wisa li wir me kovarek diweşand ku piraniya gotarên wê min dinvîsîn. Ew kovar ji bo nûçeyên şoreşê hatibû taybet kirin, Ezîz Şêx Reza di warê çap û weşandinê de hevkarî dikir, lê hevalên PDK’ê zêde girîngî nedidanê.

❖ Te li Beyrûtê tu karekî siyasî û dîplomatîk kir?

Di wê heyamê de min du karên girîng kirin, lê mixabin hevalên PDK’ê girîngî nedanê.

Yek ji wan lidarketina kongreya serkirdeyên Ereb li Mexrîbê bû, ku tê de Sedam Hisên beşdar bû, bi Enwer Sadat û Melîk Feysel re li hev hat û ji kongreyê xwest piştgiriya wê daxwazê bikin.

Heyamekê beriya kongreyê Ezîz Şêx Reza hat Qahireyê û ji min xwest hewlekê ji bo têkilîdanînê bidim. Min telefonî Mihemed Hesenîn Heykel kir lê min nekarî wî peyda bikim. Bi riya Heykel têkiliya min bi Sadat re hebû, min her tiştek ji Sadat bixwesta, bi riya Heykel pêk dihat.

Mihemed Hesenîn Heykel rakiribûn û Ehmed Behaedîn ê nivîskar û dostê Sadat danîbûn şûna wî. Min Ehmed Behaedîn nas dikir, kesekî baş bû û dostaniyek me ya kevin jî hebû.

Jimareya telefona sekreterê Heykel ba min bû. Dr. Fuad û Ezîz Şêx Reza rûniştibûn, min telefon kir zilamekî bersiv da, min gotê: Ez dixwazim bi sekreterê Mamoste Behaedîn re biaxivim, wî got: Tu kî yî? Min jî got: Celal Talebanî me.

Got baş e, lê karê te li sekreterê wî heye yan li wî bi xwe? Min got: Karê min bi wî bi xwe heye, min fem kir ew bi xwe (Ehmed Behaedîn) ye. Keniya û got: "**Ez li te digeriyam were karekî min li te heye.**"

Dema ez çûm ba wî, got: "Îro ez ba serok Sadat bûm, serok pirsî: 'Gelo Celal hîn li Qahireyê ye?'"

Min got: Belê li vir e, lê demek e min nedîtiye.

Serok got: **"Bêjê li şûna Heykel niha tu xeleka têkiliya navbera me yî û got; Bêjê Iraq dixwaze di Kongreya Serkirdeyên Ereb de, behsa pirsa lihevhatina bi Îranê re bike. Ez pêşniyar dikim şandeyek Kurdî beşdar bibe û kurekî Barzanî (احد ابناء البارزاني) di nav şandeyê de be."**

Sadat gotibû: **"Bila kurên wî (Barzanî) û Celal werin ba min, ez ê wan gel xwe bibim kongreyê. Her demê Iraqê behsa lihevhatina bi Îranê re kir. Ez ê wiha bersivê bidim û bêjim: Li şûna vê**

yekê ku wek Ereb em bi Şahê Îranê re li hev bikin, çima gel birayên xwe yên Kurd li hev nekin. Îşaretî şandeya Kurd dikim û dibêjim: Birayên me Kurd li vir in, bila em bi wan re li hev bikin."

Di bersivê de min got: **"Wele gelek baş e."**

Her wisa pirsî: **"Hûn rijd in li ser pirsa Kerkûkê?"**

Min got: **"Em dikarin çareseriyekê ji bo Kerkûkê peyda bikin."**

Ez rûniştibûm, ji Sadat re telefon kir û got: Celal li vir e.

Sadat gotê: **"Derbarê pirsa Kerkûkê bi tekezî jê bipirse, gelo dubare rijd nabin?"**

Min got: Na

Got bêjê: **"Ez wan garantî dikim (**انا اضمن لهم**)."** Armanca wî lihevkirina bi Sedam re bû.

Ez vegeriyam û min mesele ji Ezîz Şêx Reza û Dr. Fuad re vegot: Ew jî gelek kêfxweş bûn. Min nameyek ji Îdrîs û Mesûd re şand û ji wan xwest, Hebîb Mihemed Kerîm neşînin Qahireyê, ji ber ku Hebîb ji riya Îranê ve tê, wê demê navbera Misr û Îranê ne baş bû.

Li Kurdistanê dema ku nameya min xwendibûn, henekê xwe lê kiribûn û gotibûn:

"Lihevhatina çi? Erebê çi? Çawa em dikarin bi Iraqê re li hev werin."

Piştî Aşbetalê ango şikista şoreşê, Ezîz Şêx Reza behsa wê gotina wan ji min re kir.

Mela Mistefa li şûna vê yekê ku nûner bişînin (kongreyê) hejmarek name şandibû û gotibû: **"Wan nameyan nede Mam**

Celal, bila ew haj pê nebe û nezane, tu bi xwe biçe Mexrîbê bide aliyan.”

Nameyên Mela Mistefa bêencam bûn. Dema Ezîz Şêx Reza çûbû Mexrîbê li balafirxaneyê nehîştibûn biçe kongreyê lewma nameyên Mela Mistefa negihîştin kongreyê, ji ber wê yekê me ew firseta girîng ji dest da.

Serokê dewleta herî mezin a erebî dixwest şandeya Kurd gel xwe bibe kongreyê da ku pirsa Kurd û Iraqê çareser bike.

❖ Serokatiya şoreşa Kurd tu hewlek ji bo têkiliya bi Ereban bi taybetî bi Misrê yan welatên din re da?

Belê hewl da. Mela Mistefa, Hebîb Mihemed Kerîm şand ba me li Misrê, lê misriyan pêşwaziyek baş ji Hebîb nekirin.

Min got misriyan: Hûn bi xwe dizanin Mela Mistefa girîngiyê nade nêrîna min, lê şoreşê ew şandiye û hez dikim hûn bibînin. Piştre gotin: Serok Sadat naxwaze bibîne. Ebdul Hemîd Mazinî ji yekîtiya sosyalîstî diyar kirin û hat li mala me Hebîb dît.

Mela Mistefa ji Hebîb xwestibû ji rikê Sovyetiyan ve, Çîniyan bibîne, çimkî Sovyetiyan hevkariya wan (PDK’ê) nedikir, navbera min û Balyozxaneya Çînê li Qahireyê baş bû nav bi nav wan ez vedixwendim.

Li balyozxaneya Çînê min kesek nas dikir ku jê re Mister Şûz digotin. Rojekê min telefon kir û min gotê: Mister Şûz em dixwazin te bibînin.

Wî jî got: Kerem kin.

Ez çû balyozxaneyê, min gotê: **“Mela Mistefa Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê Hebîb Mihemed Kerîm şandiye û dixwaze we bibîne.”**

Mister Şûz hêrs bû û got:

“Em naxwazin têkiliya me bi wan re hebe, ew xizmetkarê kolonyalîzmê ne, rojekê ba sosyal împeryalîzmê ne, rojekê gel Amerîkaya Împeryalîzm in, nabe hêzeka siyasî bi vî awayî tevbigere.”

Min gotê: **“Ser hemdî xwe be! Ya rast ez hêrs bûm, min gotê: Ricayê dikim bêdeng be (Be Quiet please) pêwîst bi hêrsbûnê nake, bêje naxwzim bibînim.”**

Ez gelek bi acizî hatim derve, min got Hebîb: Naxwaze te bibîne, wî jî got: Ey felek! Mister Qondere jî naxwaze me bibîne!!!

Niha ji te re dibêjim: Çîroka Mister Qondere çi ye?

Me bi riya balyozê Albanyayê Mister Şûz nas kir. Wî bi xwe got: Navê min ji bîra we naçe, çimkî “Şûz” bi înglîzî yanî “qondere”, lewma êdî ba me jê re “Mister Qondere” dihat gotin.

❖ Ji bilî van hewlan, hewlên din ên erebî yan navdewletî ji bo çareserkirina pirsa Kurd hebû?

Carek din firsetek dîrokê çêbû, lê me ew jî ji dest da.

Wê demê ez li Lîbyayê bûm, li Çileya 1975’an Kongreya Ciwanên Nasirî li dar ket. Ez jî hatibûm vexwendin du kesên îranî bi navên Hesen Masalî û Hêkmet Pûrkî bi min re bûn.

Di kongreyê de, min Muemer Qedafî dît, serî li şandeyan dida, hat ba min silav kir û got: “Tu li vir î?”

Min got: “Belê”

Got: “Ne diyarî.”

Di bersivê de min wiha got: **“Hûn mijûlî kongreyê ne, ez ê piştre te bibînim.”**

Pirsî: “Çi heye?”

Min got: “Du xortên îranî yên baş hatine.”

Got: “Li ku ne?” Min bangî wan kir û hatin ba wî. Wan her du xortan daxwazek kirin.

Qedafî nivîsek da wan û tê de gotibû:**“Daxwazên wan pêk bînin.”**

Piştre Qedafî got:

“Nûçeyek min a xirab ji bo te heye, Wezîrê Derve yê Iraqê Seidûn Hemadî û Wezîrê Derve yê Îranê Ebaselî Xeletberî, li Stenbolê hev dibînin û dê van nêzîkan li hev bikin.”

Ya rast nêrîna Qedafî derbarê Mela Mistefa baş nebû, digot:

“**Aqilê min lê nabire, dema ku ez wêneya wî ya bi xençerekê ve dibînim, naşive zilamê vê sedsalê, gelek baş bû eger ew di sed-sala 19’an de bihata dinyayê.**”

Beşa Şazdehem
16
Peymana 1975’an a Cezayîrê

- Peymana 1975’an a Cezayîrê
- Rola Nû ya Sovyetê

Peymana
1975’an a Cezayîrê

❖ Hûn hajî Peymana Cezayîrê hebûn, çima Barzanî pêş herifîna şoreşê li şûna Îran û Amerîkayê ji welatên din alîkarî nexwest?

Belê em agahdar bûn. Çawa ku pêştir min got: “Di Kongreya Ciwanên Nasirî de li Lîbyayê ez û Muemer Qedafî derbarê li-hevkina Iraq û Îranê axivîn.” Qedafî pirsî: “**Eger Iraq û Îran li hev bikin, çarenivîsa we çawa dibe?”**

Min gotê: “Em ê berevaniyê bikin.”

Qedafî pirsî: **“Tu piştrastî ku hûnê berevaniyê bikin?”**

Min got: **“Belê, lê dibe ku wê demê zêdetir pêdiviya me bi alîkariya te hebe. Em dikarin rêbaza tevgerê biguherin, li şûna Îranê, em ê hevkariyê ji dostên xwe li Lîbya û Sûriyeyê werbigi-rin.”**

Di hember de Qedafî wiha got: **“Eger tevgera we wisa xebatê bike, ez amade me bi hemû awayî alîkariya we bikim.”**

Min jê pirsî: **“Bi rastî tu dixwazî bi hemû awayî alîkariya me bikî?”**

Qedafî bi tekezî got: **“Belê, ez amade me, bi hemû awayî alîkariya we bikim.”**

Lê min gotê: **“Mela Mistefa ne wek min e, mehê bi 20 hezar dînaran razî be, mehê pêdiviya wî bi çend milyon dînaran heye.”** Qedafî gotina xwe dubare kir û got: **“Belê ez amade me.”** Piştî vegerê, min nameyek ji Îdrîs û Mesûd Barzanî re nivîsî û bi

riya Ezîz Şêx Reza şand, lê dubare wek cara buhurî wan henekê xwe pê kiribûn û gotibûn: “Ev tenê propaganda ye.”

Lê girîngtir ji van gotinan, piştî ku Peymana 6’ê Adarî li Ceza-yîrê hat îmzekirin, Qedafî bi lezgînî ez şandim û got:

“Biçe bêje; Barzanî Qedafî li ser soza xwe ye, eger Barzanî berevaniyê bike û Encumena Nişтimanî ya Iraqê pişta wî bigre, wê demê ez amade me, bi hemû awayî alîkariya tevgera Kurd bikim.”

Min bi gotina wî kir, lez vegeriyam Şamê, li balafirxaneyê Omer Debabe û Ehmed Ezawî, her wisa hejmarek ji hêzên cuda yên opozisyona Iraqê li benda min bûn.

❖ Wê demê we çawa têkilî bi Barzanî re danî û we çi pêşniyar kir?

Li Sûriyeyê em hemû di rewşek şepirze de bûn. Me digot: Divê li hember vê rêketinê tiştek were kirin. Ez di vê baweriyê de bûm, Mela Mistefa berevaniyê dike, lê Omer Debabe got: **“Wele hêza Mela Mistefa nemaye, guleyekê jî nateqîne û di-reve.”**

Elî Sincarî û Es’ed Xoşewî, em agahdar kirin ku Encumena Nişтimanî ya Iraqê amade ye bi hemû awayî alîkariya tevgera Kurd bike.

Min bilez nameyek ji Mela Mistefa re nivîsî û da Omer Debabe da ku bigihîne Mela Mistefa li Kurdistanê. Di nameyê de wiha hatibû gotin:

“Lîbya û Sûriye alîkariya me dikin, Qedafî bi pere alîkariya me dike, Hafiz Esed jî çek û cebilxayê dide me, yanî pere, çek û

cebilxaneya me heye, lewma pêwîst e em li ser xebatê berdewam bin."

Omer Debabe vegeriya lê bersiv nebû, lewma min bi neçarî nameyek din bi riya Hêroyê şand, lê heta Hêro gihîşt Kurdistanê aşbetal qewimî bû. Mela Mistefa biryarek dabû, êdî çi feydeya name û pêspartiyan nebû, lê spasiya şandina wan nameyan kiribû, ku min jê re şandibûn. Spasiya malbata Mela Mistefa ji bo helwesta min hebû, ji ber ku dizanîn, ez çi dikim.

Beriya ku sala 1974'an şer dest pê bike, gotarek min di rojnameya Sefîr a Lubnanê de hat weşandin ku tê de min ji hikûmeta Iraqê xwestibû, şerê Mela Mistefa neke û bi awayekî rast tevbigere. Min gotibû: Îro Mela Mistefa Serokê Tevgera Kurd e. Tevgerek rastîn e, nabe li ber çav neyê girtin an hewla jinavbirina wê bê dayîn. Wê gotarê gelek deng veda, gelek rikê hikûmeta Iraqê li min hat.

Her wisa min ji hejmarek kesatiyên Ereb xwest peyaman ji Sedam re bişînin û jê bixwazin bi Kurd re li hev were û dest ji çareseriya bi şer berde û ji bo çareseriya bi aşitiyê hewl bide.

Mela Mistefa berî şer 30 hezar dînar dabû Ezîz Şêx Reza û gotibûyê: **"Wî pereyî bide Mam Celal, bila piçekê ji xwe re bigere."** 10 name jî bi awayekî spî îmze kiribû û gotibû: **"Bila bi xwe pir bike, ji wan kesan re bişîne ku bi xwe bi pêwîst dizane."**

Belê **biratiyek wisa ketibû navbera me, nameya spî ji min re îmze dikir**. Di hember de min dest bi karkirinê kir lê gelek derbas nebû aşbetal bi ser de hat ferzkirin.

Rola Nû ya Sovyetê

❖ Di wan bûyeran de çi roleke Yekîtiya Sovyetê hebû?

Sala 1974'an li Qahireyê bûm, rojekê Mistefa Caf ji Beyrûtê telefon kir û got: **"Ricayê dikim sibe were ba min, karekî min ê girîng li te heye, dostekî te yê kevin hatiye û dixwaze te bibîne."**

Lê dema ez çûm balafirxaneyê cih nebû. Bi neçarî min telefonî serokatiya komarê kir, çimkî her tim ji bo wan du kursî dihatin rezervkirin, wan qebûl kirin û kursiyekî xwe dane min.

Li Beyrûtê ez çûm mala Mistefa Caf. Wî got: "Hevalê te qasekî din vedigere." Nêzîkî nîv demjimêrî ez li bendê bûm, dengê zengila derî hat, Prîmakov bû, ew serdemekê wezîrê derve û serokwezîrê Sovyetê bû.

❖ Çi berpirsyariyek Prîmakov hebû û we çi gotûbêj kir?

Wê demê nûnerê rojnameya Pravda ya Rûsî li Rojhilata Navîn bû, her wisa pisporê pirsa Kurd jî dihat hesabê. Gava ez dîtim vî alî û wî aliyê min maç kir û got:

"**Karekî min li te heye, em biçin pêgermokê (pêasokê) û tenê biaxivin.**"

Piştî ku em derketin derve, Prîmakov got: **"Em te wek zilamekî pêşverû û şoreşger dizanin, lê Mela Mistefa şaşî kir"**

Gelekî axivî. Di dawiyê de min got:

"Tu dixwazî min bikşînî nav partiya komunîst? Guh bide heval Prîmakov min Beisî ceribandine, ez baş dizanim ew mafê Kurd nadin. Niha tevahiya xelkê pişta Mela Mistefa digrin, dijatîkirina wî karekî xirab e."

Min gotê: **“Heval Prîmakov werin em têkiliya we û tevgera Kurd çê bikin.”**

Wî got: “Em jî wê yekê dixwazin û naxwazin Iraqê têk bidin. Ez hêvî dikim em ji riya te, têkiliya xwe vejînin û tu wê têkiliya navbera me zindî bikî.” Piştre got: **“Hevlekî min yê kevin li balyozxaneya Sovyetê heye.”**

Dema em çûn balyozxaneyê, min ew kes nas kir, ku navê wî Zayid Seyf bû, pêştir li Bexdayê min dîtibû. Wê demê Zayid xeleka têkiliya navbera me û Sovyetiyan bû. Zayid li Lubnanê sekreterê yekem yê balyozxaneyê bû, me hev du nas kir û çend carên din jî me hev du dît.

Carekê ji min re got: **“Tu niha li derveyê, pêwîstiya te bi pere heye.”** Xwest hinek pere wek alîkarî bide min, lê min wer-negirt û min gotê: **“Ez gelek spasiya te dikim û pereyê min heye, bila em hînî perewergirtinê ji Sovyetê nebin.”**

❖ Çi helwesteke Barzanî derbarê têkiliya we bi Sovyetê re hebû?

Di wê barê de min name ji Îdrîs û Mesûd Barzanî re şand, wan jî di bersivê de gotin:

“Prîmakov sîxur e, Sovyet tiştekî ji me re nake, giringiyê nede wan, tenê armanca Sovyetiyan wergirtina agahiyan e, ew ne-hezên me ne.”

Min bi gotina wan nekir. Piştî herifîna Şoreşa Kurd jî têkiliya min bi Sovyetiyan re hebû. Dema ku Şoreşa Kurd diherifî, Sovyetiyan gotin: “Bila Mela Mistefa berevaniyê bike, em amade ne pişta we bigirin.” Lê herifîn qewimî û çi mifayek wan daxwazan nebû.

Beşa Hevdehem
17
Bingeha Xebateke Nû
Xelekên Rewşenbîriyên Komeleyê û Avakirina Wê

- Komele (Komeleya Rencderên Kurdistanê)
- Hizra Maoîzmê di nav tevgera Kurd de

Komele
(Komeleya Rencderên Kurdistanê)

❖ Rola te di Komeleya Marksîst-Lenînîst a Kurdistanê de û rola wê di avakirina YNK'ê de çi bû?

Derbarê avakirina "Komeleya Marksîst-Lenînîst a Kurdistanê" ku paşê bû "Komeleya Rencderên Kurdistanê", dikarim bêjim: Ji destpêka avabûna Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê (PDK) ve, baskekî marksîst-lenînîst di nav partiyê de hebû. Ew bask hinek caran di nav partiyê de serdest bû, hinek caran dengekî wê yê qehreman hebû, hinek caran jî lawaz bû, lê bi girseya mezin a partiyê re rêdiçû.

Sala 1953'yan PDK'ê bi xwe û bi fermî Marksîzm û Lenînîzm anî nav qada xebatê. Sala 1959'an ku em li Bexdayê bûn, me eşkere li ser vê teoriyê kar dikir. Sala 1960'an piştî ku me destûra kar û xebatê stand, di nav destûra partiyê de, behsa mifawergirtina ji teoriya Marksîzm-Lenînîzmê dihat kirin, lê wê yekê zêde nekişand, hat guhertin û bû teoriya zanistî.

Di salên 1958'an-1959'an de yên ku di nav PDK'ê de xwe wek marksîst-lenînîst dizanîn, rijd bûn li ser vê yekê ku pêdivî ye teoriya Marksîzmê bi awayekî bikeve nav programa PDK'ê. Hetta di vê barê de nakokiyek mezin di navbera PDK'ê û Partiya Komunîst a Iraqê yan di navbera baskên PDK'ê de hebû.

Çawa ku cemaeta baskê Hemze Ebdullah, Nejad Ehmed Ezîz, Xesrew Tofîq, Hemîd Osman û Salih Heyderî digotin:

“Gelo PDK xwedan milk, bazriganî û burjuwaziya Kurd e? Yan partiya rêncber, karker, cotkar, rewşenbîr, kasib û girseya Kurdistanê ye?”

Piştî cudabûna ji Mela Mistefa di sala 1964’an de, wî baskî dubare serî hilda.

Destpêkê nakokî di navbera wan endaman de çêbû ku xwedanê nêrîna siyasî û hizirkirina îdeolojîk bûn, bi taybet jî li ser pirsa Marksîzm û Lenînîzmê; çimkî wê demê Marksîzm ji du awayê hizirkirinê pêk dihat: Yek a Sovyetê û ya din jî ya Çînê bû. Ez bi xwe ji wan kesan bûm, min hizra Marksizma Çînê baş dihesiband.

Sala 1961’an min guhdariya radyoyên Moskow û Pekînê dikir û hajî nakokiyên wan hebûm bi taybet ku Ehmed Ebdullah belavokên Çînê ji min re dianîn. Ew bi xwe di vê baweriyê de bû, nêrîna marksîstî ya Çînê ji ya Sovyetê baştir e.

❖ Çima we xwe da aliyê Çîniyan?

Ya ku di nav nakokiyên Sovyet û Çînê de, zêdetir bala me dikişand, xebata şoreşgerî ya me ya li ser bingeha tevgera girseyî ya li dijî împeryalîzmê û girîngîdayîna bi tevgera rizgarîxwaziya gelan bû, lê wê demê Krûşçevîzm ji wan hemiyan dûr ketibû.

Ji ber vê yekê ku di nav PDK’ê de rewş ji bo baskê şoreşger ê marksîst-lenînîst baş bû û dihat minaqişekirin, lewma piraniya me di bin bandora bîr û hizra Çînî bi giştî û yên Mao Zedong de, bi taybetî bûn.

Destpêkê bîr û nêrînên Mao Zedong û bicihanîna Marksîzm-Lenînîzmê di welatekî nîv-axatî ya nîv-kolonyal a paşdemayî ya cîhana sêyem de, dişiviya rewşa Kurdistanê.

Her wisa xebata Çîniyan ji bo çekdariyê hatibû veguhertin û ji gundan ve dest pê kiribû, di dawiyê de bi rizgarkirina bajaran gihîştibû encamê. Pêvajoyek wiha zêde bi xebata gelê Kurdistanê re digunciya.

Serketinên Çînê, behs û nîqaşên ku pêştir derbarê Çînê ji aliyê rojname, kovara Gelawêjê û hinek pirtûkan ên hatibûn wergerandin ser zimanê erebî, bandor li wan kesan kiribû ku di nav tevgera Kurd de xwe marksîst-lenînîst dizanîn.

Bi taybet ku Krûşçevîzma wê serdemê, pişta wê teoriyê digirt ya ku hez dikir, tekane rêxistin li welatên erebî wek Misr, Sûriye û Iraqê bi navê Yekîtiya Sosyalîstî bê avakirin û tevahiya şoreşgeran di nav wê yekîtiyê de xebatê bikin. Di wê çarçoveyê de diviya marksîst û lenînîstên wan welatn partiyên xwe hilweşînin.

Sovyetiyan him di teoriyê û him jî di praktîkê de, li dijî baskê polîtburoyê pişta Mela Mistefa digirtin, rojnameya Pravda ya Rûsî li ser nakokiyên polîtburoyê û Mela Mistefa di nav PDK'ê de, gotarek weşandibû û nivîsîbû: **"Endamên polîtburoya PDK'ê û alîgirên wan komeka çepgira radîkal in ku tenê baweriya wan bi xebata çekdariya şoreşgerî heye û vê rastiyê fem nakin ku roja îro bi aşitiyê û aşitîxwaziyê xebat pêş dikeve. Komeka tundûtîj û radîkal a bi vî awayî, him di warê bîr û bawerê û him jî di warê praktîkê de neheq in û baskek di nav PDK'ê de pêk anîne ku tenê wê bîr û nêrînê qebûl dikin."**

Hizra Maoîzmê
di Nav Tevgera Kurd de

❖ Sedema din a belavbûna Maoîzmê di nav çepên Kurd de çi bû?

Piştî hatina hevalên Rêxistina Şoreşger a Partiya Tûde ya Îranê ku li Bekrecoya Silêmaniyê ba me diman, me zêdetir hizra Marksîzmê û teoriya Mao Zedong fem kirin.

Ez gel wan xortan bûm ku wê serdemê di warê bîr û hizrê de em li hev nêzîk bûn. Destpêkê ew bîr û hizr li Silêmaniyê di nav PDK'ê de belav bû, ji ber ku him ez bi xwe li wir bûm him jî hevalên rêxistina şoreşger.

Komek xortên çepgir ên hişyar wek Newşîrwan Mistefa, Bekir Hisên, Fuad Mela Mehmûd, Şazad Sayîb, Fereydûn Ebdul Qadir, Ehmed Ebdullah û Celal Kerkûkî li dor hev kom bibûn û hêdî hêdî, ew bîr û hizir bi riya wan ve zêdetir belav dibû.

Baskê din ê nav serokatiya PDK'ê li ser bîr û hizra Marksîzm-Lenînîzmê bû, lê ji sedî sed hizra Çînî qebûl nedikir, belkî hinek ji giştiyên klasîk ên Marksîzmê hez dikir.

Di rastiyê de piştî ku di sala 1968'an de, me dest bi belavkirina pirtûkên Çînî û bîr û hizra Mao Zedong di nav xelkê kir, hêdî hêdî baskê me mezin bû.

Her wisa weşandina kovara Rizgarî û hatina hevalên rêxistina şoreşger bûn sedem da ku nêrînên me bibe baskekî hizrî. Hinek hevalên din jî wek Daro Şêx Nûrî, Fazîl Mela Mehmûd û Şehab Şêx Nûrî ketibûn bin bandora bîr û hizra zanîngeha Bexdayê. Her wisa hejmarek hevalên komîteya navçeya PDK'ê

ya Silêmaniyê wek Cemal Tayer, Mihemed Sabîr, Refet Mela û Fuad Qeredaxî mîna wan difikirîn.

Tevahiya wan kesan komî dora kovara Rizgarî bibûn. Hinek hevalên din wek Mehmûd Mela Îzet, Heme Çawşîn û hejmarek xortên din li ser wê bîr û hizra çepgiriyê bûn.

Bi vî awayî baskekî çepgir ê rêûpêk karî di nav PDK'ê de hebûna xwe nîşan bide.

❖ Piştî hilweşandina Partiya Şoreşger, ew hevalên te behsa wan kir ji xwe re rêxistinek taybet avakirin?

Piştî Peymana 11'ê Adarê û hilweşandina Partiya Şoreşger a Kurdistanê yên ku xwe marksîst-lenînîst dizanîn, ji bo avakirina rêxistinek nû hewl dan.

Me li Bexdayê "Pirtûkxaneya Hizar Nû" danîbû ku mîna nûnertiya pirtûkên Çînî dihat hesabê. Pirtûkên hizra Çînî li wir dihatin firotin û belavkirin. Darayî ya wê min peyda kir, îzna wê ser navê Daro Şêx Nûrî bû, Şehabê birayê wî jî serperestiya pirtûkxaneyê dikir.

Ew pirtûkxane navendeka hizrî ya belavkirina pirtûk û bîr û hizra çepgiriyê bû. Wê demê têkiliyek me ya gelek xurt bi balyozxaneya Çînê re li Bexdayê hebû. Balyozxaneyê pişta me digirt û bi awayekî nerasterast bi riya karmendekî xwe em teşwîqî belavkirina wê hizrê dikirin.

Bi wî awayî piştî sala 1970'yan, meseleya avakirina Komeleyê ket rojevê, her çend derbarê çawaniya wê û li ser kîjan hizrê kar bike? Bîr û nêrînên cuda hebûn.

Di wê barê de du-sê bîr û nêrîn hebûn. Şehab Şêx Nûrî, Fereydûn Ebdul Qadir, Fazîl Mela Mehmûd, Dilêr Sidîq û Fuad Qeredaxî dixwestin rêxistinekê ava bikin.

Ew hatin ba min, tevî ku li gorî nêrîna min projeya wan baş bû, lê min ji wan re got: **"Ya ku hûn dixwazin gelek sînordar dibe, nabe em koma din piştguh bixin bi taybet ên ku di kovara Rizgarî de kar dikirin."**

Her wisa min ji wan re got:

"Hinek hevalên din hene, divê em wan jî bînin nav projeyê, piştre jî divê em kesên din bînin nav wê xelekê. Ji ber wê yekê, wan ez kirim wekîlê xwe da ku ez hemiyan komî dor hev bikim."

Li vir tiştekî pêwîst heye, divê ez bêjim.

Şehab Şêx Nûrî wek mezinê wê komê dihat hesabê, Newşîrwan Mistefa jî wek mezinê koma kovara Rizgarî dihat hesabê. Lê bêbaweriyek di navbera her du koman de hebû [39].

……

[39] Di sala 1991'an de, **Newşîrwan Mistefa** di hevpeyvînekê de li Berlînê dibêje: "Naveroka sereke ya navbera komên nav Komelayê, ev bû ku **helwesta me li hember Çînê bi çi awayî be?"**
Hinek ji wan hevalan di vê baweriyê de bûn, pêdivî ye hemû tiştên Çînê, em wekî xwe werbigirin, ne yên Mao Zedong jî, bi vî hesabî ku Çîn navenda nû ya cîhanê ye û divê em li pey biçin.
Di wan deman de, ji bo me derketibû ku beşek ji siyaseta derve ya Çînê şaş e. Di wê çarçoveyê de pişta hikûmeta kevneperest a Pakistanê, hikûmeta komunîstkuj a Sûdanê û hikûmeta kevneperest a Şîliyê li Amerîkaya Latîn digre.

Li ser rola Baskê Polîtburoya PDK'ê di wê rêxistina nû de, her wisa derbarê vê yekê gelo ew rêxistina nû dê **tenê rêxistineke Maoyî be** yan jî **marksîstî**? Rêxistineke mezin be û xelkekî zaf di nav de bin an **tenê dê rêxistineke elîtî be**? Nîqaş dihat kirin.

Ez ketim navbera wan, di encamê de her du aliyan qebûl kirin, em rêxistinekê bi navê “Komeleya Marksîst-Lenînîst a Kurdistanê” ava bikin ku li ser esasa hizra Marksîzm-Lenînîzmê û bawerên Mao hewl bide partiyek pêşverû ya Kurdistanê ava bike. Hevdem li dijî împeryalîzmê be û li hember tevahiya wan rêderkrtiyan bisekine ku di nav xebatê de hene.

❖ Tu wek hêza sereke ya avakirina Komeleya Marksîst-Lenînîst a Kurdistanê tê zanîn?

Li destpêka avakirina komeleyê, me komîteyeke serokatiyê ya mezin pêk anî, lê paşê hinek ji hevalan jê vekişiyan mîna: Refet Mela, Mehmûd Mela Îzet û Bekir Hisên.

Di serokatiya Komeleyê de ez, Şehab Şêx Nûrî, Fazîl Mela Mehmûd, Fuad Qeredaxî, Fereydûn Ebdul Qadir û Dilêr Sidîq man.

Piştî demekê ji min re eşkere bû ku Fazîl Mela Mehmûd dixwaze rêbaza Komeleyê biguhere. Me programek danîbû û gelek nepenî me belav dikir.

Her wisa me biryar dabû heta wê demê ku Komele baş mezin û xurt bibe, hebûna wê nepenî bimîne, da ku nekeve ber êrişên hikûmetê û Mela Mistefa.

❖ Awayê xebata rêxistinî di nav wê komeleyê de çawa bû?

Komeleyê bi riya şaneyên hişyarkirinê kar dikir. Di wê çarçoveyê de, biryar bû li hemû navçeyan şane bên pêkanîn.

Piştre di nav şaneyan de, wan kesan hilbijêrin ku şiyana wan a karê rêxistinê hebe, piştre bikin endamê Komeleyê.

Em hîn di destpêkê de bûn ku Fazîl Mela Mehmûd dest bi komployê kir. Ew kesekî gelek jîr û xwedan şiyan bû, dikarî bi her rewşekê re rêbiçe. Wî bîr û hizra iraqçîtiyê belav dikir û dixwest ew wek iraqî û em jî wek kurdistanî bimînin.

Paş hingê ez bi hevalên serokatiya Komeleyê re axivîm û min ji wan re got: “Divê em wê pirsgirêkê çareser bikin.” Di wê çarçoveyê de em civiyan, ji ber ku bîr û nêrîna Fazîl Mela Mehmûd û Fuad Qeredaxî ya iraqçitiyê hebû, me biryara derkirina wan da.

Fazil Mela Mehmûd bi nepenî û ji riya Farûq Mela Mistefayê pismamê xwe ve, têkilî bi Partiya Komunîst a Iraqê-serokatiya Navendî re danîbû.

Tevî çûyînê jî dostaniya me û Fazîl Mela Mehmûd û Fuad Qeredaxî dewam kir, lê wan çend kes ji Komeleyê gel xwe bi-rin, her çend danerên sereke yên komeleyê ba me man.

Di wê serdemê de hinek hevalan mîna Mehmûd Efendî, Şazad Sayîb û Newşîrwan Mistefa berpirsyarî wernegirtin, bi taybet Newşîrwan wê demê ji aliyê hikûmetê ve çend sal cezayê girtinê lê hatibû birîn, me jî hewl dida bişînin derve.

Lewma piştî lihevhatina bi Mela Mistefa re, me şand derve li wê derê jî her endamê Komeleyê bû, tevî ku aktîv nebû.

Lê Şehab Şêx Nûrî û Fereydûn Ebdul Qadir aktîv bûn, berevajî ku Dilêr Sidîq endamekî çalak nebû, lê piştî heyamekê ji me cuda bû**.** Tevî ku Bekir Hisên û yên din kesên baş û hişyar bûn,

lê çalakiyên wan zêde nebûn. Du-sê xortên din jî ku nişteciheê Bexdayê bûn, hatin pêş ku yek ji wan Cefer Ebdul Wahîd bû.

Wê demê her kesê ku perwerdeya kadrotiyê li Bexdayê temam nekiriba û baweriya wî li bîr û hizra Mao Zedong neba, nedikarî bihata nav refên rêxistina Komeleyê.

Piştî wan bûyeran, karkerek bi navê "Enwer Zorab" hat nav refên Komeleyê. Paşê gel Şehab Şêx Nûrî hatin girtin û bi-darvekirin. Tevî ku kurekî baş û jîr bû, lê berî bidarvekirinê wek pêdivî berevanî nekir.

Piştî heyamekê hêdî hêdî komele mezin bû, kesên hişyar û jîr hatin nav refên Komeleyê wek; Ebû Şehab ji Kerkûkê, Şasiwar Celal ji Silêmaniyê û hejmarek hevalên din ji navçeyên din yên Kurdistanê.

Wê demê gumana me li du endaman hebû, agahî derbarê komeleyê dabin PDK'ê yan jî gelekî nêzîkî PDK'ê bibûn. Yek ji wan kopiyek ji programa Komeleyê gihandibû serokatiya Bar-zanî.

PDK û xelk ji hebûna Komeleyê hisyabûn, bêyî ku bizanin nav û nîşana wê çi ye? Piştî wê yekê, Havîna 1972'yan ez çûm derve. Hevalên me yên wek; Şehab Şêx Nûrî, Fereydûn Ebdul Qadir, Ceifer Ebdul Wahîd di navxweya welat de man, ku en-damên herî baş û jîr û pisporên Komeleyê bûn.

❖ Xalên xurt û lawaz ên komeleyê çi bûn, kê tê de rola sereke didît û rola te ya şêwirdayînê çi bû?

Dema ku min ji derveyî welat ve bala xwe didayê, min du-sê tişt didîtin ku di berjewendiya Komeleyê de nebûn.

Yekem: Reftara Şehab Şêx Nûrî ji bo çareserkirina pirsgirêkan nerm û maqûl nebû. Çêbûna nakokiyê di navbera wî û Awat Ebdul Xefûr û çend hevalên din de, bû sedem hinek ji wan cuda bibin û Komeleya Rencderan avakirin.

Duyem: Awayê xebat û karkirina Fereydûn Ebdul Qadir baş nebû, zêde girîngî dida rûvet û xwe derxistinê. Wek mînak; dixwest em kovarekê biweşînin, wêneya das û çekuc li ser be, aliyê din jî stêreka sor li ser be, ku slogana eşkere ya partiyeka marksîst bû.

Berevajî nêrîna Fereydûn, wê demê pêwîstiya me bi girîngîdayîna bi naverokê hebû da ku xebata me nepenî bimîne. Eger me lez û bez xebat bimeşanda, wê demê rêxistina me zû eşkere dibû. Eger Komele eşkere biba him rastî dijatiya hikûmetê û Partiya Komunîst a Iraqê dihat, him jî PDK'ê bi tundî lê dida û zû ji nav diçû.

Wê demê nêrîna min bi vî awayî bû. Min digot:

Divê karkirina me gelek nepenî be û di wergirtina endaman de jî gelek bi hûrî û hişyarî bixebitin. Li dijî lezkirinê bûm, min digot: Pêwîst e li her derekê şaneyên hişyariyê bên pêkanîn û xebata wan bên xurtkirin. Ji nav wan şaneyan kesên baş û xwedan şiyan ji bo nav rêxistinê bêne hilbijartin, piştî ku ew bi xwe bixwazin bikevin nav rêxistinê, em bêjinê: Rêxistinek heye û hêdî hêdî bikşînin nav Komeleyê, pê bihisînin ku rêxistinek wiha heye.

Lê mixabin di wergirtin endam û alîgiran de, hevalan lez dikirin ku li gorî nêrîna min karekî xirab bû.

❖ Çi nêrîneke te ji bo çareserkirina pirsgirêkên nav Komeleyê hebû?

Wê demê di nav welat de, nakokî di nav hevalan de hebû. Min dixwest wan kesan ên bi hevalan re rênediçûn, bişînin ba min li derveyî welat. Min dikarî wan bişînim Çînê yan welatekî din, mijûlî xwendinê bin û asta rewşenbîrî û hişyariya wan bilind bibe. Wê demê ji bo paşerojê hevalên baş ji wan derdiket, hevalên navxwe ya welat jî ji serêşiya wan asûde dibûn.

Pirseka din ku li gorî nêrîna min xirab bû, ev bû di nav Komeleyê de hejmarek kes bi taybetî jî Şehab Şêx Nûrî, Ceifer Ebdul Wahîd, Fereydûn Ebdul Qadir, piştî wan jî hinek hevalên din bê sedem bi dû nivîsên "Munîr Şefîq" ketibûn ku wê serdemê xwe wekî pisporê Marksîzm û Lenînîzmê dizanî û pirtûk dinvîsîn.

Tevî ku Munîr Şefîq zilamekî têkoşer û rewşenbîr bû û zêde di wê barê de babet belav dikir, lê ew nivîs di wê astê de nebûn ku bibin çavkanî ji bo şûnketiyên wê bîr û hizrê.

Ez di vê baweriyê de bûm, li şûna ku hevalên me wek çavkanî bala xwe bidan wan pirtûkan, dikarîn bixwînin û sûdê jê werbigirin, lê pêwîst bû çavkaniyên sereke yên Marksîzm-Lenînîzmê û Maoîzmê bixwandan.

Di wê barê de roleka girîng a "Pirtûkxaneya Hizra Nû" hebû. Ji bo belavkirina hizra nû, wê pirtûkxaneyê pirtûka "Şerê Gel" wergerand ser zimanê kurdî. Piştre Newşîrwan Mistefa pirtûka "Bijî Şerê Gel" wergerand ser zimanî kurdî. Paş hingê pirtûka "Hilbijêrek ji Gotinên Mao Zedong" ji aliyê Mamoste Îbrahîm Ehmed û Newşîrwan Mistefa ve hat wergêrandin.

Bi wî awayî hejmarek çavkaniyên marksîstî û hizra Mao Zedong bi zimanê kurdî ketin nav bazarê.

Dawiya Cilda Yekem
a Pirtûka Hevpeyvîna Temen

Beşa Hejdehem
18
Wêne Mam Celal

Hejmarek wêne yên
Mam Celal
ji Rortiyê Heta Serokkomariyê




Mam Celal (Tezelawî)




Mam Celal (Xortî)



Mam Celal (Destpêka ciwaniyê)



Mam Celal
Piştî temamkirina zanîngehê



Mam Celal
Destpêka kemilîna jiyanê



Mam Celal
Jiyana di nav gundan de



Mam Celal Digel desteyeke efser û leşkeran



Mam Celal û Mamoste Îbrahîm Ehmed Di helkeftekê de



Mam Celal
Destpêka pêşmergetiyê



Mam Celal
Piştî sîh saliyê



Mam Celal - Şam Havîna 1955



Mam Celal - Festîvala Ciwanan li Moskowê



Mam Celal - Festîvala Ciwanan li Moskowê



Hejmarek serkirdeyên şoreşê û pêşmerge - Zivistana 1963



Mam Celal



Sibata 1963 - Gundê Şerwêtê

Ji Çepê ve: Kerîm Qerenî, Mam Celal, Loqman Barzanî



Ji rastê ve:

Şemsedîn Muftî, Babe Tahîr, Mam Celal, ?, Dr. Kemal Fuad



Adara 1963 - Kanî Maran
Mam Celal digel Barzanî û hejmarek Mukriyan




Adara 1963

Mam Celal digel Dr. Kemal Fuad û hejmarek pêşmerge



Bexda 1963 - Danûstandin
Ji rastê ve: Salih Yûsifî û Mam Celal, …



Civîna Koyeyê 18'ê Adara 1963'yan
Mam Celal, Şêx Letîf Şêx Mehmûd, …



Mawet 1963 - Meşeke pêşmergetiyê



Mam Celal li gel hejmarek pêşmergeyan



Destpêka 1963 - Mam Celal û Omer Debabe



Destpêka 1963 - Mam Celal li gel hejmarek pêşmerge



Kurdistana Îranê - Tîrmeha 1964
Mam Celal û çend efserên îranî



Hemedan - Tîrmeha 1964



Tehran
Mam Celal li gel çend serkirdeyên PDK'ê



Tehran - Îlona 1964
Ji rastê ve:
Hîlmî Elî Şerîf, Îsmet Şerîf Wanlî, Mam Celal, Dr. Kemal Fuad



Kurdistana Iraqê - Kelar 1967

Ji rastê ve:

Ezîz Gurge, ? , Neqîb Heme Salih, Qadir Berdespî, Ebdul Rehman Zebîhî, Hemze Axayê Pişderî, Hemed Emîn Axayê Dizeyî, Mam Celal, ? , Şêx Letîf Berzencî, Ebas Hisên



Newroza 1969 - Selman Pak nizîkî Bexdayê



George W. Bush û Mam Celal



Mam Celal û Şêx Sebah



Weşandina nûçeya serdan
Mam Celal
a Çînê û civîna bi serokê wî welatî re
di rojnameya CHINA DALLY de

Ev hevpeyvîn di heyama 15 salan de hatiye qeydkirin û nivîsandin ango ji sala 1990'an ve dest pê kiriye û sala 2005'an bi dawî bûye.

Di vê hevpeyvînê de bîranînên Mam Celal bi awayê pirs û bersiv hatine qeydkirin, Her di wê çarçoveyê de Mam Celal berê li çend cihan û bi çend kesan re behsa vê yekê kiribû, wî bîranînên xwe ji nû ve nivîsandine.

Hewceyiya dîroka hemdem a Kurd û nifşa nû bi van şahidî û agahiyên Mam Celal heye, ji ber vê yekê min girîng dît ku vê hevpeyvînê wekî emaneteke dîrokî û exlaqî biweşînim û ez gelek piştrast bûm jî dê roniyê bixe ser beşekê ji dîroka têkoşîna gelê Kurdistanê û dibe goşeyeke cuda ji bo dîtina buhuriyê.

Di dawiyê de ev hevpeyvîn ji bo dijberiya tu partiyekê yan kesatiyekî yan jî di berjewendiya wan de nehatiye kirin, belkî tenê behsa buhuriyê dike, çawa ku Mam Celal dîtiye û di nav de jiya ye.

Selah Reşîd

MAM JALAL
SUCCESSIVE INTERVIEWS
FROM YOUTH TO THE PRESIDENCY